# WATE Û GIRÎNGIYA PERWERDÊ

**HEVAL ABBAS**

WEŞANÊN OCAXA PKK YA SAKÎNE CANSIZ-20

# WATE Û GIRÎNGIYA PERWERDÊ

HEVAL ABBAS

WEŞANÊN OCAXA PKK YA SAKÎNE CANSIZ-20

**WATE Û GIRÎNGIYA PERWERDÊ**

**Dîroka Weşanê: 2016**
**Cihê Weşanê: Matbaya Azadî**

**WEŞANÊN OCAXA PKK YA SAKÎNE CANSIZ-20**

***NAVEROK***

***PÊŞEK .......................................................................................5***

***DI ÇARESERKIRINA PIRSGIREKAN DE RISTA PERWERDEYÊ ................7***
*-Em Çima Pêwîstiyê Bi Perwerdeyê Dibînin .......................................10*
*-Bêyî Ku Kesayeta Azad Were Afirandin,*
*Netewa demokratîk û Civaka Demokratîk Nayê Înşakirin ...................16*
*-Di PKK'ê De Perwerde, Bi Serê Xwe Karekî Şoreşê Ye..........................17*
*-Di PKK'ê De, Ji Roja Destpêkê Ve*
*Bîst û Çar Seatan Şoreşgertiya Profesyonel Esas e ..............................26*
*-Bêyî Ku Kesayeta Azad, Demokratîk û Komînal Were Afirandin,*
*Civaka Sosyalist Çênabe ....................................................................32*
*-Rastiya Serokatiyê, Dibistaneke Ku Her Dem Derdora Xwe Ronî Dike Ye .....38*
*-Perwerdeya Rast, Çeka Herî Mezin e...................................................43*

***PIRSGIRÊKÊN BÎRDOZÎK KU DI SEKNA KADRO DE TÊN JIYANKIRIN ....... 63***
*-Li Hemberî PKKê, Çeka Herî Esasî Ya Tesfiyegeran*
*Paşvekişandina Pîvanên Partiyê Bû ....................................................71*
*-Di Sekna Kadro De Çiqasî Ezezî û Cudabûn Hebe,*
*Di Nav Me De Ewqasî Partiyên Cuda Hene ..........................................79*
*-Aliyê Herî Girîng Ya Perwerdeyê Têkoşîna Rêxistinî û Bîrdozîk e ........92*

***PKK WEK VÎNA AVAKARIYÊ Û VÎNA XWEBÛNÊ DERKET HOLÊ ....... 125***
*- Divê Nêzîkatiyên Propagandawarî*
*û Nedîtina Merheleyên Jiyankirî, Bên Derbskirin ...............................136*
*-PKK Pênaseya Xwe, Ji Sekna Xwe Ya Giştî û Rast Digire ...................141*
*-Konfedaralîzma Demokratîk, Ne Koalîsyonek e ...............................146*
*-Sedemên Rêxistinî Yên Berovajîbûnên Bîrdozîk ...............................153*

***PÊWÎSTIYÊN XETA SEROKATİYÊ Û XETA BÎRDOZÎ-POLÎTÎK.............. 163***
*-Rêbaza Herî Baş Ya Fêmkirinê, Serokatî Ji Serokatiyê Fêrbûn e........166*
*-Ger Rexne û Rexnedayîn Tunebe, Em Nikarin Fikrên Nû Bi Pêş Bixin ...........171*

***ENCAM ......................................................................................... 173***

**PÊŞEK**

Perwerdeyê, Serokatî wek veguhestina danehevên civakê ji bo nifşên nû dinirxîne. Hemû kombûnên civaka îro, bi perwrdeyên devkî û nivîskî çêbûne. Bi taybetî perwerdeya jiyanî, ango jiyan wek perwerdeyê girtina dest; taybetmendiyeke mezin ya tevgera me ye.

Tevgerên bîrdozîk ku xwe wek alternatîfa pergalê rêxistin dikin, bê perwerde nikarin çand, exlaq, fikir, jiyan û pergala nû bi pêş bixin. Ger mirov xwediyê angaşteke wisa be, teqez divê pergaleke mirov ya perwerdeyê ku xwediyê bername û naverokeke bi vî rengî ye hebe. Ji ber ku pergala serdest, ji her aliyî ve şîlobûn çêkiriye û mirov li gorî deshilatdariya xwe kedî kirine. Bi taybetî welatekî wek Kurdistanê ku hemû cureyên qirkirina çandî li ser hatine meşandin, koletiyeke nûjen hatiye afirandin û em bûne biyaniyên heqîqeta xwe ya çandî û civakî.

Ji ber vê PKK, wek Tevgereke Azadiyê ya Kurdistanê, ji roja destpêkê ve li hemberî wê koletiyê bi perwerdeyên li dar dixe, afirandina ew kesayeta azad angaşt kiriye. Hemû hewldanên ewil, ji bo rûxandina qereqolên ku di mejiyên me de hatine avakirin û ji holê rakirina ew kesayeta kole ye. Îro jî ji aliyê civaknasiyê ve manifestoya ku Serokatiyê bi pêş xistiye xîtabî hemû mirovahiyê û gerdûnê dike. Ango naverokeke pir berfireh ya perwerdeyên me heye. Ji aliyê rê û rêbazê ve jî, em dikarin bibêjin perwerdeyên me gihîştine lûtkeyê.

Ev xebata di destê we de jî, waneyeke ku li ser esasê van mijaran, di Ocaxa PKK’ê de hatiye dayin e. Di vê pirtûkê de Hevalê Abas, diyalektîka perwerdeyê, jiyan û pratîkê vedibêje. Bi taybetî pirsgirêkên me yên rêxistinî û bîrdozîk û bi perwerdeyê ve girêdanbûna wan vedike. Ya herî girîng jî, dê kadroyek xwe çawa perwerde bike, çawa nêzîkî perwerdeyê bibe, rê û rêbazên xwe perwerdekirinê û bi awayekî rast nêzîkbûna perwerdehiyê; di vê xebatê de tên diyarkirin.

Ji ber van sedeman me girîng dît ku em vê xebatê bizivirînin pirtûkê û bigihîjînin ber destê hevalan. Ev pirtûk beriya demekê bi zimanê Tirkî, hate weşandin. Lê ji ber ku çavkaniyeke bingehîn e, me pêwîstî pê dît ku em Kurdiya wê jî biweşînin. Em bawer dikin ku dê ji bo hevalan gelek girîng û kêrhatî be.

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**Ragihandina PKK**

## DI ÇARESERKIRINA PİRSGİRÊKAN DE RISTA PERWERDEYÊ

Di demeke ku em dikevin dewreya zivistanê ya 2014-2015’an de, wek tevger pirsgirêkên me yên rojane çi ne? Bêguman em ne bê pirsgirêk in, em bi peywirên pir giran re rû bi rû ne. Em di demeke ji rêzê re jî derbas nabin. Ango serxistana van peywir û berpirsyariyên giran, ji me pêşengtiyeke xurt dixwaze. Ew yek ji pirsgirêkên kadro û rêveberiyê derdixe pêş. Di cewherê fermanameyên ku Rêber Apo ku bi çend nameyên xwe de gihandine me jî ew hebû. Di pirsgirêkên kadro û rêveberiyê de, derketina ji xetê, lewaziyên hene û aliyên me yên bi xeta Serokatiyê re nabin yek; ji gelek aliyan ve bi mînakan hatibûn rexnekirin û bi awayekî şênber danîbû holê. Li ser vî esasî sererastkirin tê xwestin.

Rojeva civîna me ya Komîteya Navendî ya vê dawiyê jî ev bû. Ew civîn wek ku di pêşnûmeya me de jî hatiye diyarkirin, piştî kongreya 11’emin wek civîna salane hat li darxistin. Lê belê di şert û mercên awarte de pêk hat. Taybetmendiyên pêvajoyê awarte bûn. Li gorî vê awartebûnê, li çar aliyên Kurdistanê berxwedan, rêveberî û kadroyên ku vê berxwedanê bigihînin serkeftinê hatin niqaşkirin. Rojevên esasî yên civînê ew bûn.

Ji civîneke asayi û salene wêdetir; civîneke ku li ser esasê rexneyên Serokatiyê, berpirsyariya bi awayekî kûr niqaşkirin û çareserkirina sekna bîrdozîk-rêxistinî, pirsgirêkên pêşengtiyê, bi taybetî jî pirsgirêkên rêveberî û kadro girtibû ser xwe bû. Wisa jî hate nîqaşkirin. Tiştê ku demxeya xwe li civînê xist, pirsgirêkên rêveberî û kadro bûn. Bi awayekî giştî rexneyên Serokatiyê wek waneyên pratîka şoreşgererane girtina dest û li gorî vê sererastkirinên pêwîst kirin, çawa çêdibe? Li hemberî vê pirsê lêgerina çareseriyeke giştî hate kirin. Wek partî em dikarin bibêjin, riya çareseriyê vebû. Jixwe bi nirxandinên Serokatiyê jî ew rê hatibû vekirin. Di niqaşên giştî de jî, ew yek tê çi wateyê; dîtin, zanîn, pêşî lê vekirin û li ser vî esasî bi pêşdîtin tevgerîn ne zehmet e. Lê belê tespîtên Serokatiyê û riya çareseriyê dîtin û nîşandayîna partiyê bes nake.

Di warê kesayet de divê pejirandin û daqurtandin çêbibe. Divê kes çareseriyeke bi vî rengî, di kesayeta xwe de biafirîne. Jixwe rêveberî, ji kes û kadroyan pêk tê. Bûna rêveberiyeke bes û nebes jî, xwe kirina hêza çareseriyê ya kadro û kesan ve girêdayî ye. Ger kes li ser esasê

xeta Serokatiyê, xwe nekin hêza çareseriyê; rêxistin çiqas pêşiyê veke, rê nîşan bide û bibe xwediyê çareseriyeke afirîner jî; dê ew yek tenê li ser kaxizê bimîne. Dê wek biryarên civînê bimînin, bi awayekî bes derbasî pratikê nabe. Dê kêmasî û şaşîtî, pratikê diyar bikin. Bi vî awayî pratîka nîvco, pratika kêm û ne bes bi pêş bikeve. An jî neketina pratikê, bêpratîkbûn bi pêş bikeve. Ya rast, ji bo ku em rewşa xwe rewa bikin, em dibêjin pratika nîvco. Serokatî dibêje: “Performansa we ji sedî yek e.” Me digot; wek nêzîkbûn rewşa me pir ne xirab e, me dixwest vê bi xwe bidin bawerkirin; lê Serokatiyê ev yek jî sererast kir, got: “Nîvco nîn e, tenê ji ser sifirê re ye.” Ew yek rewşeke pir cidî ye.

Ji vî aliyî ve mijara esasî ya perwerdeyê; bûna kadroyê rast û rêveberiya têr û tijî ye. Ger me pratîkek baş bikira, niha em ne li vê derê bûn. Gelo me yê çi bikira? Me yê şoreş ava bikira, em ê di nav pratikeke kûr de bûna, me yê serkeftinên pir xurt bi dest bixista. Derfet û potansiyela vê jî hebûn. Vê ne tenê em, hemû cîhan wisa dinirxîne. Her kes qebûl dike ku di vê pêvajoyê de ji aliyê Kurd û gelên Rojhilata Navin ve, ber bi jiyana azad û demokratik ve meşinê fersend û derfetên pir mezin derketine holê. Di navenda vê de jî Kurdistan heye. Ji dema ku pergala Osmaniyan serdest bûye û vir ve Kurd û Kurdistan cara ewil, di asta gerdûnî de bi bandor dibin. Ji bo mirovahiyê di rewşeke girîng de ne.

Bi vî awayî  bi dîrokê ve dibe yek. Ango rista wê ya dîrokî careke din derdikeve holê. Kurdên ku wek civakeke azad jiyan dikin, an ji ber bi asteke wisa ve dimeşin; ji bo gelên ku li Rojhilata Navîn jiyan dikin û hemû mirovahiyê, dibin xwediyê rist û cihekî pêşeng. Jixwe dîroka civakan jî li ser risteke wisa bi pêş ketiye, di vê dîrokê de Kurdan rista pêşengtiye lîstiye. Ev daneyên zanistî ku van deh salên dawî derketine zêdetir îspat dikin û her kes jî vê dipejirîne. Her çiqas gelek derdorên êmpêryalîst dixwazin vê rastiyê li gorî berjewendiyên xwe binirxînin jî, ew jî nikarin vê rastiyê red bikin.

Wisa be, ew rewşa ku di van çend sedsalên dawî de şêwe girtiye û sedsala dawî de jî li ser hîmê înkar û îmhayê wek rejîmeke jenosîda çandî û civakî tê jiyankirin were guhertin û ji holê were rakirin; dê sekneke pir cuda ya gerdûnî û civakî derkeve holê. Çawa ku di dîroka mirovahiyê de Kurdistanê rista pêşengtiyê lîstiye, di roja me ya îro ku pergala modernîteya kapîtalîst, ji bo ku mirovê azad û civaka azad ji holê rake, êrîşên herî hov pêk tîne û di demeke ku têkoşîna azadî û

têkoşîna civaka demokratîk bûye pêwîstiyeke girîng de jî, rista pêşengtiye dîlîze. Ji bo mirovahiyê riyeke nû datîne holê û riya pêşketinê vedike. Ev yek bi awayekî şênber tê dîtin û êdî her kes jî vê rewşê qebûl dike.

Di roja me ya îro de, derfetên avêtina gavên mezin û pêngavên nû pir zêde ne. Li her çar parçeyên Kurdistanê jî, rewşên bi nakokî û tijî pevçûn hene. Di rewşeke wisa de ji bo ku em serkeftî bibin, Pêwîstî bi pêşengtiyeke ku rast û kûr fêm dike, zêdetir wêrek û fedakar tevdigere, zêdetir bi plan û rêxistinî dixebite heye. Serkeftin, bi pêşengtiyeke wisa ve giredayî ye. Ji ber ku pêşengtiyeke me ya bi vî rengî digihîje serkeftinê tune, em pêwîstî bi niqaşeke wisa dibînin.

Têkoşîna rojane, ji bo kesên ku wê baş dişopînin dibistana herî mezin e. Çi rast e, çi şaş e, çi çêbû, çi çênebû, divê em çi bikin, tiştên ku divê bên kirin çima rast nehatin kirin, çiqas şaşîtî û kêmasî hatin kirin? Kesê ku lêpirsina van bike, kesê ku gihîştiye wateyê, kesê ku xwe perwerde kiriye û her peywir û berpirsyariyê re amade ye. Ji bo vê jî, bingeha ku li Kurdistanê çêbûye, asta têkoşînê ku heye, dewlemendî, kûrbûn û daneheva derketiye holê, li tu cihên din tune.

Em li têkoşîna li Îmraliyê binêrin, em li têkoşîna gerîla binêrin, ji heft salî heya heftî salî têkoşîna gelekî binêrin, em sekna welatparêzên xwe yên li derveyî welat di nav şert û mercên ew qas zehmet de ked û hewldan nîşan didin binêrin. Em li hewldan û lêgerînên zarok, ciwan û jinan binêrin. Ew hemû rastiyekê nîşan didin. Ew rastî, di wê astê de ne ku bandoreke kûr dikin. Fêmnekirina wê, nabe. Gelo em dikarin bibêjin ez li van rastiyan meyze bikim, bibînim, lê nikarim tiştekî jê derxim? Ger em wisa bibêjin, em ê xwe ji rê derxin. Em çima pêwîstî bi perwerdeyê dibînin, çima em ew qas dibistan û akademî vedikin? Dema ku em tengav dibin, çima em dibêjin perwerde û perwerde? Ji ber vê sedemê ye.

Peywir û berpirsyariyên me yên cidî hene, fersend û derfetên mezin derketine holê, ji bo ku em pêngavên mayînde û encamgir yên azadiyê biavêjin rewşeke pir guncaw heye. Lê ji bo ku em van hemûyan bikin, pêwîstî bi hêzeke ku van rastiyan hemûyan dibîne, bi kûrahî fêm dike, li gorî vê xwe rêxistin dike, bi plan dike û dimeşîne heye. Beyî ku hêzeke wisa hebe; fersend, derfet û mercên hene bi serê xwe pêşketinekê çênakin, encamekê dernaxin holê. Dibe ku bingehekê ava bike, lê bi serê xwe pêngaveke azadiyê neafirîne. Ger pêşengtiyeke

rêxistinkirî û bi plan tunebe, derfet û fersendên hene rast û di dema wê de nayê bikaranîn; ew derfet û fersendên ku derketine holê, dê bi êrîşên dijber ji holê bên rakirin.

Ger ya rast ew be, ji bo ku derfet û fersendên heyî jî tune nebin, çi pêwîst dike? Pêwîstî bi hêzeke şoreşgerene ku bi awayekî rêxistinî û bi plan rewşa heyî di cih de nede sekinandin û bi pêş ve bibe heye. Bêyî ku ew yek pêk were, derfet û fersend çiqasî zêde dibe bila bibe, rewşa heyî çiqasî guncaw dibe bila bibe; pêkhatina pêngava azadiyê, vesazkirina civaka demokratîk û netewa demokratîk ne guncaw e.

Serokatiyê bi fermanameyan, ew rastî dahûrand û danî pêşiya me. Civîna me ya Komîteya Navendî jî li ser vî esasî nîqaş kir û nirxand. Tespîta "Ji bo ku pêngavên mezin yên şoreşgerane pêk werin, divê pirsgirêkên rêveberî û kadro li ser bingeha xeta Serokatiyê bêyî ku bê derengxistin bê çareserkirin," pêk anîm. Di nav şert û mercên em tê de, şoreş kirin; pêşengtiya şoreşgerî û asta bîrdozîk-rêxistinî derxistina holê; sekna we ya kadro û rêveberiyê ji kesayeta xwe dayîna xwarin û pêkanîn; ji bo serkeftina şoreşê amadekariyek mezin kirin…

Ew mijar cewhera perwerdeyên me nîşan didin. Hemû kadroyên ku tevlî perwerdeyê dibin, ger bên asteke wisa dê pirsgirêka pêşengtiyê jî ji holê rabe. Bi rastî jî ger em ji pêwîstiyên pêşengtiyê û rexneyên Serokatiyê re bibin bersiv; di vê astê de pirsgirêkên kadro û rêveberiyê bên çareserkirin, hêza ev dewreya perwerdeyê, di nav van şert û mercan de, ji bo ku em pêngaveke şoreşgerî bi pêş bixin têrî dike.

### Em Çima Pêwîstiyê Bi Perwerdeyê Dibînin

Em çima pêwîstiyê bi perwerdeyê dibînin? Em çima hatin vê derê? Ev pirs li pêşiya me ne. Ya yekemin, li pêşiya me peywirên dîrokî ku em bigihînin serkeftinê hene. Ya duyemîn, di nav me de hin pirsgirêkên ku pêşiya ew peywira me dibin asteng hene. Pirsgirêkên rêxistinî û bîrdozîk hene. Wek PKK, em tevgereke ku xwedî hin rêgez û armancan e. Em ne tevgereke ku şîlo, ji her tiştî re vekirî û bê aliyî ne. Em tevgereke Serokatiyê ne; Serokatî mêzekirineke jiyanê û rêgezên jiyane îfade dike. Wisa be partiya me li gorî rêgezên xwe jiyanê digire dest û li gorî nêrinekê dinirxîne.

Yên ku Li gorî van rêgez û pîvanan e, digire nav xwe û wan wek kadro û endamên xwe pênase dike. Ango her kesî qebûl nake û nagire

nav xwe, her kesê ku bixwaze, nikare bikeve nav PKK'ê. Dema ku nêrin û mêzekirina xwe bi partiyê ve bike yek û pivan û rêgezên partiyê bipejirîne dikare tevlî bibe û bibe endam. An na her kesê ku bibêje ez PKK'yî me, nabe PKK'yî. Lê van demên dawî ev wisa bûye. Lê belê ya rast ne wisa ye, tiştê ku te jiyankirin, ji rêderketineke, tesfiyegerî ye.

Ji vî aliyî ve em dikarin bibêjin, hê jî me bandorên tesfiyegeriyê li ser xwe neavitine. Jixwe rewşeke ku partîbûnê tam jiyan nake û her tiştên dijberî partiyê jiyan dike di kadroyên me de tê dîtin. Di partîbûnê de rewşeke bi pirsgirêk tê jiyankirin. Dema ku êrîş, zext û bandorên komploya navnetewî û bandorên zemîna tesfiyeger jî li ser vê zêde dibin; di zanebûn û feraseta partiyê de ji rêderketineke pir cidî derket holê.

Gelo kesê ku dibêje ez PKK'yî me, PKK'yî ye an na? Ji bo ku mirov bibe PKK'yî, gelo gotina ez PKK'yî me têrî dike, an na? Ger bes neke, divê mirov çi bike? Divê di vê mijarê de, em zelal bin. Lewre mûxlaqbûn û şîlobûn pir xetere ye. Lê dema ku em li rewşa heyî mêzî dikin, her çiqasî em qebûl nekin jî, di pratikê de rewş bi vî rengî ye.

Her kesê ku dibêje ez PKK'yî me, dikare bibe PKK'yî? Rêgez hene, feraseta partiyê heye, peywir hene; lê qet ne di hesab û fikra wî/ê de ye. Ew rewş ji aliyê rêxistinî ve tam oportonîzm e. Wek anarşîzma rêxistinî û tevliheviya rêxistinî, di şoreşa Rûsan de Menşevîzm û Martontî pir tê nîqaşkirin. Îro di mijara partîbûnê de, tiştê ku em jiyan dikin jî ew e. Dibe ku navê wê wisa nayê danîn, lê tiştê ku tê jiyankirin ew e. Bi kurtasî wek tevgereke rêgez û pivanan PKK ve, hin feraset û nêzîkbûnên me ku hev nagirin û tam dijberî vê ne hene.

Îro di nav partiyê de tiştê ku herî kêm girîngî tê dayin sekna bîrdozîk û rêxistinî ye; têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî ye. Ger israr û zorlamaya Serokatiyê tune be, dê têkoşîna çînî û zayendî (sınıf ve cins mücadelesi) ji holê bê rakirin. Ji ber vê tesfiyegeran xwestin vê jî bi kar bînin. Hin rêbazên ku di demên berê de Serokatiyê bi pêş xistine, me normal nedîtin, me şaş dîtin, me hema ji lênûskên xwe derxistin; me li gorî xwe xwest partiyeke nû û pivanên nû bi pêş bixin. Diyar dibe ku di hundirê xwe de, em li hemberî Serokati bûne. Em ji aliyê dijber ve digirin dest, ger em fersenda wê bibînin em ê hema PKK'ê berovajî bikin. Ji ber ku em fersenda wê nabînin jî em kar bi zehmetî dimeşînin. Perwerde çima encam nagirin? Lewre wek ku Serokati digire dest,

nayê destgirtin. Wek diyardeyeke têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî nayê ditîn, ji ber vê encam nagire. Divê ew tişt bên sererastkirin.

Ji ber vê em pêwîstiyê bi perwerdeyê dibînin. Ger em ne tevgereke Serokatiyê bûna, ger em ne tevgereke bersivê dide jiyanê bûna, ger em ne tevgereke ku xwedî pîvan û rêgezan bûna, pêwîstiya me bi perwerdeyê jî nedibû. Çima? Lewre pêwîstiya me bi yekîtiyekê nedibû ku em ji bo avakirina vê yekîtiyê mijûl bibin û xwe perwerde bikin. Pêwîstiya me bi van tiştan nedibû. Bala xwe bidinê, hinek tevger hene, qet perwerdeyê nabînin, pêwîstî bi vê nabînin. Çima? Lewre ew ne tevgerên wek me ne. Felsefeya wan ya jiyanê tune, rêgez û pîvanên wan tune. Ya rast jixwe di nav pergalekê de ne, wê pergalê jî felsefeyeke wê ya jiyanê û rêgezên wan hene. Jixwe ew pergal perwerdeya pêwîst dide wan û pêwîstiyeke wan a wisa çênabe. Li Tirkiyeyê pergal vê bi rehetî dike. Tevgerên ku pergala dewletê esas digirin, pêwîstî bi xwe perwerdekirinê nabînin. Jixwe kesek çawa tê dinê, dewlet dest bi perwerdekirina wî/ê dike. Berî navê dayik û bavê wî/ê, wî/ê fêrî navê dewlet û hikumetê dike.

Baş e çima di nav PKK'ê de ew qas pêwîstî bi perwerdeyê tê dîtin? Ji ber ku PKK, pergaleke bi vî rengî ve ne girêdayî ye. Bixwe pergaleke cuda û alternatîf difikire. Pergala civaka demokratîk û netewa demokratîk dide pêşiya xwe. Ji ber vê mêzekirina xwe ya jiyanê, rêgez û pivanên xwe yên jiyanê cuda ne. Ev tevger mirov û civakeke cuda dixwaze. Ji ber ku van cudabûn û alternetîfan bi endamên xwe bide fêmkirin û li gorî vê kesayetekê bide avakirin pêwîstî bi perwerdeyê dibîne. Ji ber vê divê em xwe perwerde bikin. Bi awayekî giştî mirov dikare van tiştan diyar bike.

Ji aliyê din ve, em bi derfet û fersendên dîrokî ve rû bi rû ne; peywirên ku divê em bi ser bixin hene. Ji bo serkeftina van, divê kesayetên zîrek hebin. Kesayeteke ji rêzê, welatparêziyeke ji rêzê, şoreşgertî û sosyalîstiya ji rêzê, di demeke wisa dîrokî de; ji bo pêşxistin û xurtkirina têkoşîna azadiyê bes nake. Bi rastî jî, pêwîstî bi kesayeteke bi pêşbîni tevdigere, bi kûrahî fêm dike, bi tarz û tempo û islûbekî rast dikeve pratikê heye. Pêwîstî bi milîtanê pêşeng heye. Ji bo ku kesayetên wisa bên afirandin jî, pêwîstî bi perwerdeyê heye. Bi rewşa heyî sekna me ji bo pêkanîna van peywiran têrî nake. Rêber Apo got: "Pratika we ji sedî yek e." Wisa be, em ji sedî not û neh vale dihêlin û heder dikin. Ev wisa naçe. Dema ku rewşa me wisa be, em nikarin ji xwe re

bibêjin milîtanên pêşeng. Ger em ji sedî yekê bikaribin derxin ji sedî heştê, em dikarin behsa milîtantiya şoreşgerane bikin. Wê demê em dikarin kesayeta Apoyî û kesayeta partiyê ava bikin. Ew rewş bi xwe diyar dike ku pêwîstî û pirsgirêkên me yên perwerdeyê hene.

Rêber Apo got: "Pergala modernîteya kapîtalîst, pergala qirkirina civakê ye." Di vê sedsala dawî de li ser Kurdistanê rejîma qirkirina çandî tê ferzkirin. Qirkirina civakê, di asta jenosîdekê (soykırım) de tê meşandin. Di vê qirkirina civakî de, li ser Kurdan bêaqilbûn û bêfikirîn tê ferzkirin. Di salên heftêyî de, Serokatiyê ji vê re digot: "Mêtîngeriya mejiyî (beyinsel sömûrgecilik)." Di parêznameyên dawî de dibêje: "Qirkirina zihni." Di navenda qirkirina çandî de jî ew yek heye. Cihê ku qirkirina fizîkî zindîbûnê tune dike, qirkirina çandî jî fikir tune dike. Dixwazin kesê ku ji bo xwe nefikire, rastiya xwe nebîne; kesê ku jiyana azad fêm neke û vîna jiyanê dernexe holê, biafirînin. Dixwazin zihniyet û kesayeta ku ji bo hinekan difikire, ji bo hinekan jiyan dike bi pêş bixin. Dixwazin koleyên ku ji bo hinekan dixebite, xizmet dike û bi her awayî radest bûye û bûye yê hinekan derxin holê.

Cewhera qirkirina civakî ku modernîteya kapîtalîst ferz dike ew e. Li ser vê dixwaze kes û civakan bi rê ve bibe. Dixwaze hêza xwe ya rêvebirinê bi êrîş, serdestî û tahakûmê xurt bike. Bi danehevên dewletên berê, dixwaze xwe derxe asteke wisa. Qirkirina civakî; ji holê rabûna zihniyet, rih û hestan e. Ji rastiya xwe qutbûn, koletî û metingerî ye. Qirkirina civakî, vê bi awayekî girantir dike. Kes û civakê ji çand, ziman û civaka wî/ê qut dike. Qirkirina civakî, di nav heman ziman û çandî de, dixwaze tahakûmeke fikrî û hestî bi pêş bixe; lê qirkirina çandî ji aliyê nirxên çandî ve, ji aliyê ziman û çand ve jî bişavtin û qirkirineke û ji rastiya xwe dûrketinekê dide jiyankirin. Niha em jî bi êrîşeke bi vî awayî re rû bi rû dimînin.

Hemû mirovahî îro bi vê êrîşa modernîteya kapîtalîst re rû bi rû ye. Gelê Kurd, bi vê êrîşa rejîma qirkirinê re rû bi rû ye. Ev êrîş hemû tiştên me bandor dike. Hemû pergala jiyanê, perwerde, ziman, çand… Her tişt li gorî qirkirina civakî û jenosîdê hatiye rêxistinkirin. Wek ku kevirê aş ard dihêre; pergala heyî jî mirovan dihêre û li gorî xwe dike ard û dixwaze li gorî xwe şêwe bidiyê. Mirovahî di bin êrîş û zexteke wisa de ye. Ji aliyê rih, hest û nêzîkbûnên xwe ve, bîst û çar seatan, em di bin êrîşê de ne. Her tiştê me li gorî berjewendiyên pergala serdest şêwe digirin. Em wê dibîhîzin, wê difikirin, wê dizanin.

Em di asteke wisa de ne. Ev yek li hemberî pergalê, her dem têkoşîn meşandin û li ser esasê vê têkoşînê jî, xwe ji nû ve avakirinê û xwe guhertinê li ser me ferz dike. Afirandina kesayet û pêkanîna şoreşa kesayet di vir de derdikeve holê. Rêber Apo vê, wek şoreşa kesayet, şoreşa zihniyet û şoreşa wijdanî dinirxîne; pêvajoyeke wisa pêşbînî dike.

Li hemberî qirkirina modernîteya kapîtalîst, li hemberî qirkirina çandî ya pergala înkar û îmhayê; ji bo ku em bikaribin bibin mirovên welatparêz, gelperwer, azadîxwez, komînal, demokrat; ji bo ku em bikaribin bibin mirovê pêşeroja xwe ya azad dibîne û bi plan dike, ji bo ku em bikaribin bibin mirovê zane û rêxistinkirî; divê li hemberî hemû êrîşan em têkoşîn bikin û li ber xwe bidin. Şoreşeke kesayet ku van taybetmendiyan hemûyan di hundirê xwe de dihewîne, pêwîst dike. Cewhera şoreşa PKK'ê jî, ji vê şoreşa kesayetê pêk tê.

Serokatî bi nirxandinên xwe gihîşt vê encamê. Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd, ji merheleya çareseriya leşkerî, çarereseriya siyasî, avakirina pergala siyasî û avakirina merheleya devletbûnê ve hate derbasbûn. Em gihîştin çareseriya netewa demokratîk û çareseriya civaka demokratîk. Hate fêmkirin ku bi çareseriyên siyasî û leşkerî û bi avakirina dewletan kes û civak azad nabin. Civakên ku ji bo vê bi milyonan şehîd dane, dîsa vegeriyan pergala berê. Di rewşeke wisa de, Serokatî li ser esasê "Paradîgmaya Ekolojîk, Demokratik û Azadîxwaziya Jinê" pêşxistina civaka demokratîk û netewa demokratîk esas girt.

Perwerdeya me, perwerdeyeke têkoşînê ye. Parçeyek ji têkoşîna hundirîn e. Di qada leşkerî û siyasî de, di têkoşîna li hemberî hêzên derve tê dayin de û li hemberî bandorên van hêzan ku di nav me de avakirine, têkoşîneke bîrdozîk û rêxistinî ye. Wisa be divê em perwerdeyê wek diyardeyeke têkoşînê bigirin dest. Li hemberî bandorên ku dijmin di nav me de avakirine; têkoşîneke hundirîn, têkoşîneke çînî û cînsî ye. Têkoşîneke terbiyekirina nefsa xwe ye. Divê perwerdeya me ji binî heya serî, têkoşîneke di nav xwe de bihewîne; an na perwerde bi awayekî pasif, tenê fêrbûna hin tiştan nîn e. Carinan wisa tê dest girtin, ew yek şaş e. Ji ber vê em nikarin xwe bigihînin zanebûnekê û nikarin pratîkeke rast bi pêş bixin. Ger em perwerdeyê wek têkoşîneke pratîkî û jiyanî bibînin, em dikarin encama ku em dixwazin bi dest bixin û têkoşîneke çar bi çar bi pêş bixin.

Di têkoşîna leşkerî û siyasî de serkeftin, bi têkoşîna bîrdozîk ve girêdayî ye. Rastiya PKK'ê ew e. Ger derketina mezin ya Serokatiyê tu-

nebûya, ne gotin ne jî çalakî çêdibû. Ger berxwedana mezin ya zindanê tunebûya, ne serkeftina mezin ya gerîla dibû, ne jî serhildan dibûn. Rewşa kesên ku di zindanê de li ber xwe nedana binêrin; kesên ku digotin: "Em serokên Kurdistanê ne, em rêxistina herî mezin in." Ketine çi rewşê. Lê PKK'ê çi kir? Bi bexwedana bîrdozîk serkeftin afirand, di xeta serkeftinê de têkoşîna bîrdozîk meşand. Bêyî ku têkoşîna bîrdozîk bê meşandin û di vir de serkeftin nayê destxistin; teqez li wir têkoşîna leşkerî û siyasî jî bi pêş nakeve. Kî PKK'ê wek tevgereke leşkerî û siyasî bigire dest, ew kes ji serî ve şaş nêzîk dibe. Divê ew kes nêrina xwe ya PKK'ê biguherîne û feraseteke rast ya partiyê bipejirîne. An na nêrineke wisa di serî de li dijberî felsefeya Serokatiyê be.

Rastiya Seroktiyê, qadeke felsefîk û bîrdozîk e. Ger Serokatî hêzeke felsefîk û bîrdozîk be û tevgera me jî tevgereke Serokatiyê be, wê demê tevgera me tevgereke têkoşîna felsefîk û bîrdozîk e. Tevgera me her tiştê xwe, bi vê bi dest xistiye. Divê em rastiya Serokatiyê ne li gorî xwe, bi awayekî rast fêm bikin. Ger em rast bigirin dest, em ê bibînin ku di PKK'ê de esasê têkoşîn û serkeftinê li ser rastiya bîrdozîk û xeta rêxistinî ye.

Esasê perwerdeyê jî, meşandina têkoşîna rêxistinî û di kesayetê de afirandina serkeftina bîrdozîk û rêxistinî ye. Ger em di vê de bi ser bikevin, ew kesayet di hemû cureyên têkoşînên siyasî û leşkerî de dê bibe milîtanekî/ê partiyê. Lê ger ew kesayet nikaribe bandorên dijmin ji ser xwe bavêje û li ser xeta bîrdozîk û rêxistinî dijmin di hundirê xwe de têk nebe; ji wî/ê kesî/ê ne leşker derdikeve, ne siyasetmedar û ne jî propagandîst derdikeve. Ger kes di hundirê xwe de têkoşîneke bi vî rengî nemeşînin; dê guherîn û veguherîneke mayînde çawa çêbibe, şoreşa zihnî û wijdanî çawa pêk bê, em ê çawa şoreşa kesayet bi pêş bixin? Dijberî vê em ê kesayetên xwe yên heyî zêdetir cîla bikin û zêdetir xwe bi rûpoş bikin, dê hê zêdetir hêza me ya demogojiyê bi pêş bikeve. Ger em nekevin riya rast û em xwe baş nedahûrînin, ji xeynî xwe veşartinê tiştekî cuda dernakeve holê.

Ger em bixwazin û ji vî aliyî ve hewldanên me hebin, bi rehetî em dikarin vê pêk bînin. Di vê xalê de bila tu kes nebêje kêmasî hene. Ger rewşeke serneketinê û kêmasiyan heye, divê her kes li pratika xwe binêre. Divê em li cihekî din, an jî li derdora xwe lê negerin. Ger em nêzîkatiyeke rast û bes nîşan bidin, ji bo serkeftinê hemû derfet hene; rewşeke pir guncaw heye, bes bila pêşeng karê xwe rast bike. Ger wisa bibe em ê bi ser bikevin. Em di pêvajoyeke bi vî rengî re derbas dibin.

**Bêyî Ku Kesayeta Azad Were Afirandin**
**Netewa Demokratîk û Civaka Demokratîk Nayê Înşakirin**

Di navenda civaka demokratîk û netewa demokratîk de mirovê azad heye. Heta ku mirovê azad xwe nespêre civakê û bi pêş nekeve, avakirina civaka demokratîk û netewa demokratîk çênabe. Ya heyî jî mirov nikare li ser piyan bigire. Wisa be kesê azad ku xwe dispêre civaka demokratîk: tenê bi fikir, rih û hestên azad pêk tê. An na kesê ku negihîştiye fikrên azad, nikare bibe kesê azad û nikare bi awayekî azad tevbigere. Pêkhatina vê jî em wek şoreşa kesayet û şoreşa wijdanî pênase dikin.

Lêgerînên Rêber Apo ku di navenda wê de çareseriyên leşkerî û siyasî hene, ew gihandin fikra şoreşa kesayet, şoreşa zihniyet û wijdan e. Serokatî heri zêde di vê xalê de hewhldanan nîşan dide û vê wek şoreşa herî mezin dinirxîne. Şoreşa zihniyet û wijdanê, îro cewhera şoreşa PKK'ê ye. Ew yek di heman demê de, riya yekane ya mayîndekirin û parastina deskeftiyên şoreşê ne. Bala we jî kişandibe, ev encam derdikeve holê; li hemberî pergala qirkirina çandî, pêwîstiya me tenê ne bi perwerdeyê, bi pêkanîna şoreşa zihniyet û kesayetê heye. Di cewhera wê de perwerde ne karê guhertinên ji rêzê ne, ne karê guhertin û encamên reformîst in; perwerde di rastiya xwe de pêkanîna şoreşa kesayet, pêkanîna şoreşa zihniyet û wijdanê ye. Têkoşîneke misoger û teqez dixwaze. Guhertinên şoreşgerî, di asta zihnî û wijdanî de, ango di giştîbûna kesayet de pêkanînê dixwaze. Vê îfade dike.

Tabî em perwerdeyê jî wek peyveke teqez nikarin bigirin dest. Li gorî armanca her hêz û civakê misyona wê diguhere. Pêkanîna armancekê îfade dike û li gorî armancên cuda şêweyên cuda digire. Ji her perwerdeyekê heman armanc jî dernakevin û tenê ji bo armancekê jî nayê kirin. Li gorî armanca kesê ku pêk tîne diguhere.

Perwerde; guherîna rih, hest, fikir û nêzîkbûnên ku ne li gorî armancên me ne îfade dike. Li gorî cewher, hebûn û armancên xwe guhertin û sererastkirinê îfade dike. Ji hest, fikir û hestên li dijî rastiya me; zivirîna hest, fikir û nezikatiyên li gorî rastiya me îfade dike. Ji vî aliyî ve pêkanîna şoreşa kesayet e. Em ji rastiya xwe çiqas dûr bikevin, zemîna ku em lê perwerdeyê dikin û guherîna ku em di kesayeta xwe de bikin jî dê di wê astê de be. Ji vî aliyî ve carinan li gorî vê rewşê guhertinên pir lewaz jî çêdibin. Lê ger ji rastiya xwe dûrketina me pir mezin be û di navbera me û heqîqeta me de mesafe pir mezin be, dê

em ê wê demê çi bikin? Wisa be guhertinên şoreşgerî pêwîst dikin, şoreşeke kesayet pêwîst dike, şoreşa zihnî û wijdanî pêwîst dike. Rewşa ku em lê ne jî, vê pewîst dike. Lewre em di bin zextên qirkirina civakî û qirkirina netewî de ne. Kesayetên me di bin vê rastiyê de şêwe girtine.

Serokatî ji bo vê kesayeta me dibêje, “Kesayeta birîndar.” Kesayeta ku ji rastiya xwe dûr ketî û qut bûyî. Ew kesayet ji koletiyê jî xirabtir e; lewre kesayeteke koleyan jî heye. Di rewşeke wisa de mayîn, ji koletiyê jî xirabtir e.

Ji berî kapîtalîzmê, kesayet û statûyeke koleyan heye. Bi zextan kar dikin, lê dema ku fersenda wê dibînin serî radikin. Bi xwesteka xwe ne di wê rewşê de ne, bi tundî û zextan wî karî dikin. Lê koletiya ku bi qirkirina civakî û bi qirkirina netewî bi pêş ketiye, bi xwestek û bi pejirandinê dimeşe. Di vir de daqurtandina zextan jî heye. Bi bişavtin û qirkirina fikrî, kes jî dûrketina rastiya xwe pejirandiye, qebûl kiriye. Ew ne koletiyeke ji rêzê ye, li vir koletî di hundirê kesan de hatiye pejirandin. Disa li gorî hinek kesên din tevgerîn û kar kirin heye; lê ew yek bi tundî û zextên çort nayê kirin, bi qirkirina zihnî û ji dil tê kirin. Koleyê nû hatiye vê astê.

Bêguman ew koletî ji koletiya kevn cudatir e. Koletiya ku qirkirina civakî û qikirina netewî derxistiye holê; ji koletiya kevn kurtir, jê derbaskirî û bi awayekî daqurtandî tê jiyankirin. Ji ber vê, li hemberî vê têkoşîn jî bi awayekî ji rêzê nabe. Em nikarin têkoşînê yekalî bigirin dest. Tenê bi guhertinên mayînde û mezin têkoşîneke teqez dikare vê rewşê biguherîne; ew jî guhertinên şoreşgerî ne. Tiştê ku em wek şoreşa kesayet û şoreşa zihnî û wijdanî diyar dikin jî ew e.

### Di PKK’ê De Perwerde Bi Serê Xwe Karekî Şoreşê Ye

Di tevgera me de perewerde, bi serê xwe karekî şoreşê ye û guherîna şoreşgerî dixwaze. Ji ber vê divê em wisa nêzîkî rastiya perwerdeyê bibin. Divê em perwerdeyê wisa teng û sînordar negirin dest. Divê em nebêjin, “Bibe jî dibe, nebejî dibe.” Perwerde nebe, nabe; divê em wisa giştî û kûr bigirin dest û teqez em wek şoreşa kesayet bigirin dest. Ger em dixwazin ji koletiyê rizgar bibin û bibin kesayetên azad, ji pêkanîna şoreşa kesayet wêdetir tu riyên me tune nin. An na lihevanîna kesayeta kole û kesayeta azad ew yek pêk nayê. Bi piranî jî em rewşeke wisa jiyan dikin. Cihê ku em perwerdeyê wek guhertin ve

guhertinên mayînde û şoreşgerî bigirin dest; em hinekî xwe bi pêş dixin û hinekî jî cîla dikin û bes dibînin. Em dibêjin, “Bila wek berê nebe, lê bila li gorî pêwîstiyên kesayet û azad jî nebe, bila her duyan jî hinekî di nav xwe de bihewîne, ji bo me bes e.”

Ew nêzîkbûn jî kesayeta riya navîn, kesayeta durû û kesayeta çîna navîn derdixe holê. Ew kesayet pergala heyî û şoreşê bi hev re dixwaze jiyan bike, taybetmendiyên her duyan jî di hundirê xwe de dihewîne. Bi vî rengî nabe, perwerdeyeke bi vî rengî bes nake. Wisa be ya rast û bes kijan e? Guherîn û veguherîna teqez e. Esasgirtina guherîna misoger û şoreşgerî ye. Kesayeta azad-demokratîk-welatparêz ku li hemberî kesayeta qirkirina civakî ye derxistina holê ye. Bi rih, hest, fikir û nêzîkbûnên vê kesayetê tijîbûn; gihîştina zanebûna van; pejirandin û daqurtandina vê kesayetê ye. Bêguman ji bo ku mirov bigêheje vê kesayetê jî zanebûn, pejirandin û xwestekek pêwîst dike.

Di pergala qirkirina çandî de, di vê mijarê de berovajîkirinek wisa heye ku çi azadîxwaz e, çi xizmetî koledariyê dike mirov nizane; bi piranî koletî wek azadîxwaziyê tê nirxandin. Jixwe sextekariya herî mezin ya kapîtalîzm û lîberalîzmê di vir de ye. Fêrbûn û tevgerên ku kolêtiya herî kûr in îfade dikin, wek azadiyê pêşkeşî me dike. Her tiştî berovajî dike. Di qirkirina çandî de, ew rewş xetertir e. Ger li ser kesê azad û civaka wî êrîşên pergala qirkirina çandî ew qas giştî û kûr in; divê li hemberî vê têkoşîn û xwe perwerdekirin jî ew qas kûr, giştî û şoreşgerî be. Tiştê ku em wek Şoreşa kesayet pênase dikin, divê giştî be û bi kûrahî be, an na bi awayekî din li hemberî vê pergalê têkoşîn bi ser nakeve.

Ger em wisa bikin em dikarin kesayet, civak û pergaleke alternatîf ava bikin; an na kiryarên me nîvco bimînin û em ê bibin dûvikê pergala heyî; ew jî kêrî tiştekî nayê. Ji ber vê sedemê; yek, pêwîst e em li hemberî hemû xapandinan rastiyê bibînin. Çi azadî ye çi koletî ye, divê em baş ji nav hev û din derxin. Di vê mijarê de divê em hemû peyv û nêzîkbûnên xapînok û yên ku ji rê derdixin derbas bikin. Du, divê ya rast û azadîxwaz bê pejirandin. Jixwe bawerkirina tiştekî; bi wî tiştî re jiyankirin û pejirandina wî tiştî îfade dike.

Kapîtalîzm nêrîneke wisa diafirîne ku dema tu rastiya wê dibînî jî bêyî vîna xwe tu jê bawer dikî. Xwe cîla û boyax dike; hewl dide ku xwe xweşik nişan bide, dixwaze ku xwe bide pejirandin. Ji vî aliyî ve pejirandina tiştê civakî û azadîxwaz girîng e. Tenê pejirandin jî têrî

nake, divê bê daqurtandin. Li ser esasê rêgez û pîvanan, avakirina pergaleke fikir û jiyanê û avakirina kesayeteke rêxistinî pêwîst dike. Pêwîstî bi pêkanîna şoreşa kesayet û di pratîkê de nîşandana vê heye. Ji vî aliyî ve daqurtandin û pejirandina ji dil jî pir girîng e. Carinan nêzîkbûnên nîvco derdikevin holê. Bêyî ku guhertineke mayînde û kûr çêbibe; di nav hev de koletî û azadî jiyankirin û ew her du diyardeyên dijber, li gel hev jiyankirin derdikeve holê. Ger guhertineke şoreşgerî û mayînde nayê jiyankirin û pejirandineke ji dil bi pêş nekeve, kesayet û sekneke azadîxwaz jî bi pêş nakeve.

Wisa be perwerde; dîtina rastiyê, xweşikiyê û nûbûnê îfade dike. Li gel vê li hemberî pergala deshilatdarî û dewletê, li hemberî pergala qirkirina çandî, li hemberî pergala modernîteya kapîtalîst; di rih, hest, fikir û nêzîkbûnê de li hemberî tiştên ku van pergalan bi me dane xwarin, têkoşînekê ifadê dike. Şertê ewil ew e. Şertê duyemîn jî; li ser esasên azadîxwaziya civakî û demokrasiyê, bi rêgezên komînalite û wekhevî yên civaka exlaqî û polîtîk afirandina kesayetekê pêwîst dike. Bi van taybetmendiyan ji nû ve înşakirin û avakirina kesayetê pêwîst dike.

Civak û netewa demokratik, tenê bi kesayeta azad tê înşakirin. Tenê kesayeta azad dikare netewa demokratîk ava bike. Wê demê înşaya netewa demokratîk û civaka demokratîk ku xwe naspêre kesayeta azad çênabe. Ger cewherê şoreşê, înşakirina netewa demokratîk û civaka demokratîk be, divê em bizanibin ku di cewherê wê de jî înşakirina kesayeta azad heye. Înşakirina kesayeta azad ku ji hemû koletiyan rizgar bûye, di navenda înşaya civaka demokratîk û netewa demokratîk de cih digire. Bêyî ku şoreşa kesayetê pêk werê, şoreşa civaka demokratîk û netewa demokratîk pêkanîn, ne gengaz e. Ev hemû di nav hev de û bi hev re gengaz in. Ji hev û din ne dûr û qut in.

Perwerde, di wateya giştî de; xwe gihandina asta karkirinê û hatina asta karkirinê ye. Perwerdeya partiyê jî, em dikarin wek xwe ji karên partiyê re amedekirinê pênase bikin. Wek hest û fikir, wek danehev xwe ji karên partiyê re amadekirin û înşakirina kesayeta azad em wek perwerde dinirxînin.

Wate û girîngiya perwerdeyê di van xalan de derdikeve holê. Tu wateyek wê ya din tune. Wisa be di navbera perwerde, peywirmeşandin, karkirin û pratik meşandinê de girêdanbûneke teqez heye. Perwerde, ji pratik û karkirinê ne qut e. Em perwerdeyê bi giştî bigirin

dest, fêrbûna jiyanê ye. Mesele perwerdeya zarokekî vê îfade dike. Mirov ji vî aliyî ve jî dikare bigire dest. Fêrbûna jiyan û karkirinê, afirandina xwe û jiyanê, xwe ji bo karkirinê amadekirin e. Pêşxistina hest, fikir û danaheva wê ye. Em dikarin wisa pênase bikin.

Di tevgera me de jî, gihîştina zanebûna kesayetê partiyê îfade dike. Azadî û rizgarkirina gel wek peywireke esasî girtina dest îfade dike. Ji bo bi serxistina van peywiran, ji bo gihîştina hêza hest û fikra vê; xebat meşandin, lekolîn kirin û gihîştina daneheva teorîk îfade dike. Ji bo daneheva fikrî ku derketiye holê bigihînin derdorê, hewldana vê nişan bidin û van fikran pêk bînin; qezenckirina hunera axaftinê, xitabet û propagandayê ye. Hêza ziman derxistina holê, bi mirovan re bûna yek, perwerdekirin û rêxistinkirina wan û peywirdarkirina wan e. Rêxistinkirin, bi rê ve birin û tanzîmkirin e.

Di heman demê de, ev hemû armancên perwerdeya me ne. Ji bo pêkanîna van; xwe perwerdekirin, rêxistinkirin û qezenckirina hêza rêveberiyê pêwîst dike. Ji bo vê şopandina peywiran, plankirina kar û peywiran, hevsengiya kar û kesê kar bike avakirin, peywirdayîna kesan û şopandina vê pêwîst dike. Ev hemû di nav perwerdeyê de xalên bi hev ve girêdayî ne.

Divê em bizanibin ku Serokatî her xwe perde dike. Di serî de ne di asteke ku her karî bike de bû, ji bo vê ne amade bû. Her ku peywir hatin rojevê û xwe spartin pêvajoyê, Serokatiyê li gorî pêwîstiya peywiran xwe perwerde kir. Ji ber ku partî û karên partiyê her berdewam dikin, divê li gorî vê perwerdeya partiyê jî her berdewam bike. Ger jiyan û karkirin her hebin, divê perwerde jî her hebe. Li gel vê di perwerdeyê de, aliyê moral, motivasyon û hestan heye; aliyê fikir, zihniyet û ferasetê heye; aliyê pêkanîna karên pratîkî û danehevan heye. Ji van re perwerdeya moralî, perwerdeya bîrdozîk, perwerdeya leşkerî û teknîkî, an jî perwerdeya pîşeyî tê gotin. Dema ku derbasî pratîkê bû, ji aliyê qad û beşên kar ve amadekirina kesan ve, perwerde di nav xwe de cuda dibe. Ger hostatiyê bi pêş bixe, em ji wê re dibêjin perwerdeya pîşeyî; ger kesan ji aliyê fikrî ve amade bike, em ji wê re jî dibêjîn perwerdeya teorîk û bîrdozîk. Ger ji aliyê moral û hestan ve kesan amade dike, em ji wê re jî dibêjin perwerdeya moralî.

Di vir de ya girîng, fêmkirina têkiliya teqez ya di navbera perwerde, jiyan û karkirinê de ye. Jiyan û karkirin bi perwerdeyê gengaz e; ji bo ku em karên serkeftî bi pêş bixin û jiyaneke rast jiyan bikin, divê em

li gorî wê xwe perwerde bikin. Li ser vî hîmî em xwe amade û perwerde nekin, di jiyanê de pratika serkeftî û rast bi pêş nakeve. Li hemberî peywiran em çiqasî xwe perwerde bikin, em ê ewqasî jiyanê rast bijîn û pratika me ewqasî serkeftî bibe. Yên ku bê perwerde bikevin pêvajoyê, dê bieciqin û nikarin xwe li ser piyan bigirin. Bê amadekarî û bê watebûn wisa derdikeve holê û ew jî tê wateya bêperwerdebûnê. Bêperwerdebûn, li gorî karê xwe, xwe amade nekirine. Bi vî awayî, di rewşeke wisa de tu kes nikare karê xwe bi ser bixe û peywirên xwe bi awayekî serkeftî bimeşîne. Me xwe çiqasî perwerde kiribe û amade kiribe, em ewqasî dikarin karên xwe bimeşînin.

Ji ber ku partî jî li gorî xwe afirandina jiyaneke nû û şêwazeke jiyana alternatîf îfade dike û li gorî vê her xebat pêwîst dike; her xwe perwerdekirinê jî îfade dike. Her wiha em dizanin ku rastiya Serokatiyê, rastiyeke ku her xwe perwerde dike û dibistaneke ku xwedî xweseriyan e. Serokatî her tiştî li ser hîmên perwerdeyê bi pêş dixe, ew mijar teqez û bê nîqaş e. Rastiya çiqasî perwerde, ew qas jiyana rast û pratika serkeftî, divê em derxin zanebûnê. Ev girîng e. Divê em bizanibin ku bêyî perwerdeyê li ser navê jiyan û têkoşînê em nikarin tiştekî jî bikin. Di vê mijarê de Serokatiyê got: "Bêyî ku li Kurdistanê pêşengtiya partiyê hebe, pel jî nalebitin." Peşêngtiya partiyê, ji bo karkirinê xwe amadekirin e. Li gorî karên gel, karên şoreşê, karên netewiyet û demokrasiyê xwe amadekirin e. Pêşengtiya partiyê vê îfade dike.

Wisa be, bê perwerde em nikarin tiştekî jî bikin. Li Kurdistanê, li ser navê azadî û têkoşînê em nikarin tiştekî bikin. Dema ku me xwe perwerde kir, em dikarin van tiştan bikin; em dikarin xwe bi çalak bikin, em dikarin di pratikê de serkeftî bibin û daneheveke pratîkî û jiyanî jî derbixin  holê. Lê di rewşa heyî de ji van rastiyan qutbûnek tê jiyankirin. Pergala qirkirina çandî, rejîma dagirker û hevkarên ku radestî wan bûne, ji aliyê hestan ve civak ji van rastiyan qut kirine. Ji ber vê pêwîstî bi hest, rih û moraleke nû heye. Bêyî ku ew hêmanên jiyanê hebin, em ne dikarin xwe perwerde bikin, ne jî dikarin kar bikin.

Ji aliyê din ve pêwîstiya me bi perwerdeyeke xurt ya fikrî û hêza têgihiştina ferasetê heye. Lewre em angaşt dikin ku, em ê li hemberî pergala heyî kar bikin. Em ê vê çawa bikin? Di destê me de dane û danahevek tuneye. Divê em van bi xwe bibînin û biafirînin. Em vê jî bi xwe perwerdekirinê dikarin bikin. Tenê perwerde dikare vê pêk bîne.

Tu çiqasî feraseta xwe biguherînî, xwe têr û tijî bikî; di karkirin û peywirmeşandinê de, tu xwe çiqasî qane bikî, tu ewqasî dikarî kar bikî. Bêyî ku yekîtiyeke fikrî û qenekirin hebe, kar nayê kirin. Em niha jî êşên wê dikişînin. Em carinan dibêjin li gorî xwe bûn heye; tu çiqasî kar û peywir bîdê jî, dê ew ê li gorî zanebûna xwe tevbigere, ma tiştê ku nizanibe wê çawa pêk bîne. Ji ber vê ew yek xwezayî ye. Hevalê Mezlûm ji Serokatiyê re got: “Van tiştan em dizanin, hûn çima van dinivîsîn?” Serokatî jî got: “Jixwe em ê tiştên ku em dizanin binivîsîn, tiştên ku em nizanin em ê çawa binivîsîn?” Mirov tiştên ku dizanin, tê de qane bûne û fêmkirine pêk tînin. Wisa nebe tiştên pewîst pêk nayên. Pêwîstiya ferman û fermanameyan nayê cih.

Em encamên ji pratîka me derketine holê bigirin dest; li Kurdistanê mirov bi qasî ku qane dibin, dipejirînin û jê bawer dikin pêk tînin. Dema ku dipejirînin, mirinê didin ber çavan û pêk tînin. Zîrek in û karên serkeftî dikin. Di vê mijarê de gotina “Fizyolojiya mirovan paşve ye û nikare kar bike.” Ne rast e. Ew derew in, fikrên dijmin in û heqaretê li mirovan dikin. Lê em jî dibêjin, “Em nikarin kar bikin.” Çima em nikarin kar bikin? Ji ber ku em qane nabin, fêm nakin û napejirînin. Ji ber vê, dema ku di pratîkê de kar nedihat kirin û şêwazên wê yên rast nedihatin dîtin Serokatî digot: “Baweriya xwe di ber çavan re derbas bikin.” Ne ku ji ber kêmasiyeke din e. Digot: “Diyar e ku we xwe tam qane nekiriye, we xwe tam bi armancê ve girênedaye û hûn di asta evînê de ne girêdayî ne.”

Tişta ku em ji perwerdeya bîrdozîk qest dikin, afirandina hêza qanekirinê ye. Li ser esasê karên şoreşê, jiyana şoreşgerî, jiyana azad û xweşikbûna jiyana civakî; derdora xwe qanekirin û pê dayîna bewerkirin e. Gelo ji xeynî vê, em ê ji perwerdeya bîrdozîk çi fêm bikin? Fêrbûna çend agahiyan, ne perwerdeya bîrdozîk e, girêdana wê bi bîrdoziyê ve tune, ew tenê fêrbûna agahiyên teorîk îfade dike. Di rastiya wê de bîrdozî xwe qanekirin e. Bawerkirina jiyana azad, rastiya şoreşê ye; ji bo jiyaneke wisa têkoşîndayîn bawerkirin e. Rûmet û xweşikbûna wê, bi jiyanê ve girêdanbûn û di vir de xwe qanekirin e. Ji xeynî vê ne tiştekî din e. Ji ber vê zanebûn (bîlînç), ji agahiyên teorîk cudatir e. Fêrbûna agahiyên teorîk cuda ye, zanebûn girtin cuda ye.

Zanebûn bi bîrdoziyê ve girêdayî ye, ya din perwerdeya nêzîkbûn û hostatiya karan e. Perwerdeya nêzîkbûnan û hostatiyê; ji bo ku em bi awayekî serkeftî danehevên xwe bixin pratîkê rê, rêbaz û şêwazên

şoreşê fêr bibin û amûrên şoreşê baştir bi kar bînin pêwîst dike. Propaganda jî; ji bo ku em hêza zimanê xwe bi pêş bixin pêwîst dike.

Ger qada leşkerî be ji bo ku alavên leşkerî û teknîkî baş bi kar bînin; qada têkiliyên gel be ji bo ku em xîtabet û islûbekî baş bi pêş bixin û li hemberî gel rast tevbigerin; ger qada rêveberiyê be jî, ji bo ku em bikaribin mirovan di cih de peywirdar bikin; islûb, şêwaz, rê û rêbazên rêvebirinê fêr bibin pêwîst dike. Em dikarin van jî di nav perwerdeya hostatî û pêşketina teknîkî de bigirin dest. Ev yek wek bi pratîkirina becerî danehevên kes, li hemberî kar baş bikaranîna van û di serxistina kar de bi awayekî bandorker û rast bi pêşxistina rêbazan dikare were îfadekirin. Em dikarin ji vê re bibêjin perwerdeya pîşeyî û teknîkî jî. Perwerdeyên leşkerî dikevin vê kategorî ye.

Perwerdeya ragihandin û çapemeniyê, perwerdeya siyasî, perwerdeya rêxistinî û perwerdeya propagandayê; ev hemû jî bi awayekî baş bi kar anîn hostatî û beceriyên xwe; ji bo bi serxistina peywiran, rêbaz û alavên pêwîst baş bi karanînê îfade dikin. Ev yek jî, tê wê wateyê ku di meşandina karên partiyê de perwerdeyeke girîng e.

Me got rastiya Serokatiyê, rastiyeke perwerdeyê ye. Tevgera me, tevgereke perwerdeyê ye. Dîroka partiya me, di rastiya xwe de xebat û têkoşîneke perwerdeyê ye. Wisa be ev dîrok çawa bi pêş ket, ji kîjan merheleyan re derbas bû, bi kîjan rêbaz û amûran, me xwe perwerde kir? Çawa me xwe gihand asta ku em rast bijîn û peywirên partiyê, karên gel û şoreşê bi awayekî serkeftî bimeşînin? Di vê mijarê de divê em ji roja derketina ewil ku em wek derketineke Serokî pênase dikin û heya roja me ya îro em bizanibin. Jixwe dîroka partiya me jî, ji aliyekî ve ji van merheleyên perwerdeyê pêk tê. Tiştê ku di vir de derdikeve pêş û girîngiya xwe li ser me ferz dike; bê perwerde tu kar bi pêş nakevin û divê em di destpêka her tiştî de xwe bi perwerdeyê, amade bikin. Di encamê de, fêrbûna hostatî û daneheva hemû karan re, em dikarin bibêjin perwerde.

Vê di serî de çawa destpê kir? Serokatî bi lêkolîn, xwendin û nîqaşan destpê kir. Bi çavdarî, agahî girtin, fêrbûn, fêmkirin, xwendin û şîrovekirina van xwe perwerde kir. Ew tişt hemû kirin bingeha kadrobûnê. Aliyekî perwerdeya Serokatiyê ya bi vî rengî heye. Di Serokatiyê de, bi zanistê xwe zanekirin û ew zanebûn zivirandina bîrdoziyê esas e. Bi vê jî dizivirîne hêza qanekirin û baweriyê. Ji destpêkê ve ji bo

ku kes di xizmeta şoreş û partiyê de xebatê bimeşînin; divê ew bihatana qanekirin û rastî û rûmetiya vî karî bawer bikirana. Divê di serî de zanebûna vê bihata avakirin. Perwerdeyên ewil wisa bi pêş ketin. Derketina PKK'ê, ji pergalê qutbûn û afirandinên taybetî û pîvanên wê çêbûn. Dê ji pergalê qutbûn çawa çêbe û jiyaneke alternatîf çawa çêbe? Di serî de pirsyariya vê kir. Ji jiyan û karên wê qutbûn tiştekî cidî ye. Dibêjin: "Mirov wek masiyê ku ji avê derdikeve dibe." Mirovan di serî de tiştekî wisa jiyan kirin. Lê dema ku mirov ji pîvan û taybetmendiyên pergalê qut dibe, ji nav wê derdikeve û dikeve nav tiştekî din, tenêbûn û veqetînekê jiyan dike.

Pergal jî, ji bo ku mirovan bixe xizmeta xwe mirovan perwerde dike. Dixwaze hest, rih, fikir û hemû nêzîkbûnên wî/ê li gorî xwe bi şêwe bike û pergala xwe bide qezenckirin. PKK'yî bûn û ketina nav jiyan û xebateke alternatif; ji van hemû taybetmendiyên pergalê qutbûn û dev jê berdanê pêwîst dike. Ew qutbûn tenê bi hatina çiyan û beşdarî nav refên gerîla bûnê, nabe. Hinek kes dikevin nav şaşiyeke wisa. Dijberî vê di nav pergalê de jî, ji wê qutbûn gengaz bû.

Jixwe PKK'ê wisa destpê kir, hem jî di navenda pergalê de li Enqereyê; di navenda jiyana wê de, ji wê qut bû û bi awayekî teqez jiyaneke alternatif ava kir. PKK tevgereke bi vî rengî ye. Dijberî vê rastiyê, em bibêjin ji wir reviya û derket çiyan û bi vî rengî xwe parast û gihîşt şêwazeke nû ya jiyanê, em dîroka PKK'ê jî rast fêm nakin. Ji ber vê jî em ê bigihîjin encamên şaş. Ji bo ku em ji pergalê qut bibin, pêwîst nake ku em ji bajar, gund û hemû qadên jiyanê birevin û bên çiyan. Ew şaşiyeke mezin e.

PKK'yî bûn, di kesayetê de serxistina jiyaneke alternatîf û ji ber vê ji hemû jiyan û xebatên pergalê bi awayekî teqez qutbûnê dixwaze. Bêyî ku qutbûneke bi vî rengî pêk were, mirov nikare bibe PKK'yî. Ji destpêke ve, bûna xwediyê sekneke bi vî rengî ya jiyanê, ji ber vê ye. Ew jî li gorî ya nû her xwe perwerdekirinê pêwîst dike. Ger mijara gotina me ji pergalê qutbûneke misoger be, di du şaxan de girîngiya perwerdeyê derdikeve holê; yek, li hemberî hemû zanebûnên kevn têkoşîn bi pêş xistin û ji bîr kirin, mehkûmkirina wan e; ya duyem jî fêrbûna tiştên nû û li gorî vê xwe zane kirin e.

Kesek çiqasî ketibe nav jiyana pergalê, di partîbûnê de bi pêş ketin û ketina nav jiyana PKK'ê ya vî kesî jî dê ew qas bi zehmetî be. Li gorî vê xwe zêdetir perwerdekirin, hewldana têkoşîna hundirîn nîşandayinê

pêwîst dike. Bi awayekî giştî, bandorên pergalê ji ser xwe avitin û derbaskirina wan pêwîst dike. Ji aliyê din ve divê rastiyên ku aîdî rastiya Serokatî û partiyê ne, bike cihê wan tiştên ku di hundirê xwe de hildiweşîne. Ev yek jî zêdetir hewldan û têkoşînê ferz dike. Kesek çiqasî ketibe bin bandora modernîteya kapîtalîst, ewqasî dûrî PKK'yî bûnê ketiye. Ji vî aliyî ve PKK, ji sosyalîzma pêkhatî (rêl sosyalizm) cuda dibe. Pîvanên sosyalîzma pêkhatî çi bûn? Digotin: "Mirov çiqasî di kapîtalîzmê de bi pêş ketibe, hîm û bingeha sosyalîzmê jî ewqasî bi pêş ketiye." Di pratîkê de derket holê ku ew nêrîn şaş e.

Dijberî wê rastiyeke îsbat bû. Rast e, PKK jî di nav derdoreke wisa de derket holê, lê piştre ber bi pîvan û xeteke rastir ve meşiya û li ser xeteke wisa xwe da rûniştandin. Ji bo perwerdeya PKK'ê, pêwîst nake ku mirov di perwerdeyeke pergalê re derbas bibe. Dijberî vê mirovên ku di perwerdeya pergalê re derbasbûne divê mirov zêdetir têkoşîn bike. Ew zêdetir zehmetiyan, bi partiyê didin kişandin. Kesek çiqasî ji jiyan û perwerdeya pergalê dûr mabe, ewqasî ji perwerdeya PKK'ê re vekiriye. Dîroka me û jiyankirinên me yên şênber ev nîşanî me dan.

Ji aliyê perwerdeyê ve, em di gelek merheleyên girîng re derbas bûn. Di destpêkê de em ne di vê astê de bûn. Em her bûn tevgerke perwerdeyê; lê nêzîkbûn, şêwaz û şêwaya perwerdeya me her ne wisa bû. Di serdemên stratejîk yên cuda de; naverok, armanc, amûr û rêbazên perwerdeya me jî cuda bûn. Mînak, di dema bîrdozîk ya partiya me de; armanca perwerdeyên me, zanebûneke nû qezenckirin, di vê de xwe qanekirin û li gorî vê zanebûnê jiyîn û bi riya propagandayê ew zanebûn li derdora xwe belavkirin bû. Rêbaza vê jî zêdetir pêşxistina perwerdeya teorîk û bîrdozîk bû. Zêdetir xwendin û lêkolînkirin bû. Me ev yek bi awayekî komî û takekesî dikir. Serokatî ew, di hemû qadên nîqaşê de, di semîneran de, di pirtûkxane û yurdan de, di dibistan û komaleyan de û di malên xwendekaran de dikir. Di wê demê de, ew qad hemû bi kar anîn û di perwerdekirina xwe û kadroyan de girîngî dida wan. Perwerdeyên herî bingehîn jî, perwerdeyên komî ku li malan pêk dihatin bûn. Bi vî awayî jiyan jî dibû du beş; yek, bi perwerdeyê xwe amadekirin bû. Duyem, xebat û têkoşîn meşandin, propaganda bi pêş xistin û di nav têkoşîna rojane ya ciwanan û qadên din yên têkoşînê de cih girtin bû.

**Di PKK'ê de Ji Roja Ewil Ve**
**Bîst û Çar Seatan Şoreşgertiya Profesyonel Esas e**

Jiyana me bîst û çar seatan li ser van esasan bi pêş diket. Par Serokatiyê got: "Gerîlatiya bîst û çar seatan bikin." Wek ku Serokatî tiştekî nû dibêje hevalan wisa ew gotin girt dest. PKK tevgereke ku bîst çar seatan şoreşgeriyê dike ye, wisa dest bi têkoşînê kir. Lê Serokatî dît ku di rewşa heyî de: ji ber pêşketinên rojane, di parzemînên agirbestan de tevgerîna gerîla lewaz bûye, sistbûn heye, li ser esasê bîst û çar seatan di rewşa têkoşînê de mayîn tune. Ew yek dide windakirin, derfetên serkeftinê ji holê radike û li hemberî êrîşên dijmin bi me dide windakirin. Ji bo ku vê rewşê û vê çûyînê bide sekinandin, ew hişyariyên xwe kirin. An na ji destpêkê ve, derketin û sekna Serokatiyê, li ser esasê bîst û çar seatan şoreşgerî kirinê bû.

Ji vî aliyî ve jî PKK ji tevgerên din cuda dibe. Ji vî aliyî ve ji roja ewil ve ji sosyalîzma pêkhatî cuda dibe. Dîsa ji destpêkê ve ji tevgerên din yên Kurd qut dibe. Qet wek wan nebû. Di dema paradîgmaya kevn û di dema daxwaziya avakirina dewletê de jî xwe wisa rêxistin dikir. Li gorî xwe pîvanek afirand. Ew yek di roja me de jî berdewam dike. Ji vî aliyî ve her tiştê PKK'ê neguheriye. Bîst û çar seatan şoreşgerî kirin, ji roja ewil ve derbasdar e û îro jî wisa ye. Ger bala we kişandibe, her ku em ji vê rêgezê dûr ketin me nikarî em karê xwe rast bimeşînin û em hatin asta ku em nikarin kar bikin.

Heke wisa be divê em baştir fêm bikin ka di PKK'ê de çi diguhere û dijberî wê çi naguhere. Em her behsa guhertin, veguhertin û nûbûnê dikin. Tesfiyegeran ev yek wek guherîna cewhera partiyê girtin dest, wisa dikirin rojev. Divê me wisa fêm nekiribûya. Hin tişt tên guhertin, hin tişt nayên guhertin. Hin tiştên ku ji roja destpêkê ve naguherin, mayînde bûne û zivirîne pergalekê hene; hin tiştên ku kêm in, şaş bûn û hin tiştên ku rista xwe lîstine û divê bên guhertin hebûn. Guhertin yekalî girtina dest, ne rast e. Ji vî aliyî ve tiştê ku tesfiyegeran kirine divê em rast fêm bikin. Tiştên ku divê were xurtkirin û pêşxistin, wek tiştên ku bên guhertin girtin dest. Her tişt berovajî kirin.

Perwerdeyên serdema stratejîk a yekemîn a partiyê, perwerdeyên komî bûn û li ser esasê xwendin û nîqaşkirinê bûn. Ew yek me pir zêdê bi pêş dixist. Wisa bû ku êdî me teori jiber dikirin. Ji ber ku bi pratîkê ve nedibû yek, çiqasî fikrên teorîk bihatana jiberkirin; ew qas qanebûn û girêdanbûn çêdibû. Di xweseriya tevgera me de hê pir fikir bi pêş

neketibûn. Her me hewl dida em danehevên têkoşîna mirovahiyê û bindestan a cîhanê fêr bibin.

Di serî de danehevên pratîkî û fikrî yên sosyalîzma pêkhatî, tevgerên rizgariya netewî û hemû tevgerên azadiyê mijarên me yên perwerdeyê bûn. Me wek mîrate digirt dest. Ger ew tunebûna, tiştekî din ku em pê xwe qane bikin, xwe pê perwerde bikin û li ser wê esasê lêgerînên alternatîf yên jiyanê bi pêş bixin tune bûn. Ji ber vê li ser van danehevan fêrbûn, pirtûkên ku behsa wan dikin xwendin, bi komî xwendin û nîqaşkirina van rêbaza me ya esasî ya perwerdeyê bû. Jixwe bêyî ku tu xwe perwerde bikî, te nedikarî tevlî jiyana PKK'ê bibî. Ji bo wê tu hewl didî ku jiyaneke alternatîf biafirînî, ew jî ji ber xwe ve nabe. Yek jî divê tu ji jiyana kevn qut bibî û jiyana nû pêk bînî. Ew yek jî tenê bi xwe perwerdekirinê dibe. Berî ku tu xebatê bimeşînî û kar bikî; xwe perwerdekirin, xwe ji kar re amadekirin û xwe gihandina asta rast jiyankirinê û karkirinê esas bû. Li ser vî esasî pratîk bi pêş ket.

Li metrepolên Tirkiyeyê û li bajarên Kurdistanê ev yek çêbû. Di pêvajoya ku em ber bi partîbûnê ve diçûn, bi vî awayî bi sedan dibistanên partiyê hebûn. Li her cihê ku kadro lê diman, di heman demê de dibistanên wan bûn. Jiyan û perwerde hevpar bû. Divê dîsa wisa be. Di derketina PKK'ê de ev heye. Cihê jiyan û perwerdeyê cuda nabe. Di PKK'ê de ew yek nabe. Di navbera afirandina jiyan û xwe ji kar re amadekirinê de her girêdaneke teqez hebû. PKK'ê ev girêdanbûn bi awayekî diyalektîkî her da berdewamkirin. Bîst û çar seatan şoreşgerî di jiyan û xebatan de pêk hat.

Bi vî awayî sekneke nû, exlaq û şêwazeke nû ya xebatê derket holê. Şêwazeke nû ya perwerdeyê jî derket holê. Wek cihên din, her derfetên dibistana bi pergal tune bûn. Perwerdeyên me ne li ser esasê derfetan bûn. Ji bo ku agahî û zanebûneke biçûk bibîne her lêkolîn kir, şîrove kir û zanebûnek derxist holê. Pirtûkên ku rastbûna wan dihat bawerkirin, dihatin xwendin, lêkolînkirin û li ser nîqaş bi pêş diketin. Bi vî awayî partîbûn bi pêş ket. Em dibêjin niha dibistanên partiyê bi pêş ketine, ne wisa ye. PKK her di rewşeke perwerdeyê de bû. Di 1978 û 1979'an de, di pêvajoya partîbûnê de ji aliyekî ve pratîk dihat meşandin, ji aliyekî ve jî perwerde dihat dîtin. Perwerde ji pratîkê zêdetir bû. Ji ber ku perwerde jî têkoşînek bû; têkoşîna bîrdozîk bû, têkoşîna xwe guherîn û veguherînê bû. Têkoşîna ji pergalê qutbûn û fêmkirin û daqurtandina rastiya Serokatiyê bû. Têkoşîna fêmkirina xetê û li ser vî

esasî têkoşîna afirandina jiyanê bû. Vê jî hewldan û têkoşîneke mezin dixwest. Wisa di kêliyekê de û bi gotinekê pêk nayê.

Di serdema duyemîn de, ango di serdema gerîlatiyê de perwerdeya leşkerî jî li ser vê zêde bû. Şaxên tektîkî, teknîkî, şêwazî û fermandeyî yên perwerdeya leşkerî hebûn. Ew hemû li ser zêde bûn. Ji 1979'an û ji berxwedana Sîverekê û vir ve û bi derketina derveyî welat, di xeta Filistîn-Libnanê de, di amadekariyên ku li vir dihatatin kirin de; perwerdeyên bîrdozîk û leşkerî diketin nav hev û pergaleke bi vî rengî ya perwerdeyê bi pêş ket. Ji van re qamp dihat gotin, pergala qampên leşkerî bi pêş ket. Li vir hem perwerdeyên bîrdozîk, hem jî perwerdeyên leşkerî hatin dîtin. Yekîneyên ku ji wir derketin ew yek dikirin. Ew pergal bi demê re zivirî akademiyên leşkerî. Di zivistana 1986 û 1987'an de, piştî kongreya sêyemîn; ji bo ku pêngava gerîla ya sala 1987'an bide destpêkirin, li qada Serokatiyê Akademiya Mehsûm Korkmaz vebû. Wek akademiyeke Serokatiyê hate vekirin.

Ji 87'an heya 92'yan hem perwerdeyên teorîk û bîrdozîk, hem jî perwerdeyên leşkerî li ser esasê wê pergala akademîk, rasterast ji aliye Serokatiyê ve hatin meşandin. Ev yek di perwerdeyê de girîng bû, ji ber ku em derbasî pergala perwerdeya akademîk dibûn. Di vê astê de ji 79'an ve perwerdeyên leşkerî li qada Filistîn-Libnanê jî dihatin kirin. Sekn û perwerdeya gerîla bi vî awayî bû. Lê bi awayekî pergala qampan didomî, guhertin dihatin kirin. Şêwaz, pergal û berdewamiya xwe ne teqez bû. Di 86-87'an de bi Akademiya Mehsûm Korkmaz, bi pergal bû û ji pergala qampan derbasbûna pergala dibistanê çêbû. Ev yek êdî mayînde jî bûbû.

Ji aliyê armancê ve, di navbera perwerdeyên bîrdozîk û perwerdeyên leşkerî de tu ferq tune. Di her duyan de jî, afirandina kesayeteke nû, pêkanîna şoreşa kesayet û guherîna kesayet esas e. Yek bi qanekirinê û guherîna ferasetê, nêzîkbûnan diguherîne; ya din bi guherîna nêzîkbûnan, ferasetê diguherîne. Ango derketina wan cuda ye, lê armanca her duyan jî pêkanîna şoreşa kesayet e. Hemin aliyên perwerdeya leşkerî ku beşên teknîkî û beceriyên kes jî derdixe holê hene. Lê şaxên bîrdozîk hevpar in. Divê em perwerdeya leşkerî û perwerdeya bîrdozîk ji hev û din qut nekin. Ji hin cudahiya derkevin rê û hin rêbazên cuda hebin jî, tiştê ku dixwazin biafirînin nêzîkî hev in. Ji ber vê hev û din temam dikin. Perwerdeyêyên leşkerî û bîrdozîk bi hev re dîtîn gengaz e. Dê pêşketin û encamên hevpar derxin holê.

Ji 92’yan û vir ve, dema ku êrîşên dijmin zêde bûn û Akademiya Mehsûm Korkmaz hate girtin û hat asteke nikare kar bike, di xebatên perwerdeyê de lêgerînên cuda derketin holê. Serokatiyê ji zivistana 93-94’an ve Dibistana Navendî ya Partiyê rêxistin kir. Milê wê yê leşkerî û pratîkî tune bû. Lê perwerdeyên leşkerî jî ji aliyê teoriyê ve dihatin dîtin. Heya Cotmeha 98’an jî di pergaleke bi vî awayî de perwerde meşand û têkoşîn kir. Di asta teorîk de pirsgirêkên partiyê çareser dikirin û dimeşandin. Di asta feraset û zihniyetê de mirov anîn asta karê şoreşê kirinê. Li ser vî hîmî, perwerdeyên kadro û fermandeyê bi pêş xistin.

Ew perwerde pir girîng bûn û me jê pir sûd wergirt; lê ji aliyê şêwaza pratîkî, islûb û tempo ve têrî nedikir. Ji bo temamkirina van kêmasiyan li Kurdistanê perwerdeyên leşkerî û perwerdeyên bingehîn yên şervanên nû hatin vekirin. Qamp, wek qadên perwerdeyê dihatin bikaranîn û di asta yekîneyan de perwerde dihatin dîtin. Li gorî derfetan perwerdeyên şervanên nû dihatin kirin. Piştî 93’yan li Botan û Behdînanê û li hin cihên din, perwerdeyên ku li qada Serokatiyê derfeta pêkanîna wan tunebûn û bi girtina Akademiya Mehsûm Korkmaz nehatibûn kirin, kêm be jî hewl hate dayîn ku bên kirin. Ji bo vê qamp û dibistan hatin avakirin. Li hin cihan dibistan vebûn û demekê berdewam jî kirin. Li hin cihan qamp çêbûn. Qampan dewreyeke perwerdeyê pêk dianîn. Derfetên her berdewamkirinê û gelek dewre li pey hev dîtin li van qampan tune bû. Tenê ji bo dewreyekê dihatin rêxistinkirin. Lê dibistan pergaleke ku dewre li pey hev û her dibînin bûn. Ew cudabûna qamp û dibistanan, em dikarin wisa pênase bikin.

Di tevgera me de pergala qamp û yekîneyan her hebû. Herî kêm perwerdeya leşkerî qet qut nebû. Ji aliyê tesfiyegeran ve hatibe sabotekirin û kêm bûbe jî, dîsa jî herî kêm zivistanê her perwerdeya qamp û yekîneyan pêk dihat. Ger ew pêk nehatibana, tevgerê nedikarî têkoşîna xwe berdewam bike. Niha jî wisa ye, em zivistanê perwerde dikin û havînê dikarin kar bikin. Ger perwerdeyên zivistanê, perwerdeyên demî û perwerdeyên din ku em fersendê diafirînin û li dar dixin tunebin; di têkoşînê de berdewamî pêkanîn û serkeftin bi dest xistin ne gengaz e. Piştî qomployê, ji bo ku perwerdeya Serokatiyê dida were berdewamkirin, li çiyan pergalên perwerdeyê yên wek wan hatin amadekirin. Ji ber wê diyar bibû ku ger pergala perwerdeyê û dibistanan nebe, partî nikare li ser piyan bimîne û têkoşîna xwe bimeşîne. Êdî

kêm û zêde be, ew tiştekî cuda ye; lê teqez divê perwerde û ji bo wê jî pergala dibistanê hebûya. Li ser vî esasî piştî kompoyê pergala dibistana kadro hat pêşxistin. Li biryargeha navendî jî perwerdeyên leşkerî hatin meşandin. Ji 2001'ê ve jî pergala ku em niha wek Dibistana Navendî ya Partiyê ya Mezlûm Doxan bi nav dikin, hate rêxistinkirin. Ji wê rojê ve bi awayekî bi pergal perwerde li wir berdewam dike.

Dîsa ji 2001'ê vir ve, li ser esasê encamên kongreya heftemîn pergalên cuda yên perwerdeyê hatin pêşxistin. Jixwe ji 1990'î ve û bi avabûna YAJK'ê ve, perwerdeyên xweser yên leşkerî û bîrdozîk yên jinê dihatin lidarxistin. Di 2001'ê de perwerdeyên leşkerî û bîrdozîk hinek ji hev û din cuda bûn. Ji bo xebatên din; xebatên çapameniyê, xebatên çand û wêjeyê, xebatên gel, xebatên civakî û siyasî di xweseriya wan de dibistan hatin vekirin û perwerde hatin dîtin. Armanca van perwerdeyan, li gorî qada xebatê amadekirin û gihandina asta karkirinê ya kadroyan bû. Dîsa di navenda van perwerdayan de dibistana kadro hebû, lê perwerdeyên ku pîşe û bîrdoziyê di nav hev de digire dest û kadro dide lêhûrbûnkirin, li cihên cuda hatin pêşxistin.

Salên 99 û 2000'î serdemeke navîn ya derbasbûnê bû. Ji 2001'ê û vir ve pergal û rêxistibûneke teqeztir ya perwerdeyê ku hîmê pergala perwerdeya îro jî tavêjin hate pêşxistin. Ew pergal îro zêdetir hatiye pêşxistin. Ji 2004'an ve Ocaxa PKK'ê lê hate zêdekirin. Di 2001'ê de dema ku parêznameya AÎHM'ê hat, Serokatî diyar kiribû ku navê PKK'ê jî dikare bê guhertin. Kongreya heştemîn ku di avrêla 2002'yan de hat lidarxistin navê PKK'ê hate guhertin û KADEK hat avakirin. Piştre jî bi navê Kongreya-Gel xebat hatin meşandin. Ji 2004'an ve dema ku li ser esasê guherîna paradîgmayê di bîrdoziyê de zelalbûnek çêbû, li ser esasê paradîgmaya nû, ji nû ve înşa û avakirina PKK'ê hate rojevê. Jixwe dema berî wê Serokatiyê gotibû: "Serdema qeyrana bîrdozîk." Ji bo ji nû ve avakirina PKK'ê, pêwîstî bi pergaleke perwerdeyê û dibistaneke nû hebû. Jixwe hemû dibistanên din jî li ser xeta partiyê perwerde dikirin, lê Ocaxê ji nû ve înşa û avabûn îfade dikir. Wek dibistana înşayê ket rojevê. Wek dibistaneke partiyê, bi nîqaşkirina pirsgirêkên ji nû ve avabûnê û wek cihêkî ku kadroyên înşayê bigihîne hat vekirin.

Di pergala me ya dibistanan de, perwerdeyên me yên dorfireh hene. Di amûr û rêbazên perwerdeyê de guhertin çêbûn. Lê ew rastî hê jî berdewam dike; çiqasî perwerde bê lidarxistin, ew qas pratîkbûn, hêza karkirinê û derfetên wê derdikevin holê. Ev yek di serî de jî wisa

bû, niha jî wisa ye. Di lidarxistina perwerdeyê de, rastiya di mejî, rih, hest û nêzîkbûnê de guhertin kirin û ji karkirinê re amadebûnê berdewam dike.  Zêdetir profesyonelî bi pêş ket û pergala me ya perwerdeyê zêdetir bi naverok bû. Ji aliyê şêwaz û bernameyê ve jî pêşketin çêbûn. Lê armanc neguherî, wate û girîngiya perwerdeyê neguherî ye. Dijberî vê her ku têkoşîn mezin bû û bi şax bû, perwerde bû pêwîstiyeke mezintir. Wate û girîngiya perwerdeyê zêdetir bû. Di asta ku me xwe perwerde kir de, em mezin bûn û em hatin asta ku peywirên şoreşê ku her roj zêdetir bi pêş dikevin û cihêreng dibin bikaribin bimeşînin. Di perwerdeyê de ew qas mezinbûn, profesyonelbûn; bi mezinbûn û dewlemendbûna peywirên şoreşê ve jî girêdayî ye.

Perwerdeya ku di malan de wek xwendin û nîqaşên koman dest pê kiriye, li hemberî faşîzma 12'yê îlonê di pêvajoya 15'ê Têbaxê de, di qampan de û wek pergala yekîneyan bi pêş ket û di Akademiya Mehsûm Korkmaz de berdewam kir. Piştî 93'yan di dema stratejîk ya sêyemîn de; bi cudabûn, bi şaxbûn û bi cihêrengbûnê di pergala dibistanê de hate meşandin. Piştî komployê jî li ser esasê guhertin û ji nû ve avabûnê, zêdetir ji hev û din cudabûn, cihêrengbûn û bi pergalbûn hate jiyankirin. Pergala dibistanê jî li gorî wê hate guhertin.

Tesfiyegeran xwestin di serî de wê pergala dibistanê belav bikin û darbeyê lê bixin. Perwerde ji bo xwe wek xeteriya herî mezin didîtin. Ji bo ku pergala dibistanan ji holê rakin, pir hewldan nîşan didan. Dema ku nikarîn vê bikin, xwestin perwerdeyê bê rist bikin û hundirê wê vale bikin. Di rastiya xwe de ger me karîbe li hemberî tesfiyegeran bisekinin, di vir de dû hêmanên esasî hene. Di serî de bi deswerdana Serokatiyê hate tesfiyekirin. Lê ger kadroyên ku ew qas Serokatî dişopandin û li pey diçûn tunebana, me nedikarî em bi ser bikevin. Hebûna van kadroyan jî, bi her berdewamkirina perwerdeyê û encamên perwerdeyên kadro ve girêdayî bû. Divê em vê rastiyê qet ji bîr nekin.

Tesfiyegeriyê, pergala perwerdeyê ji bo xwe wek xeteriya herî mezin dît û di destpêka 2002'yan ve xwest ji holê rake û tune bike. Bi tevahî nikarî ji holê rake, lê hundirê wê vale û lîberalîze kir. Pergal sist bû, cîdiyeta wê kêm bû û disiplîna rêxistinî û xebatan kêm bû. Ji 2003'yan heya dawiya 2006'an me hejandinek wisa jiyan kir û tevgerê zirar dît. Bi girîngî nedana rêveberiya perwerdeyê, bi girîngî nedana disiplîn û pergala perwerdeyê, bi girîngî nedana avakirina yekîtiya ferasetê û jiholêrakirina têkoşîna xetê di naveroka perwerdeyê de, xwes-

tin perwerdeyê ji cewhera wê dûr bixin. Pir zêde xirab kirin û guhertin. Guherîna ku Serokatî dixwest berovajî kirin. Ji ber vê ji nû ve biserxistina pergalê zehmet bû. Hê jî kêmasiyên ku di encamgirtina perwerdeyan de derdikevin, bi bandorên tesfiyegeriyê ve girêdayî ne.

Bi hemû kêmasiyên xwe ve, ger dîsa jî partîbûn û li ser piyan mayîn hebe, bi perwerdeyên ku hatine meşandin ve girêdayî ne. Lê ji ber ku wisa ye, em nikarin bibêjin ku kêmasiyên pergala me ya perwerdeyê tune ne; em nikarin bibêjin cihên ku werin rexnekirin û werin sererastkirin tune nin û em gihîştine ya herî baş. Ji aliyê hejmar ve kêm in. Li gelek qadan perwerde nameşin. Mînak Serokatiyê, rexne kir û got: “Li Bakur çima akademî tune nin.” Ji aliyê hejmarî ve kêmasî hene, lê ya esasî jî ji aliyê çawaniyê ve kêmasî hene. Ger perwerde, kadroyên ku serdem dixwaze bigihîne, dê serkeftî bibe. Perwerdeyên me ji peywiran re çiqasî amade dike, pîvana serkeftinê di wir de ye.

Di çareserkirina pirsgirêkên kadro de; di kêmasî û lewaziyên ku di partiyê de tên jiyankirin û li gorî xwesteka Serokatiyê partî nexistina seferberiyê û di wê astê de nexistina nav kar de rista perwerdeyê jî heye. Li ser vî esasî divê pergala me ya perwerdeyê jî were rexnekirin, were nîqaşkirin û sererastkirin. Ji bo hemû astên perwerdeyê ev yek derbasdar e. Divê em hemû pergala xwe ya perwerdeyê di ber çavan re derbas bikin, em bi çavekî rexnegir bigirin dest. Bi perwerdeya ku di malekê de bi komekê dest pê kiriye, gihîştiye asta bi sedan dibistan û akademiyan. Ew pêşketineke mezin e. Divê em vê bibînin, tune nehesibînin. Lê ji ber ku wisa ye, li ser vê razan û bi gotina kar baş dimeşin û em bi ya heyî xwe sînordar bikin, teqez dê bibe şaşîtî. Tunehesibandin çiqasî şaş be, bi vî awayî li ser kar razan jî ewqasî şaş e.

### Bêyî Ku Kesayeta Azad Demokratîk û Komînal Were Afirandin Civaka Sosyalîst Çênabe

Serokatî di hemû parêznameyan de dinirxîne. Di serneketin û belavbûna hemû tevgerên demokratîk û azadîxwaz de ev heye. Di cewherê xwe de neafirandina kesayeta azad, Şoreş li ser vî esasî bi pêş nexistin; ji ber avanekirina civaka li ser esasê kesayeta azad e. Herî dawî dema ku Rêber Apo pratîka sosyalîzma pêkhatî nirxand, ew yek bi awayekî zelal danî holê. Bêyî ku kesayeta demokratîk, azad û komînal hebe, civaka azad pêk nayê. Sosyalîzma ku xwe nespêre kesayeteke wisa nikare li ser piyan bisekine. Bi qasî ku dikare bila wêrekî, fede-

kartî, egîdî û lehengiyê biafirîne; di encamê de mehkûmî ruxandinê ye. Dîrok bi mînakên vê yên bêhêjmar dagirtiye.

Belavbûna sosyalîzma pêkhatî, mînaka vê ya herî şênber û herî dawî ye. Em jî dibêjin, lê pêk naynin. Çima? Ev deh sal in em dibêjin, em ê konfedaralîzma demokratîk û civaka demokratîk înşa bikin. Lê Serokatî ji bo vê pratîka me got: "Ji sedî yek e." Di vê mijarê de me kevir nedaye ser kevir. Em dibêjin, lê tiştekî ku em dikin tuneye. Tiştên ku em dibêjin, wek gotin dimînin; nazivirin pratîkeke piçûk û çalakiyê. Deh sal in, em xwe difelişînin. Lê a-b-c ya rêxistinê jî me ji bîr kiriye. Em li cihekî dijber disekinin. PKK ya 1979'an, ji ya îro rêxistinkirîtir bû, peywirên pêşengtiyê baştir dianîn cih. Hin pirsgirêk hêsantir dihatin çareserkirin. Rêveçûneke xwe ya rêxistinî hebû, di roja me de hema hema ew jî nemaye. Piştî danehevên çil salî, dest û piyên me tevlî hev dibin, em şaş dibin ku çi bikin. Çima? Serokatî vê wek: "Pisgirekên kadro û rêveberiyê" pênase dike. Nîqaşên me jî ew rastî derxist holê.

Ew deh sal in em bi înşaya civaka demokratîk re mijûl dibin; lê me tiştek li ser kiryarên xwe yên deh sal berê zêde nekiriye, me tiştek neguhertiye. Ya rast deh sal berê hîmê vê jî hatibû avitin, lê li hemberî êrîşên tesfiyeger me nikarî em wan jî biparêzin. Wisa be, em dikarin bibêjin nabe. Em dibêjin, bêyî ku kesayeta azad hebe, şoreşa azadiyê nikare li ser piyan bisekine û xwe mayînde bike. Em dev ji vê jî berdin, lê ew Şoreş pêk jî nayê. Ji bo ku pêk ware, ew yek pêwîst dike. Wisa be divê berî ku em di civakê de şorêşê pêk bînin, divê em di serî de di kesayêtên xwe de şoreşê pêk bînin. Berî şoreşa civakî; divê şoreşa kadro, şoreşa kesayet û şoreşa partiyê pêk were. Herî kêm kesê em wek pêşeng dibînin, divê civaka ku em armanc dikin di kesayeta xwe de bijî ku înşaya civaka demokratîk û netewa demokratîk pêk were.

Pirsgirêkên kadrotiyê jî ji ber vê ne. Derbaskirina van pirsgirêkan jî, bi pêkanîna şoreşa kesayet ve girêdayî ye. Divê pirsgirêkên kadro, li ser hîma paradîgmaya demokratîk û azadîxwaz werin çareserkirin. Divê netewa demokratîk, civaka demokratîk û civaka exlaqî û polîtîk di kesayeta milîtan, şoreşger û kesayeta partiyê de şêwe bigire. Divê wek hest, fikir û nêzîkbûn şêwe bigirin. Ji xeynî vê çareserî tune, kadroyên ku bi vî awayî tevnegerin, nabin kadroyên demê. Şoreşeke xweseriyê û înşakirineke netewa demokratîk, bêyî ku xwe bispêre pêşengtiyeke wisa pêk nayê.

Di encamê de pratîka me ya deh salan ew e. Em nerevîne, ji cihekî dîtir ve nerevîne û bi awayekî şênber em li meydanê ne; em xwêdan didin, xwîn dirêjin û ked didin. Ev deh salên me wisa vale jî derbas nebûn. Lê Serokatî dibêje: "Pratîka we ji sedî yek e." Jixwe pêwîst nake ku Rêber Apo jî vê bibêje. Dema ku em pratîka xwe mêze dikin, tiştekî ku em wek civaka demokratîk, netewa demokratîk pênase bikin; diyardeyeke ku xwe bi xwe bi rê ve dibe, xwe wisa rêxistin kiriye û bûye xwediyê rêveberiyeke cewherî tuneye. Ne gundekî wisa, ne taxeke wisa, ne jî civakeke biçûk ku bi vî awayî ye heye. Pergalên me yên rêxistinî jî bi piranî li gorî ya kevn e, ne li gorî ya nû ne. Wisa be, bêyî ku guhertineke şoreşa kesayet bide çêkirin û kesayeta bi vîn ava bike pêk neyê; em nikarin bi paradîgmaya Serokatiyê, pêşketinên şoreşgerane ku em dikin armanc pêk bînin. Derfet û fersend çiqasî zêde dibin bila bibin, em nikarin vê pêk bînin. Teqez ji vê re em dibêjin perwerde. Avakirina kesayetê, perwerde ye.

Perwerde; li hemberî pergala paşverû berxwedan e. Dîsa kesayeta exlaqî û polîtîk, kesayeta demokratîk û azadîxwaz avakirin e. Di rih, mejî û hestan de xwe gihandina kesayeteke wisa û li ser vî esasî pêkanîna şoreşa kesayeta azad e. Bêyî ku ew yek pêk were em nikarin tiştekî din bikin. Ango bêyî ku em xwe di asta pêkanîna şoreşa kesayet de perwerde bikin, bêyî ku em xwe bigihînin asta kesayeta azad ku pêşengtiya înşakirina netewa demokratîk bike, em nikarin bibin milîtanên pêşeng û şoreşger yên demê. Em nikarin peywirên pêşengtiyê pêk bînin. Girîngiya perwerdeyê di vê astê de ye. Bala xwe bidinê, ev ne girîngiyeke ji rêzê ye. Wisa em nikarin bibêjin; bibe jî dibe, nabe jî dibe. Divê ji sedî sed pêk were.

An em ê wisa bibin û di nav şert û mercên heyî de îmkanên şoreşgerane ku derketine holê em ê bizivirînin şoreşeke mezin ya azadiyê; an jî bêyî ku em kesayeta xwe ava bikin, rewşa heyî heya demekê dê bê îdarekirin û dê binketin û windakirin pêk were. Jixwe pêşeroja dibêtiya duyemîn tuneye. Riyeke din ya navber tuneye. Riyên navber derbasdar in; naverast (orta yolculuk) û sekna li naverastê derbasdar e. Niha em bi sekna naverastê dimeşînin, me heya demekê jî îdare kiriye û em bi vê xwe dixapînin. Bi nêzîkatiyên me ev rewş berdewam jî dike.

Yên ku rast dikin jî hene, yên dixwazin kar bikin jî hene, yên ku li ser hîmê kesayeta şoreşgerena têkoşînê bimeşînin jî hene; lê di nav vê

parastina hevsengiya ku wan avakiriyê de naverast parastin çêdibe. Li hemberî hemû êrîşên dijşoreşî, yên ku şoroşê dimeşînin jî hene. Hevsengiyeke ku di vê navberê de hatiye avakirin heye, naverastî parastin di nav vê hevsengiyê de heye. Ger şoreşgertî ji holê rabe, ew parastina naverastiya heyî nikare rojekê jî li ser piyan bisekine. Nikarin îdarekirineke biçûk jî bimeşînin. Divê kes nebêje: "Îdarekirin jî rêbazek e, binêrin bi salan e em wisa dikin." Ev îdarekirin hêza xwe ji ku digire, xwe dispêre çi? Ger ew tiştên ku xwe dispêrin, ji holê rabin; gelo wê bikaribin bi hêza xwe li ser piyan bisekinin? Gelo ew bi hêza xwe li ser piyan disekinin, an li ser ked û nirxên ku hinekan ava kirine hebûna xwe berdewam dikin? Ya duyemîn rast e. Ji ber vê tiştekî ku vê xetê daye qezenckirin tuneye. Li dijberî wê tiştên ku dadiqurtîne hene. Ew ne rê û rêbazek e, wisa nabe.

Serokatiyê ev bi awayekî zelal diyar kir. Dema ku Serokatî diyar dike, em jî dibêjin: "Rast e, lê binêre em jî hene; em îdare dikin û kar wisa bi rê ve diçe." Li gorî xwe em feraseteke wisa bi pêş dixin. Divê êdî em vê li xwe mikur werin. Ger ne wisa bûya, em ne di vê rewşê de bûn. Serokatî jî dibêje: "Ger hûn naynin ziman jî, di hundirê we re ev derbas dibe." Serokatî rast dibêje. "Hûn li ser piyan e, lê kî we li ser piyan digire; hûn bi hêza xwe li ser piyan e, an hûn xwe dispêrin nirxên ku hinekan ava kirine?" Di vir de bersiva vê pirsê girîng e. Dîsa ya duyemîn rast e. Ger tiştên ku em xwe dispêrin, ji holê rabin dê em ê av û av biçin. Divê wisa îdarekirin tune be, naverastî tunebe, nîvco hiştin tunebe. Diyardeyeke wek serkeftina nîvco tune, şoreşgertiya kêm nabe. Ev hemû têgehên ku hinekan ji ber xwe ve gotine. Di nav van 35-40 salan de, em gelek tiştan fêr bûn, lê me gelek têgehên wisa berovajî jî afirandin.

Serokatiyê got: "We ji ber xwe ve Parastina Pasîf, derxist." Roja han min nivîsên Mao yên li ser leşkeriyê nivîsandine mêze kir. Dibêje: "Têgeha parastina pasîf, têgeheke berovajî ye." Tiştekî wisa tuneye, wî jî di wê demê de gotiye. Me ew qas têgeh ji ber xwe ve çêkirine ku; "Şoreşgertiya kêm, şoreşgertiya nîvco, şoreşgertiya lewaz" di rastiya xwe de tişketî wisa tune. Ev hemû têgehên ku hinekan ji ber xwe ve derxistine holê ne, ew li ser pişta şoreşgertiyê jiyankirin e. Tu yan şoreşger î, yan jî ne şoreşger î; pîvan ev e. Lê me ew têgeh şîlo kiriye, me gelek pîvanên navber derxistine holê. Bi vê em rewşa xwe ya ku nayê şoreşgertiyê rewa dikin, an jî em hewl didin vê bikin. Ev ne rast e. Pirs-

girêka esasî, nêzîkbûnên ku ew riya naverast rewa dikin, rewşa heyî bi dijşoreşê re dixin nav dengeyê, sekna ku hewl dide xwe bide jiyankirin, ruxandin e. Naverastî (orta yolculuk) ew e. Kesayeta çîna navîn ew e. Li Bakur heval, çîna navîn pir rexne dikin; li cihê ku li xwe binêrin û rexne bikin, hinekên din dinêrin. Rast dibêjin, lê tewanbar li cihekî din digerin. Tiştên ku dibêjin, di xwe de bigerin dê çareseriyê jî bibînin. Lê ji ber ku hinekên dîtir mêze dikin, nikarin çareseriyê jî bibînin. Divê ev rewş were sererastkirin.

Ya rast, pirsgirêka herî esasî pirsgirêka xwe perwerdenekirinê ye. Tiştên ku tên zanîn pir dubare kirin, dibe ku pir bi wate nebe. Lê pirsgirêkên me hene, lêwaziyên me hene; divê em bi awayekî şênber û rast deynin pêşiya xwe, sedemên wan bibînin û çareser bikin. Ger em ê bi perwerdeyê dema xwe derbas bikin, divê li ser vî esasî be. An na em ê xwe bixapînin. Wê demê perwerdeya ku em bibînin jî, dê vale biçe. Dibêjin: “Tiştên ku bêhn dikevê, mirov bi xwê telafî dike; lê ger bêhn bikeve xwê tuyê çi bikî?”

Ger naveroka perwerdeya ku em bibînin bêhna rêformîzmê, oportînîzmê jê were û ne li ser esasên şoreşgerane be; wê demê tuyê kadro û milîtanan li ku bigihînî. Ji vî aliyî ve girîng e. Rast e, perwerde li dar xistin pêwîst e, zêdetir perwerde li dar xistin zêdetir pêwîst e; lê li ser esasê xeteke şoreşgerane li dar xistin jî girîng e. Ger ne li ser xeta şoreşgerane û xeta Serokatiyê be, ji zirarê jî wêdetir ew perwerde xeterî ye. Ger ferasetên şaş, meyîlên naverast û burjûwatiyê rewa bike, bide pejirandin û mehkûm neke; ew perwerde şaşiyeke mezin di hundirê xwe de dihewîne û xeterî ye. Em vê pir jiyan dikin.

Em şaşiya: “Min perwerde dît û temam bûm.” Jiyan dikin. Perwerde dîtin, bi serê xwe nayê wateya rast û besbûnê. Rast meşîn û nemeşîna perwerdeyê divê were pirsyarkirin.

Dîsa tevlînebûna kes, divê were lêpirsînkirin. Tu pola xwe derbasbûyî, an na; tu di deriyê pêşî re derketî, an di deriyê paşî re? Ev hemû girîng in. Em van mijaran hemûyan ji nedîtî ve bên, lêpirsîn nekin; em bibêjin: “Bila dibistanek hebe, em demekê biçin û derbas bikin, dema em derketin em qet tiştekî nekin jî em şoreşgerên çar û çar in. Piştî wê her gotin û kiryara me jî bila rast bê dîtin.” Ev ne rast e, nayê pejirandin. Ger em vê qebûl bikin jî, pratîk vê qebûl nake. Bi qasî ku em dikarin bila em bibêjin: “Wisa jî dibe.” Dema ku em çûn pratîkê dê her tişt diyar bibe. Çima? Ji ber ku pîvan pratîk e. Ji tiştêkî re tu bibêjî

rast e û bes e, ew têrî nake. Divê ev di pratîkê de were îspatkirin. Ger neye îspatkirin, dê rûpoş bikeve û her tişt dê derkeve holê.

Diyar e ku wisa nabe. Diyardeya ku em wek perwerde pênase dikin, karekî girîng û cidî ye. Em dikarin bibêjin karekî ku ji şer jî hesastir û xetertir e. Em şer xeter dibînin, lê divê em perwerdeyê xetertir bibînin. Çima? Ji ber dema ku tu di şer de şaşîtiyekê bikî, tuyê di wê kêliyê de winda bikî, lê tu di perwerdeyê de şaş bikî tuyê heya heyayê winda bikî. Ji vî aliyî ve xetertir e. Ji ber vê sererastkirina kêmasiyên di perwerdeyê de pir girîng e.

Perwerde meşandin gihandina asteke bes û rast pir girîng e. Ger wisa nebe û rista xwe nelîze, dê dijberî vê zirarê bide. Divê em nebêjin ger bi kêr nayê, zirar jî nade; ger bi kêr nayê, dê zirar bide. Ger kêm bi kêr ware, dê zêde zirar bide. Aliyekî wê yê dijwar jî heye. Ji vî aliyî ve divê em li ser pergala perwerdeyê bisekinin. Bi rastî jî em ê bikaribin xwe perwerde bikin, an na? Dê pirsgirêk bi perwerdeyê çareser bibin, an na? Ango dê pirsgirêk bi perwereyekê çawa çareser bibin? Divê em perwerdeyê çawa bikin ku pirsgirêkan çareser bike? Ew kar wisa bi rojê sê danan xwarin xwarinê nabe. Tu yê carekê bikî, rast bikî û bi serkeftinî bimeşînî. Ger tu rast nekî, tu çil carî bikî jî dê di tiştê neyînî de kûrbûn û teqezbûn çêbibe û zirar bide. Ji ber vê di perwerdeyê de xeteke rast girtin, pir girîng e.

Ji bo nirxandina derfet û fersendên heyî; dîtin, fêmkirin û bi şêwaz, islûb, tempoyekî rast pêwîst dike. Ji bo vê jî mîlatanên pêşeng ku rast pratîze bikin pêwîst dikin. Wek me got, milîtanên wisa jî bi perwerdeyê tên afirandin. Wisa be dê em ê çawa bibin milîtanekî/e bi vî rengî? Perwerdeyeke wisa heye, dikare pêk were? Bi rastî jî bi perwerdeyê em dikarin rewşeke wisa ava bikin? Ev pirs ji bo me girîng in. Ger em ê di sekna rêveberî û kadro de sererastkirinekê çêbikin, di serî de divê em di perwerdeyê de sererastkirinekê çêbikin.

Di perwerdekirin û birêvebirina kadro de, sererastkirin mijareke pir girîng e. Lê di tevgera me de, ji vî aliyî ve şaşîtiyek heye, nebesiyek heye. Li mêzekirina perwerdeyê ya ji rêzê û tenê wek cihekî fêrbûna hin agahiyan girtina dest heye. Cihê ku em ya rast bibînin û li ser vî esasî bi têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî û bi têkoşîna çînî û cînsî şoreşa kesayet pêk bînin; em kesayeta kevn û agahiyên nû dixin nav hev û kesayeteke ku bi tiştên vale serê wî/ê tijî bûye derdixin holê. Divê perwerde rê nede rewşên wisa. Divê sekn û nêzîkbûnên wisa bên sererastki-

rin û zelalkirin. Rewşa heyî nezelalbûn e, şîlobûn û tevlîhevî ye. Di hest, mejî, şêwaz û nêzîkatiyê de tevlîhevî pir zêde derdikeve holê.

Çi dibe bila bibe, dema ku em dizivirin û li dîroka xwe mêze dikin em vê dibînin; bi başî û şaşiya xwe, di hîma her tiştî de perwerde heye. Hemû pêşketin bi perwerdeyê çêbûne, ev rastiyeke ku divê em qebûl bikin. Bê perwerdeyê tu tişt çênebe. Bêyî ku perwerdeyeke cidî were dîtin, karekî cidî jî pêk nayê. Çima? Ji ber nijadkûjî, qirkirina çandî ya pergala tunehesibandin û tunekirinê ye; Ji ber qirkirina civakî ya pergala kapîtalîzmê ye. Divê ev rastî bên dîtin, bên fêmkirin û li hemberî vê zanebûn, hêrs û vîn derkeve holê. Ji bo ku ew bizivire çalakiyê jî, xwe zanekirin û biryarbûneke mezin pêwîst dike. Ger wisa nebe, em ê nikaribin gavekê jî biavêjin, jixwe wisa jî bû.

### Rastiya Serokatiyê Dibistaneke Ku Her Dem Derdora Xwe Ronî Dike Ye

Em li rastiya Serokatiyê binêrin, li dîroka partiyê binêrin, li hewldanên Serokatiyê binêrin; di navenda her tiştî de perwerde heye. Bi rastî jî em her tiştî bi perwerdeyê diafirînin û bi ser dixin. Ji derketina xwe ve, sekneke perwerdeyê ye. Xwe perwerde dike, partiyê perwerde dike û gel perwerde dike. Niha jî bi parêznameyên xwe, bangî hemû mirovahiyê dike û xwe gihandiye asteke ku mirovahiyê perwerde dike. Wisa be rastiya Serokatiyê, li gorî xwe pergaleke dibistanê ye. Ger em dibistanê wek rastiyeke perwerdeyê pênase dikin û cihekî perwerdeyê ye; rastiya Serokatiyê dibistanek e. Dibistaneke ku her dem xwe û derdora xwe perwerde dike ye.

Dema ku em dibêjin dibistan, hema cihên wisa wek qesran û naveroka wan bi tiştên modernîzmê tijîkirin tê bîra hevalên me. Piştî wê kesekî ku bixin hundir û çend gotina bike nabînin û ew dibistan tesfiye dibe. Wisa nabe, ew yek ji bo nîşandayîn û rizgarkirina demkî ye. Di vir de cewhera kar tune, tenê şêweyî ye. Lê di şêwaza Serokatiyê de cewherê kar girîng e. Bêguman şêwe jî li gorî cewher dirûv digire, lê tiştê ku em diyar dikin; şêweyeke bê cewher derdikeve holê. Ger ne bi naverok be, bi şêwe rizgarkirina rewşa heyî ne rast e. Lê Serokatiyê cihê ku di fermiyetê de ne dibistan e; mal, çiya, gund, qamp li ku dibe bila bibe, wê derê dizivirîne dibistanê. An na dibistan wek bîna û hin masayên hundir de girtina dest, valekirina cewher e. Lê perwerde wisa nayê lidarxistin; wek me got, ji bo perwerdeyê şoreşa kesayet û afi-

randina kesayeteke nû pêwîst dike. Em ji rih, hest, fikir û zanebûna wê derxistina holê re dibêjin perwerde. Bala xwe bidinê, rastiya Serokatî her bi van heqîqetan dagirtiye. Ji destpêkê ve xwediyê jiyan û xebateke bi vî şêwazî ye.

Hin rojnamegeran pirsî û gotin: "Çeka te ya herî bi hêz çi ye?" Serokatî bêyî ku bikeve duduliyê got: "Çeka min ya herî bi hêz, zimanê min e." Ziman amûreke ku fikir derdixe holê ye, dema ku bi fikir ve dibe yek, tê wateya perwedeyê. Serokatiyê her diyar kir karê herî bingehîn ku pêk tîne perwerde ye. Carinan hin fikrên wisa bi me re bi pêş dikevin; em dibêjin: "Ew fikra heyî, dayîneke xwedê ye." Van fikir bi awayekî amade ji cihekî dîtir nehatine. Bi hewldanên zanebûnê, bi lêhûrbûnê, li ser pirsgirêkan ponijandin û bi lêgerîna çareseriyan bi pêş ketiye.

Yên ku van pêk tînin, dibin afirînerên fikrên nû. Yên ku vê nekin û nizanin, wek ku ev tiştekî kerametî ye digirin dest. Yên ku vê dikin jî, wek xwe perwerdekirin, lêhûrbûn, hestên berpirsyariyê, girêdanbûna bi armancê ve û ji bo pêkanîna vê armancê; nîşandayîna vîneke ji pola û wêrekiyeke mezin digirin dest. Bala xwe bidinê, ev hemû jî hewldan, xwe bi pêş xistin û xwe perwerdekirinê dixwazin. Divê em vê bizanibin. An na Serokatî wek xwediyê kerametên xwezayî girtina dest, şaşiyeke û nêzîkbûneke dijber e. Dijberî vê divê em wek xwediyê kedeke mezin, xwediyê hewldaneke mezin, xwediyê berpirsyariyeke mezin û xwediyê lêhûrbûneke mezin bibînin. Ango divê em wek bi xwe perwerdekirinê, xwe bi pêşxistiye û xwe gihandiye vê astê bibînin. Serokatiyê bi xwe jî wisa nirxand.

Bala we kişandibe, Serokatiyê hemû pêşketin wisa afirandin. Di serî de ne wisa bû, Serokatiyê got: "Em bi du hevokan derketin rê." Di serî de ne wisa bû, ne dikarî ew qas biryar bigire. Ev hemû bi ked û hewldan, bi xwe perwerdekirinê pêşketin û nirxên ku derketine holê ne. Perwerde wisa encam dide, mirov dikare xwe perwerde bike. Tiştê ku herî teqez rastiya Serokatiyê diyar kiriye, ev rastî ye. Mirov dikare xwe perwerde bike; ger bixwaze dikare bi awayekî îstîkrar, bi hin armancan ve bê girêdan. Dikare xwe bîne asta kesê ku van armancan jiyan dike, dide jiyankirin û digihîne serkeftinê. Tiştê herî esasî ku rastiya Serokatiyê îspat kiriye, ev e. Ew yek tê çi wateyê? Mirov dikarin xwe perwerde bikin, guherîn û veguherîn gengaz e. Di asta şoreşa kesayet de perwerde dikare were lidarxistin. Mirov bibêje nabe, tenê ew qas

dibe û ya ku nîvco ye wek encama teqez bihesibîne û bibîne misoger şaş e. Ev ne rast e.

Dema ku em van tiştan hemûyan dinirxînin, divê em rastiya Serokatiyê wek pîvan bigirin dest. Wek diyardeyeke şênber û hatiye îspatkirin, rastiya Serokatiyê li hemberî me disekine. Bala xwe bidinê, her tiştî bi perwerdeyê pêk tîne, hemû tiştên nû bi riya perwerdeyê dibîne. Ew qas girîngî dayîna perwerdeyê, ew qas xwendin û lêkolîn kirin, ew qas lêhûrbûn, ew qas xwe û derdora xwe perwerdekirin û ronîkirin; diyar dike ku mirov hem dikare vî karî bi ser bixe, hem jî dikare karên dîrokî bi perwedeyê bigihîne encamê. Rêber Apo, bi van encam girt. Ango helwestên ku hatine îspatkirin in; wisa bi dibêtî û angaştan em neaxivin. Ev hemû di pratîkê de hatine îspatkirin.

Ji vî aliyî ve divê em ji xwe perwerdekirinê bawer bikin. Divê em bawer bikin ku em ê bikaribin perwerdeyan li dar bixin û em ê bikaribin xwe perwerde û terbiye bikin. Divê baweriya me bi xwe hebe. Bêguman ev jî bi xwe nabe, bi nêzîkbûnên lewaz nabe û nabûye jî. Dê çawa bibe? Ev girîng e. Rast e, divê em bi perwerdeyê bawer û ewle bin, lê em ê çawa bikin? Em ê çawa xwe perwerde bikin û biguherînin? Ev mijar girîng e. Di vê mijarê de jî divê em şêwaza Serokatî û asta wî ya dahûrandin û çareserkirinê mêze bikin. Serokatiyê ev wek "Di xwe de çareserî afirandin" pênase kir. Wisa be divê berî her tiştî, ji bo ku em bikaribin perwerdeyê li dar bixin û em bikaribin di perwerdeyê de serkeftî bin, divê em di xwe de avakirina çareseriyê esas bigirin. Divê em vê bizanibin. Divê em vê esas bigirin û bi vê bawer bikin. Çareserî di xwe de avakirin jî, berpirsyariyeke mezin e. Karekî girêdana armanc, karekî hewldan û fedekariyê ye. Ji bo armancên şoreşê Serokatiyê digot: "Her tiştê xwe, li gorî wê bi pergalkirin." Bi hemû hêzê xwe dayîna armancê, serkeftinê û bi her awayî xwe tevlîkirin û xwe bi pergalkirinê amadekirin e.

Tiştên ku serkeftina perwerdeyê diyar dikin ev in. An na li cihekî kombûn, nîqaş kirin û xwendin nîn e. Ger ev helwestên ku me diyar kirin tunebin; bi qasî dikare li cihekî kom bibe, bixwîne, nîqaş bike, lêkolîn bike, encamên ku tên xwestin dernakevin holê. Lê bi taybetmendiyên ku me diyar kirine tevgerîn çêbibe; dê her kes xwe bi xwe perwerde bike û dê her kes bibe dibistana xwe. Pêwîstî bi dibistanan jî namîne. Dê hem bibe xwendevan, hem jî bibe mamoste. Serokatî jî her li ser vê mijarê sekinî û digot: "Ez çawa xwe perwerde dikim? Hûn çima

li ser vê nasekinin? Ez jî bi perwerdeyê jiyan dikim, wisa be ez çawa xwe perwerde dikim? Tu dibistan min perwerde nakin, ger mesele çûyîna dibistanê be, ez çûm dibistana herî mezin ya Tirkiyeyê, lê tiştên ku min dizanîn jî min ji bîr kirin. Wê derê tiştek jî neda min, min avakirina zanebûna xwe ji wir negirt. Bi xebatên ku min meşandine min ew tişt derxistin holê." Wisa be divê em ji rastî û şêwaza Serokatiyê hin waneyan derxin. Diyar e tiştê ku em di serî de bikin ne tiştên wisa şêweyî ne. Ya girîng cewhera perwerdeyê ye, bêyî ku em biçin dibistanan jî em dikarin xwe perwerde bikin.

Bêyî ku em tevlî dewreyên perwerdeyê bibin jî em dikarin xwe perwerde bikin. Gelo ev gengaz e? Ger hinek dibêjin, ne gengaz e; vaye li pêşiya me îspata me heye. Di vir de em rastiya Serokatiyê dikarin wek îspat destnîşan bikin. Rastiya Serokatiyê heye û dikare perwerde jî bike. Ji bo pêkhatina perwerdeyê, pêwîst nake ku em tiştên şêweyî derxin pêş. Cewherê vî karî girîngtir e. Ji bo ku perwerde serkeftî be, tiştên ku pêwîst dikin; hestên berpirsyariyê, girêdana bi armancê ve, hewldan û fedakarî ye. Bêyî ku ev tişt pêk werin û bêyî ku nêzîkbûnek wisa tunebe, em kesekî çiqasî bixin dibistanan, zanîngeh bi zanîngeh bigerînin jî encamek dernakeve holê. Tu perwerde pêk nayên.

Aliyê şêwê, bi berfirehî pêkanîna vê ye. Em li perwerdeya Serokatî û partiyê binêrin; ji perwerdeya xwe, perwerdeya derdora xwe ya teng, her ku diçe dizivire perwerdeya partiyê û gel. Dema ku qadên bên perwerdekirin zêde dibin, şêwe jî derdikeve pêş. Bi mezinbûna tevgerê re, pergala şêweyî bi pêş dikeve û dihêle ku ew cewher û naverok bi awayekî berfireh belav bibe. Di destpêkê de çi heye? Ji bo ku xwe bizivirîne fikirekî, xebatên ku Serokatî bixwe dimeşîne hene. Ji aliyekî ve bi lêkolîn, lêhûrbûn û nîqaşan vê kûr dike; ji aliyê din ve hevalên xwe yên li derdorê li ser esasê van fikiran dizivirîne hêzekê, bi wan re nîqaş dike û perwerde dike. Ji bo vê carinan mal, carinan komale û carinan jî hin cihên zanîngehê dibin; van hemûyan dizivirîne dibistanê. Ev hemû tiştên ku hatine kirin in. Piştî ku ji koma bîrdozîk, em ber bi tevgereke ciwanan ve çûn; ev pergal zêdetir mezin dibe. Me li gelek cihan êdî mal digirtin, komale ava dikirin, me ji yurdan sûd werdigirt. Bi kurtasî hemû bingehên ku me dikarî mirovan kom bikin û bînin gel hev, me dizivirand qadeke perwerdeyê û me dikir dibistan.

Dema ku gerîlatî dikeve rojevê, qamp derdikevin holê. Perwerdeya leşkerî, qampên leşkerî û perwerdeyên leşkerî dixwaze. Ji salên 80'yî ve em ketin nav pergaleke wisa. Ji ber ku em tevgereke partîzanan in jî, di rewşa heyî de hem perwerdeyên leşkerî, hem jî perwerdeyên bîrdozîk tên dayîn. Bi vî awayî qampên perwerdeyê û qampên leşkerî dibin cihekî ku mirov hê zêdetir tê de tên perwerdekirin. Li van deran li ser armancekê, perwerdeyên leşkerî û bîrdozîk tên dayîn.

Bi demê re em ketin nav têkoşîneke dijwar. Bi vê re bi pêşengtiyeke bîrdozîk-polîtîk û bi şêwaz, islûb, tempoyeke guncaw tevgerîn, di tektîk û startejiya leşkerî de tiştên pêwîst kirin, bes nekir. Dema ku serkeftina teqez dihat xwestin, wêrekî û fedakariya heyî jî têra vê nedikir; divê zihniyeteke ku şêwaz û tektîkeke nû bi pêş bixe derkeve holê. Qempên heyî jî bi vî awayî zivirîn dibistanên leşkerî. Akademiya Mehsûm Korkmaz bi vî awayî hate vekirin. Demeke dirêj Serokatiyê li vê derê, perwerdeyên leşkerî û bîrdozîk meşandin. Dema ku li pêşiya vê astengî derketin jî, di Dibistana Navendî ya Partiyê de hewldanên xwe berdewam kir. Ji bo ku di şêwaza gerîla û serhildanan de pêşengtiya partiyê bi pêş bixe, şêwaz û tektîkeke rast derxe holê; pêwîstiya bi perwerdeyê her didît. Dizanî ku bê perwerde ev kar pêk nayê.

Mînak dema ku perwerdekirina gel pêwîst kir, Serokatiyê ragihandin bi pêş xist. Di serî de weşana nivîskî bû, piştre ragihandina dîmenî bi pêş xist û televizyon derketin holê. Di perwerdekirina gel de, amûreke pir bi bandor bû. Her ku Serokatiyê televîzyon baştir bi kar anî, bi rastî jî di perwerdekirina gel de pêşketinên pir baş çêbûn. Hem di perwerdekirinê de, hem di rêxistinkirinê de, hem jî di rêvebirinê de bû amûreke bingehîn. Jixwe weşana nivîskî jî wisa bi kar dianî. Bi xebatên pirtûkan encamên kurtir û teqeztir digirtin. Bala we kişandibe, bi xweperwerdekirina kesekî; zivirî partî, tevgereke gerîla û gel. Partî derxist holê, gerîla derxist holê û gel derxist holê. Gelek afirand û hîmên netewa demokratîk avêt. Li gorî vê jî amûrên perwerdeyê û pergalên dibistanan bi pêş ketin. Dibistanên ku zêdetir bi pergal û giştî bûne derketin holê. Di serî de bi têkoşîna partî û gel ya di nav hev de, li hemberî faşîzma 12'ê îlonê bi Akademiya Mehsûm Korkmaz hîmên vê pergalê avêtin û li ser vî hîmî xebatên perwerdeyê bi pêş ketin.

Niha di înşakirina netewa demokratîk de, peywir û berpirsyarî zêdetir berfireh û bi kîte bûne. Di vê çarçoveyê de perwerde jî zêdetir

fireh û kûr bûne. Li gel perwerdeya leşkerî, di perwerdeyên bîrdozîk, siyasî û rêxistinî de zêdetir kûrbûn çêbûye. Her wiha di perwerdeyên jin, ciwan, aborî, civakî û çandî jî wisa ne. Niha her şaxeke înşakirina netewa demokratîk divê li gorî pêwîstiyên xwe, pergalên xwe yên perwerdeyê ava bikin. Ev jî peywireke herî esasî ya li pêşiya perwerdeya me ye. Di van demên dawiyê de, mijara ku dibe rojeva civîna me û herî zêde li ser biryar û planlama tê çêkirin ev e. Pergala me ya perwerdeyê di vê astê de berfireh bûye.

Di perwerdeya gel de jî, astek hatiye girtin; lê hê jî lewaz e. Serokatiyê weşana nivîskî jî, televîzyon jî zêdetir bi bandor bi kar tanîn. Piştî komployê tevgera me bi awayekî bi bandor nikare bi kar bîne. Dîsa jî amûra herî girîng ya perwerdekirina gel, ragihandin û çapemenî ye. Baştir bikaranîna vê qadê girîng e. Divê bernameyên afirîner û dewlemend, bi awayekî ku hemû cihêrengiyên gel bandor bike û bide guhertin rista xwe bilîze. Divê bikaribe xîtabî gel bike. Di van mijaran de tengbûn û lewazî hene. Bi kurtasî pergala perwerdeyê ya ku heye; pêwîstiyeke, pêwîstiyeke têkoşînê ye, şêwegirtina cewher û armancekê ye. Li gorî van hecm û şêwe digire, bi encam dibe. Bi rastî jî van hemûyan encam jî da. Di vê astê de pêşketinên Serokatî û têkoşîna tevgera azadiyê derketin holê.

**Perwerdeya Rast Çeka Herî Mezin e**

Em dikarin bi awayekî zelal vê bibêjin; ew qas pêşketin û têkneçûn, bi vê asta perwerdeyê derkitin holê. Ev pergala perwerdeyê, pêşketin derxistin holê û serkeftin çêkirin. Bi demê re em gihîştin asteke ku di qada gerdûnî de şer dike û li ber xwe dide. Ev hemû li ser hîma perwerdeyê bi pêş dikevin. Pêşketinên pir mezin afirandin. Tu kes nikare bibêje li vir pêşketin çênabin. Ev rastî bi awayekî şênber li ber çavan e. Em dixwazin çi bibêjin? Ger em bixwazin, em dikarin bi perwerdeyê encamê bigirin. Ango perwerde encam dide. Perwerdeya rast, çeka herî mezin e. Rêber Apo got: “Li hemberî hemû cureyên teknîkê, perwerde çeka me ya herî mezin e.” Tiştê ku afirîneriya mirov derdixe holê û dixe tevgerê perwerde ye. Mirov dikare vê amûrê bi kar bîne û dê encam jî bide. Xebatên Serokatî û danehevên me yên çil û du salan, vê nîşanî me didin.

Serkeftin û encama ku derketiye, li holê ye. Em nikarin bibêjin: “Nabe, nayê kirin û tenê ew qas dibe.” Ji ber vê, xwe perwerdekirin,

rêxistin û têkoşînên mezin derxistina holê û kadroyê ku şoreşa azadiyê pêk bîne afirandin gengaz e. Jixwe bi awayekî dîtir ne gengaz e. Bi awayekî din û bi riyeke din kadro, rêxistin û têkoşîneke bi vî rengî derxistina holê, ne gengaz e. Serokatî ew derfet baş bi kar anî û encam jî girt. Ev rêbaz bi awayekî serkeftî hate îspatkirin. Di vê mijarê de tiştê ku dikeve ser milên me; dîtin, fêmkirin û bawerkirina vê serkeftinê ye. Her wiha bi awayekî ku vê serkeftinê mezin û mayînde bikin, divê em pergala xwe ya perwerdeyê jî bi pêş bixin.

Bêyî ku em xwe biguherin û perwerde bikin, em nikarîn tiştekî din bikin. Bi kesayeta ku dijmin perwerde kiriye û ava kiriye, bi kesayeta ku nehatiya guhertin; di nav me de têkoşîna azadiyê meşandin, şoreş pêk anîn, rêxistin ava kirin û çalakî li dar xistin ne gengaz e. Nîqaşên li ser kesayeta azad ku di çarçoveya netewa demokratîk de tên kirin jî vê îfade dikin. Pêkanîna parastin û înşaya netewa demokratîk jî, bi kesayeta azad ve girêdayî ye. Ango bi kesayeta ku hatiye rêxistinkirin û milîtanên pêşeng ve girêdayî ye. Rêber Apo her digot: "Kesê/a ku mejî û dilê wî/ê ne yê me be, çalakiya wî/ê jî ne ya me ye." Ew tê çi wateyê? Kesê/a ku şoreşa zihniyet û wijdanê pêk neanîbe, kesê ku bi rih, hest û fikrên Serokatiyê xwe danegirtibe; pêkanîna wî/ê ya çalakiya şoreşgerane û azad, xebat meşandin û rêxistin avakirina wî/ê jî ne gengaz e. Xebatên ku bimeşîne jî xizmetê şoreşa azadiyê nakin. Çi difikire, ji aliyê fikir ve çi dabin wî/ê, dê xizmetê wê bike. Ê wê pratîze bike. Ev jî destnîşan dike ku bi awayekî rast û şoreşgerane xizmetî tevgera azadiyê kirin; li ser vî esasî çalakî li dar xistin û xebat meşandin; berî her tiştî ji aliyê mejî û dil ve xwe bi hest û fikirên Serokatiyê dagirtinê dixwaze. Xwe perwerdekirin, veguherîn, pêkanîna şoreşa kesayet û xwe gihandina asta kesayeta milîtantiya Apoyî dixwaze. Ev êdî bê nîqaş e.

Niha rê û rêbazên pêkanîna vê çi ne? Di vê mijarê de kêmasî ji ku derdikevin? Rast e, ji aliyekî ve tevgereke ku her tiştê xwe bi perwerdeyê çêdike û hemû pêşketinan bi perwerdeyê diafirîne heye, lê di vir de besbûn û nebesî ji ku derdikeve? Bi rastî jî, perwerdeyeke bes; guherîn û veguherîna kesayet çi îfade dike? Kêmasî di ku de ye? Divê em hinekî li ser vê rastiyê bisekinin. Ger em hemû pêşketinan bi perwerdeyê çêdikin, Serokatiyê ew qas hewldan nîşan dabe û wek dibistaneke xwe ava kiribe, her tişt bi vê meşandibe, mifteya serkeftinê jî di vir de ye. Ger derfet û fersendên derdikevin holê, em tenê dikarin ji sedî

yêkê wê bi kar bînin, divê em di vir de berpirsyariya perwerdeyê jî bibînin. Diyar e perwerdeyên ku hene, di asta ji sedî heştêyî de bikaranîna derfet û fersendan nikare pêk bîne. Çima? Ji ber çi wisa dibe? Ev kar di ku de xirab dibe? Herî kêm bi qasî lidarxistina perwerdeyê, bersivdana van pirsan jî girîng e. An na em ê şaşiyan jiyan bikin.

Ger mirov li cihekî din şaşiyan jiyan bike, zirarên ku bên dayîn dê bi wê qadê ve sînordar bimînin. Lê ger em di perwerdeyê de şaşiyan jiyan bikin, di hemû dem û cihên têkoşîna me de zirarê bide. Wisa be hewldan û keda ku em didin, çiqasî encam digire? Çiqasî cihê xwe digire? Ger cihê xwe nabîne sedem çi ye, şaşîtî û kêmasî di ku de ye? Ji aliyê hecm ve em ew qas berfireh xebatan dimeşînin, perwerde dikin, lê em çima nikarin encam bigirin? Ev pirs jî girîng in. Aliyê hesas û cewherî ya kar ev e. Ji vî aliyî ve divê em pergala xwe ya perwerdeyê nîqaş bikin, binirxînin, lêpirsîn bikin, bi awayekî rexnegir di ber çavan re derbas bikin. Divê em ji her aliyî ve li seradê bixin. An bi awayekî din nabe. Tenê bi awayekî şêweyî li gelek cihan dibistan vekirin, lidarxistina dewreyan, vekirin û girtin bes nake. Ev girîng û bi wate ne. Ji ber ku ev tên kirin, em rexne nakin; lê naveroka wê çiqasî tijî ye, hewldanên ku ew qas berfireh bûne çiqasî encam didin? Çiqasî kesayeta ku serkeftinan diafirîne û encam digire derxistiye holê. Di vê derê de pirsgirêk hene, kêmasî hene.

Ji vî aliyî ve pergala me ya perwerdeyê tê nîqaşkirin. Di her civîneke me de tê nîqaşkirin, tê lêkolînkirin û di encama nîqaşan de car caran hin guhertin tên çêkirin. Ya rast, di dawiya her dewreyê de, em nîqaşên ku encamên waneyan derdixin holê dikin. Em dibistan bi dibistan digirin dest û di nîqaşên kordînasyonê de dikin yek. Li gorî vê çiqasî serkeftî bûye, serkeftî nebûye; çiqasî encam girtiye û kêm maye; nebesî ji ku tên û dê ev nebesî çawa ji holê bên rakirin? Em li ser van disekinin û li ser vî esasî guherînan dikin. Lewre derfet û fersend gelek zêde ne, em di demeke şoreşê de ne. Fedekartî û wêrekiya ku van derfetan bizivirîne şoreşê bê mînak e, di asta ku di dîrokê de tu caran nehatiye dîtin fedaîtî heye.

Lê ruxmê vê, em nikarin ku bibêjin, me têkoşîneke leşkerî, siyasî û bîrdozîk meşandiye. Berxwedan bi hêz e, di xeta wêrekî û lehengtiyê de ye, ev têkoşîn pêşketinên leşkerî û siyasî jî derdixe holê. Lê bi berdêlên pir giran ev pêk tê. Divê bi xwîn, ked û hewldaneke kêmtir; em bikaribin encamên zêdetir bigirin. Di hostetî, afirînerî û marîfeta

pêşengiyê de wisa derdikeve holê. Lê dema ku em li pratîka xwe mêze dikin; encam derdikevin holê, lê ev encam li gorî ya tê xwestin pir kêm in. Ya duyemîn jî, yên derdikevin jî bi berdelên pir giran derdikevin. Wisa be di vir de kêmasî hene, afirînerî kêm e, di şêwaz û rêbazan de nebesî hene, di islûb de kêmasî hene, di şêwaz û tektîk de kêmasî hene. Di rastiya têkoşîn û rêxistina heyî de; çortbûn, seranserbûn, bê planî, bê disiplînî, giştîbûneke ku nakeve kîteyan heye. Em li serhildan, şer, xebatên înşayê, propaganda û ajîtasyonê mêze bikin; hemû jî wisa ne. Di rewşeke pir çort, teng, bê plan de ne. Di dawiyê de pir berdêl tên dayîn û pir kêm encam derdikevin holê.

Ya rast, ev rewş bêperwerdehiyê nîşan dide. Diyar e ku di vir de, milîtantiyeke ku bûye hoste, di hunera têkoşînê de kûr bûye tuneye. Çima tune, dê ev rewş çawa bê derbaskirin? Du aliyên wê hene; yek, perwerde ye. Didu, rêveberî ye. Her tişt wek perwerdeyê girtina dest û perwerde jî wek pergaleke dibistanan dîtin ne bes e. Teqez ev, pirsgirêkê çareser nake. Mirov dikare vê wek aliyekî mijarê bigire dest. Lê tenê yekalî ye. Mesale em nikarin her tiştî li vê dibistanê çareser bikin. Em dikarin riya çareseriyê deynin holê. Pirsgirêk çawa tên çareserkirin mirov dikare bibîne, lê ev nayê wê wateyê ku pirsgirêk hatine çareserkirin. Ji bo pirsgirêk di pratîkê de bên çareserkirin, pêwîstî bi pêvajoyeke nû ya pratîkê heye. Ji ber wê zimanê pratîkê cuda ye. Li wir, şêwaz, islûb û tempoyeke rast pêwîst dike. Li wir rêxistinbûn, disiplîn û rêveberî pêwîst dike. Bi awayekî bi plan û bi bername û rêxistinkirî meşandina kar pêwîst dike. Di vir de rastiya rêxistin û rêveberiyê derdikeve holê. Wisa be, di bi rê ve neçûna kar de ya baş, berpirsyarî ne tenê ya perwerdeyê ye. Perwerde aliyekî wê ye. Aliyekî wê jî rêveberî ye. Kêmasiyên ku ji ber perwerdeyê û rêveberiyê derdikevin, bi hev re girtina dest girîng e. Ger bi rastiyeke rêxistinî û rêveberiyê ve nebe yek nagihîje encamê. Ji ber wê di perwerdeyê de çiqasî rastiyan derxe holê, bi kesekî bide qanekirin jî; ger bi xwe ev rastî her berdewam nekiribe, bi rêbaz û şêwazeke rêxistinî ve nekiribe yek, ev zû jî diguhere. Tiştên ku di perwerdeyê de hatine girtin, dikarin werin valederxistin. Encameke girîng ya perwerdeyên me jî ev e.

Di vê mijarê de ez dikarim van bibêjim; yek, bi rastî jî di perwerdeyên me de kêmasî pir in. Nêzîkatiyên pir zêde teorîk, tiştên ku di gotinê de dimînin, pir zêde seranser û bi awayekî îdareker tevgerîn heye. Em rastiyan dibêjin û derdixin holê, em nîqaş dikin û kêmasiyan

datînin holê, bi rexne û rexnedayînê em hewl didin hin tiştan derbas bikin; lê ev hemû razber (soyut) û di gotinê de dimînin. Wek nêzîkatî di nav dibistanê de kêm be jî pratîzebûnek çêdibe, parzemîna odeyan û dibistanê teng e û jiyan jî teng dibe. Dem bi sînor e. Di parzemîneke wisa teng û sînordar de, di guhertineke kesayet û pratîkê de encamên vê dîtin zehmet e. Mirov van bi rihetî dikare bibîne û bîne ziman. Ji vî aliyî ve divê em şêwaza xwe ya perwerdeyê di ber çavan re derbas bikin. Li gorî derfetên heyî, divê zêdetir bi hêz bikin û divê em bigihînin asteke ku encamên teqez û mayînde bigire.

Em tevgereke çalakiyê ne, rêxistineke têkoşînê ne. Em bîst û çar seatan di nav têkoşînê de ne û em perwerdeyê jî ji bo ku fermande û kadroyekî li gorî vê derxe holê li dar dixin. Perwerdeya ku em dimeşînin, bi armanceke wisa ve girêdayî ye. Ger pêwîstiyên vê armancê pêk neyne, xizmeta vê neke, rista xwe ya di vê mijarê de nelîze; wê demê dê bê wate bibe û ji armancê qut bibe. Ev jî rastiyeke û ji ber vê divê di hin mijaran de, em kêmasiyên hene ji holê rakin. Di rewşa heyî de ev hinek zehmet dixwiye. Derfet kêm û sînordar in, lê ji aliyê din ve pêwîstî pir zêde ne. Ev rast in, lê dîsa jî tiştên ku em di vê rewşê de bikin hene. Di van de kêmasî û nebesî pir zêde ne. Her wiha di rêxistin û rêveberiyê de jî pirsgirêk hene. Çawa? Mekanizma û pergleke ku encamên perwerdeyan bi awayekî bi bandor bizivirîne serkeftinê, araste bike û bi rê ve bibe tune. Di karîneya rêxistînî de bi rastî jî lewaztî û valatî hene.

Di nav perwerdeyê de bi qasî ku tu dixwazî li ser esasên pîvanan bîst û çar seatan jiyanekê ava bikî û her kêliyê bi vê dagirî; lê dema ku kes ji vê derê derdikevin û diçin pratîkê valatiyeke mezin tê jiyankirin. Ji ber wê dikeve nav parzemîneke sist. Divê bi şêwazeke rêxistînî û rêveberiyê heman tişt li wir jî were berdewamkirin. Valetî çêdibe, sistbûn çêdibe, ji ber vê fikir û nêzîkbûnên ku di perwerdeyê de hatine qezenckirin li ser parzemîneke wisa ji holê radibin û tune dibin. Di vê mijarê de rêveberiyên me îzaheke wisa dikin û dibêjin: “Bila bixwe bikin, bila her berdewam bikin, cihê ku hatinê jî bila serarast bikin. Bêyî ku bikevin bendewariyê bila pêşengtiyê bikin.” Bêguman ev jî carinan dibe, lê carinan jî nabe, an jî li her cihî nabe. jixwe pergalek heye, guherîna wî hema ne gengaz e. Ango di nav bendewariyeke wisa de mayîn jî ne rast e. Encam nade.

Ya rast, pirsgirêka mezin nemeşîna şêwaza rêveberiyê ye. Ji valetî hiştin, sistbûn, peywirdar nekirin û ji neşopandinê bingeha xwe digire. Di xeteke ku fersend bide de û di dema wê de hesab bipirse de nîn e. Di vê mijarê de pêkhateya me ya rêxistinî parça ye, sist e. Karîneya rêxistinî di her astê de lewaz e, di her astê de keyfiyet heye. Li gorî xwe bûn heye. Li ser esasê planeke hevpar rêxistinkirin û xebat pê dayîna kirin, kêlî bi kêlî şopandin, bi pergala rapor û fermanameyan şopandina encaman, encam û serkeftinên ku derketine li ser xetekê anîna gel hev tune.

Pergaleke ku bi ser şaşîtî û kêmasiyan ve biçe, bi ser bêpratîkiyê de biçe û hesab bipirse jî tune. Di rewşa heyî de ev pirsgirêkeke girîngtir e. Dema ku ev rewş wisa tê ziman, rêveberî hinceteke wisa derdixe pêş û dibêje: "Divê perwerde wisa be, da ku kadroyê mijara gotinê ye karîneya pêwîst ya rêxistinî û rêveberiyê, bi xwe ava bike û pêşengtiya wê bike." Di vê mijarê de jî kêmasî çêdibin. Ji bo ku ev tiştê tê gotin pêk were, divê dema ku dewreyek perwerde hate lidarxistin hemû xebatên berê bên sekinandin û em hemû pratikan jî bidin hevalên ku ji perwerdeyê derketine. Divê em hemû rêveberiyan, ji hevalên ku ji perwerdeyê derketine pêk bînin. Tenê wisa dibe. Lê ger wisa nebe, dema ku ket nav ya bere, dê winda bibe.

Serokatiyê li ser van mijaran pir nîqaş kir. Di parêznameya xwe ya dawî de got: "Gelo cihê ku ez ew qas berfireh bixebitim, min tengtir û kurtir xebat bida meşandin, dê zêdetir encam bigirta an na?" Her perwerde li dar xistin, her xwesteka kişandina nav pratîkê û li ser vî esasî sererastkirina pratîkê zehmet e. Lewaz dimîne. Bi awayên din dibe? Em vê pir nacerîbinin. Carinan Serokatiyê rêbazeke wisa bi kar tanî. Li ser esasên ku me anîn ser ziman, mûdaxeleyî hin cihan dikir. Li hin cihan hevalên ku ji perwerdeyê derketine dikir rêveberî. Di adaptasyonê de qutbûn çêdibû. Niha pirsgirêkên wisa jî hene. Lê divê dîsa jî em wisa bifikirin; divê perwerde bi awayekî wisa bibe ku, divê kes wisa bi pêş bixe û dema ku çû pratîkê; tenê ne bi peywir û yetkiyan, bi awayekî xwezayî ev kes şaşîtiyên hene sererast bike. Ya rast û sererastkirî berê cihê ku çûyê û van rastiyan bê kêmasî pêk bîne. Divê perwerde di vê astê de be. Ger wisa bibe çareserkirina pirsgirêkan jî hêsantir bibe.

Di rêxistinê de pêşketin û nûbûnê, em dikarin di pratîkê de derxin holê. Lê em ê çawa van pêk bînin? Divê em pergala xwe ya perwer-

deyê bigirin dest, baş bimeşînin ku ev tişt pêk werin. Di vê mijarê de problem hene. Di vê mijarê de em gelek kêmasiyan diyar dikin; perwerde tenê teorîk dimîne, demkurt e, jiyana perwerdeyê têra xwe mirovan rêxistin û disiplîne nake. Di şexsê kesan de, pir zêde li ser sekinîn û şopandin çênabe. Perwerde pir giştî dibe, kes tenê dema ku dixwazin hin tiştan jê digirin. Ji xeynî vê dibe jiberkirin. Zêdetir teorîk e û bi kes dayîna xwarin û zivirandina şêwaz û islûb, di qada perwerdeyê de pir pêk nayê. Ev hemû kêmasî û rexne ne.

Di vê mijarê de Serokatiyê got: "Kêmek zanebûna rast, kêmek jî hewldana rast dê serkeftinê bîne." Divê perwerde vê zanebûna rast û hewldana rast, zihniyeta helwesata rast derbixe holê. Ev jî girêdayî perwerde zivirandina têkoşîneke bîrdozîk û rêxistinî ye. Tenê fêrbûna çend tiştan û perwerde wisa girtina dest bes nake. Ji fêrbûnê zêdetir; divê em ya kevn, ya şaş, ya ku aîdê pergalê ye, bi têkoşîna rêxistinî û bîrdozîk biruxînin û li cihê wê ya nû bi pêş bixin. Di pratîka me de, piranî rûxandin pêk nayê. Em bi ya nû jî dixwazin xwe perwerde bikin, lê kesayeteke dudilî derdikeve holê. Rewşa zihnî wisa ye, nêzîkbûn wisa ye, di encamê de kesayeteke ku pîvanên wî tevlîhev in derdikeve holê. Li gorî cih carinan tiştekî dibêje, carinan jî dijberî wê dibêje; carinan fikrekî diparêze, carinan jî fikrekî cudatir diparêze; di nêzîkbûnê de jî, ne diyar e ka dê kêngê çawa tevbigere.

Perwerdeya ku xwe naspêre têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî van encaman derdixe holê. Ji ber vê di perwerdeyan de bi qasî ku em xeta Serokatiyê, rêgez û pîvanên vê xetê dadiqurtînin, divê li ser vî hîmî em kesayeta xwe bidarizînin, lêpirsîn bikin û têkoşîna xeta rêxistinî û bîrdozîk jî bidin. Bi riya rexne û rexnedayînê xwe lêpirsînkirin, guherîn û veguherîna kesayet kirin, li ser vî esasî şoreş bi pêş xistin girîng e. Ger perwerde ne li ser esasên pîvanên şoreşgerî be, encam nade. Ger nezivire kesayeteke şoreşger û têkoşîneke bîrdozîk û rêxistinî ku şoreşa kesayet ava bike nayê meşandin, encam nade. Têkoşîna rêxistinî û bîrdozîk seranser e, lewaz e. Hem bi awayekî lewaz nêzî xwe dibe, hem jî kêmasiyên derdora xwe ji nedîtî ve tê. Dikare bibêje: "Ji min re çiye." Ger ji tiştekî re bibêje neyînî ye, dizane ku dê rojekê dê ji bo wî jî bê gotin. Di encamê de, cihê ku bingeheke zelal û bi disiplîn bipejirîne, ji qadeke tevlîhev zêdetir hez dike û xwe zêdetir rihet dibîne. Nêzîkbûn û tevlîbûna perwerdeyê jî li ser vî esasî bi pêş dikeve. Ev, nêzîkbûnên kêm û şaş in. Kesê ku wisa nêzîk dibe, şaşiyan jiyan dike û nayê

perwerdekirin. Wisa dibe ku li hemberî şaşîtî û kêmasiyan bê deng e, liberal nêz dibe. Li hemberî perwerdeyê bê xwestek û bê hewldan e. Dibêjin: “Bila yek, an jî rêxistin bê min perwerde bike.” Kêm maye ku bibêjîn: “Bila rêxistin were qapaxê serê min veke, hin tiştan têxê û dîsa bigire.” Wisa nabe. Nêzîkbûneke wisa heye. Hem jî di nav me de pir tê jiyankirin. Divê em ji vê dûr bisekinin, ji ber ku wisa nabe. Perwerde cihekî têkoşînê ye, di têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî de cihê hewldaneke mezin e. Wek ku tê gotin, ji têkoşîna leşkerî û siyasî hêsantir nîn e. Wisa bi hêsanî jî nameşe.

Wê demê divê em rast nêzî perwerdeyê bibin, rast fêm bikin û bi rêbazên rast bimeşînin. Ger wisa were meşandin, dê encam bigire. An na encam nade, encamên bide jî dê sînordar bimînin. Encamên bi sînor jî, her kesayeta dudilî derdixin holê. Ev jî kesayeta navîngir e. Serokatiyê digot: “Dest, çav û lingekî wî/ê li pergalê ye, yek jî li partiyê ye.” Ev tê wateya kesayeta navîngir. Divê perwerdeyên me vê kesayeta naverast zelal bike û bandorên pergalê ji nav me bavêje. Divê pîvan û rêgezên şoreşgerî yên xeta Serokatiyê di kesayetê de serwer bike. Di encamê de em dîsa zivirîn ser şoreşa kesayet.

Em niha dikarin hinekî jî li ser perwerdeya Ocaxê bisekinin. Jixwe mijareke ku tê nîqaşkirin e. Eleqeyek jî derketiye holê, lê di pişt vê eleqeyê de çi heye, mirov vê nizane. Divê ev rewş were dahûrandin. Ji ber ku bi qasî ku tê dîtin, pir zêde ne li ser esasên peywir û berpirsyariyan e.

Em li ser wate û rastiya perwerdeyê sekinîn. Hinekî jî li ser pratîka perwerdeyên Ocaxê sekinîn dê baş bibe. Di çareserkirina pirsgirêkan de, me rista perwerdeyê û rêveberiyan jî vekir. Li ser vî esasî di çareserkirina pirsgirêkan de rista Ocaxê û divê em çawa nêzîk bibin girtina dest, girîng e. Di vê mijarê de şaşî hene. Berê pir eleqe tunebû. Di dewreyên ewil de, pir kesî eleqe nîşan nedida. Ez kombûna dewreya yekemîn û duyemîn dizanim. Pir kesên ku eleqe nîşan didan û dixwestin tevlî bibin tunebûn. Zêdetir bi teşvîkirinê, tevlîbûneke bi sînor çêdibû. Niha ne wisa ye, eleqeyek heye. Mirov dikare vê wek encameke ji nû ve bi avabûna partiyê ve girê bide. Lê Ocax çiqasî serkeftî dibe, di çareserkirina pirsgirêkan de li ku disekine? Divê mirov vê jî binirxîne.

Em dikarin naveroka vê eleqeyê jî ji vir fêr bibin û bidahûrînin. Ya rast, bi mêzekirina avabûna Ocaxê, em dikarin vê pênase bikin. Li ser esasê guherîna paradîgmayê û li ser esasê ji nû ve avabûnê PKK hate

vekirin. Em dikarin vê bi awayekî zelal bînin ziman. Dewreyên ewil, dewreyên kongreya ji nû ve înşakirinê bûn. Wê demê rist û misyona wê çi bû? Dayîna fêmkirinê ya paradîgmaya nû bû, di kadro de daqurtandin û pejirandina paradîgmaya nû bû. Ango afirandina kadroyên ku pêvajoyê ji nû ve înşakirina PKK'ê, bi awayekî serkeftî bide meşandin bû. Ocax li ser vî esasî derket holê. An na tenê bi armanca dibistanek ji pergala me ya dibistanan bê zêdekirin nebû. Bi misyoneke girîng derket holê. Ji bo ku pêwîstiyên demekê, pêk bîne hate vekirin.

Wisa be encamên deh salan çi ne? Ew qas dewreyên perwerdeyê hatin lidarxistin. Ger bîst dewre perwerde kiribe û di her dewreyê de sî kes hebe, hefsed kes dike. Çil kesî cih girtibe, heştsed kes dike. Nêzî hezar kesî di van dewreyan re derbas bûne, di nav van deh salan de. Bêguman nîqaş û xebatên girîng jî hatin kirin. Di pêvajoyeke wisa de, kadroyên ku hêz dane têkoşînê jî di Ocaxê re derbas bûn. Kombûneke kadroyên ku di demên cuda de rist lîstine û pêşengtî kirine jî hene. Ev hemû rastî ne û ji vî aliyî ve encama xebatên deh salan heye. Serokatiyê digot: "Ji bo ku partiyek nû were avakirin sed kadro were perwerdekirin bes e." Bala we kişandibe, Ocaxê nêzî hezar hevalî perwerde kiriye. Ji aliyê hejmar ve deh qat zêdetir e, ango wisa ne lewaz û paşvemayî ye. Lê ji aliyê çawaniyê û serkeftinê ve rewş çi ye? Peywir û berpirsyariyên ku danîne pêşiya xwe û li gorî rista xwe çiqasî tevgeriya ye? Bersiva vê pirsê zehmet e. Bersiva vê pirsê, em dîsa dikarin bi pîvanên Serokatiyê bidin: "Ji sedî yek e." Ji ber ku rêjeya pratîka me wisa diyar kir.

Ocax, bi meşandina pratîk û gihandina kadroyên pêşeng berpirsyar bû. Dibistanên din, bi gihandina kadroyên din ve berpirsyar bûn. Akademiya Mehsûm Korkmaz, Akademiya Zeynep Kınacı û Dibistana Navendî ya Mezlûm Doxan; ev dibistan jî ji dema kevn ve mane. Lê bi guherîna paradîgmayê re, li gorî erka ji nû ve partîbûnê hatin peywirdarkirin. Dema ku pêvajo gihîşt asteke wisa, hemû dibistan jî bi peywira partîbûnê hatin erkdarkirin. Lê Ocax di demeke wisa de hate avakirin. Ji vî aliyî ve, ji wan cudatir e. Ji sedî sed, ew rist girt ser xwe. Bi şîara, ez ê vî karî bikim, hate avakirin. Ango berpirsyariya xwe ya di encamên derketî de jî, ji dibistanên din cudatir e. Dibistanên din dikarin ku bibêjin, "Me peywirên xwe yên rûtîn anîn cih, me ew qas kadro perwerde kirin, erênî û neyînî tevlî pratîkê bûne." Lê Ocax nikare vê bibêje. Ocax nikare bibêje: "Me ew qas kadro perwerde kirin, me

peywir û berpirsyariyên xwe anîne cih.” Ji ber ku nikare berpirsyariya xwe bi hejmarê diyar bike. Ji ber ku misyoneke çawaniyê girt ser xwe. Ev misyon, paradîgmaya nû dana pejirandin û ji nû ve înşakirina PKK’ê bû. Wisa be PKK, çiqasî ji nû ve hatiye avakirin, paradîgmaya nû çiqasî hatiye pejirandin? Li ser vî esasî çalakiyên rêxistinkirî çiqasî hatine lidarxistin? Serokatiyê got: “Hûn qet neguherîne. We ji KCK’ê tiştek fêm nekiriye. Pratîka we, ji sedî yek bikaranîna derfet û fersendan e.” Wisa be, kî ji vê berpirsyar e? Bêguman rêveberî berpirsyar e, li gel wê Ocax jî berpirsyar e.

Meşandina vê peywirê, bêguman karê rêveberiyê ye. Ji ber vê dibe rêveberî û ew berpirsyarî tê dayîn. Lê Ocaxê jî herî kêm bi qasî rêveberiyê ev kar girt ser xwe. Ji ber vê navê wê wek Ocaxa PKK’ê hate diyarkirin. Saziya ku guherîna paradîgma û kadroyê dema nû ava bike ye. Lê çiqasî ev derxist holê? Nêzîkî hezar hevalî perwerde kiriye, lê çawaniya wê çi ye? Dema ku em li çawaniyê mêze dikin, rewş pir cidî ye. Rast e, kadroyên pir wêrek û fedekar derxistin holê. Bi rastî jî ji aliyê wêrekî û fedekariyê ve rista pêşengtiyê lîst.

Dîsa ji aliyê pejirandina ferasetên nû ve tevlîbûneke xwe heye. Lê deh sal, ne demeke kêm e. Di demeke wisa de ji aliyê ji nû ve înşa û rêxistinkirina PKK û KCK’ê, kêmasî û lewaziyên pir mezin hene. Wisa be, em ê niha çawa binirxinin. Ruxmê ku wisa ye jî, çima ew qas eleqe hate nişandan? Bala we kişandibe, pir serkeftî nebûye. Wisa gelek tiştên baş kirî û encamên mezin girtin tuneye. Encama pratîkê, vê nîşan dide. Encamên mezin bigirtana me yê wisa pênase bikira.

Ji ber vê, em perwerdeya Ocaxê û li vir perwerde dîtinê li gorî dibistanên din cuda dinirxînin. Em nikarin wisa bi lêpirsîneke seranser derbas bibin. Pêwîstî bi lêpirsîneke ku pratîka heyî derbas bike heye. Ji ber wê divê kadroyê ku guherîna paradîgmayê pejirandiye û pêşengtiya partiyê ava kiriye derketiba holê. Divê ji hemû perwerde û kadroyan re pêşengtî bikira. Angaşt ev bû. Peywir û berpirsyariya wê ev bû. Niha hê jî behsa pirsgirêkên bîrdozîk û pêşengtiyê dikin. Em behsa pirsgirêkên kadro ku bi hemû şewata xwe, xwe disepînin dikin. Em behsa pêkhatin û pêknehatina înşaya nû dikin. Di van mijaran de me bi qasî misqelekê jî rê negirtiye.

Wisa be, em nikarin bibêjin ku Ocaxê li gorî rist û misyona xwe, perwerde meşandiye. Ji ya ku hatiye kirin re em ê bibêjin çi? Bala we jî kişandibe, wek dibistanên din rûtîn bûye. Cudahiya wê ji wan nemaye.

Naverok û çawaniyeke wê ku dibistan û akademiyên din derbas dike nemaye. Di encama vê de jî nikare rist û misyona xwe tam bîne cih. Bi vî awayî nabe, ev nayê qebûlkirin. Çima wisa ye? Bi armanc û risteke wisa nehat avakirin ku, misyona wê cuda bû. Çima nikare li gorî misyon û armanca xwe xebatekê bimeşîne û encam bigire? Em dikarin ji tiştê ku derketiye holê re bibêjin encameke? Ger em bikarin bibêjin encameke, wê demê rewşa me baş e, pêwîstî bi rexne û rexnedayînê tuneye. Ger em nikarin bibêjin, ev jî encameke, wê demê çima wisa bû? Kêmasî û şaşîtî di ku de ye û em ê çawa sererast bikin? Em neçarin ku wisa binirxînin. Em nikarin bi awayekî dîtir nêzîk bibin. Bi rastî jî dema ku em ji vî aliyî ve digirin dest, kêmasiyên cidî hene. Ocax kêm ma. Ya rast, nêzîkbûna Ocaxê, di heman demê de nêzîkbûna partiyê ye. Pê ve girêdayî, em dikarin bibêjin, ji nû ve partîbûn û ji nû ve înşa jî kêm maye.

Em navê wê wek ji nû ve înşa diyar dikin. Ji ber ku kongreya di avrêla 2005’an de hat lidarxistin, wek “Kongreya ji nû ve înşayê” hat pênasekirin. Em ketin sersala dehemîn. Ev deh sal in ger PKK bihata înşakirin, dê civak jî bihata înşakirin. Her wiha ji ber ku înşaya konfedaralîzma demokratîk û netewa demokratîk tuneye, înşaya PKK’ê jî tune. Jixwe civîna kongreya 11’emîn û civînên din jî ev tespît kirin. Înşa tuneye. Ji ber vê em ew qas li ser înşayê disekinin.

Têgeha înşayê, bûye têgeha me ya esasî û bûye rojêva me ya yekemîn. Lê ev deh sal in çima PKK’ê xwe înşa nekir? Di pêşengtiya xwe de PKK’ê çi ava kir? Tiştek tuneye. Gel jî, gerîla jî wek berê ye. Tevgerên jin û ciwanan jî wisa ne. Berî 2005’an jî, berî 2000’î jî wisa bû. Bi rastî jî em nikarin behsa nûbûn û guhertineke cidî bikin. Hem ji aliyê zihniyet, hem jî ji aliyê pergalê ve wisa ye. Ger guherîna pergalê çêbûbûya, dê di şêwaz û pergalê de jî guhertin çêbûbûya. Lê di şêwaz û pergalê de guhertineke cidî tuneye. Bi navên cuda rêxistin ava kirin û her nav guhertin, nayê wate ya guhertinê. Ji ber wê tenê şêweyî ye. Di vê pêvajoyê de me pir nav guhertin. Her roj dibêjin em navan biguherînin. Wek fêrbûnekê lê hatiye. Her ku zehmetiyek tê jiyankirin, hema çareseriyê di navguhertinê de dibînin. Ev ne nêzîkbûneke rast e.

Me dewreyeke perwerdeyê li dar xist. Hinek heval ji Zelê hatibûn, me got; divê hûn nav neguherînin, li Zelê navê we çibe divê wisa bimîne. Me got; divê hûn xwe biguherînin. Me got; bi nav guhertin û wek ku hûn di wir re derbasnebûne nîşan dayîn nabe. Niha kêm maye

ku feraseta me ya rêxistinî bigêhîje wir. Divê paradîgma biguhere, pergal biguhere, şêwaz biguhere, nûbûn çêbibe; lê cihê vê em navan diguherînin. Wek ku dema me nav guhert, em ê jî biguherin em digirin dest. Çend sal di ser re derbas dibin, dema ku guhertin çênebe; em dibêjin careke din em navê xwe biguherînin. Wisa nabe, ev kar wisa nayê meşandin. Divê guhertin di cewher de pêk were, di şêwê de nabe. Divê kesayet, pergal, zihniyet û şêwaz were guhertin. Divê paradîgmaya nû jî bi vî awayî bihata pejirandin. Lê çima nabe, çima nayê pejirandin? Ger Ocaxê berpirsyariyên xwe anîbana cih, deh sal ne demeke kêm bû. Niha pirsgirêkên rêxistinî û bîrdozîk bi vî awayî dernediketin pêşiya me. Dê pirsgirêkeke me ya partîbûnê tunebûya. Me nedigot; pirsgirêka rêxistinbûnê ya PKK'ê heye û hê jî a-b-c ya wê nayê zanîn. Me ji vê derê dest pê nedikir.

Ger Ocaxê peywirên xwe anîbana cih, rewşa şer wisa nedibû. Dê di şêwaz û tektîk de guhertin bihatana çêkirin. Hemû fermandeya HPG û YJA-Star'ê ku şer dimeşînin, Di Ocaxê re derbas bûn. Niha pratîk çi be, Ocax ew e. Divê heval vê bizanibin, rexneyên ku ji bo pratîkê tên kirin, hemû ji bo Ocaxê ne. Rexneyên ku ji rêveberî û Ocaxê re têne kirin in. Ji ber yên ku wê pratîkê dimeşînin, hemû di vir re derbas bûn. Lê li ku ye? Di vir re derbas bûn, paradîgmaya nû pejirandin, şêwaza nû fêm kirin, divê xwe sererast bikirana, dê xwe nû bikirana, dê ji nû ve avabûn çêbibûya. Çima çênebû? Wisa be, kêmasî hene, divê em cidî bin, divê gotina me kiryarên me yek bin.

Ger wisa be, em dikarin eleqeya ji Ocaxê re jî cuda binirxînin. Cihê ku wek cihekî guherîn û veguherînê bê dîtin, cihêkî têkoşînê bê dîtin; wek cihekî îtîbarê tê dîtin. Wisa gotin ne baş e, lê ger encam wisa be, em nikarin vê encamê bi awayekî din pênase bikin. Îtîbara bi vî awayî, dijberî paradîgmaya nû, dijberî paradîgmaya kevn, dijberî PKK'tiyê, dijberî her tiştî Ocaxê ye. Dijberî rih, zihniyet, nêzîkbûn û pîvanên wê ye. Wisa nabe. Ji bo ku cudabûn û hiyerarşiyê li holê rake, PKK hate avakirin. Ne ji bo pîvanên cuda, çînên cuda avakirinê ye. Diyar e ku niha di vê mijarê de lewazî hene, nayê nîqaşkirin. Wisa nabe.

Cewhera kongreya 11'emîn ev bû. Piştî wê Serokatiyê em ew qas rexne kirin. Me rapor da û me got: "Em perwerdeyê li dar dixin." Lê wî got: "Hûn perwerdeyê li dar dixin, lê rewşa we wisa ye, diyar e ku perwerdeyên we encam nagirin." Çima encam nagirin? Me got; ger perwerde encam nedin, xeterî ye. Bi taybetî ger perwerdeyên Ocaxê

encam nedin, xeteriyeke pir mezin e. Ji ber angaşt dike ku dê ji hemû perwerdeyan re jî pêşengtiyê bike. Bi qasî ku ji xwe berpirsyar e, ji hemû perwerdeyan jî berpirsyar e. Ger di vê serdemê de perwerdeyan encam negirtibe, saziyeke ku berpirsyarê vê ye jî Ocax e.

Wisa be, nêzîkbûneke ku em vê perwerdeyê lêpirsîn bikin pêwîst dike. Em nikarin wisa ji rêzê nêzîk bibin, em nikarin li gorî xwe û li gorî pîvanên dibistanên din nêzîk bibin. Em nikarin wek dewreyeke perwerdeyê nêzîkî vir bibin û bibêjin: "Ez çûm, min dewre dît û ez bûm kadroyê PKK. Min dema nû fêm kir û ez dimeşînim." Tu çûyî ku, cihê ku tu çûyî çawa dihat pênasekirin? Misyona wir çi bû û te kîjan peywir û berpirsyarî girtin? Te çiqasî fêm kir û pejirand? Tempo, şêwaz û islûbê ku tu pê van peywiran jiyanî bikî, te çiqasî di kesayeta xwe de dan rûniştandin? Li ser van esasan tu çiqasî pratîkê dimeşînî? Dê van pirsan ji mirov bipirsin. Ji bo ku em bersivên erênî bidin van pirsan, em tên perwerdeyê. Divê heval cihê ku hatine bizanibin, nas bikin. Pênaseya wê, peywir û armancên wê bizanin. Divê van bizanibin û tevlîbûneke rast bikin. Divê li gorî armancê xwe perwerde bikin û xwe bigihînin asta bes dike.

Ger wisa nebe, dê rewş girantir bibe. Cihê ku tevlî bibin û pêwîstiyên wê neynin cih, qet tevlî perwerdeyê nebûn baştir e. Qet nebe, mirov tiştên ku dizane pêk tîne. Lê tu were Ocaxê, perwerdeya paradîgmaya Modernîteya Demokratîk bibîne, li ser vî esasî soza pêşxistina pergala partiyê û netewa demokratîk bide, piştî wê jî biçe pratîkê û van pêk neyîne. Wisa nabe. Ger perwerde wisa bibe, ji aliye bîrdozîk û rêxistinî ve tu wateya wê namîne.

Ji bo ku em pêşengtiya bîrdozîk û rêxistinî serwer bikin, divê berî her tiştî em pergala xwe ya perwerdeyê sererast bikin. Di destpêka wê de jî sererastkirina perwerdeya Ocaxê pêwîst dike. Di vê mijarê de sererastkirin û pêşxistineke teqez pêwîst dike.

Gotina: "Ez ê ji rêzê nêzîk bibim, pêwîstiya min ya perwerdeyê heye û ez ê bibînim, ji ber ku min perwerdeya Ocaxê dît jî îtîbareke min çêbibe, ez çawa dizanim ez ê wisa berdewam bikim, ez ê ya berê wek xwe berdewam bikim û li gorî xwe tevlî perwerdeyê bibim, ev jî bes e, wê bi wate bibe û bê qebûlkirin" ne rast e. Em nikarin van bibêjin, em nikarin wisa nêzîk bibin. Em nikarin wisa werin vir û wisa tevlî bibin. Divê Ocax nekeve vê astê. Ger wisa bibe, dê ji peywir, misyon, berpirsyarî û rista xwe qut bibe. Revîzekirin ji vir dest pê dike. Dema ku wisa

bû, cihê ku kadro li gorî ya nû biguherîne, dê bi kadroyê zihniyeta kevn wate û pênaseya Ocaxê bê guhertin. Pergala perwerdeyê li gorî xwe ava dike û dema ku ji wir derket jî tiştê ku dizane pêk tîne. Cihê xwe guhertinê, pênase û rista Ocaxê guhertin, zivirandina ya kevn; bêguman dê guherîn û veguherînê, ji nû ve avabûnê vale derxe û pêşiyê bibe asteng. Divê wisa nebe. Divê em destûr nedin ku wisa bibe. Divê em tevlîbûna bi vî rengî rast nebinin, divê li gorî rist û pênaseya xwe ya ewil sererastkirinek derkeve holê.

Bi rastî jî ev dibistan çi bû û ji bo çi hat avakirin? Kîjan berpirsyarî û rist girtin ser milê xwe? Ev çiqasî pêk anîn, çiqasî pêk neanîn? Çima nayne cih? Şaşîtî û kêmasî di ku de ye? Dê ev şaşîtî çawa bên sererastkirin? Divê em pirsan wisa bipirsin û bersiva wê bibînin. Bala xwe bidinê, naşibe dibistanên din. Lewre xwediyê rist û misyonekê ye. Saziyên din jî xwediyê rist in; mesele Akademiya Mehsûm Korkmaz çawa derket holê? Ji ber di xeta Serokatiyê de gerîlatî bi pêş neket, derket holê. Di parzemîneke ku gerîla xitimî de, ji bo pêşengtiya rast ya partiyê û fermandariyê li ser xeta Egîd serwer bike hate avakirin. Ji ber wê wek Akademiya Mehsûm Korkmaz hate pênasekirin. Rist û mîsyoneke wê jî heye. Ev sî sal in pratîka gerîla çi be, berpirsyarê wê Akademiya Mehsûm Korkmaz e. Serkeftin û pêşketin jî li ser hîmê akademiyê hatin afirandin. Lê ji kêmasiyên gerîlatiyê jî berpirsyar e.

Dîsa di rêxistinkirina jina azad de, misyona Akademiya Zeynep Kınacı wisa ye. Di rêxistinbûna ciwanan de, rista Akademiya Elî Çîçek wisa ye. Li gorî wê berpirsyariyên wan hene. Di parzemîneke ku Akademiya Mehsûm Korkmaz nehat meşandin de, Dibistana Navendî ya Partiyê; ji bo ku piştî komployê jî perwerdeyên felsefik, bîrdozîk û rêxistinî berdewam bikin, hebûna xwe berdewam kir. Serokatiyê dabû destpêkirin, lê di vê pêvajoyê de jî rista wê hebû. Dibistaneke bingehîn ya kadro bû.

Bala we kişandibe, Ocax; ne şaxeke Akademiya Mehsûm Korkmaz e, ne şaxeke Akademiya Zeynep Kınacı ye, ne şaxeke Dibistana Navendî ya Mezlûm Doxan e. Jixwe van dibistanan hemûyan şaxên wan hene. Ger ji wan yek bûya, dê wek şaxa duyemîn, an jî sêyemîn bihata vekirin. Navekî din pêwîst nedikir. Tenê dê şaxek lê bihata zêdekirin. Lê wisa nebû. Bi navekî cuda, dibistaneke cuda hate vekirin. Çima? Diyar e ku pêwîstî hebûye û ji ber pêkhatina van pêwîstiyan hatiye avakirin. Lê van pêk tîne, an na? Peywir û rista xwe çiqasî anî cih, çiqasî neanî

cih? Ya rast ger pergalek bihata rûniştandin, divê kadroyê heyî berpirsyar bihata girtin. Xebateke bi îstîkrar meşand, lê ji aliye çawaniyê ve nikarî ji guherîn û veguherîna ku divê tevgera azadiyê jiyan bikira re pêşengtiyê bike.

Wek me got; du sazî berpirsyarê vê ne; perwerde û rêveberî. Rêveberiya partiyê ji ber pêknehatina van berpirsyar e. Lê herî kêm bi qasî revêberiyê, Ocax berpirsyar e. Ji ber wê Ocaxê ev peywir û berpirsyarî dabû ser milên xwe. Wisa be divê perwerdeya Ocaxê li gorî vê be, pênaseya wê wisa ye. Divê waneyên wê li gorî vê bin, xebatên wê li gorî vê bin, rexne û rexnedayîna wê li gorî vê be.

Li ser vî hîmî, li gorî rist û misyona xwe divê kadroyan ava bike; li gorî vê jî divê bibe xwediyê bername, şêwaz û pratîkekê. Kêmasî hene, di rexneyan de lewazî heye. Bi rastî jî di asteke cidî de kêmasî hene. Ya rast, ji dibistan û saziyên din yên perwerdeyê re pir nikare pêşengtiyê jî bike. Di kongreya 11'emîn de me careke din biryar girt ku bi nîqaşên xwe pêşengtiyê bike û sererast bike, lê ev pir pêk nehat. Em nikarin bibêjin, pir zêde pergala perwerdeyên din jî derbas kir. Hinekî din zêdetir nîqaş dibin, lê em nikarin bibêjin encamên van ji saziyên din yên perwerdeyê re û ji dewreyên dîtir re dihêle. Ji ber ku kadroyên zêdetir di nav rêxistinê de mane û pratîk kirine li vir in, nîqaş jî hinekî din zêdetir in û hew. Ji wê wêdetir tiştek tune. Lê armanca kombûna ew qas kadroyên ku xwediyê danehevên pratîkî ne; pêkanîna guherîna paradîgmayê bû, bi paradîgmaya nû û danehevên partiyê gihandina hev û ji nû ve înşakirin li ser vî esasî bi pêş xistin bû. Divê Ocaxê ev bikira, lê nikarî û kêmasî hene.

Pergala perwerdeyê, li gorî mîsyona ku hatiye pênasekirin naguherîne. Wisa be ne li gorî pênaseya wê ye. Pergala perwerdeyê ya heyî, ne li gorî misyon û rista wê ye. Divê ev rewş bê guhertin. Ger ev nebe, bi rastî jî tiştek bi Ocaxê ve namîne û rewşa xwe dixe nîqaşê. Dema ku me ev dewre araste kir jî, me pir nîqaş kir; gelo em dewreyekê li dar bixin, an na? Her ku rêveberiya partiyê kom dibe, nîqaş li ser Ocaxê tên kirin. Biryarên cuda jî hatin girtin, me got; bila ne dibistanek be, bila cihekî nîqaş û lêkolînan be, bila cihekî ku pirsgirêkên partiyê lê tê nîqaşkirin be. Me got; bila cihekî ku her rêveberiya partiyê xurt dike û cihekî ku kadroyên berdest (yedek) bên amadekirin be. Ji vî aliyî ve me di dema derbasbûyî de pir biryar girtin. Lê me nikarî em bixin meriyetê. Di encamê de, wek dibistanên din bû cihekî ku ji salê

du dewreyan pêk tîne. Ji aliyê bername û asta nîqaşan ve jî nikarî vê derbas bike. Nikarî pêşengtiyê bike. Ji ber vê perwerdeyên din jî, nekarîn xwe bigihînin asteke dahûrandinê. Ji Ocaxê pir zêde sûd wernegirtin. Mesele kîjan perwerdeyê, çiqasî xwedî dike. Tiştekî wisa tune. Lê divê bibûya, sedema avabûna wê ev bû. Çima nebû? Diyar e ku ne li gorî pênase û hincetên avabûnê ye. Di vê mijarê de kêmasî hene.

Wisa be divê bê guhertin. Ji ber ku wisa ye, heta hetayê nikare wisa berdewam bike. Ger tenê ev dewre jî bikaribe xwe biguherîne û li gorî misyona Ocaxê û pênaseya wê kar bike, bikaribe xwe bigihîne wê astê, dê her tişt bizivire aliyê din. Derketinek xurt û destpêkeke nû dikare bê kirin. Divê em vê bizanibin.

Bi civîna Komîteya Navendî, ev rewş derket holê; divê li gorî pênaseya xwe be, an na bi qasî ku em dixwazin em bixin rojeva civînên rêveberiyê, bi qasî ku em dikarin em biryaran bigirin, rexneyan bikin û pirtûkan binivîsîn, dê tu encam dernakevin. Guherîn û veguherîna mayînde pêwîstiyeke bi şewat e. Dibe ku ji ber lewaztiya rêveberiyê rêxistin baş neşopîne, dibe ku nikaribe baş rêxistin bike û bi rê ve bibe, dibe ku di pratîkê de heval parzemîneke ku baş bixebitin nebinin. Lê ji ber ku wisa ye nêzîkatiyeke bi vî rengî derkeve holê, tê wateya ji Ocaxê tiştek negirtine û neguherîne. Divê xwe bigihînin asteke ku lewazî û kêmasiyên rêveberiyê biguherînin. Jixwe hemû kadroyên ku tevlî dibin, hevalên ku di asta jor de peywir girtine û kar meşandine ne. Yên ku bi awayekî serkeftî derbas dibin, dîsa di heman astê de peywir digirin. Peywir digirin, lê peywira xwe tam nikarin rast bînin cih. Rêxistin derfetan dide û hewl dide perwerde bike, berpirsyarî û şens dide; lê pêwîstiyên wê nayên cih. Di vir de lewaziyek heye, lewaziya pîvanan heye.

Her ku diçe pênaseya Ocaxê tê berovajîkirin. Ger em vê sererast nekin, dê em ê berovajîkirineke mezintir jiyan bikin. Ger em li vir berovajîkirin û jirêderketinan jiyan bikin, em li cihekî din jî nikarin sererast bikin. Ger em şaşîtiyên xwe li qadên perwerdeyê, bi taybetî jî li Ocaxê nikaribin sererast bikin û em nikaribin li gorî pênaseya wê encam bigirin, dê em ê li ku ya rast pêk bînin. Gelo em ê di nav êniyên şer de pêk bînin, an em ê di qadên serhildanê de pêk bînin? Dîsa li wan deran mirov dikare şensekî bidê, ji bo wê şert û merc cuda ne. Di wan şertan de, mirov dikare hinekî din li gorî mercan tevbigere. Ger em ê toleransekê nîşan bidin, li van deran dibe.

Lê ger em ê bêyî toleransê guhertinê bixwazin, berî her cihî divê ev li Ocaxê pêk were. Divê parzemîna perwerdeyê ya li vir, li gorî wê were bipêşxistin. Divê li ser vî esasî tevlîbûna xwe çêkin, wisa nêzîkî her hevalî bibin. Divê li vir kêmasî û şaşîtî nayên qebûlkirin. Divê li vir, nêrînên cuda û lewaztî nebin. Divê nêzîkatiyên wek, me fêm nekir, me nedizanî û me nekarî şêwazeke rast bi pêş bixin li vê derê çênebin. Divê nîqaşên wisa şênber bi pêş bikevin ku kevir jî bihele û wisa li gorî ya tê xwestin ji vê derê derbikeve. Kadroyê ku ji pratîka herî şaş hatibe, zehmetî kişandibe û pirsgirêkên herî mezin jiyan kirine jî were vir; divê ji vê derê bi awayekî ku li gorî pîvanên partiyê xwe ji nû ve ava kiriye derkeve. Ji her aliyî ve; bi rih, hest, fikir û nêzîkatiyên xwe yên dewlemend divê xwe bigihîne vê astê. Divê tempo û şêwazê milîtanê/a serkeftî bigire. Divê bibe milîtanekî/e ku her cihê biçê bibe navenda çareseriyê. Pênaseya Ocaxê ev e û li vir perwerde dîtin, bi vî awayî berpirsyarî û peywir girtinê dibe.

Dibe ku rêveberî nikaribe bişopîne, rêxistin sist nêzîk bibe û ji yên ku xwe negihînin vê astê hesab nepirse. Ev jî gengaz e. Berî her tiştî ji ber ku rêxistin hesab napirse, li gorî keyfa xwe nêzîkbûn bêwijdanî ye. Ger wisa bibe, tê wê wateyê ku perwerdeya Ocaxê şoreşa wijdanê pêk neaniye. Ger bizanebûn û bi awayekî vekirî şaşîtiyan dike, kêmasiyan dike; ya ku pêk nayê dîbîne û pêk nayne, ji bo vê hewldan nîşan nade, ev bêwijdanî ye. Bi kurtasî bêberpirsyartî ye. Divê nêzîkatiyên wisa bên şikandin û bên derbaskirin.

Bi kurtasî rist û misyona Ocaxê girîng e. Ji aliyê perwerdeyên demê ve girîng e. Ji aliye guherîna paradîgma û ji nû ve avabûna partiyê ve girîng e. Xebateke bêrewestan jî çêbû; lê diyar e ku kêmasî hene, şaşîtî hene û di pîvanên wê de lewazî hene. Ne li gorî pênaseya xwe ye û di meşandinê de kêmasî hene. Lêhûrbûn û kûrbûneke tam çênabe; pirsgirêkan bi awayekî şênber danaynin holê. Ferasetên ku qalik girtine hene; bi rexne û rexnedayîneke têr nikare van derbas bike. Ne ku qet nabe, lê kêm û sînordar dibe. Ev jî di pratîkê de guherîn û veguherînekê nake û rewşa heyî nikare rizgar bike. Guhertineke wisa lewaz, li gorî ya tê xwestin ne bes e. Wisa be ev pîvan şaş in.

Hê jî em di nav partiyê de pirsgirêkên rêxistinbûnê nîqaş dikin. Di 2005’an de kongreya înşayê pêk hatibû. Înşa çi ye? Avabûn e. PKK bi navê xwe çiqasî xwe ava kir? Her wiha di kongreya yazdemîn de jî me heman biryar girt. Divê Ocaxê kadroyê ku ava bike û înşayê pêk bîne,

derbixista holê. Ji ber ku di Ocaxa PKK'ê de perwerdeyê dibîne û her cihê ku diçê divê ew der rêxistin bikira. Divê di pêşengtiya PKK'ê de xebatên din hemû bimeşandana. Gelo wisa kir? Nikarî bike. Gelo Ocaxê ev zanebûn dayê? Nedayê. Gelekên wan nizanîn ku çi bikin. Bi awayekî sînordar berpirsyariya partiyê bû û li gorî pîvanên PKK'ê kêmek nêzîkbûn derket holê. Kombûneke kêm jî çêbû, bi awayekî çort li hemberî nêzîkatiya belavkirinê ya tesfiyegeran, li partiyê xwedî derket. Lê di pêkanîna guherîna paradîgmayê de, tesfiyekirina bandora tesfiyegeran, bûna pêşengê ji nû ve înşayê û kadro li gorî ji nû ve înşakirin û di perwerdekirinê de paşde ma. Lê niha ji ber ku ev pêknehatine, em nikarin heman rewşê berdewam bikin.

Ger em heman rewşê berdewam bikin, wê demê guhertinek nabe û em nikarin biryarên kongreya yazdemîn jiyanî bikin. Em nikarin bi awayekî têr û tijî bersiva rexneyên Serokatiyê bidin. Ger wisa be, divê em çi bikin? Em vê pirsê ji hevalan dipirsin, em çi bikin? Dê heval vî karî çawa bi rê ve bibin, di vê mijarê de çi difikirin? Divê ev dewreya perwerdeyê çawa bimeşe? Di vê xalê de wek min got, divê em nebêjin: "Bila her tişt bi awayekî amade were û bikeve mejiyê min. Bêyî ku em hewldan nîşan bidin û zehmetiyan bikişînin, em xwe heman wek milîtanên Apoyî bibînin." Ne parzemîneke wisa heye, ne jî perwerdeyeke wisa heye. Bila tu kes nekeve bendewariyeke wisa. Ger wisa be jî, ne rast e. Jixwe kesekî ku bikaribe vê bike tuneye. Teqez Serokatiyê perwerdeya xwe, li ser esasê tiştekî wisa ava nekir.

Wisa be tenê tiştek dimîne; divê ev dewreya perwerdeyê xwe bigihîne asteke wisa. Divê bibe xwedî berpirsyarî, bi bername û bi plan xebatên xwe li ser vî esasî bimeşîne. Divê ji destpêkê ve karê xwe baş bigire dest, bêyî ku hincetekê derxe pêş, bêyî ku ji lewaziyeke biçûk re çavên xwe bigire, guherîn û veguherînê di kesayet û giştî perwerdeyê de serwer bike. Divê bibe xwediyê pratîkeke wisa. Divê heval li gorî wê xwe berpirsyar bibînin û wisa tevlî bibin. Divê di bendewariyê de neminin. Ger Ocax hebe, jixwe divê pirsgirêk heya niha bihatana çareserkirin. Ocax hebû, lê heya niha pirsgirêk nehatin çareserkirin; dijberî vê pirsgirêk zêde bûn û hate asta xitimînê. Wisa be, ev Ocaxeke çawa ye û ev perwerdeyeke çawa ye? Çi çareser dike û kîjan çareserî afirandiye? Çiqasî ji nû ve ava kiriye? Ne diyar e. Di vir de kêmasî û dijberbûnek heye. Divê bi awayekî zelal em vê bibînin.

Li ser esasê biryarên kongreya yazdemîn û rexneyên Serokatiyê; divê em Ocaxê bizivirînin cihekî ku kadroyên guherîn û veguherînê pêk bînin û li ser esasê paradîgmaya nû ji înşaya PKK'ê re pêşengtiyê bikin bigihîjîne. Ger xwe negihîne van pîvanan, bi ser neketiye. Ger wisa bibe, em dikarin behsa serkeftinekê bikin. An na em çiqasî bibêjin: "Em tevlîbûn û baş bû; me ji Ocaxê sûd wergirt; pirsgirêkên min hebûn û min zehmetî dikişand, Ocaxê ez sererast kirim" jî bê wate ye. Jixwe ev ne pîvan in. Lê hinek heval wisa nêz dibin. Jixwe bi awayekî vekirî dibêjin: "Ji min re pir baş hatiye." Tu dipirsî û dibêjî: "Te çi kiriye ku baş bûye?" Dibêje: "Pirsgirêkên min hebûn, min sererastkirin û derbas bûn." Gelo pirsgirêka me ev e, Ocax tenê ji bo vê heye? Tu ji bo vê tevlî Ocaxê bûyî? Wisa nabe, em nikarin wisa nêzîk bibin. Ger em wisa tevlî dewreya perwerdeyê bibin û perwerde jî wisa xilas bibe; wê demê ev dewre ne serkeftî ye.

Lê me civîneke navendî ku pratîkên me yên salene û encamên pratîkên me yên rêxistinî û bîrdozîk dinirxîne li dar xist, encamên ku ji vê civînê derketine pir cidî ne. Di vê pêvajoyê de, ji derveyî perspektîfên hevdîtinan, Serokatiyê sê name şandin. Hem rexne kir û kêmasî danîn holê, hem jî dê em ê çi bikin nîşanî me da. Ger li ser van lêhûrbûn kirin, ev kêmasî dîtin û derbas kirin nebe; dê em ê dema xwe vale berdin. Bi awayekî din nêzîkbûn, tê wateya valederxistina perwerdeyê. Perwerdekirina xwedî qarekterekî oportînîst e. Ger perwerde bibe xwedî qarekterekî oportînîst, ji vir serkeftin dernakevin; dijberî wê dê encamên xirabtir derbikevin. Bi kurtasî divê dewreya me ya perwerdeyê wisa nebe. Dijberî wê divê bibe cihekî ku li gorî her cihî kadroyê pergala civaka demokratîk ava dike. Divê bibe dewreyeke ku pêşengtiya partiyê li her derî rast ava dike û parastina cewherî bi awayekî teqez bi pêş dixe. Divê kadroyên bi vî awayî biafirîne.

Tiştê ku li pêşiya dewreya Ocaxê ye û divê pêk were ev e. Encamên ku ji vir derdikevin, heya niha me tam nikarî rêxistin bikin, lê êdî em ê zêdetir hewl bidin ku rêxistin bikin. Çi hatibe axaftin û nîqaşkirin; em ê biweşînin û îlan bikin. Ger kêm hatibe nîqaşkirin, dê ev jî bi awayekî vekirî be û dê her kes bibîne. Ya rast ger berê ew bihata kirin, dê zêdetir nêzîkatiyek cidî bi pêş biketa. Rexneyên giştî dê derbiketana, şopandin û zextek derbiketa. Ev jî tune. Çi tê gotin, pir zêde girîng nayê dîtin. Wisa tê gotin û tê derbaskirin. Gelo ya wisa girîng; vale berdana demê ye, li vir bi hinek xwe bi pêşxistin û bi hinek îtîbar

qezenckirinê derdikevin û diçin pratîkê. Ev rewş wisa berdewam nake. Divê heval vê jî bizanibin. Kê çi gotibe, pêwîst bike em ê bi navê wî biweşînin. An na divê her kes rast biaxife û rast nîqaş bike.

Di nav rêxistinê de vekirîbûn, pir girîng e. Ger di nav partiyê de vekirîbûn û aleniyet tunebe, partî nabe. Em partiyeke veşartî ne, me wek rêxistineke terorê dibînin û dijminên me hene. Em li hemberî vê têkoşînê dimeşînin. Ji ber vê li hemberî dijmin em veşartî ne. Ev rewş, kêmek jî dihêle ku di nav partiyê de û li hemberî gel jî veşartî bin. Divê em xwe nespêrin vir. Pêwîst bike, em ê deşîfrebûnê jî bidin ber çavên xwe û her tiştî îlan bikin. Di nav partiyê de li pêşiya vê astengiyek jî tune. Ji ber ku heya niha me nikarî em rêxistin bikin, me nekir. Êdî em ê rêxistin bikin û vê bikin.

## PIRSGIRÊKÊN BÎRDOZÎK KU DI SEKNA KADRO DE TÊN JIYANKIRIN

Li ser esasê xeta bîrdozîk, di sekna kadroyên me de pirsgirêk hene. Ji gelek aliyan ve ev pirsgirêk xwe didin der û li nav hev ketine. Di kadroyên ku rêveber in de; lewaziya pêşdîtinê, di dem û cihê wê de rast neaxifîn û nêzîkbûnên rast nîşan nedan, neherikbarî, xwe nekirina navenda çareseriya pirsgirêk û hezê heye. Mirov van, dikare wek pirsgirêkên sekna bîrdozîk pênase bike.

Bê guman bingeheke van pirsgirêkan ku xwe dispêre pergalê heye, ango li ser van nêzîkbûnan şopa civaka kevneşop heye. Kêm be jî bandorên modernîteya kapîtalîst li ser hene. Ya rast di kadroyên me yên rêvebir de, bi piranî bandorên civaka kevneşop û heveseke modernîteya kapîtalîst heye. Di rewşekê wisa de tevlî bûye û bandorên modernîteya kapîtalîst jî wisa wek xwestekekê di hundir de mane. Lê bandorên civaka kevneşop pir zêde ne. Hemû taybetmendiyên ku pergala dewletperest û deshilat li ser civakê dane avakirin in; parçebûn, ezezîtî, deshilatdariya mêr û kolebûna jinê, li ser kadro hene. Her çiqasî di perwerdeyan de me xwest em van taybetmendiyan derbas bikin jî, ji ber ku asta rêveberiya me nunertiya Serokatiyê dike, divê li gorî wê jî kûrbûnek hebe. Ev mijar hesasiyetekê dixwaze.

Dema ku em gihîştin wê astê jî, em dibêjin: "Min hinek ya berê derbas kir, ez wek berê ne feodal im û wek berê ne gundî me." Lê wisa gotin jî mirov rizgar nake. Divê mirov xwe bigihîne kûrbûna bîrdozîk ku Rêber Apo ava kiriye. Ji aliyê rêgezan ve, ji aliyê hesasiyetan ve, ji aliyê pîvanan ve, ji aliyê xwe birêxistinkirinê ve, ji aliyê xwe berpirsyar dîtinê ve; ango ji aliyê rêxistinkirina kesayet ve kêm mayînek heye, lewaziyek heye. Di bûna kesayeteke rêxistinkirî de; li ser esasê xeta Serokatiyê bi kûrbûn û bi hesasiyet tevgerîn û wek kesayeteke rêxistinkirî xwe di kirina xwediyê gotin û nêzîkbûnê de pirsgirêk derdikevin. Li gorî xwe bûn, ezezîtî, hêrs, bertek, tengaviyên takekesî, tengasiyên ruhî, bandorên çîna navîn; ev kêmasiyên sereke ku xwe didine der in.

Lê di sekna giştî kadroyan de, nexweşî, çûn-hatin zêdetir in. Jixwe em her nexweş in; lê di nav me de kesên ku nexweşiyê jî wek marîfetekê dibînin hene. Nexweşiyê ji xwe re wek stargehekê dibînin; ger tu nexweş bibî tu rizgar dibî, jixwe rêxisin jî di vê mijarê de tiştekî nabêje û dê li nexweşan binêre. Wisa xwe dixapînin. Hinek kes cihê ku PKK wek çepereke ku li hemberî paşverûtiya cîhanê şer dike bibînin; wek

saziyeke ku alîkariya kesên zehmetiyan dikişîne û jiyana wan araste dike dibînin. Wisa difikirin ku çiqasî nexweş bibin, dê ew qas cih bigirin. Lê ne wisa ye, Serokatiyê ji nexweşiyên bi vî rengî re got: "Siyasî ye." Bila qet gumana me tunebe ku aliyê wê yê bîrdozîk-polîtîk pir li pêş e. Lê ev tişt girîng e; PKK, heya ku bû PKK bi gelek pirsgirêkên bîrdozîk re mijûl bû. PKK, ne hêzeke ku ji banî hatiye û ji berê ve xwediyê van rêgez û pîvanan e. Ji sifirê dest pê kir; bi ked û hewldaneke mezin, di nav xwîn û xwêdanê de rêgez û pîvan girtin, ev pîvan bi pêş xistin û heya roja me anîn.

Ji ber vê di destpêkê de amatorî pir zêde bû. Ji pîvanên xwe zêdetir, PKK pîvan ji derve girtibûn; di bin bandora gelek derdoran de ji xwe re riyek didît û wisa şêwe girt. Bandorên sosyalîzma pêkhatî, bandorên rizgariya netewî û tevgerên demokrat hebûn. Hewldanên ji van nêzîkbûnan sûd wergirtine hebûn, jixwe wisa nebûya nedakarî ew qas bi pêş bikeve. Ango di destpêkê de zelalbûn, kûrbûn, şênberbûna bîrdozîk tunebû; ev tê fêmkirin jî. Rêber Apo got: "Em bi du hevokan derketin rê û em wisa meşiyan." Hêza partiyê ku pirtûkan binivîse tunebû, ji ber ku danehev û kombûneke wê tunebû û wek tevgereke ciwanan derket holê. Her wiha li derveyî Kurdistanê; li metrepolan, di bin serweriya dijmin de ev fikir derxistin holê. Ji ber vê demeke dirêj, ji van tevgerên din bandorbûn hebû; li gorî xwe pîvan û rêgez avakirin tunebû, bes nedikir.

Di dawiya salên 80'î û dema ku em ber bi 90'î ve çûn; dema ku bû tevgireke ku şoreşa vejîna netewî pêk anî, an jî dema ku li hemberî belavbûna sosyalîzma pêkhatî li ser piyan ma; wê demê PKK bû xwedî rêgez û pîvanên xwe. Sekna Serokatiyê, rêgez û pîvanên rêxistinî zelal bûn. Ji ber vê dema ku berê li gorî xwe bûn, ezezîtî, nefêmkirin çêdibû dihat fêmkirin. Dîsa ne rast bû, lê sedemên wê dihatin zanîn. Di sekna bîrdozîk de gelek şaşîtî û kêmasî derketin; nêzîkbûn û feresatên cuda derketin holê. Ew hatin rexne kirin, rexnedayîna wê çêbû û hatin mehkûmkirin. Lê em niha di sala çil û duyemîn ya ku meşa Serokatiyê destpêkirye de ne, em salvegera sî û şeşemîn ya avabûna partiyê jiyan dikin. Dê em ê bikevin salvegera sî û heftemîn ya partiyê. Di nav demeke ew qas dirêj de; em di gelek şeran re derbas bûn, me gelek badîre derbas kirin û em niha di nav tevgereke wisa de ne. Ji ber vê ew pirsgirêkên ku tên jiyankirin, ev tevlîhevî nayê fêmkirin.

Dibe ku mirov nikaribe ji pirsgirêkên ku di destpêkê de dihatin jiyankirin re tiştekî bibêje. Ji ber ku nedihat zanîn, mirov di carekê de jî her tiştî fêr nabe û tevgerek jî wisa di carekê de şêwe nagire. Tevgerek di gelek serdeman re derbas dibe; di serî de di zikê dayika xwe de ye, piştre dibe zarok; piştre dema xwe ya ciwantiyê jiyan dike û dibe kesekî têgihiştî (olgun). PKK di navbera salên 85-90'î de gihîşt asta hebûnê û têgihîşt. Li hemberî têkçûyîna sosyalîzma pêkhatî li ser piyan mayîn jî wisa bû. Bû partiyeke xwedî rêgez û pîvan. Bû tevgereke xwediyê pîvanên kadrotî û rêxistinî; li gorî xwe, bû tevgereke xwedî pîvan û rêgezên bîrdozîk-rêxistinî. Heya wê demê hinekên din hebûn, her di bin bandora wan de bû û bi ji wan sûdwergirtinê meşiya. Lê niha ev rêgez hemû rast in, gelek tişt pêk hatine û bi deh hezaran şehîdên wê hene. Ev rastiyeke ku çil sal in tê jiyankirin e, bûye realite; her tişt pir vekirî ye, ne gengaz e ku mirov fêm bike û fêr bibe.

Sekna bîrdozîk ya PKK'ê, rêgez û pîvanên wê ne tevlîhev in, ne şîlo ne, ne ji hev û din cuda ne. Pêkhatina wan li gorî kes û cihan naguhere. Li Bakur cuda, li Başûr cuda nîn e; ji bo jinê cuda, ji bo zilam ne cuda ye; ji bo ciwan û kalan ne cuda ye, ji bo her kesî yek e û giştî ye. Tevgereke wekheviyê ye, rêgez û pîvan di xwesertiya wan de wek hev in. Ferq û cuda bûn teqez tune û di vê mijarê de şênberbûnek heye. Lê ruxmê vê jî rewşên pir cuda derdikevin holê, ferasetên pir cuda û li gorî xwe derdikevin holê. Bila tu kes li qisûrê mêze neke, lê ji her seriyekî dengek derdikeve, rastiya her kesî li gorî wî/ê ye. Ruxmê ku partiyeke di rêgez û pîvanên xwe de, xwe îspat kiriye heye; dîsa jî di nav vê partiyê de nêzîkbûn û pîvanên li gorî xwe derdikevin.

Min raporeke ku ji Ewrûpayê hatibû xwend. Hevalên Gazî konferansa xwe çêkirine û wisa dibêjin: "Gaziyên ku kadrotiyê dikin û gaziyên jiyana xwe ya şexsî didomînin nizanim çi bûne…" Ka em li vê pênaseyê mêze bikin. Hem jiyana xwe ya şexsî berdewam dike, hem jî gazî ye. Bi carekê gazîtî girtiye û bernade. Kesekî reviyaye, xayintî kiriye ji bo ku vegere rapor nivîsandiye, dibêjin "Nizanim kîjan gazî rapor nivîsandiye, dixwaze vegere." Hê jî dibêjin gazî. Ev têgehek çawa ye, ev gotineke çawa ye? Ev ne kadroyeke jî. Li gel wê jî dinivîse û dibêje: "Serokatiyê gotiye, 'gaziyên me şehîdên ku jiyan dikin e." Xwe di asta şehîdan de dibîne; îtîbar û rûmetê dixwaze. Pir balkêş e, ew qas jî şemitîna pîvanan nabe. Vê wek ferasetekê jî dispêre te; tu çi dikî bike, vê dispêre te û dixwaze li ser we jî bimeşîne. Ya rast, dixwazin bibêjin:

“Pîvanên partiyê em diyar dikin.” Dibêjin: “Divê hûn li me binêrin, hûn bi me re mijûl bibin, ji ber ku em gazî ne.” Hê jî xwe wek gaziyên PKK’ê dibînin. Yek jî qaşo nûnerê şehîdan e. Ma şehîd wisa ne? Qey kes vê napirse? Dê mirov bipirsin, bila her kes biaqil be. Ew qas jî nabe; her tişt li gorî xwe guftûgokirin, berovajîkirin derketiye asteke wisa ku mejiyê mirov ranake.

Wisa rewşeke ku nayê fêmkirin û nayê zanîn jî nîn e. Hinek kes, kêmek ketine têkoşînê û kêrê têliya wî jê kiriye, hema dibêje: “Ez bûm gazî, êdî mafê xwe dixwazim.” Ji bo ku wisa bibin, hinek li xwe jî dixin; ma em van nizanin? Lê wisa nabe. Berovajîkirina bîrdozîk heye; bîrdoziya partiya ku zelal bûye, ji nû ve li gorî xwe guftûgokirin, berovajîkirin, revîzekirin heye. Di nav me de ev pir tê jiyankirin. Berê di lîteratûra sosyalist de, ji van nêzîkbûnan re digotin: “Revîzyonîzm.” Lê em vê têgehê pir kar naynin; li gorî xwe pîvan û rêgez revîze kirin û li gorî xwe sererast kirin heye. Tu dibêjî çi bibêje, ne gengaz e; partî çi dinivîse bila binivîse, çi biryarê digire bila bigire ne girîng e. Ji ber ku bi xwe partî ye, hem gazî ye, hem jî şehîdê ku jiyan dike ye. Hemû pîvanan diyar dike. Ev ne derew e jî, ev berovajîbûn û ji rêderketin e. Ew qas berovajîbûna bîrdozîk dibe? Lê niha cihekî vê ku nayê fêmkirin heye? Em gazîtiyê jî deynin aliyekî, kadro ye. Pîvanên kadrotiyê ji bo her kesî yek in, wekheviyek heye. Ger tu kadro bî, yên din jî kadro ne. Divê tu wekî wan bî, ji xeynî vê, dê çawa çêbe?

Her sekneke kadro tê wateya partiyekê. Divê em bi girîngî li ser berovajîkirinên bîrdozîk yên kadro û pirsgirêkên bîrdozîk yên feresatê bisekinin. Di vê mijarê de em ji kîjan aliyî ve bigirin dest û çawa rexne bikin? Mirov nizane. Rewşa heyî pir giran e, em çawa hatin vê astê? Bingeha xwe, ji pratîze nekirinê, rast biryar negirtinê û bi awayekî bandor têkoşîn nekirinê digire. Pîvan berovajî bûne, şemitîn çêbûye. Ji hêştirê (deve) re gotine: “Çima stûyê te xwar e?” wê jî gotiye: “Ma kudera min rast e.” Niha em ê bibêjin pirsgirêkên ferasetê yên kadro hene; ma çi tune, an jî çi rast e… Dê em ê ji çi re bibêjin şaş e? Pir balkêş e, em bi ya berê re qiyas dikin. Em dibêjin, em li paş ya berê jî mane. Me guherîna paradîgmayê çêkir, em zêdetir azadîxwaz, wekhevîperest û civakperest in.

Wek partî me xwe ji pergala dewletê û deshilatdariyê rizgar kir. Em gihîştin asteke ku zêdetir gelperest e. Pîvanên kadro Serokatiyê diyar kirin û got: “Xwediyê felsefeya luqmeyek û xirqeyekî ye; yekîtiya

fikir, zikir û çalakiyê ye; heqîqeta ku bûye rêxistin û çalakî ye." Niha em li ser van pîvanan lêhûrbûn çêdikin? Gelo kadroyên partiyê bûne xwediyê van pîvanan? Li ser vî esasî xwe ji şaşîtiyan şûştinek heye? Ger em li gorî van pîvanan bin, dê civak li dora me bizivire. Hema dev ji vê berde, em di nav lêgerîna pîvanên ku bi bîrdoziya paradîgmaya kevn derketine holê ketine. Em dibêjin: "Berê wisa bû, bi vî rengî bû." Em li paş wan pîvanan mane, em nikarin xwe bigihînin ya kevn jî. Bi guherîna paradîgmayê re, pîvanên kadrotiyê jî bilind bûn, lê me xwe gihandiye wan pîvanan? Dev ji ya xwe gihandina ya nû berde, em li paş ya kevn mane. Li gorî paradîgmaya nû divê pîvan pir xurtir bûna. Ji vî aliyî ve PKK ya îro, li paş ya kevn maye.

PKK şûrê adaletê bû. Mirovan ji tiştekî xwe bawer nedikirin, lê bi PKK'ê bawer dikirin. Mal û canê xwe radestî PKK'ê dikirin. Tiştên ku ji xwe vedişartin jî radestî PKK'ê dikirin. Bi qasî ku ji xwe bawer dikin, çil qatî zêdetir ji PKK'ê bawer dikirin. Digotin: "Di PKK'ê de berovajîbûn nabe, haqaret nabe, bêmafî nabe, xirabûn nabe, zirar nade." Li gorî PKK'ê, sezayê herî mezin, şemitîna di pîvanên jiyana bîrdozîk de bû. Li hemberî vê sezayê herî mezin dihat dayîn. Niha jî em dibêjin: "Çi bûye, em îdare bikin, em şensekî din bidinê." Em wisa dibêjin û derbas dibin. Lê di pratîkê de ev nêzîkbûn, rê li pêşiya her cure jirêderketinan vedike.

DEV-YOL çawa tune bû? Şaradariyên SHP'ê ew tune kirin. Angaşta hevalê Karasu ev e. Çawa çêbû? Bûn namzetên şaredariyan; bûn namzetên serokatiya şaredariyê, bûn namzetên meclîsên şaredariyê. Piştî wê jî ev gotin: "Li cihê ku birjûwa bixwin, bila em bixwin; ji berazan rizgarkirina muhekî jî, kar e." Pîvanên xwe wisa danîn.  Ketin nav xwarina tiştên şaredariyê û li holê ne kadro man, ne jî pîvan man. Wisa heliyan. Cewher û pîvanên şoreşgerî xilas bûn. Ji reformîstiyê jî wêdetir, ji birjûwazitiya biçûk jî derbas kirin û niha ber bi birjûwazîtiya mezin ve dimeşin. Dîsa jî heman peyvan dubare dikin. Me hinek rexne kir; li hemberî vê dibêjin: "Mahîr Çayan şoreşger bû." Em jî dizanin ku Mahîr Çayan şoreşger bû, ma ÖDP şoreşger e? Ji mîrateya Mahir Çayan dest pê kirin, lê hatine ku? Di me de jî pîvanên dişibin wê hene.

Em li ser van dibistanên ku Bakur hatine avakirin jî nîqaş dikin. Li Bakur malên piştgiriya perwerdeyê hene. AKP'ê girtine, lê hevalên me ketine şoqê. Nîqaş dikin ka çi bikin. Me jî got: "Pir baş bûye, em ji bo wê li çepikan didin." Ji wan re pir balkeş hat. Dibêjin: "Ger me neki-

ribûya, dê rêxistina Fetûlah bikira.” Wisa be, em ê bi rêbazên fethûlahiyan li hemberî wan têkoşîn bikin. “Bila ew nekin, em bikin. Ger ew bikin Fetûlahî ne, ger em bikin baş e.” Lê karê ku em dikin yek e. Gelo wisa dibe? Wisa pîvan dibin? Fethûlah ji bo çi dike, ji bo Kurdan tune bike dike.

Ew qas şemitîna pîvanan heye. Rewş gihîştiye asta bi rêbazên Fethûlahiyan, li hemberî Fethûlahiyan têkoşîn kirine. Li cihê wî, em ê ji wî zêdetir dibistanan vekin, em ê yurdan vekin. Bi vî awayî dê gelê Kurd, li gel Fethûlahiyan cih negire, li gel me cih bigire. Dê li gel me cih bigire, ma heya wê demê dê Kurd li holê bimînin? Wê demê mirovên ku li hemberî me bin, dê mirovên çawa bin?

Di hilbijartinên derbasbûyî de, me çima li Dersîmê winda kir? Kes lêpirsîna wê nake. Gotin: “Alîkariyê bigirin, lê reyên xwe nedin wan.” Bi sekna xwe me gel teşfîqî diziyê kir. “Ger AKP alîkariyê dide, bigirin, lê reyên xwe nedinê.” Hişê min vê nagire. Berî her tiştî hûn mirovan teşvîqî dirûtiyê dikin. Wisa be tu gelê Dersîmê jî nas nakî. Dê çawa alîkariyê bigire û reya xwe nede. Gelo ev gengaz e? Alîkarî jî girtin, reyên xwe jî dan; me jî wisa winda kir. Li hevalan guhdarî kirin û alîkarî girtin, lê piştî wê guhdarî nekirin. Çûn û reyên xwe jî dan wan. Kêm mabû ku CHP û AKP Dersîmê bi dest bixin. Ji bo ku pîvanên bîrdozîk giştî bên nasîn ez dibêjim.

Milîtanekî/e PKK’ê, ji bo jiyaneke wisa tenezul nake. Her kî tenezulî jiyana ji rêzê dike, di wê/î de PKK’yî bûn tuneye, divê mirov jê bitirse. Biçûkbûn, mezinbûn; cudabûnên hecmî (nicelîk) ne. Ya esas çawanî (nitelik) ye. Wê rojê me mînaka pereyên ku mehane tên girtin da. Dibêjin: “Pereyên ku em digirin kêm in.” Îro kêm e, dibe ku sibê zêde bin. Ger tu pereyan qebûl dikî, jixwe tu şêwaza jiyana moderníteya kapîtalîst jî qebûl dikî. Serokatî ji bo pereyan dibêje: “Fermandarê pergalê ye.” Niha tu dikevî bin fermana wî fermandarî, an na? Qirûşek û milyarek ferq nake. Ferqa di navberê de tenê ji aliyê hecm ve ye, çawanî yek e. Niha tu xwe bi spartina pereyan jiyankirinê qebûl dikî, an na? Hevalên me qebûl dikin. Ji bo ku ji partiyê pereyan bigirin, bi dil û can xwe dispêrin partiyê. Filistîniyan ji bo cixareyê, hinek pere dan hevalê Kemal Pîr. Gotin: “Bigire, pereyên te yên cixareyê ne.” Kemal Pîr, ew pere girtin û avêtin rûyê wan. Got: “Me ez leşkerê bi pereyan kar dike me? Cihê ku ez bibînim, ez ê vexwim; an na ez venaxwim. Bi

qasî ku hebe, ez ê vexwim. Pere yên partiyê ne." Pîvanên PKK'ê yên kevn, wisa bûn. Ez ji bo kesekî/ê heqaret nakim. Kemal Pîr wisa kir.

Niha dev ji pereyên ku derdorên cuda didin jî, dev jê berdin; dibêjin: "Em ê ji partiyê çiqasî pere bigirin?" Ger kêmek fersend çêbe, em ê hema bizivirin kesên bi meaşê kar dikin. Dibêjin: "Pêwîstiyên me hene. Bila partî bide û em jî bi taybetî bi kar bînin." Wê demê li wê derê komînalîzm xilas dibe. Tuyê bigirî, dê tuyê çawa bi kar bînî ne diyar e. Li wê derê birjûwazîtiya biçûk, ezezîtî dest pê dike. Dibe ku îro, ji aliyê hecm ve kêm be; lê dema ku sibê derfet zêde bibin, dê ev hecm jî zêde bibe. Tu yê bibî wek çînên li Yekîtiya Sovyetan.

Dibe ku derfet bi carekê re jî zêde bibin, ya girîng li hemberî van derfetan jiyankirina te ye. Heval dibêjin: "Ger hebe, em bi kar bînin, çima em bi kar neynin? Di vir de pîvana esasî ev e; jixwe dema ku tunebe, tu nikarî bi kar bînî. Ya girîng dema ku çêbû, tu dikarî bi kar neynî, an na? Dema ku hebûneke madî çêbû; tu li wê derê xwe winda dikî û her tiştî çarçûr dikî, an na? Tu dikevî rewşeke wisa, an na? Jixwe tiştek tunebe, tu nikarî bixwî. Mesele pereyên te tunebin, tu nikarî xerc bikî; nanê te tunebe, tu nikarî bixwî. Bi neçarî tuyê bi ya kêm îdare bikî. Ew ne merîfeteka te ye, encama rewşa heyî ye. Marifet û hunera kes, dema ku hebe diyar dibe; wê demê kes dikare bi pîvan be û gelperest be? Dikare şêwazeke rast ya jiyanê ava bike? Dikare xwe winda neke. Pîvan ev e. Pîvanên PKK'yîbûnê li vir dest pê dikin. Li hemberî hebûnê berxwedan girîng e. Jixwe li hemberî tunebûnê berxwedanek pêwîst nake, ew tunebûn jixwe te dikişîne xetekê. Ya girîng li hemberî hebûna madî, tu dikarî vînekê nîşan bidî; tu dikarî tenezul nekî; tu dikarî sekna xirqeyek û luqmeyekî nîşan bidî, an na?

Dibe ku ev tişt, wek sekneke nû were dîtin; dibe ku wek wêjeya (edebiyata) hejariyê jî were ditin; dibe ku wek ehmeqiyê jî were nirxandin. Jixwe di nav me de hinek wisa dibînin. Yên ku virde, wirde diçin; çawa hewl didin xwe bidin jiyankirin û ji me re dibêjin çi, em dizanin û dibihîzin. Lê di vir de dê pîvanên partiyê çi bin? Divê em di vê xalê de zelal bin. Yên ku di bin kayê re avê derbas dikin û yên ku keştiya xwe rizgar dikin, dê bibin pîvanên milîtantiyê? An li hemberî her tiştî em ê di pîvanên jiyanê de, di jiyana gelperest de, di pîvanên jiyanê yên bi rêgez de, di pîvanên jiyana azad de israr bikin; çi dibe bila bibe em ê van pîvanan bispêrin? Di vê mijarê de em ê têkoşîn bikin, an na? Hemû mesele ev e.

Têkoşîna pêşengtiya bîrdozîk, di vir de dest pê dike. Kêmasiyên pêşengtiya bîrdozîk, di vir de dest pê dikin. An na bi fîlozofbûnê ve ne girêdayî ye. Dibêjin: “Mirovên pir paşverû bûne, zanebûna wan kêm bûye.” Tu eleqeya wê bi vê ve tune. Pîvana pêşverûtî û paşverûtiyê çi ye? Em ne neçarin tiştên ku birjûwa dizanin, bizanibin. Em ne neçarin tiştên ku dagirker dizanin, em jî bizanibin. Li gorî me, pîvanên me yên zanebûnê jî hene. Çima em xwe li gorî pîvanên wan bipîvin, em ê li gorî pîvanên xwe, xwe bipîvin. Ji vî aliyî ve kurmek ket nav me, nîfaq ket navbera me, windakirina pîvanan çêbû. Kêm maye ji hev û din dîzîn çêbibe, bi rastî jî şerm e. Gelo PKK wisa bû? Hevalên me di asteke wisa ku ji bo hevalê xwe her tişt dikirin de bûn. Serokatiyê ji bo Heqî Karer, got: “Bixwe nexwar, bi hinekên din da xwarin; li xwe nekir, li hinekên din kir; raneza, hinekên din dan razandin.” Ev rastiyeke, ne nepixandin e. Serokatiyê ev wek pîvanekê danî holê.

Em li nivîsên ku Serokatiyê, ji bo bîranîna Heqî Karer nivîsandine binêrin. PKK, wisa bû PKK. Vê da qezenckirin û di PKK’ê de pêşketin çêkir. Ya girîng di paradîgmaya dewletperest de bûn û nebûn nebû; ya girîng şêwaz û çawabûna jiyana wê bû. Di qezenckirinê de jî, di windakirinê de jî, pîvana esasî ev bû. Hemin ger xwe bispêre wê zanebûnê û mirov bibe xwediyê zanebûneke berfireh ya cîhanê jî baş e. Divê em hewl bidin ku wisa bin. Tu kes wê red nake, lê em nikarin bibêjin, dema ku ev zanebûn çêbû; partîbûna rast jî çêbûye. Ger wisa bûya, dê filozof bibana PKK’yiyên herî xurt.

Ji vî aliyî ve dijminên PKK’ê zêdetir û baştir fêr dibin û dizanin. Ger wisa be dê hemû birjûwa û alîm zêdetir bibin PKK’yî. Lê ne wisa ye. Pirsgirêkên pêşengtiya bîrdozîk bingeha xwe ji wir nagirin. Pirsgirêka pêşengtiya bîrdozîk; bingeha xwe ji ezezîtiya kadro, di jiyanê de ketina wî/ê û di bin bandora modernîteya kapîtalîst de mayînê digire. Bingeha xwe ji baş temsil nekirina PKK’ê ya ku Rêber Apo dixwaze û ji pîvanên wê pêkneanînê digire. Di vê derê de em nikarin meşeke bi îstîkrar bimeşînin, di vê derê de şîlobûn û tevlîhevî tê jiyankirin. Di vir de ne ji bo civakê, ji bo xwe lêgerîna jiyanê heye. Xirabûnek heye, her tişt ji xwe re kom kirin heye.

**Li Hemberî PKK'ê Çeka Herî Esasî Ya Tesfiyegeran Paşvekişandina Pîvanên Partiyê Bû**

Îro, ji pîvanên PKK'ê yên vejînê û pîvanên derketinê ketinek heye, xirabûnek heye. Lê Serokatiyê bi guherîna paradîgmayê, ev derxist asteke bilindtir. Got: "Xwe bi dewlet û deshilatdariyê ve girêdayîn, xirabûnê tîne. Xeta moderníteya demokratîk, li dijberî vê ji xeynî azadî û wekheviyê tiştekî qebûl nake; ev karê yên ku vê jiyan dikin û yên bi her tiştê xwe fedayê civakê dikin e." Ji aliyê pîvanên bîrdozîk ve kadro wisa pênase kir. Lê ew qas şemitîn heye. Hinek heval qebûl nakin. Pîvan berovajî bûne, pîvanên jiyanên cuda derketine holê; lê ev xwezayî tê dîtin. Ruxmê vê van nikarî, vê bikin biryar. Di destpêka salên 2000'î de tesfiyegeran ev pîvan spartin partiyê. Li kongre û konferansên partiyê ev red kirin. Lê di pratîkê de pêk anîn. Di destê wan de bû û xirab kirin. Gotin: "Em ê partiyê wisa xirab bikin." Ew, rêbaza xirabkirinê ya tesfiyegerên wek Ferhat û Botan bû. Li hemberî partiyê, çeka wan ya herî mezin ev bû. Di rewşeke wisa de mayîn, di bin bandora tesfiyegeran de mayîn e. Li hemberî wê nesekinîn û derbas nekirin; teqez tê wateya li hemberî tesfiyegeriyê nesekinînê.

Bîrdozî çi ye? Têkoşîna bîrdozîk çawa tê dayîn? Têkoşîna çînî û cînsî çawa tê meşandin? Têkoşîna navxweyî çi ye? Têkoşîna nefsî çi ye, li derve ew çawa dibin? Ev, pirsên jiyana me ya bîst û çar seatan e. Divê em bersivên rast bidin van pirsan; lê em jê dûr disekinin, kes xwe pê re mijûl nake. Ji bo ku jê re îmkan vebin, tu kes nakeve nav têkoşîneke wisa. Ger bi derdora xwe re têkoşîneke wisa bike, divê bixwe jî li gorî wê tevbigere. Lê ger wisa şîlobûn û tevlîhevî hebe, ji bo ezezîtiya wî/ê jî bingeh çêdibe. Wisa be, nêzîkatiyên wisa, nêzîkatiyên ezezî ne. Ger kes bi xwe ne di nav sekneke wisa de be jî, ger ji van tiştan re dengê xwe dernaxe, diyar e ku ew jî li parzemîneke wisa digere. Pîvana me ev e, divê wisa be.

Ger em ê têkoşîna bîrdozîk bidin û pirsgirêka pêşengtiya bîrdozîk çareser bikin; divê em wisa pirsgirêkan bigirin dest. Wisa bi gotinên xemilandî û têgehên ku nayên fêmkirin rewş pênase kirin pêwîst nake, tu wateyeke wê jî tuneye. Ji ber ku pirsgirêk ne wisa ne, pirsgirêkên bîrdozîk şênber in. Dibe ku hêsan bên dîtin, pratîkî bin, lê cewherê vî karî ev e. Dibe ku wek hêsan û biçûk bên dîtin, lê her tişt bi wan tiştên biçûk dest pê dike. Ew kesê bi navê Ferhat, carekê rast axifî û got: "Her tiştî bi pastayekê dest pê kir. Ji Îranê wek diyarî pasteyek hat û min

qebûl kir. Piştî wê yê duyemîn hat. Piştî pasta nizanim çi hat; bi vî awayî li Xakûrkê ez bûm lord. Lê her tişt bi tenezulkirina pastayekê çêbû.” Niha tenê pasteyek e, çi jî tê em hemû dibêjin: “Xwedê jê razî be.” Kesekî ku dibêje: “Filan tişt hatiye û min red kiriye” heye? Tune, ji ber ku di nav partiyê de diyarî dayîn û standin, gihîştiye asteke rewa.

Dema ku ez di zindanê de bûm, kesekî pênûsek anîbû û di dadgehê de da min. Got: “Kanî ev pênûs şandiye, diyarî ye.” Ez şaş bûm, me bi hevalê Fuat re nîqaş kir. Me got: “Kanî xebatên partiyê nameşîne, an di karekî cuda de dixebite?” Gotin: “Na, nunerê partiyê ye.” Pênûs bi pereyên partiyê standiye. Gelo bi pereyên partiyê, diyarî dibe? Bi pereyên PKK’ê, diyarî dide min. Dixwaze min bandor bike. Wek tiştên biçûk tên dîtin, lê ger pêşî lê neyê girtin, ya girîng ne hecm e. Bi pereyên partiyê Kanî diyariyan belav dike. Dibêjin: “Diyariyên Kanî.” Lê kadroyan meaş distandin, her pere dihatin.

Min digot: “Neşînin. Jixwe pere li wir dimînin. Nadin me û di qaseya zindanê de dimînin. Me ji wan pereyan xerc dikir, ez çiqasî bixwim jî, ez nikarim ji deh paran pareke wê jî xerc bikim. Ji ber vê neşînin, jixwe dewlet faîza wê distîne.” Ji min re digotin: “Em van pereyan didin her kesî, mafê te ye. Bigire û bixwe.” Dema ku ez ji zindanê derketim, min 5-6 hezar mark jî bi xwe re derxistin. Min bir û dan maliyeyê. Ji xeynî xwarina roja înê, min her bi pereyên xwe xwarin dixwar. Lê dîsa jî ew qas lê zêde bû. Ne tiştekî ku mejiyê mirov fêm bike ye.

Di 2000’î de, piştî kongreya heftemîn em diçûn Ewrûpayê, em çûn Şam’ê. Keseke bi navê Melîha ku bi me re hebû. Em li Şamê di malê de rûniştibûn. Dibistan bû, yên ku li dibistanê mêze dikirin hebûn. Her dibêje: “Ez biçim û hinek tiştan bînim.” Diçe û her carê gelek tiştan tîne. Dema ku dubare û sebare wisa kir, min got: “Melîha ew çawa çêdibe, tu bi çi van tiştan distînî?” Got: “Pereyên me hene, partî meaş dide me, yên we tunene?” Min got: “Na, pereyên me tunene. Partî meaşê nade me. Qey em kar nakin, hûn jî pir kar dikin; ji ber vê dide we.” Ji ber vê di nav PKK’ê de bûn û nebûn ferq nake. Piştî ku pîvanên te wek yên pergalê bûn; dixwazî di nav PKK’ê de be, dixwazî bireve; ferq tuneye. Bi rihetî tu dikarî li gorî wan pîvanan jî jiyan bikî. Ev hemû xirabebûn û şemitîn in. Ji ber vê, ger îro sererastkirinek çêbe û ji nû ve partîbûn bi pêş bikeve; bi taybetî ger di xeta modernîteya demokratîk de PKK’yeke nû çêbe, ev nabe PKK’yeke pir mezin; dê bibe PKK’yeke ku ji aliyê çawaniyê ve pîvanên wê pir bilind û mezin bûne.

Serokatiyê got: “Em ê ne wek berê şer bikin, ne jî wek berê jiyan bikin.” Wisa be dê şer, jiyan û têkoşîna nû çawa çêbe? Ji bo ku em bi şêwazeke nû şer bikin û jiyan bikin, divê em ya kevn bizanibin û biguherînin. Em ê çawa biguherînin? Ji ber ku em nikarin jiyanê biguherînin, em nikarin bi şêwazeke nû têkoşîn bikin. Ne di qada gerîla de, ne jî di qada serhildanê de em dikarin guhertinekê bikin. Ev deh sal in em di nav HPG’ê de bi nîqaşên wisa xwe diteqînin; ne ji aliyê şêwaz ve, ne jî ji aliyê encamgirtinê ve, em nikarin milîmekê jî guherînan bikin. Di sala 2004’an de em hê li paş mabûn. Me di konferansa 2007’an de wek HPG’ê ji nû ve tevlîbûna PKK’ê kir biryar. Niha jî ji bo ku ji nû ve tevlîbûna PKK’ê pêk bînin, min ji YRD (Yekîtiya Ragihandina Demokratîk) re pêşniyar kir. Ruxmê ku PKK’ê, ev rêxistin ava kirine jî pêwîstiyeke wisa heye.

Dibêjin: “Em hinek kar bikin, hinek jî xwe bidin jiyankirin; em lihevkirineke bi vî rengî pêk bînin ê çi xweş bibe. Bîst û çar seatan karkirin, ne li gorî me ye, em nikarin xwe rabigirin.” Em nayên şoreşgertiya bîst û çar seatan. Di kongreya sêyemîn de, Serokatiyê ji vê nêzîkbûnê re got: “Birjûwaziya biçûk.” Got: “Hûn ne kesên xirab in, hûn baş in; lê hûn birjûwaziyên biçûk in. Hûn dixwazin ku hinek hûn bidin partiyê, hinek jî partî bide we. Hemû pîvanên sosyalîzma pêkhatî wisa ne. Hûn dibêjin, ‘bila ya me jî wisa be.’ Lê li Kurdistanê nabe, em nikarin vê bikin. Ez jî ne li hemberî vê me, lê em nikarin wisa bimeşînin. Dema ku wisa dibe partî xilas dibe.”

Pirsgirêkên me yên bîrdozîk pir cidî ne. Serokatî dibêje: “Pirsgirêkên partiyê yên bîrdozîk tune ne, pirsgirêkên bîrdozîk yên kadro hene.” Ji ber ku pirsgirêka pêşengtiya bîrdozîk di kadro de derdikeve holê. Pirsgirêka kadro ya fêmkirinê heye, pirsgirêka kadro ya welatparêziyê heye, pirsgirêka kadro ya welat heye. Sekna heyî, me ji dagirkeriyê, ji metîngeriyê qut dike; an ber bi wir ve dibe? Gelek xebat û pergal ber bi wir ve dibin. Me pergal ava kiriye û em mirovan bi destê xwe dişînin gel dewletê, da ku piştî wê jî em ji dewletê bigirin têkoşîn dikin. Şêwaz û rêbazên me mirovan ber bi dewletê ve def didin. Wê derê rewa dike, wek ku dikarin wisa jî jiyan bikin dide nişandan.

Mesele di 1994’an de destûr dayîna gel, da ku biçin metrepolan şaşîtiyek bû. Çima ji pergalê qut nabe? Ji ber ku me destûr da ku biçin metrepolan, me sekneke zelal nîşan neda. Di pêvajoyên agirbest û diyaloqan de, wek ku em bi dewletê re bûne yek hate fêmkirin; civakê

jî li gorî vê ferasetê tevgerîn kir. Ku der ji xwe re nêzîk dîtibe, çû wir. Ev cudabûn nedît. Gelo em dikarin bibêjin, civakê şaşîtî kir? Me pêşî lê negirt. Niha baş bû? Em li rewşa heyî mêze bikin; di çaresernekirina ew qas pirsgirêkan de, di dirêjkirina pêvajoyê de, di hêviya tunekirina PKK'ê ya pergala komkûjiyan de rista van sekn û tevgerînên me hene.

Belgeyeke MÎT'ê hebû, belgeya AKP'ê bû. Navê wê: "Li hemberî PKK'ê, dê şerê piskolojik çawa were meşandin" bû. Ev vekirî jî digotin. Qaşo kesên ku hevdîtin dimeşandin bûn, lê bi kîjan hesaban tevdigerîn. Divê em van bizanibin; an na em çima çavgirtî bin, çima em bikevin bendewariyan. Dibêjin: "Ya rast, me xilas kiribûn. Lê ev PKK derket, hejmareke pir kêm mabû; ew li gel xwe hiştin, derdorek jî ji me qut kirin."

Niha tiştê ku dewlet wek serkeftina PKK'ê dibîne çi ye? Hin derdorên ku hatine asîmîlekirin, ji dewletê hatine qutkirin. Dibêjin: "Xeteriya herî mezin ew e û divê hemû xebat li ser vê bên kirin. Derdorên ku PKK ji me dizîne, divê em dîsa vegerînin. Bêguman em dijminê hemûyan in, lê di serî de biçin malbatên şehîdan, biçin gel malbatên kesên ku çûne çiyan, bi awayekî dostane nêzîkî wan bibin. Dijminên me ne, em wek dijmin bibînin; lê ji aliyê polîtîk ve em bi awayekî dostane nêzîk bibin, ber bi dewletê ve bikişînin û wan qezenc bikin. An na derdoreke civakî ku ji me qut bûye diafirînin, nasnameyeke cuda ya netewiyetê diafirînin. Divê ev teqez bê asteng kirin." Bertek nîşandan û li hemberî partiyê serîrakirina van malbatên ku zarokên wan tevlî gerîla bûne jî, wek pratîzekirina vê nêzîkbûnê derket holê. Li pişta wê MÎT heye. Planeke ji aliyê AKP'ê ve çêbûye û MÎT jî pêk tîne. Li pişta wê, ew belgeya şerê psîkolojîk heye. Ew planeke berfireh e, mirov dikare li hemûyî jî mêze bike. Hêzên li hemberî me ku em wek dijmin pênase dikin, ew qas bi plan û bi pergal tevdigerin. Li gorî wê êrîşên xwe pêk tînin. Sistbûna polîtîk nîşan dide, lê di sekna xwe ya bîrdozîk de qet tawîzan nade. Heya dawiyê di meşînê de û di serxistina konevaniya înkar û tunehesibandinê de bi biryar in.

Rewşa di nav civakê de neynika me ye, neynika sekna me ya rêxistinî ye. An na em nikarin bibêjin; em baş in, civak xirab e û me naşopîne. Li me mêze dike û li gorî wê sekna xwe diyar dike. Em li vê girseya ku em alîgirên xwe pênase dikin binêrin; gotinên wan çawa ne, nêzîkbûn û pîvanên wan çawa ne? Divê em xwe di wir de bibînin. Ji ber ku teyisîna me ya bîrdozî li wê derê ye, neynûka me ev e. Wêneyê me

li wê derê derdikeve holê. An na em nikarin li xwe mêzekirinê wêneyê xwe bibînin. Li vê derê, dema ku şemitîneke biçûk çêdibe, li wê derê dizivire dijberbûneke mezin. Berovajîbûneke biçûk ya li vê derê, li wê derê dizivire şemitîneke mezin ya jiyanî û dikevin nav pergalê. Di encamê de ji pergalê qutbûn, li hemberî pergalê rabûn û bi pergalê re têkoşîn çênabe. Bandorbûnên bîrdozîk di vê astê de ne.

Şaxên girîng yên pirsgirêkên kadro ev in. Divê em kadro di vê derê de pênase bikin. Serokatiyê pênase kiriye, em sekna Serokatî û ya xwe mûqayese bikin; em sekna tenezulî jiyana ji rêzê dike dikin û bi meaşan jiyan dike û em bi sekna xwedî xirqe û luqmeyekî mûqayese bikin. Gelo ev her du sekin wek hev in? Pratîzekirina wê teori ye, gelo bi vî awayî dibe? Çima heval van nîqaş nakin? Ger xirabûn çêbûbe, çima sererastkirin çênabe? Çima em nikarin ji nû ve şoreşa bîrdozîk pêk bînin û guherînan bikin? Em van tiştan lêpirsîn nakin. Dev ji lêpirsînê berde, nîqaşkirin û xistina rojevê jî balkêş tê dîtin; tu kes bi çavekî rexnegir lê mêze nake. Bi vî awayî, em nikarin bibin PKK ya serdema nû; em nikarin bibin PKK ya modernîteya demokratîk, ji bo ku em bikaribin bibin PKK ya modernîteya demokratîk, divê em di sekin û pîvanên xwe de guhertinên teqez bikin.

Divê gelek tiştên ku hatine şemitîn, em sererast bikin û em yên kêm temam bikin. Ji ber ku guherîna paradîgmayê çêbû. Paradîgmaya dewletperest û deshilatî me red kir. Wisa be divê em hemû nêzîkbûnên xwe yên ku me ber bi wir ve dibin, pîvanên xwe yên jiyanê sererast bikin. Ruxmê qerektera xwe ya PKK'ê, berê di şêwaza jiyana PKK'ê de tiştên wisa jî dihatin dîtin. Herî kêm ji aliyê teorik ve pêşiya tiştên wisa vekirî bû. Lê di pratîkê de nedikarîn pêk bînin. Serokatiyê digot: "Em nikarin li Kurdistanê pêk bînin." Jixwe pratîka li Kurdistanê, di dema têkçûyîna sosyalîzma pêkhatî de hişt ku PKK têk neçe. Niha jî Serokatiyê ev valetiya teorik bi giştî ji holê rakir. Pênaseyeke teorik û giştî bi pêş xist. Wisa be divê sekna me ya heyî, sekna kadro li gorî vê pênaseyê be. Divê li gorî pêwîstiyên xeta bîrdozîk be, divê nûnertiya wê bike, wê jiyanî bike û ji bo pêkanîna wê divê em têkoşîneke mezin ya bîrdozîk di nav xwe de bihewînin. Ne şexsî, divê em bi awayekî rêxistinî jiyan bikin. Divê em nêzîkbûneke wisa di nav partiyê de bikin rojev; li ser vî esasî divê yên ku dibêjin: "Ez ê xwe sererast bikim." Ji nav derxe û yên din endamtiya wan ya partiyê jê bigirê. Cihê ku em pîvanên partiyê bixin, divê em endamtiya kesên ku nayên pîvanên

partiyê bixin. Bila KCK'î bin, bila ji rêxistinên din bin; bila pîvanên wan temsîl bikin, ne mesele ye. Lê bila pîvanên PKK'ê nexin, paş ve nekişînin. Ev xirab nabe. Ger pîvanên wan wisa ne, dikarin di nav wan rêxistinên li gorî pîvanên wan bi awayekî serkeftî jî kar bikin.

Divê pîvanên mezin yên PKK'yîbûnê hebin. Yên ne wisa ne, ger di têkoşîna welatparêziyê de bi israr e, dikare di rêxistinên din de jî kar bike. Divê pîvanên kadrotiyê yên wan rêxistinan temsil bike. Ev jî baş e, ger zelalbûn çêbe dê kar baştir bimeşin. Lê ger zelalbûn çênebû û tu pîvanên welatparêziyê bispêrî PKK'ê, tu yê PKK'ê ji piştve xencer bikî. Her wiha tu biçî û pîvanên PKK'ê bispêrî gel, tuyê bi PKK'ê gel jehrî bikî. Wê demê tu yê gel ji PKK'ê dûr bixî û ev jî ajantî ye. Ew qas zelal e. Her tişt di cihê xwe de girîng e, wisa bi wate dibe û pratîzebûnê dixwaze. Pîvanên PKK'ê spartina welatparêziyê, spartina welatparêziyê û KCK'ê, bi zorê kirina PKK'yî ev e. Yên ku wisa dikin jî hene. Di demên berê de, di xebatên gel de wisa nêzîk bûn û xebatên girseyî tam teng kirin. Serokatiyê bi awayekî tûj rexne kir û got: "Hûn tolê distînin. Ez hinek pîvanan dispêrim we, hûn jî wan wisa dispêrin girseyê û bi vî rengî hûn tola xwe distînin. Bi belavkirina têkiliyên partiyê, hûn dixwazin girseyê ji partiyê dûr bixin û wisa encam bigirin."

Pîvanên cuda spartina PKK'ê, paşvekişandina pîvanên PKK'ê; tê wateya êrîşa herî hişk ya hundirîn. Êrîşên ku dijmin di qada siyasî û eskerî de ji derve ve nikare bike, bi êrîşên bîrdozîk ji hundir ve çêdibin. Wateya wê ev e. Kongreya yazdemîn biryara sererastkirinê girt. Ev sererastkirin ê çawa bibe? Dê rêveberiya partiyê van jî nîqaş bike û rê û rêbazên wê bibîne. Rê û rêbazên rast yên pratîzêbûnê çi ne? Divê em van bikin rojeva xwe. Lê nîqaşeke wisa nabe. Bi vî awayî tûjbûn û teqezbûnek çênabe. Dema ku hinek rexneyên hişk çêdibin jî, bertek çêdibin. Kes bawer nake ku kêm e û dibêjin: "Di nav van şert û mercan de tenê ew qas dibe." Dema ku hinek tê rexnekirin jî, vê carê giştîkirin çêdibe û dibêjin: "Temam, kêmasiyên min jî hene, şaşîtiyên min hene. Ez rexnedayîna xwe didim." Lê dema ku hinek din tê rexnekirin û bi gotina: "Te li filan cihî şaşîtî kiriye." şênberbûn çêdibe, hema bertek derdikevin. Dema ku hinek din bi ser de diçî, destpê dike; "Yê din kir, suçê min tunebû." Wisa dest bi xweparastinê dike. Îdarekirineke wisa heye; çiqasî rexne bên, li gorî wê xwe amadekirin, li gorî dozaja wê bertek nîşan dayîn çêdibe.

Wisa be li wê derê angaşt tuneye, bi armancê ve girêdanî tune. Lêpirsîna 'gelo min ev kar bi ser xist, an na tune.' Ger bi ser nexistibe, fikareke wek 'min çima bi ser nexist' tune. Lê divê her kes xwediyê fikarên wisa be. Divê pirsên wisa ji xwe bike. Kî dibe bila bibe, li ku kar dike bila bike, divê vê pirsê ji xwe bike. Ger bingeha xwe ji wî/ê digire, divê bi rexnedayînê derxe holê; ger bingeha xwe ji yekî/ê din digire, divê bi rexneyan hesab bipirse. Dema ku ji Serokatiyê, ji rêveberiyê rexne nayên dibêjin: "Em pir kûr nekin, em îdare bikin, ya herî baş ev e." Nêzîkbûna giştî ev e. Nêzîkatiya kadro wisa dibe? Nêzîkatiya milîtanan wisa dibe? Ji aliyê bîrdozîk ve kesê ku wisa nêzîk dibe, gelo dikare têkoşîna siyasî û leşkerî bimeşîne? Dê li wê derê jî zêdetir îdare bike, ê ji nedîtî ve bê û taloq bike. Li wê derê ne rêgez, ne jî pîvan dimînin. Ev mijar pir zelal, vekirî û şênber in.

Divê em têkiliya di navbera şêwaza jiyan û şêwaza têkoşînê de bibînin. Bi awayekî kolektif xebitîn, bi jiyana komînal dibe. Ji kesekî/ê ku komînal jiyan nake, kolektîvîzm dernakeve; dê ezezîtî derkeve, deshilatdarî derkeve, ferman dayîn derkeve. Ger em dibêjin, 'di pergala rêxistinî de, di şêwaza rêveberiyê de, di şêwaza xebatê de em xwe bigihînin kolektîvîzmê' têkiliya vê bi sekna bîrdozîk ve girêdayî ye. Divê em sekneke bîrdozîk ku li gorî vê ye ava bikin, divê em li gorî vê şêwazeke jiyanê ava bikin. Komînalîzm, bi şêwaza xirqeyekî û luqmeyekî, afirandina yekîtiya fikir-zikir-çalakî ye. Ger wisa bibe, kadroyek dikare kolektîvîzmê biafirîne. An na li ser navê kolektîvîzmê, dê her cure ezezîtî û parçebûn bi pêş bikeve. Qaşo em rêxistina herî kolektif in, lê şaş fêmkirina kolektîvîzmê heye. Di pratîkê de xirabkirina kolektîvîzmê tê jiyankirin. Pir zêde burokratîzm bi pêş dikeve. Karê ku kesek bike, ger deh kes dikin; ev ne kolektîvîzm e. Li hinek cihan şêwazeke wisa bi pêş ketiye. Şêwaza sosyalîzma pêkhatî ew bû û ji ber vê têk çû. Ew şêwaz têk çû. Kolektîvîzîm ne ku karê kesekî deh kes bikin e; divê bi du kesan karê pênc kesan bê kirin, bi sê kesan karê deh kesan kirin e. Di asta biryargirtinê de jî, di pêkanînê de jî kolektîvîzm enerjî û hêzeke wisa derdixe holê. Ji ber vê hilbêrîna mirovan zêde dike. Di xebata kolektif de zêdebûna hilbêrînê heye. Karê ku tu bi kesekî bikî, deh kesan bide ser; binêre ka kolektîvîzm çêdibe, an na? Têkiliya vê jî bi bîrdoziyê re heye.

Hemû sedemên van encaman, şêwaza jiyanê ye, sekna bîrdozîk e. Ger em nikarin li cihekî biryarên rast bigirin û bi awayekî serkeftî di

karkirinê de em lewaz dimînin, sedema vê ev e. Ger em kolektif tevbigerin, tiştekî ku yekî nedîtiye dê yên din bibînin û em biryarên şaş nagirin. Ger yek di pratîkê de lewaz dimîne û hêza wî/ê têrî nake, li ser esasê planlamayên hevpar û karbeşiya xebatê em ê wê lewaziyê ji holê rakin; em di pratîkê de lewaz namînin, li hemberî dijmin em bê tevdîr namînin. Kolektîvîzm tê wateya bi ênerjiyeke kêm, pir kar kirine; encamên serkeftî girtinê îfade dike. Şêwaza hemal, bi pir enerjiya kêm encam girtin e.

Şêwaza şoreşger, bi kedeke kêm, pir encam girtine. Şêwaz û hunera şoreşgerî ji vê derê tê. Hunermend kesê ku bi kedeke kêm, encamên mezin derdixe ye. Zanatkar, wek hemalan her lê dide û encamên ku derketine her dubare dike. Ji wê derê nikare derbas bike. Beriya wî/ê jî tiştê ku hatiye afirandin, dîsa tê çêkirin. Di heman astê de xwe dubare dike, nikare bi pêş ve biçe. Divê em ji bîr nekin, ev şêwaz di tevgerînên me de pir girîngtir e. Kar pir in û peywir zehmet in. Li hemberî vê divê em bibin xwediyê hewldaneke mezin. Divê em lewaziyên xwe bi kolektîvîzmê ji holê rakin. Em bi xebata kolektif dikarin lewaziyên xwe yên şexsî ji holê rakin. Em ê xebata kolektif, bi jiyana komînal derxin holê. Em ê bi pîvanê bîrdozîk, hebûnên bi rêgez û bi çawaniyê derxin holê. Em  ê jirêderneketin û berovajînebûnê derxin holê.

Em dibêjin, 'tiştek nabe.' Ev gotin xeter e. Özal digot: "Ez jî carekê mekezagonê kun bikim, dê çi bibe?" bi sekna bîrdozîk, mirov nikare wisa nêzîk bibe. Em nikarin bibêjin, 'ez jî carekê xirab bikim.' Nabe. Mirov nikare bibêje: "Ez carekê xirab bikim, ez careke din nakim." Bîrdozî qadeke rêgezên hişk e. Di sekna bîrdozîk de hişkbûn esas e. Ji ber hişkbûna bîrdozîk, mirov nikare ji kesî re bibêje doxmatîk. Li hemberî doxmatîzmê Serokatiyê şer daye destpêkirin. Em vê wek: "Em xwe şîlo bikin, em rêgezan bi erdê re bikin yek." fêm bikin, dê şaş bibe. Qada bîrdozîk, qada rêgezan e û qada hişkbûnê ye. Yên ku di bîrdoziyê de xwediyê rêgez in, herî kêm di konevaniyê de jî ew qas dikarin nerm nêzîk bibin û vekirinan çêbikin. Yên ku di rêgezan de ne hişk bin, di konevaniyê de nikarin nerm bibin, nikarin vekirinan çêbikin. Cihê vekirinan, dê bên derbaskirin, ji holê rabin. Dê çem û çem biçin. Dê rêgezên xwe winda bikin. Ji ber vê nermbûna polîtîk û hişkbûna bîrdozîk cuda ye. Divê em wê ferqa di navbera wan de ji bîr nekin.

Divê em bîrdozî û konevaniyê tevlîhev nekin. Divê em taybetmendiyên her du qadan tevlîhev nekin. Du qadên cuda ne û taybetmendiyên cuda dihewînin. Hişkbûna yekê, nermbûn û sistbûna ya din xwedî dike. Yê ku ji aliyê rêgezan ve hişk e, ji aliyê konevaniyê ve li gorî pêwîstiyan dikare nerm bibe û dê ji her cure têkilî û îtîfaqan re vekirî be. Ji ber ku ji xwe bawerbûna wî/ê hebe. Di xeta xwe de saxlam disekine, ji ber vê dikare bi yên din re jî têkiliyan çêke. Lê yên ku ji aliyê bîrdozîk ve ne xwedî rêgez bin û ne hişk bin, dê bi yên din re çawa têkiliyan deyne? Têkilî danîne, di hundirê wan de winda bibe û biçe. Ji bo ku winda nebe, dê ji aliyê polîtîkayê ve jî xwe şûnde bikişîne. Li Tirkiyeyê rêxistinên çep yên marjinal vê jiyan dikin. Xwe pir bîrdozîk nîşan didin, lê ji xwe ne bawer in, bê rêgez in. Bîrdozî û konevanî derbasî nav hev kirine. Dema ku bi hev re têkiliyê datînin, dihelin û tune dibin. Ji ber vê cuda disekinin ku nasnameya xwe biparêzin. Bi vî awayî qada polîtîk parçe dikin û yekîtiya demokratîk asteng dikin.

Ji vî aliyî ve divê em baş bizanibin ku qada bîrdozîk qadeke rêgezan e. Divê em heya dawiyê jî di rêgezan de hişk nêzîk bibin, baldar bin û tûj bin. Divê em ji şêwazên ku ne diyar e xwedî rêgeze, an na dûr bikevin. Em ê rêgezên jiyanê û rêgezên bîrdozîk yên Serokatiyê rast fêm bikin û bi awayekî teqez û hişk em ê jiyan bikin û bidin jiyandin. Partîbûna rast, PKK'yîbûna rast; bi sekneke rêgezî ya bi vî awayî pêk tê.

### Di Sekna Kadro De Çiqasî Ezezî û Cudabûn Hebe Di Nav Me De Ew qas Partiyên Cuda Hene

Jiyana partiyê, sekna bîrdozîk ya kadro diyar dike. Partî çi dinivîse bila binivîse, angaşta wê çi dibe bila bibe; di encamê de tiştê ku sekna bîrdozîk ya partiyê diyar dike, jiyana partiyê ye. Tiştê ku wê diyar dike jî jiyan, pîvan û rêgezên kadro ne. Di partiyekê de ger jiyan û pîvanên cuda yên kadro hebin, ya rast di nav wê partiyê de bi dehan partî hene. Çiqasî navê partiyekê li xwe bike jî, bi dehan partî li holê hene. Her pîvan û jiyana kadroyekî tê wateya partiyekê. Ji ber vê berê ji kesên ezez re digotin: "Partiya xwe fes bike û tevlî partiyê bibe." Ji ber ku pîvanên wî/ê, wek yên partiyeke din bûn û wek partiyeke cuda tevdigeriya. Ji rêgez û pîvanên PKK'ê dûr bû.

Bala xwe bidinê, bi rastî jî mejiyê mirov nagire. Tiştekî ku nayê fêmkirin û nayê zanîn jî nîn e. Rêziknameya partiyê heye û li gorî vê xwe rêxistin dike. Her wiha pênaseya kadro heye; lê kes li wê derê

nanêre, ew bi qasî bandor nake û her kes li gorî xwe pênase dike. Kadro çawa ye? Pênaseyek di mejiyê xwe de çêkiriye, rêziknameya partiyê çawa pênase dike, qet nayê bîra wan. Dibêjin: “Ez jî PKK’yî me û PKK’yiyekî bi vî rengî me.” Ew qas jî li gorî xwe gûftûgo kirin nabe. Ezezîtiya di nav me de tê jiyankirin, wisa ne ji rêzê ye; ezezîtiyeke ku carinan şaşîtiyan dike, carinan seknên ezez nîşan dide nîn e; pir zêde xwe spartina partiyê, pir zêde li gorî xwe pênasekirin, di nêrîn û feraseta xwe re derbas kirin heye. Gihîştiye asteke bi vî rengî. Ji ber vê em ne dikarin bibin rêxistin, ne jî dikarin bibin rêveberî. Ango bi vî awayî tu nikarî mirovan komî ser hev bikî û bînî gel hev. An ê têkiliyên derveyî partîbûnê yên ehbabî çêkin, koman ava bikin û bibin çete; an jî dê hev û din qebûl nekin, bi hev û din bikevin, xirab bikin û belav bikin.

Di nav me de her du jî çêdibin, lê partîbûneke rast bi pêş nakeve. Gelek tiştên ku parzemîna partiyê wisa tengav dikin hene. Feraset û seknên derveyî partîbûnê ne. Ev nêzîkbûn ew qas zêde bûne ku meseleyên herî biçûk jî êdî bi vî awayî tên rojevê. Piştî wê jî dibêjin: “Bila rêveberî bi me re mijûl bibe, bila filan kes bi me re mijûl bibe, nizanim çi pirsgirêka me heye.” Ji bo rewşên wisa Serokatiyê digot: “Ew ne rizgarkerên gel in; ew bi xwe hejar û kesên melûl ê ku benê rizgarkirin in.” Bi rastî jî rewşeke wisa heye.

Niha ew kes rizgarkerê gel e, an bêçareyekî ku were rizgarkirin e? Ne diyar e. Li cihekî ku di pirsgirêkên gel çareser bike de cih digire, dibêje “Ez kadro me.” Lê nikare pirsgirêkên xwe çareser bike. Serokatî dibêje: “Ez tu caran pirsgirêka xwe ya şexsî naynim û nakim pirsgirêka rêxistinê, nakim rojeva rêxistinê.” Lê hevalên me vê wek marîfetekê dibînin. Ya rast qedemeya rêveberiyê her bi van tiştan re mijûl dibe, tiştê ku rêveberiyê kot (köreltme) dike hinek jî ev e. Ez wê feraseta rêveberiyê dizanim, çiqasî bi van karan re mijûl dibin, bi wan pir zêde kar dikin. Lê karê xwe yê esasî dide aliyekî, an jî li holê dihêle. Bi kûrbûna bîrdozîk, pirsgirêkên teorik, pirsgirêkên siyasî, pirsgirêkên tektîkî-stratejîk ve mijûl nabe; bi armanca ji xwe re kar dîtinê, bi tiştên wisa re mijûl dibe. Ev bi kêrî rêveberiyê jî tê û du şaşîtî dibin yek; bi vî rengî jiyan û rewşeke dijberî partiyê derdikeve holê. Ne rêveberî, rêveberiya xwe dike; ne jî kadro, dikeve sekna rast ya kadrotiyê. Niha wisa nabe, bi vê şêwazê nabe. Ev bingeha xwe ji ku digire? Bi rastî jî mirov vê bêzanebûn dikin? Ger wisa be, em tiştekî nabêjin. Lê ger bi zanebûn dikin, wateya ew qas xwe spartina partiyê çi ye? Mirov dikeve

şoqê, ew qas çavsorî ji ku tê? Her kes dibîne, em rojê deh şehîdan di-din. Lê yê din çûye Ewrûpayê, parçeparçe bûye û dibêje: “Çima bi min re mijûl nabin, filan tiştî û bêvan tiştî nadin me.” Êdî dewlet jî wisa nêzîk nabin. Lê wek kadroyekî PKK’ê, çawa mafekî wisa tê xwestin, mirov çawa dikare di nav PKK’ê de bi vê ferasetê bisekine, çi têkiliya van bi PKK’ê re heye? Bi rastî jî mirov şoq dibe.

Dev ji gazîbûnê berde, gazî kesê ku serkeftin bi dest xistiye. Li holê gazî tune ne, birîndar bûye û dibêje: “Ez gazî me.” Her kesê ku birîndar bûye gazî be, wê demê PKK’yî hemû  gazî ne. Hinek kes parçe dibin, tu jî dixwî û vedixwî, tu şerm nakî. Wisa nabe. Piştî wê jî dibêje: “Ez gazî me, mafên min hene, nizanim ez ê çi bikim.” Tu yê çi bikî, li hemberî dijminê xwe bike. Lê dijmin tê jibîrkirin, xebat tên jibîrkirin û tên ji partiyê maf xwestin derdikeve pêş. Wek ku bi peymanan tevlî partiyê bûbe; personelê bi peyman e, heya cihekî hatiye û karê wî xilas bûye û nikare partîtiyê bike; ji ber vê divê mafê wî bê dayîn. Ne fedaiyek e, ne kadro ye jî; lê behsa gazîbûnê dike. Gazî kêsê ku serkeftinan bi dest dixe û di xeta serkeftinê de dimeşe ye. Şehîd, yên serkeftinê bi dest dixin û nûnertiya serkeftinê dikin in. Tu nakevî nav tu xebatan, tu bi karekî re mijûl nabî û piştî wê dibêjî: “Ez gazî me.” Gazi ye çi ye, em ê çi ji gaziyê wek te bikin? Çima ez van tişan dibêjim? Ji ber ku pir cidî ye, di ser şehîdbûnê re van tiştan bi pêş dixin.

Dema ku tesfiyegeriya 2002-2004’an derket holê, di serî de dest avêtin gaziyan. Ji wê derê dest pê kirin û xwestin jiyan û sekna kadro-tiyê berovajî bikin. Digotin: “Mafê we yê jiyankirinê heye; kar nekin, bila mafê jiyanê bidin we, bila we bizewicînin, bila ji we re malekê ava bikin.” Niha jî dibêjin: “Gaziyên ku jiyana xwe ya şexsî didomînin.” Qet gaziyên ku jiyana xwe ya şexsî didomînin, dibin? Dişibe gaziyên TC; ew jî dixebitin, meşan li dar dixin, dixwazin nîjadperestiya pergalê di nav civakê de belav bikin. Yên me wê jî nakin. Wisa nabe. Ev rewşeke dijber e, kes li hemberî vê dengê xwe jî dernaxe. Divê tu kes wisa nexebite.

Niha hinek gazî hene, parçeparçe bûne; ji Kobanê hatine, bi çi zehmetiyan me di ser Amedê re derbasî Behdînanê kirin. Hinek tedavi dîtin, lê dîsa pêsîra biryargehê girtine û dibêjin: “Ji xeynî Kobanê em naçin tu cihan.” Dîsa çûn Kobanê. Her cihê giyanê wî/ê parçe bûye, lê yê din tenê cihekî wî/ê birîn bûye û heya Ewrûpayê çûye; ji wan re dibêjin: “Gaziyên ku jiyana xwe ya şexsî didomînin.” Niha kîjan gazî ye,

maf û dadgerî li ku ye? Em vê bibêjin; pirsgirêkên bîrdozîk, ne ku wisa nayên zanîn û nayên dîtin in, zelal in; li ber çavê me hemû bi pêş dikevin, an em fêm nakin, an jî em wek ku fêm nakin didin nîşan û em bi rihetî jiyan dikin. Mesele em bi her cure dijbertiya partiyê re li hev dikin; li kêleka me jiyan dike, em hevaltî-hevrêtiyê pê re dikin, em bûne dost û yaren; ji ber vê em qet eciz nabin, bi rehetî nêzîk dibin. Wisa nabe; kadrotiya bi vî rengî û sekna partiyê bi vî rengî nabe. Pirsgirêkên kadro jî wisa derdikevin holê, wisa bûye ku pîvan li holê nemane.

Ger di dema nû ya derketina partiyê de bûya, dê me bigota, ‘nizanin, amatorî heye.’ Ji ber ku PKK hê di asta zarokatî û ciwantiyê de bû. Wê demê hinek kesan dikarî bibêje: “Ez nizanim, min fêm nekiriye.” Dikarîn bibêjin: “Em di bin bandora jiyana xwe ya kevn de mane.” Lê niha rastiya Serokatiyê; teoriya partiyê, şehîdan û gel ew qas zelal bûye. Rastiyeke tevgera me ya wisa heye. Berê, heya 77’an jî hevokek nivîs û teoriya vê tevgerê tune bû. Gotin çi ye? Tu yê bibêjî û derbas bikî, ji aliyê berdewamkirinê ve teqeziya wê tune. Lê niha wisa ye? Niha her tişt li holê ye, pir vekirî ye. Gel hemû berdêl dane ber çavên xwe û bi fedakarî tevlî meşa azadiyê bûye; lê ne diyar e ku pêşengên wî li ku ne. Dibêje: “Ez pêşeng im.” Lê pêşengtî tune, çîrokan dibêje. Dibêje: “Min filan tişt fêm nekir, min bêvan tişt fêm nekir.” Nêzîkbûn ew e. Aliyek bi hemû giyana xwe parçe parçe dibe; me berxwedana 14’ê Tirmehê dît, di rojiyên mirinê de dihelin, di êniyên şer de kunkunî dibin. Aliyek jî tenê diaxife: “Ez filan tişt im, ez bêvan tişt im.” Aliyê din çi dibe, qet ne xema wî ye. Divê qet nebe bibêje: “Ez rêz nîşan bidim, li gorî pêwîstiyên wê tevbigerim, bila ez zehmetî bikişînim; ger ez nikarim bibim hêza çareseriyê, qet nebe ez pirsgirêkan dernexim.” Lê ne wisa ye, derxistina her cure pirsgirêkan ji xwe re wek maf dibînin. Dibêjin: “Mirov dikare wisa jî bike.” Ew qas bê quraliyê dike, lê piştre hincetan ava dike. Bi vî awayî nayê qebûlkirin.

Ya rast, PKK ji aliyê bîrdozîk ve dema xwe ya herî zelal jiyan dike. Tu caran negihîştibû vê aste, tu caran li gorî xwe nebûbû xwediyê xeteke teorik-bîrdozîk ya bi vî rengî. Pîvanên kadrotiyê û milîtantiyê, bi pirtûka “Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk” gihîştin lutkeyê. Teorî û rêgezên wê, di wê derê de ne. Pratîka wê jî di nav têkoşîna ku li çar aliyên Kurdistanê bi xeta fedaî tê dayîn de ye. PKK, tevgereke fedaiyan e; kadroyên PKK’ê fedaî ne. Ferq û cudahiya di

navbera kadro û welatparêziyê de di vê derê de derdikeve holê. Tu fedaî yî, an na? An na armanca her kesî yek e, her kes ji bo azadî û demokrasiyê têkoşînê dide. Her kes bi xeta Serokatiyê ve girêdayî ye; ji vî aliyî ve di bîrdoziya kadro, sempatizan û welatparêziyê de cudabûn tune. Cudabûn di ku de ye? Di rêgeza jiyankirin û jiyandina vê bîrdoziyê de heye. Yek bi fedaîtiyê dike; yek jî bi fedakarî tevlî dibe, lê jiyana xwe jî didomîne, em ji wî/ê re dibêjin ne kadro ye. Lê niha ji yên ku jiyana xwe didomîne re, di nav me de jê re dibêjin: "Gazî, kadro." Ew qas şemitîn çêbûye. Konferansek jî wisa bi encam bûye. Wek ku tiştên pir xweş çêkiribin, wisa ji me re rapor nivîsandine. Wisa nabe. Em ne zarok in, em ne ehmeq in jî, da ku em van tiştan fêm nekin. Tevgereke ku di nav xwe de adaletê pêk neyne, qet nikare li derve pêk bîne; nikare avakeriya edaleta civakî bike, nikare mafperweriyê bike. Lê Serokatiyê got: "Dîroka PKK'ê, tevgereke lêpirsîn û dadgeriyê ye." Tevgera ku hemû bêmafiyan didarizîne û dikişîne xeta rast, niha ketiye vî halî.

Bala we kişandibe; ev rewş û sekna partiyê, civakê jî pir bandor dike. Tevgerên civakî û tevgera welatparêziyê çiqasî bandor kiriye. Mirov hene, hinek heft salî û hinek jî heftî salî ne; naxwin, venaxwin, jiyana xwe ya şexsî dane sekinandin û li ser sînorê Kobanê bi hefteyan û mehan di nav çalakiyan de ne. Em van wek welatparêz pênase dikin. Lê hinek jî hene em dibêjin: "Gazî-kadro." Kadro wisa nabe. Ev rewşeke bê cîdiyet e, ew qas jî zêde ye. Em ketine halekî bi vî rengî. Lê çima? Ev hemû ji dema tesfiyegeriyê tên, hê jî me nikariye bandorên tesfiyegeriyê ji ser xwe biavêjin.

Rast e, di nav têkoşînê de pirsgirêkên me yên bîrdozîk derdiketin. Heya salên 90'î jî bi awayekî derketin, lê wek Serokatiyê jî di nameya xwe de gotiye, ew demên amatoriyê bûn, dibe ku pirsgirêkên wisa derkevin. Lê piştî 90'î bi giştî di derbaskirina ezezîtiyê de, di daqurtandin û pejirandina tektîk, strateji û şêwaza partiyê de pirsgirêk derdiketin. An na di rêgez û pîvanên jiyanê de, di sekna kadro de zelalbûnek hebû. Piştî kompleyê hinekî sist bû. Serokatî di parêznameyên xwe de dibêje: "Dema ku ez hatim girtin, hinekên di nav me de cejn kirin û gotin êdî em ê xwe bidin jiyankirin. Qey xebera min ji vê tune." Rast e, wisa bû. Teoriyeke Ferhat hebû; digot: "Hê bandora kompleyê germ e." Piştî ku salek di ser kompleyê re derbas bû û îdam hate astengkirin

got: "Êdî sar bû, bandorek wî nema. Êdî em dikarin li gorî xwe jiyan bikin." Wisa got û bi zanebûn tevgeriya, her tişt bi hesab kir.

Hemû berovajîbûn û şemitînên pîvanan ku îro tên jiyankirin, di pêvajoya tesfiyegeriya 2002-2004'an de gihîştin lûtkeyê. Gav bi gav bi pêş ketin. Ew lewaziyên berê û kêmasiyên ku cih bi cih xwe didan der, di wê pêvajoyê de xwe rêxistin kirin. Komekê xwe anî asta tevgerekê. Niha jî me hê nikariyê bandorên wê derbas bikin. Bi rastî jî li hemberî tesfiyegeriyê di têkoşîndayînê de em lewaz in. Em li dahûrandinên Serokatiyê binêrin; tevgera gerîla di 84'an de dest pê kir. Lê dahûrandinên Serokatiyê di 87'an de, bi Akademiya Mehsûm Korkmaz dest pê kirin. Em li ser lêhûrbûnê bikin; li hemberî tesfiyegeriya wê demê, çiqasî dahûrandinên berfireh hene. Di tesfiyegeriya 2002-2004'an de me nikarî em vê bikin. Li ser vê pirtûk, an jî broşûrekî me heye? Gelo me karî em bibêjin; "Tesfiyegerî ev e, ew qas ne baş e, li dijberî partîbûnê ye, li hemberî tesfiyegeriyê rêgezên partîbûnê yên rast ev in." Ma me li ser vê tiştek nivîsandiye? Na, hê jî me nikariye em binivîsîn. Li hemberî tesfiyegeriyê, di têkoşîn û sekna bîrdozîk de em lewaz in. Ji tesfiyegeriyê qutbûn û di li hemberî wê têkoşîn meşandinê de em lewaz in. Em nerm nêzîk bûn, em bi sekneke naverastî (orta yolcu) nêzîk bûn. Bi îdarekirinê, rewşa tesfiyegeriyê her berdewam kir. Ji bo vê ji nû ve kombûn dereng û lewaz bû. Ji ber vê ji nû ve avabûn bi pêş nakeve. Ji ber vê daqurtandin û pejirandina paradîgmaya nû û li ser vî esasî ji nû ve rêxistinkirina partiyê dereng dimîne, bi pêş nakeve.

Ya rast, bandorên înkarkirinê hebûn. Ez dikarim hinek tiştan bibêjim. Divê em nebêjin pergala înkar û tunehesibandinê û em wisa seranser derbas nebin. Pergala înkar û bişavtinê, qirkirina çandî pêk tîne. Di navenda vê de jî şikandin û tunekirina zihniyetê heye. Tunebûn û windakirina zihniyetê, mirov ber bi înkarkirinê ve dibe. Di cewhera wê de çi heye? Xwe înkarkirin heye. Di zindanê de, li xwe mikurhatin (itirafçılık) spartin hevalên me. Li xwe mikur hatin çi ye? Wek mirov, wek Kurd, wek şoreşger, wek PKK'yî divê tu xwe înkar bikî. Cewhera li xwe mikur hatinê, ev e. PKK hebûneke wisa bi tirs dihat dîtin. Tesfiyegeriya 2002-2004'an înkarkirineke wisa bû. Ji ber vê li hemberî PKK'ê guman afirandin. Di vê pêvajoyê de Serokatî jî, ji bo guherîn û veguherîna bîrdozîk û nûbûnê, di PKK'ê de guherîna nav û guherîna paradîgmayê esas digirt. Di pêvajoya guhertinê de, hin valatî hatin jiyan kirin. Çawa ku bi careke re û wek ku ji ezmanan hatiye partî ava nebû,

bi vî rengî nehat guhertin jî. Me di pêvajoya komploya navnetewî de, guherîna paradîgmayê û guhertinên stratejîk kirin. Di encamê de çi bû? Di demeke wisa de hin valetî hatin jiyankirin û înkarî bi pêş ket.

Hevalên ku tevlî Kongra-Gel bûne dizanin; ma ji bo PKK'ê çi nedigotin… yên ku bîst-bîst û pênc salên xwe dane PKK'ê, ji bo PKK'ê pir heqaret dikirin. Xwîna mirov dicemidî. Mirov ew qas heqaretê li dîroka xwe dike, mirov ew qas êrîş dike? Lê kirin. Di pêvajoya amadekariya wê de, di sala 2003'yan de civînek çêbû; hinek rabûn, giriyan û gotin: "PKK'ê çi ji me kir, çi ji destê me girtin…" Serokatî dibêje: "Ya rast hûn vê ji min re dibêjin; 'te ciwantiya me ji destê me girt, em ê jî tola xwe ji te bigirin." Ev tiştên ku em dibêjin, ne dibêtî ne; hemû hatine jiyankirin. Hem jî bi mehan û bi salan, di hemû astan de hatin jiyankirin. Ji ber vê bi guman li mêzekirina PKK'ê heye. Digotin: "Dê bi PKK'ê bibe, an na? Bi PKK'ê meşîn dibe, an na?"

Em li vê derê tiştekî din bibêjin; Nasuh Mîtap hebû, van rojên dawî jiyana xwe dest da, yekî ji Dev-Yol'ê bû. Di navenda ewil ya Dev-Yol'ê de yekî bi navê Taner Akçam hebû; di 77'an de hate girtin, piştî wê ji zindanê reviya û derbasî Ewrûpayê bû. Piştî cuntaya leşkerî, di 81'ê de wî Dev-Yol li derveyî welat temsil dikir. Dema ku Nasuh Mîtap û rêvebirên din yên wê tevgerê hatin girtin, me "Li Hemberî Faşîzmê Eniya Yekgirtî ya Berxwadanê" ava kir. Di navenda vê êniyê de PKK û Dev-Yol hebûn. Salekê berdewam kir; PKK vegeriya welat, lê wan gerîlayên xwe girtin û çûn Ewrûpayê. Têgeheke wî ya balkêş hebû, ez ji ber vê qalê dikim. Di 83'yan de dema ku Taner Akçam xwe diparast, wisa digot: "Em ê çawa tevgereke wek PKK'ê ku wek kevirekî aş e, li stûyê xwe daleqînin û bikevin Tirkiye." Ji ber vê, hatina wî ya gel PKK'ê li ser esasê peywirekê bûye. Ji bo ku ji hinek derdoran, îmkanan bi dest bixe hatiye. Ev piştre eşkere bû. Dema ku dibêje: "Em çawa tevgereke wek PKK'ê ku dişibe kevirê aşan bixin stûyê xwe û bikevin Tirkiye?" Ango dibêje, di demeke ku me bi PKK'ê re êniyek ava kiriye de, em ê çawa bikevin Tirkiyeyê. Ev mesele girîng e.

Di dema tesfiyegeriya 2002-2004'an de jî, bi awayekî eşkere û veşartî, bi zanebûn û bêzanebûn me jî digot: "Êdî bi PKK'ê nabe, PKK'ê rista xwe ya dîrokî temam kir û dema PKK'ê derbas bû. Jixwe ji PKK re dibêjin 'tevgera terorê' û di vê cîhanê de bi PKK'ê jiyan nabe." Em hatin astek wisa. Înkarkirineke pir mezin derket holê. Di vê tesfiyegeriyê de îxanet û înkarkirin di vê astê de bû. Êdî em ji nav, giyan û rêgezên

PKK'ê tirsiyan; me her tiştê wê lêpirsîn kir. Her tiştê ku me heya demekê wek hêzeke îlahî didît, vê carê jî me lêpirsîn dikir û em bi guman nêzîk dibûn.

Angaşta min ev e; ev pir zêde hat jiyankirin. Ji ber vê hê li gelek cihan nabe qala PKK'ê bikin, ditirsin. Êdî em dibêjin: "Partî." Em nerm dikin. Gelek partiyên din ku di nav PKK'ê de hatine avakirin jî hene, kîjan partî? Mesele konferansên kadroyan çêdibin; kes nabêje: "Kadroyên PKK'ê." Wê demê kadroyê çi ye? Êdî xwedê dizane. Dibe ku kadroyê filan çiyayî û bêvan darê be. Kadroyên her rêxistin û saziyê hene; ji ber ku rêgez û pîvanên wan hene. Ji yên ku van pîvan û rêgezan esas digirin re, kadro tê gotin. Konferansên kadro, ne konferansên partiyê ne, ne konferansên PKK'ê ne. Hê jî ev tişt tê jiyan kirin. Em li xwedîderketina PKK'ê; em bi nav û rêgezên wê lê xwedî derketinê, bi awayekî kûranî girtina dest û jiyanîkirina wê ditirsin. Serokatiyê, di "Parastina Gelekî" de û di parêznameya dawî de rêgez bi awayekî vekirî danîn holê. Lê ruxmê vê jî hê em wisa ne; nêzîkbûnên ku rêgezan sist û şîlo dikin, berdewam dikin.

Ji bo ku ji êrîşên derve biparêze, Serokatî car caran navê PKK'ê dernexist pêş. Mirov vê fêm dike; nêzîkbûnên polîtîk bûn, di demên derbasbûnê de wisa kir. Armanceke Serokatiyê heye, li ser wî esasî û bi qasî ku xizmetî wê armancê kir, Serokatî ev kir. Lê ev rewş, di nav me de gihîşt cihekî çawa? Zivirî ferasetekê. Me got: "Ger Serokatî wisa dibêje, divê em jê dûr bisekinin." Jê dûrketin hate jiyankirin. Ne ku hincetên vê jî tune ne; Almanya ji ber ku ala PKK'ê rakir ji parlementerekê re lêpirsîn da dest pê kirin. PKK'yî bûn; wêrekiyê dixwaze, dilekî ji pola dixwaze, fedakariyê dixwaze. PKK, tevgereke fedaiyan e û ji bo ku mirov bibe PKK'yî jî divê sedî sed mirov fedaî be. Wisa nebûn, ji feadîtiyê dûrketin; ji dûrketina nav û cûseya PKK'ê derdixe holê. Tu dikarî ji rêxistineke cuda bî; mînak yên DBP'î li Ewrûpayê hevdîtinan dikin, lê ger tu PKK'yî bî, tu yê bikevî zindanê. Ger tu parlementer bî jî; dê mafên te yên parlementeriyê ji holê rakin û te bidarizînin û bixin zindanê. Ji ber vê yê.

Çima ew qas ji partiyê direvin? Divê em vê bibêjin; beriya komployê her tişt li ser navê partiyê dihat kirin. Serokatiyê dimeşand; vîn, nav û dengî, îtîbar û rûmet hemû bi navê PKK'ê bû. Yên ku ne PKK'yî ne jî, dema ku diketin zindanê digotin: "Em PKK'yî ne." Lê niha rewş guherî, yên PKK'yî ne jî, ji PKK'ê direvin. Nasnameya xwe vedişêrin û

xwedî lê dernakevin. Bi navê PKK'ê jiyan nakin, xebat nakin; ger wisa bibe dê pîvan û rêgez jî bişemitin. Ger tu li gorî çi bixebitî û jiyan bikî, dê sekna te jî li gorî pîvan û rêgezên wê nasnameyê be. Ger tu ji xwe re nebêjî kadroyê PKK'ê, wê demê tu nikarî li gorî pîvanên PKK'ê bî jî. Nikarin bibêjin. Yên ku dibêjin: "Em kadroyên PKK'ê ne" nîn in, an jî pir kêm in. Balkêş e, ji vê revek heye. Teqez bandorên tesfiyegeriyê ne, ne tiştekî din e.

Ruxmê ku deh sal di ser re derbas bûne jî, bandorên tesfiyegeriya 2002-2004'an hê jî berdewam dikin. Em nikarin mesafeyê bixin navbera xwe, me nikarî li hemberî wê tesfiyegeriyê têkoşîn bikin, me nikarî em wê tesfiyegeriyê têk bibin. Lê Serokatiyê hemû kirin, li gorî Serokatiyê niha her tişt zelal e. Carinan dibêje "Ez PKK'yî me" carinan jî dibêje "Ez KCK'yî me." Li gorî rist û dema wê nasnameya xwe diguherîne. Li hemûyan jî xwedî derdikeve. Lê yên ku li hemberî tesfiyegeriyê radibin wisa dikin, yên ku li nasnameya xwe xwedî derdikevin wisa dikin. Yên ku li nasnemaya xwe xwedî dernekevin û li hemberî tesfiyegeriyê têkoşîn nameşînin jî, dê jê birevin. Yê ku bireve, dê hemû cudabûnan nîşan bide.

Çima ez van dibêjim? Çima di demeke wisa de xirabûnên bîrdozîk û nêzîkbûnên ji derveyî rêgez û pîvanan derkevin? Divê nebin. Bibe jî divê pir kêm bin, îstîsna bin. Lê dijberî wê pir zêde ne. Bingeha xwe ji vir digire. Ez ji bo ku sedama wan îzah bikim, van tiştan dibêjim. Ji PKK'yî bûnê rev heye, ji PKK'yî bûnê qutbûn heye, PKK'yî bûna xwe înkarkirin heye. Taner Akçam got: "Bi kevirekî aş yê wek PKK'ê re siyaset nayê kirin." Hê jî bandorên Taner Akçam hene. Her çiqas em ferq nekin jî, kêm be jî di mejî û dilê me de hene. Wan eşkere gotin, lê em veşartî jiyan dikin. Divê di vê mijarê de em vekirî bin, divê em her tiştî bi awayekî zelal û eşkere bînin ziman. An na ya din ne gengaz e.

Binêrin, ciwanekî/e ku qet PKK'ê nas nake û tenê bi sempatiya gerîla tevlî bûye jî; tê û tu xeletiyan nake.  Pêwîst nake ku bên vir jî; li Botanê tevlî dibin, li Dersîmê tevlî dibin. Raporên hevalên 20-25 salî tên; seknên li wir wisa rexne dikin ku… dibêjin: "Nizanim pîvanên rêxistinî çi dike, dijberî partiyê ye, tevgerên wî/ê li derveyî partîbûnê ye." Mirov dibêje: "Qey pênc salan bi Serokatiyê re jiyan kiriye." Lê hê bixwe pazdeh salî ye. Lê PKK'ê nas dike, dizane. Naskirina PKK'ê ne wisa zehmet e. Yên ku ji Bakur tevlî bûne, gelek raporên wan di destê me de ne; tiştên ku em dibêjin ne nepixandin e, ez tiştên ku di nav

rêxistina me de tên jiyankirin dibêjim. Ew ciwan van tiştan dibînin; lê kesên ku pazdeh-bîst sal in di nav tevgerê de ne û ew qas perwede dîtine, vê nabînin? Dibînin. Wê demê, bizanebûn şaşîtiyan dike. Bi aweyekî zanebûn dijbertiya partiyê dike. Kes nikare bibêjê: “Min bê zanebûn kir.”

Bizanebûn tê kirin. Çima bi zanebûn ev tişt tên kirin? Gelo yên ku wisa dikin, pêwîst nake ku birevin? Divê birevin. Hem wisa dike û hem jî di nav me de disekine. Çima? Ji ber van sedemên ku me dane diyarkirin e. Ji bo ku em ji van pirsan re bibin bersiv, em dikarin van tiştan diyar bikin. Çima wisa dike? Ji ber ku înkarkirin heye. Ya rast xwe di nasnaneya PKK’ê de îkna nekiriye, li derve jî nasekine. Bernade û naçe. Ji ber vê înkarî heye. Ditirse, bi xof e, wek tesfiyegeran ew jî dixwaze PKK’ê biguhere. Ne wek xwesteka Serokatiyê, vê guhertinê wek xwesteka pergalê dixwaze. Ji ber ku dixwaze bi pergalê re li hev bike û bikeve nav pergalê. Dixwaze ji fedaîtiyê qut bibe û xwe bide jiyankirin. Sedemeke cuda tune, divê em vê bizanibin. Ji ber vê divê em feraseta xwe ya partiyê şênber bikin. Ev ne rewşeke rêxistinî ye, ev rewşeke bîrdozîk e.

Girîngiya PKK’ê, bi jiyankirina nasnemeya partiyê û li xwedîderketina wê gengaz e. Ger tu wisa nêzîk bibî, tu yê rêgez û pîvanan biparêzî. Wek ku Misilman her roj, bîst û çar seatan dibêjin “Xwedê, Xwedê” dê tu jî bibêjî “PKK, PKK” tu şaşîtiyan nakî. Ger wisa bibe şaşîtiyên rêgezî û pîvanî nayên kirin. Lê tu wisa nebêjî, tu yê şaşîtiyan bikî. Dev ji bîst û çar seatan gotina PKK’ê jî berde, ger tu ji her tiştê PKK’ê fikaran bikî û her tiştê wê lêpirsîn bikî, tu yê şaşîtiyan bikî. Divê em vê bizanibin; li hemberî PKK’ê êrîşên derveyî pir zêde ne. Dibêjin: “PKK êrîşî her kesî dike; rexne dike, lê dixe û dişkîne…” Tiştekî wisa tune, dijberî wê her kes êrîşî PKK’ê dike. Ji ber ku ew qas êrîş hene, bixwazî nexwezî ev êrîş me bandor dikin. Jixwe êrîşên tesfiyegeriyê li me pir bandor kir. Ji derveyî wê jî pergal rojê bîst û çar seatên êrîş dike. Ji bo reşkirina rêgezên PKK’ê; têgeh û gotinên ku qet nayên bîra mirov, gotinên ku mirov neyne ser zimanê xwe bi pêş dixe. Ew bandor dikin; di bin van êrîşên dijwar de, ji PKK’ê gumankirin, tirsîn û revîn heye.

Serokatiyê got: “Gumankirina ji sosyalîzmê; gumankirina ji mirovahiyê, ji civakbûna mirovahiyê ye.” Çawa ji sosyalîzmê rev çêbû? Têkçûyîna sosyalîzma pêkhatî gumaneke çawa ava kir? Rev ava kir,

guman ava kirin. Dema ku li Moskowayê pergala wê ruxiya, ji her tiştê wê guman kirin û her tiştê wê hate lêpirsîn kirin. Niha jî yên dibêjin: “Em PKK’yî ne” ji PKK gumanan dikin. Ji rêgez û pîvanên wê guman dikin. Dibêjin: “Gelo em sûç dikin, em şaşîtiyan dikin?” Hemû rêgez, pîvan û şêweyên modernîteya kapîtalîst û civaka kevneşop ku di mejî, dil, fêrbûn û nêzîkatiyên me de hatine çandin; em ber bi lêpirsîna her tiştê PKK’ê ve birin. Cihê ku em li PKK’ê xwedî derkevin û bi rêgezên PKK’ê pergalê lêpirsîn bikin; berovajiyê vê dibe. Ew êrîşeke psîkolojîk e, êrîşeke bîrdozîk e, êrîşeke şerê taybet e. Di navenda şerê taybet de, êrîşên psîkolojîk hene. Di belgeya MÎT’ê ya şerê taybet de jî ev hene. Qaşo saziya herî baş ku pirsgirêka Kurd çareser bike ye; wisa digotin: “Dixwaze pirsgirêka Kurd çareser bike, an dixwaze PKK’ê çareser bike?” Em dikarin ji belgeyên wê fêm bikin. Şerekî psîkolojik yê pir mezin heye; pir bi plan e, pir bi zanebûn e û pir bi bandor e. Ger mirov xwe baş û rast perwerde neke, ger mirov xwe her di bin venêrîneke rêxistinî de negire; ne gengaz e ku mirov ji vî şerê psîkolojîk bandor nebe. Ji ber ku bandorên şerê psîkolojîk hene.

Sekn û ferasetên ku li dijî partiyê hene, bi van bandoran çêdibin. Wisa be, çi pêwîst dike? Ji bo ku mirov bikaribe milîtanekî partiyê, her di xeta bîrdozîk ya partiyê de bimîne û bimeşe; divê mirov li hemberî van êrîşan her di nav têkoşîneke bîrdozîk-rêxistinî de be. Divê mirov pir zêde rêxistinkirî be û mirov pir zêde bi danehev be. Divê mirov têkoşîna çînî û cînsî her bi pêş bixe û kûr bike. Bêyî vê nabe. Ger têkoşîna bîrdozîk û têkoşîna xetê timî neyê meşandin, dê şerê psîkolojîk di nav rojekê de me daqurtîne. Ji ber vê li cihê ku têkoşîna bîrdozîk kêm e, an jî tuneye bandorên şerê psîkolojîk pir zêde ne. Êrîşek dijber e, me bandor dike û araste dike. Bereya me jî, diyar dike. Bi demê re me tîne asta gumankirina ji PKK’ê. Em dibêjin: “Gelo em şaşiyan jiyan dikin, gelo ev PKK bi rastî jî dibe ku xetere û şaş be?” Herî kêm em dibêjin: “Gelo dema van derbas nebû?” Ji wê jî zêdetir, dibêjin “Em bi hemû cîhanê re di nav şer de ne. Ma mirov li hemberî hemû cîhanê dikare wisa şer bike? Gelo wisa jiyan dibe? Em dijberê hemû cîhanê ne, gelo em li gorî pîvanên cîhanê bin baştir nabe?” Bi ya min, heval dikarin zêdetir lêhûrbûn bikin û lêpirsîn bikin; em dikarin zêdetir eşkere van tiştan nîqaş bikin.

Pêwîst nake em wek ku van tiştan qet tune ne tevbigerin. Pêwîst nake ku em ji nedîtî ve bên. Çima? Ji ber ku ger wisa nebe, sererastki-

rin çênabe. Ger em niha wisa nekin, em nikarin van xirabûnên bîrdozîk, feresat û nêzîkbûnên derveyî xetê fêm bikin. Divê ew qas nebe, lê çima dibe? Ji ber van sedemên ku me daye diyar kirin çêdibe. Wisa be, em di bin êrîşeke pir mezin de ne. Ger niha em li hemberî wê têkoşîn nekin, em daneheva xwe zêde nekin; bêguman gelek şemitînên rêgez û pîvanan çêbibin. Dema ku ew tişt derketin holê û hatin jiyankirin, em ê jê bandor bibin, şaşîtiyan bikin û ji aliyekî şaş ve biçin. Jixwe ev tişt dibin. Em nikarin bên gel hev, em hev û din guhdarî nakin, em nikarin bibin rêxistineke rast, em nikarin fikrên xwe bi pergal bikin, em nikarin hestên xwe rêxistin bikin, di rih de em nikarin bilindî û kûrbûnê biafirînin, em nikarin mirovan bikişînin cem xwe. Serokatiyê got. "Kadroyek, kesê ku xwe dike şekir-şerbet û bi dora xwe dide vexwarin e." Dev ji şekir û şerbetê berde, em dibin dirî û em giyana mirovan didirînin. Herî zêde jî em giyana hev didirînin; wisa be pêwîstî bi dijmin tune, diriyên me têra tunekirina hev û din dike.

Dema ku mirov hate rewşeke wisa, ne gengaz e ku mirov li ser piyan bisekine. Ne gengaz e ku mirov rêxistinê rast bi rê ve bibe û sekneke rast ya bîrdozîk nîşan bide, ne gengaz e ku mirov li hemberî dijmin têkoşînekê bimeşîne. Pêwîstî bi dijmin tune. Jixwe dibêjin: "Kurmê darê ji darê ye." Ya me jî wisa dibe, jixwe em hêz û enerjiya xwe dihelînin. Cihê ku em hev û din bi hêz bikin, em mil bi mil bin, yek bin û peywirên mezin pêk bînin; em hev û din vale derdixin û bi bin dixin. Wê demê pêwîstî bi dijmin namîne. Jixwe serneketina xwe, em bi xwe diafirînin û piştre jî em dizivirin û dibêjin: "Em çima ne serkeftî bûn." Bi vî şêwazî em çep û rastê xwe sûçdar dikin. An em hinekên din gumanbar dikin, an em binkeftinê wek serkeftinê nîşan didin, an jî em dibêjin "Tenê ew qas dibe. Ji vê zêdetir nabe. Tiştekî nû nabe." Ev tişt wek nexweşiyên cur bi cur derdikevin holê.

Nebûna rêxistin, hev û din guhdar nekirin, xwe nekirina rêveberî, nezivirîna hêzeke biryarên hevpar digire û pêk tîne, ezezîtî, keyfiyet, li gorîxwebûn, xwe spartin, xwe paşvekişandin, berovajîkirina rastiyan, ketina lêgerîna jiyana ji rêzê heye. Ji wê jî zêdetir, her şaşîtî di kesê/a li hemberî xwe de dîtin, çavê xwe kirina çavên wan heye. Hin parzemînên wisa hene ku tu kesî guhdarî nakin. Partiyî guhdarî nakin. Cihê ku partî ji her tiştî re pêşengtiyê bike, rêxistinê li her cihî bide pejirandin, sekna bîrdozîk bi pêş bixe, civakê wek netewa demokratîk rêxistin bike; li tu cihan tuneye. Kesa/ê ku hev û din guhdarî dike, fêm dike tuneye.

Ger hinek derfet û bi nav û dengî tune be, li vê partiyê tu kes namîne; dê her kes xwe li cihekî wek PKK'ê îlan bike. Lê niha partî hê li ser piyan e; Serokatî li ser piyan digire. Ji ber vê ditirsin, ger niha wisa bikin, tu marîfe-

teke wan namîne, dê tiştên di destê wan de ne jî biçin, dê bi bin bikevin. Ji bo ku nekevin rewşeke wisa îdare dikin, wek ku pêk tînin nîşan didin. Wek feraset bi partiyê re nabin yek, lê jê qut jî nabin. Ruxmê ku ew qas pîvan û ferasetên cuda hene, çima ji partiyê qut nabin û naçin? Ji ber van sedeman e. Ger partî lewaz be; ji bo ku derfetên wê, bi nav û dengiya wê parve bikin û xwe li ser jiyan bikin, tiştekî ku nekin namîne. Tu şerê ku nekin namîne. Ger rewşeke wisa derkeve holê, ev tiştên ku em dibêjin jî gengaz in. Tu sedemên vê yên cuda tune; ev hemû ji ber pirsgirêkên me yên bîrdozîk û partîbûnê ne.

Bi rastî jî di parzemîneke ku bîrdoziya partiyê ew qas zelal bûye, guherîna paradîgmayê hatiye kirin, li ser esasê komînalîzma demokratîk Serokatiyê ew qas rastiya partiyê ew qas zelal û şênber kiriye; jiyankirina nêzîkbûnên derveyî partîbûnê ji ber van sedeman in. Pirsgirêkeke bîrdozîk ya partiyê tune, tenê pirsgirêka bîrdoziya partiyê ya gûftogokirina bûyerên pêk tê heye. Jiyana partiyê ya herî zindî ye; ji aliyê paradîgmayê ve, wek xeta siyasî û bîrdozîk, wek plansaziya stratejîk û tektîkî; partî di dema xwe ya herî xurt û zelal de ye. Em di pêvajoyeke ku partî dahûrandinên herî kûr û berfireh dike re derbas dibin. Pirsgirêk ji ber kadroyê ku dev ji ezezîtiya xwe bernade; kadroyê ku bi van taybetmendiyên partiyê re nabe yek û jê dûr disekine; kadroyê ku rewşa partiyê têra xwe fêm nake û napejirîne; kadroyê ku pir zêde di bin bandora pergalê de dimîne ye.

Di vê mijarê de, pir zêde hestiyarî heye. Her wiha fanatîzma ku fedaîtiya xwe ji pîvanên bîrdozîk-rêxistinî qut kiriye heye. Ev nêzîkbûn jî di nav me de rexne û rexnedayînê lewaz dike. Li hemberî ferasetên wisa bi riya rexne-rexnedayînê têkoşînkirinê lewaz dike. Pêşî li vê digire û dixitimîne. Ev rewş di van demên dawî de zêdetir bûye. Dema ku tu yekî/ê hinekî rexne dikî, hema dibêje “Ez dixwazim biçim filan cihî.” Ger em li vir bibêjin, dibêje “Ez dixwazim biçim Behdînanê.” Ger tu li Behdînanê rexne bikî, li wê derê jî dibêje: “Ez dixwazim biçim Botanê.” Çima? Ji ber ku dibêje: “Ez wisa dixwazim û tu nikarî min rexne bikî.” Vê jî wisa li nav çavên te dixin. Lê belê her şervanê ku tevlî HPG’ê bûye, jixwe ji bo ku bikeve nav her şerî sond dixwe. Vê jî wek pîvanekî pir mezin be derdixin hemberî pîvan û rêgezên partiyê. Hemû nêzîkbûn û ferasetên bi vî rengî; jirêderketin in, hem jî jirêderketinên bîrdozîk in; divê mirov li hemberî van baldar be.

**Aliyê Herî Girîng Yê Perwerdeyê Têkoşîna Rêxistinî û Bîrdozîk e**

Wek pirsgirêkên kadro, divê mirov hinekî li ser pirsgirêkên rêxistinî û birêvebirinê jî bisekine. Bi vî awayî pirsgirêkên me yên sekna bîrdozîk derdikevin holê. Bi rastî jî wêrekî û fedakariyeke pir çor heye, ziravî tune. Têkoşerî rast û rast e, teng e; ne dewlemend û kûr e. Welatparêzî bi sînor e; ne ku qet tune, lê lewaz e. Di sekna şoreşa demokratîk de, di civakbûnê de pirsgirêk hene. Ezezî pir zêde ye; bi jiyana komînal, tevlî xebatên kolektîf bûn pir kêm e, di vê mijarê de kêmasiyên me pir zêde ne. Ji aliyekî ve bê perwerdebûn pir zêde heye; bi taybetî di civak û ciwanan de bê perwerdebûn pir zêde ye. Bandorên şerê psîkolojîk li ser gel û kadro pir zêde hene. Rewşên ku ji partiyê guman dikin, ji rêgez û pîvanên partiyê guman dikin hene.

Bi giştî îstîkrarî tune, wek ferasetekê di tevlîbûna têkoşîna şoreşê de seqetî hene. Çawa? Ji aliyê herî baş ve, şoreş wek deshilatdariyê girtina dest heye, ev jî xwedî derfetî ye. Dema ku wisa bi hêsanî nikaribin bibin deshilatdar jî, car caran dibêjin: “Dê kêngê ev şoreş bibe?” Wek ku bibêjin; bibûya û em rizgar bûbana. Bendewariyeke wisa heye. Cihê ku bibêjin: “Pirsgirêk hene, peywir hene û em van bînin cih. Pirsgirêkên civakê, pirsgirêkên civakî me jî eleqedar dikin.” Dikevin bendewariyê. Berê ji pergalê qutbûn, ji jiyana berê qut bûn; bûna deshilatdariyê bû. Dema ku rewşa bûna deshilatdariyê ji holê rabû; ji pergalê qutbûn jî lewaz û sînordar bû. Cihê ku ji pergalê qut bibin; gotin: “Dê ev kar kêngê xilas bibe, da ku em vegerin pergalê.” Ev bendewarî pir zêde ye û cihekî wê yê ku nayê fêmkirin jî tune. Tê wateya qutnebûna ji pergalê. Ne ku PKK’ê ev, wek teorî îzah nekiriye; ne ku ji aliyê polîtîk ve bi bername nekiriye; ne ku di pratîkê de nezivirandiye têkoşînê; ev hemû hene. Lê pejirandina van tune, bi xwestek tevlîbûna van tuneye. Tiştê ku pir zêde û wek xetere tê dîtin ev e. Dibêjin: “Cihê van tiştan; wek şoreşa berê, dê şoreşek pêk were û em jî rizgar bibin, em jî vegerin malên xwe, em jî vegerin ya berê.” Ango ji parzemîna berê qutnebûn heye.

Di welatparêziya civakê de jî lewazî çêbûne, rewşeke balkêş e. Hêrî zêde malbat û derdorên kesên bi partiyê re têkiladar in, ji partiyê dûr disekinin. Di rewşeke ku ji partiyê maf dixwazin de ne. Cihê ku herî zêde ew partiyê rast fêm bikin û têkoşîna partiyê bidin, tam dijberî wê tevgerîn çêdibe. Yên ku partiyê rast fêm dikin jî hene, lê pir kêm in. Bi piranî ji partiyê dûr disekinin; zarokên xwe dişînin cihên dûrî partiyê.

Bav û dayikên ku zarokên xwe (qesta me ne zarokên biçûk in) dişînin Pirsûsê û bixwe li Kobanê şer dikin hene. Li Botanê binêrin; dema ku hinekî şer çêdibe, hinek kes hene, qaşo welatparêz in; hema zarokên xwe dişînin metropolên Tirkiyeyê, dişînin Stenbolê. Bixwe jî li êniya pêş, li Mexmûrê di nav şer de ne. Mesele li Mexmûrê çima li gorî pîvanên PKK'ê pergalek nayê avakirin? Ji ber ku li Mexmûrê, jixwe yên tevlî partiyê bûne hene, yên mayî divê tevlî nebin. Çima? Ji ber ku êdî PKK ne li gorî her kesî ye, di PKK'ê de jiyan tune; hinek avêtine nav PKK'ê, qurban kirine, yên din jî dûr disekinin. Jiyan li derveyî PKK'ê tê dîtin. Wisa fêm dikin û wisa tevdigerin. Ji ber vê bi hêsanî direve pergalê.

Xizmetê pergala PDK'ê dike, lê nayê jiyana ku bi pîvanên PKK'ê tê honandin, nakeve nav pergaleke wisa. Dema ku sekna me ya rêxistinî hinekî teqez nebe jî, ev rewş zêdetir bi pêş dikeve. Her kesî digot: "Qey PKK li Mexmûrê tê jiyankirin." Lê herî zêde li Mexmûrê ji PKK'ê revîn çêdibe. Milîsên Botanê, hê jî milîs in. Lê her yekî/ê wan 15-20 zarokên wan hene û gihîştine salên 25-30'î, lê ji bikaranîna çekan jî fêm nakin. Dema ku tiştekî herî biçûk biqewime jî, hemûyan didin revandin. Di têkoşînê de tunene, nakevin nav. Li cihê wan bavên wan peywirê dikin. Zihniyeteke wisa bi pêş ketiye. Bêguman ev tişt; bi pêşengtî, xebat, rêxistinbûn û danasîna partiyê ve jî girêdayî ne. Dema ku ez van tiştan dibêjim, ne ku ez dibêjim sezayê wan e; ez ji aliyê ferasetê ve vedikim. Me nekariye ku em vê ferasetê bişkînin. Wisa be yan em jirêderketinan jiyan dikin, an jî ew jiyan dikin. Rewşeke wisa heye.

Ev welatparêziya lêwaz nîşan dide; ya rast ji serkeftina têkoşînê bawernekirinê îfade dike. Tenê ji bo ku bibêjin fedekarî kiriye, hin zarokên xwe didin. Lê çawa? Wek ku pereyan dide, wan ji çavê xwe derdixe. Welatparêziyeke wisa heye. Rewşa heyî bes tê dîtin û dibêjin: "Ew qas têra min heye." Bawerî bi serkeftinê tune, bawer nakin ku dê li wê derê serkeftin çêbibe, dê li wê derê jiyaneke nû bê avakirin; feraset, zanebûn û nêzîkbûneke wisa tune. Ev rewşeke cidî ya bîrdoziyê ye, lewaztiya welatparêziyê ye. Ji ber vê em nikarin bi çalakiyên encamgir ku pêrgalê biruxînin, li dar bixin. Ne gerîla dikare bike, ne jî qada serhildanê dikare bike.

Ciwan jî parçe bûne; hinekên wan fedaî ne û tên çiyan, hinekên wan radibin serhildanê û karên heyî îdare dikin, hinekên wan jî ji me dûr in. Rûyên xwe dirêj dikin û li holê digerin. Niha biçin û li metropo-

lan bigerin, ger hûn kesên ku rûyên xwe berdane bibînin, bi pêsîra wan bigirin; an Geverî ne, an jî Cizîrî ne. Ne ku em van tiştan nizanin û fêm nakin; em ne ehmeq in jî. Em di rewşeke ku her tiştî bizanibin û fêm bikin de ne.

Bi vî awayî bûne hevkarên pergalê. Demekê di çapemeniyê de derket, hewl dan ku wek ciwanên zanîngehê yên Cizîrê xwe rêxistin bikin; lê me mûdexele kir, me got: “Wan biqewitînin.” Piştre çi bû nizanim. Ez dixwazim çi bibêjim? Ew cih, cihên wisa lê têkoşîn û fedekarî heye ne; lê têkoşîn heya cihekî ye. Hinekên wan wisa parçe ne, hinekên wan jî li gel dijmin in. Jinek radibe û dibêje: “Zarokekî min li çiyan e, yek jî leşker e û her du jî baş in.” Bi xwe jî dikeve nav her serhildanê. Dibe ku ew kurê xwe yê leşkeriyê bê û wê gulebaran bike, lê ne di ferqa wê de ye. Ji vî aliyî ve welatparêziya lewaz heye. Ew tişt bandor dikin, sekna kadro û tevlîbûnê bandor dike. Li ser sekna bîrdozîk bandor dike. Ev hemû bingeha xwe ji bîrdoziyê digirin, civak hê ji aliyê bîrdoziyê ve ji pergalê qut nebûye.

Serokatiyê gelek caran got: “Kurd ji pergalê qut bûn, veqetîn.” Ya rast xwest bibêje: “Divê wisa bibe.” Lê ji pergalê qutbûn bi lewazî bi pêş ket. Tu Geveriyan bikûjî jî, tu nikarî wan ji Stenbol û Ewrûpayê qut bikî. Jixwe girêdana Kurdan ya Stenbolê pir balkêş e. Hêjayî nirxandin û lêkolînê ye. Ew eleqe ji ku hatiye, me pir zêde fêm nekir. Dibe ku di encama qirkirina navendî ya emperyalîzmê de çêbibe. Lê li gel me, bi awayekî dîtir li Stenbolê mêze dikin. Hinek kesên sist û pist hene, ji wan re dibêjin: “Zarokên Stenbolê.” Ger Stenbolê bibînin, dê tevzên xwe pê bikin. Lê li Kurdistanê ne wisa ye. Berê yekî Amedî hebû, destê xwe li masayê xist û got: “Ger em ê bi pasaportê bikevin Stenbolê, ez Kurdistaneke wisa naxwazim; dê ez ê bibim Stenbolî, baştir e.” Dema ku di navenda şoreşgeran de nîqaşa Kurd û Kurdistanê hebû; li Fequlteya Zanistên Civakî ya Enqerê ev tişt gotin. Tiştên wisa hebûn, lê li hemberî van rexne tunebûn.

Serokatiyê rexne dikir û ya rast datanî holê, sererast dikir. Ji bo ku dengê Serokatiyê qut bikin û yên wisa nayên rexnekirin, qomplo bi pêş xistin. Bala we kişandibe, piştî wê tu rexneyên ku tên ser civakê tune ne. Ew qas mirov çûn metrepolan. Dîsa Serokatiyê di nîşeyên hevdîtinan de got. “MÎT dibêje, ‘piştî salên 90’î 3-4 milyon kes hene ku ji Kurdistanê koçî Îzmîr û Stenbolê kirine.’” Girêdana wan ya welat ne xurt e, pir zû dikare qut bibe. Her wiha li Ewrûpayê jî wisa tijî bûye. Çima ez

van tiştan dibêjim? Ji ber ku kadro bandor dike, çawa? Di têkoşînê de bi îstîkrar nebûn û gotina: “Dê kengê şoreş bibe û em ê vegerin ya kevn.” Ji ber vê ye. Ango ji ber vê bi şoreşê ve nebûna yek û li ser esasê armancê tevlînebûna Serokatiyê çêdibe. Ev, wek pirsgirêkên tevlîbûnê derdikevin holê. Li gorî xwe tevlîbûn, li gorî xwe şoreşgertî, li gorî xwe kadrobûn derdikeve holê. Dê bi qasî ku dixwaze kar bike; ji ber ku di asta evînê de bi demokrasi û azadiyê ve ne girêdayî ye. Wê wek tiştekî ku jêveneger nabîne, ji bo serkeftina wê xwe bi giştî tevlî nake. Girêdana wî/ê her wek derziyeke zirav e, her dem ji qutbûnê û firînê re amade ye; girêdaneke lewaz heye, tevlîbûn û girêdaneke memûrwarî heye. Ew tişt, di pratîkê de tên jiyankirin.

Ev hemû pirsgirêkên perwerdeyê ne û ger bi têkoşîna bîrdozîk nayên sererastkirin, partî li holê namîne. Hebûna van tiştan, tunebûna yekîtiya bîrdozîk nîşan dide, jiyannekirina homojeniya bîrdozîk nîşan dide. Tevlîhev e. Bîrdoziya her kesî/ê, li gorî wî/ê ye. Dema ku mirov ji derve lê dinere, mirov dibêje “Di nav PKK’ê de yekîtiya bîrdozîk heye.” Biwêjek heye, dibêje “Hundirê wê min dişewitîne, qalikê wê we dişewitîne.” Ya me jî wisa ye. Yên ku ji derve mêze dikin, wisa fêm dikin. Lê di hundir de tam dijber e. Parçebûn pir zêde ye.

Serokatiyê jî got: “Ew çi parçebûn e?” Bêguman her ferasetek, dê xwe pêk bîne; kes tiştê ku rast dizane dê pêk bîne; dê kadro xwediyê kîjan ferasetê be, dê wê pêk bîne. Mirov nikare bibêje, bila feraseta te wisa be, lê tu were û vê pêk bîne. Tevlîbûna partiyê wisa dibe, rêxistibûn vê pêwîst dike. Lê di nêzîkbûnên me de rêgezên rêxistinê, berpirsyariya rêxistinî û zanebûna rêxistinê tune; em di van mijaran de pir lewaz in. Bi kurtasî wisa nabe. Bi qasî ku di pratîkê de fêm dike û dipejirîne dibe. Kes, an jî kadroyek çi rast dibîne, wê pêk tîne. Partî çi biryarê digire bila bigire, kîjan planê dike bila bike; dibêje: “Ya rast, tiştê ku ez dizanim e.” Ya ku bixwe dizane pêk tîne. Yek jî dibêje: “Ez sererast dikim.” Vê ji xwe re wek mafekî dibîne; bi pêkneanîna biryarên rêxistinê, guherîna biryaran ji xwe re maf dibîne. Hewl dide ku biryarên kongre û konferansan, fermanameyan biguherîne. Ji ber ku ya rast û ya şaş ew diyar dike; tevlîbûna wî/ê jî di wê astê de ye, ezezîtî gihîştiye wê astê.

Ev hemû diyar dikin ku pirsgirêkên me yên perwerdeyê, pirsgirêkên me yên bîrdozîk, pirsgirêkên me yên ferasetê hene. Pirsgirêkên me yên fêmkirin û pejirandina bîrdoziya Serokatiyê hene. Pirs-

girêkên şexsî yên kes û kadroyan hene. Ji van pirsgirêkan beşeke mezin pirsgirêkên perwerdeyê ne. Bi taybetî pirsgirêkên ciwanan, yên perwerdeyê ne. Yên din jî teqez pirsgirêkên bîrdozîk-rêxistinî ne. Pirsgirêkên têkoşîna çînî û cinsî ne. Pirsgirêkên rexne û rexnedayînê ne. An na nezanîn û perwerde ne pirsgirêk e. Em perwerdeyên xwe li ser esasê zanebûn û fêrbûnê jî li dar naxin. Em neçar in ku perwerdeyên xwe li ser esasê têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî li dar bixin. Em di dibistaneke ciwanan de dikarin li ser esasê zanebûn û fêrbûnê li dar bixin; ji ber ku pêwîstiya wan bi wê heye. Lê pirsgirêka kesên ku 15-20 sal in di nav partiyê de ne û dibêjin: "Em her tiştî dizanin." Ne zanebûn û fêrbûn e. Pirsgirêka wan, di nav bîrdoziyên cuda de bûn e. Ango têkoşîna bîrdozîk pêwîst dike, têkoşîna çînî û çinsî pêwîst dike. Em di bin navê perwerdeyê de kom bibin jî, divê perwerdeyên me li ser vî esasî bin û divê aliyê wê yê herî girîng têkoşîna xeta bîrdozîk û rêxistinî be. Bi nêzîkbûnên li derveyî vê, em nikarin van pirsgirêkan ji holê rakin.

Niha pirsgirêkên rêxistinî û rêveberiyê hene. Pirsgirêkên bûna rêxistin, rêxistin avakirinê, bûna rêveberî, feraseta rêveberiyê, pirsgirêkên şêwaz û pergalê yên kadro hene. Di sê beşan de pirsgirêkên rêveberî û ferasetê hene. Pirsgirêkên bîrdozîk; ango nêzîkbûna li hemberî bûna rêveberiyê, nêzîkbûnên li hemberî yekbûnê hene; ezezîtî heye, kesên li derdora xwe ji xwe dûr dixe. Hesasiyeta rêxistinî dibîne, lê hesasiyeta bîrdozîk nabîne; hesasiyeta bîrdozîk dibîne, ya rêxistinî nabîne. Bi parçe ye, ne giştî ye. Bi vî awayî di nêzîkbûn û rêbazê de pir şaşîtiyan dike. Kêmasiyên bi vî rengî di vir de derdikevin holê. Li gelek qadan di rêxistinbûnên siyasî de hevserokatî bi pêş dikeve; ji aliyê mêr û jinê ve tevlîbûneke azad û wek hev çêdibe, rêveberiya hevpar bi pêş dikeve, wek şêwaz û pergaleke nû dimeşe. Ev hemû zanebûneke kûr ya vîn û azadiyê, zanebûna civakbûnê û li ser esasê civakbûnê kesayeta azad pêwîst dike.

Ger di astekê de feraseteke rast û bîrdozîkeye kûr nebe; bêguman rêveberiyeke wisa hevpar, rêveberiyeke wisa kolektîf û hevgirtî bi pêş nakeve. Girêdana armancê û armancên bîrdozîk-siyasî zanîn û li ser vî esasî di asta evînê de tevlîbûn pir girîng e. Bêguman yên wisa tevbigerin, dê bizanibin ku ji aliyê bîrdozîk û rêxistinî ve sekna rastî jî çi ye, dê her sekneke rast nîşan bidin. Lê girêdanbûneke wisa tunebe, memûrwarî tevdigere û bi sedemên cur bi cur bi zorê di nav rêxistinê de dimîne; dê nikaribe şêwaz û islûbekî rast jî bi pêş bixe. Dê li gorî

xwe tevbigerin, dê ezezîtiyê bikin, nikarin bi zehmetiyan re têkoşîn bikin, dê xwe ji rexne û rexnedayînê re bigirin, vîn û biryarên partiyê napejirînin, dê gelek nêzîkbûn û ferasetên derveyî partîbûnê nîşan bidin.

Divê em bi awayekî zelal vê bêjin; em li çepa xeta Serokatiyê nasekinin, em li rasta wê disekinin. Bêhevsengiyek heye, carinan çepbûn jî heye, lê bi piranî rastgirî heye. Ya rast em Serokatiyê hişk û misoger dibînin. Em li hemberî pergala Serokatiyê wek neyê lihevkirinê dibînin û em dixwazin pergal û Serokatiyê li hev bînin, ango em Serokatiyê ji pêwîstiya wê zêdetir misoger dibînin. Em dibêjin: "Em hinekî din nerm bin, baştir e." Rewşeke wisa heye. Çîna navîn, ev bixwe ye. Li Bakur çîna navîn her tê nîqaşkirin. Kombûna çîna navîn ev e, ango ne li derveyî me ye.

Wisa be em nêzîkbûnên çîna navîn temsil dikin û jiyan dikin. Çîna navîn û lihevkirin wisa derdikeve holê. Ev rastiyeke ku nayê înkarkirin e. Serokatî di parêznameyên xwe de jî bi awayekî zelal dibêje: "Ji destpêkê ve xeta rastgir, li ser xeta me ya têkoşînê û li ser xeta me ya gerîla serwer bû û me nikarî em derbas bikin." Ev nirxandineke pir şênber e, ji aliyê sekna xetê ve çi îfade dike, pir vekiriye. Pirsgirêkên kadro jî wisa derdikevin holê. Ya rast mezinkirina partiyê, tevlîkirin û perwerdekirina kadroyên nû zêdetir; divê kadroyên heyî bên guhertin û sererastkirin. Ev pirsgirêk zêdetir derdikeve pêş. Tiştê ku divê bê veguhertin çi ye? Divê sekna ku ji aliyê zihniyet, feraset, hest, şêwaz û rih ve bi Serokatiyê ve nabe yek û zêdetir bi Serokatiyê ve di nav lihevkirinekê de ye, were guhertin û sererastkirin. Pirsgirêk ne tiştekî din e, ev rastiyeke bê nîqaş e; pêwîst nake ku em veşêrin û ji çep û rastê ve berin. Rastiya şênber ev e, bi êş e, lê rast e. Li zora me jî biçe, divê em rastiya heyî ji hemû aliyan ve deynin holê û mirov li riyên çareseriyê bigere. Dibe ku wê demê mirov çareseriyê jî bibîne.

Nexwe bi nêzîkbûnên vedişêre û bi rûpoş dike, em nikarin tu çareseriyekê bibînin. Çima? Ji ber ku ger tu rastiyê ji rêxistinê veşêrî û her ser bigirî tu yê çawa çareseriyê bibînî? Feraset û rêbazên ku te wek çareserî danî holê dê çawa bibin bersiv? Nabin. Li wê derê xwexapandin heye. Niha rewş ev e. Bi ya min, ne rewşeke wisa pir cuda ye jî. Rewşa heyî ne ku nayê fêmkirin jî, em di asta fêmkirinê de ne. Divê em nebêjin: "Em nikarin îzah bikin û em nikarin fêm bikin." Teqez ne wisa ye, rewş vekiriye, tê fêmkirin, em dikarin îzah bikin. Ya rast pirsgirêk di

vê derê de jî dernakeve holê, hinekî bi rûpoş kirin û sergirtin hebe jî, pirsgirêk ew qas pir in ku nikarin hemûyan veşêrin. Xwe bi xwe deşîfre dibin, xwe eşkere dikin. Li ser vî esasî her tişt tê dîtin, kêm zêde her kes fêm dike, neyê gotin jî her kes dizane ku rastî ev e. Pirsgirêk tenê fêmkirin û nefêmkirina me ye jî, hêzên derveyî me jî fêm dikin, gel jî fêm dike. Êdî em nikarin xwe cuda jî nîşan bidin.

Wê demê pirsgirêk çi ye? Em ê xwe çawa ji van pirsgirêkan rizgar bikin? Guherîn û veguherîn ê çawa çêbe? Dê sererastkirin çawa û bi kîjan rêbazan çêbe? Di vê rewşê de ber bi ya rast ve çûyîn ê çawa çêbe? Kîjan rêbaz û têkoşîneke çawa dê me ji vê rewşê derxe û me di xeta Apoyî de ber bi partîbûna rast ve bibe? Teqez pirsgirêk, di vê derê de pirsgirêka rê û rêbazan e, pirsgirêka fêrbûna şêwaz û islûbê guhertinê ye. Di dîtîna vê de em zehmetiyan dikişînin. Her ku me zehmetî kişandin û em tengav bûn, çareseriya ku rêveberiya me dîtiye, perwerde ye. Dema ku yekî/ê hinek kêm bibîne, hema pêsîra wî/ê digire û dibêje: “Dê biçe perwerdeyê.” Piştî wê jî dibêjin: “Ev perwerde qet naguherîne.” Ango rêveberiyê çareserî û rizgarî di perwerdeyê de dîtiye û ji ber vê jî li hemberî perwerdeyê eleqeyek heye. Ji ber ku xitimiye, tê dibêje: “Derketin jî di perwerdeyê de ye.”

Gelo ev rêbaz rast e? Niha herî zêde xebatên perwerdeyê tên rexnekirin, cihên dîtir nayên rexnekirin. Dibêjin: “Perwerde sererast nake; em ew qas dişînin perwerdeyê, lê diçin û tên ku wek berê ne.” Bi ya wan dema ku tên vê dibistanê, di deriyekî re dikevinê û di deriyê din re derdikevin, bi vî rengî wek ku ji tornayê derketiye hema şêweyeke din digirin. Rewşeke wisa tune. Pirsgirêk, bi rastî jî pirsgirêka perwerdeyê ye; an jî çiqasî pirsgirêka perwerdeyê ye? Ez ne di wê baweriyê de me, lê em nikarin vê ji hevalan re bibêjin. Ji ber ku bi perwerdeyê re pir mijûl nabin, li qadên wan pirsgirêk hene, wê jî naxwazin bibînin û berpirsyariya wê bigirin ser xwe. Dibêjin: “Rizgarkerekî wek perwerdeyê hebe, dê çiqasî baş bibe.” Nêzîkbûneke çiqasî niyet paqij e. Ne nêzîkbûneke şênber û rast e; nêzîkbûneke li ser esasê niyetê ye, niyeteke baş e. Şaşîtiyê dibîne, li çareyan digere, li cihekî rast lê nagere. Wek peywira xwe lê nagere, li cihên dûrî xwe lê digere. Ji ber vê jî em çareseriyekê nabînin. Ji vî aliyî ve di vê pirsgirêkê de aliyê perwerdeyê pir zêde ne li pêş e, ez dikarim vê bi awayekî zelal bînim ser ziman. Ji ber vê wisa hemû peywir li perwerdeyê barkirin û

piştre jî gotina: "Perwerde jê re nabe bersiv," ne rast e. Di vê astê de rexnekirina perwerdeyan jî ne rast e.

Serokatiyê jî perwerdeyên bi vî rengî kirin, lê di parêznameyan de sekneke rexnadayî nêz bû û got: "Gelo bi lidarxistina wan perwerdeyên giştî min şaşîtî kir, ez li ser hinek derdoran bisekinîma baştir nedibû?" Ya rast Serokatî vê nû jî nanirxîne û nîqaş nake. Dema ku perwerde li dar dixistin jî, ev tişt nîqaş dikir. Lê niha dema li encama ku derketiye mêze dike, dibêje "Wê demê min wisa bikira dibe ku baştir bibûya." Lê bi ya min, ev jî ne rast e. Ger wê demê Serokatiyê wisa bikira jî di destê wî de tiştek nedima. Ji ber ku bi vî awayî kir, kêm zêde rêxistin heye, têkoşînek heye, astek hatiye girtin. Ger wisa bikira ne diyar bû dê çi bibûya.

Carekê Serokatiyê got: "Me ji kê bawer kir û xwe spart kê." Ango wisa kesên ku hema mirov jê bawer bike û mirov bibêje: "Dê ez li ser vî/ê bisekinim, dê min fêm bike û dê karên min bi serkeftî bike." tuneye. Pir ne hêsan e, jixwe di piratîkê de derdikeve holê. Bê pratîk tu nikarî ji kesî re wisa bibêjî, amûreke me ya ku pîvan û seknên mirovan dipîve tuneye. Tenê têkoşîn heye; parzemîn û amûra me ya yekane ku mirovan zelal dike û derdixe holê têkoşîna pratîk e. Her tişt di nav têkoşîna pratîkê de bi ceribandin û bi ezmûnan derdikeve holê. Ji ber vê Serokatiyê ya rast kir. Li Kurdistanê ya herî rast ev bû; ger perwerdeyên ew qas berfireh çênekiribana, derdorên ew qas berfireh tevlî nekirîbûya û her kes seferber nekirîba, ew qas têkoşîn bi pêş nediket. Dibe ku her wek komeke biçûk bimana û her dem dibêtiya ji xetê derketinê hebûya. Li vê derê ger beşek ji rê derketibe û qut bûbe jî, beşeke din girêdayî ma û bi rê ve bir. Ger yekî îxanet kiribe, du kesan xeta têkoşînê berdewam kirin. Ger bi komeke biçûk re kar bihata kirin, ne diyar bû dê ev kom bi ku ve biçûya. Dibe ku hemû jî biçûna îxanetê, li Kurdistanê pêşiya tiştekî bi vî rengî jî her vekirî ye. Mirov nikare bibêje: "Teqez nediçûn îxanetê û dê encameke baş ji vê derbiketa."

Rewş û parzemîneke wisa tune, ev nêzîkbûn mirov dibe şaşiyan. Ji vî aliyî ve Serokatî bi perwerdeyan li çareseriyan geriya, bi perwerdeyên pir berfireh li çareseriyê geriya. Ev li hemberî her cure îxanet û binkeftinan jî bû tevdîreke xurt. Dîsa jî bû rêbazeke perwerdeyê ya ku têkoşînê didomîne û bi pêş dixe. Dibe ku serkeftin neanîbe, lê hinek encam derxistin holê. Ji ber vê divê tiştê ku hatiye kirin rast were fêmkirin.

Serokatiyê got: “Em bi perwerdeyê jî heya cihekî dibin çare. Em kesên ku xwe dixapîne û di nav şaşiyan de ne û rewşa wan ya rihî hinekî deşîfre dikin, teşîr dikin; ya din dîsa bi kes re dimîne. Bi tevlîbûn, xwestek, nêzîkbûna kar, têkoşîn û lê xwedîderketina kes ve girêdayî ye.” Perwerde nikare her tiştî bike, bi ya min ger perwerde, rê û rêbazên xwe perwerdekirinê fêr bike, rista xwe dilîze. Tiştê ku ji pergala me ya dibistanan were hêvîkirin çi ye? Ez dikarim van bibêjim; ger bêyî ku kes careke din biçe dibistanê û di dema meşandina pratîkê de, fêrî rê û rêbazên xwe perwerdekirinê bibe, vê ji xwe re bike şêwazek, em di perwerdeyê de gihîştine serkeftinê. Ji vê zêdetir tiştekî din ji dibistanan dernakeve. Ji ber ku wisa statik jî nîn e, dînamîk û bi tevger e; peywirên îro, dê sibe bibin tiştekî din. Her roj guhertin û nûbûnek heye; peywirên nû derdikevin holê û her peywireke nû jî şêwaz û islûbekî nû dixwaze. Li gorî van pêwîstiyan jî xwe ji nû ve perwerdekirin pêwîst dike. Pêwîstî her bi xweperwerdekirin û xwe amadekirinê heye. Di PKK’ê de kar wisa dimeşin. Ji ber vê jî, ji perwerdeya ku nizanim di kîjan dîrokê de hatiye kirin encam bigire û her li ser wê bimeşe, nabe. Ger em perwerdeyê wisa fêm bikin, dê şaş bibe. Ev ê me ber bi jiberkirinê (ezberleme) ve bere.

Di vê mijarê de çîrokek heye; mirovekî ku her xwestiye ku rojî bigire û cejnê pîroz bike hebûye. Salekê gotiye: “Teqez ez ê îsal rojiyê bigirim û cejnê pîroz bikim.” Lê nekariye dema wê bigire, xwe şaş kiriye û bi carekê re dîtiye ku dema wê derbas bû. Ji bo vê carekê diçe gel mele û dibêje: “Ka dîroka rojiyê ji min re bibêje ku ez îsal jî nerevînim.” Mele dema wê dibêje, lê ji mele dixwaze ku li ser kaxizê binivîse. Mele li ser kaxizê dinivîse û dibêje: “Piştî çar rojan rojî ye.” Bi vî rengî kaxizê dide wî. Ew zilam kaxizê dike berika xwe û diçe mala xwe. Her roj kaxizê derdixe, lê dinere ku hê ji rojiyê re çar roj hene û kaxizê dîsa dike berîka xwe. Di vê navberê de rojî xilas dibe û cejn tê pîrozkirin. Dema ku vê dibîne, dipirse dibêje “Ev çi ye?” Ji wî re dibêjin: “Rojî xilas bû û îro cejn e.” Lê hê jî zilam dibêje: “Çi cejn e, hê ji rojiyê re çar roj hene.”

Niha bi vî rengî perwerde nabe. Ger em perwerdeyê wisa fêm bikin, ne gengaz e ku em mirovan biguherînin. Ji ber ku jiyan ne wisa ye. Bala we kişandibe, li gel me jî fêmkirina perwerdeyê wisa ye. Em dibêjin: “Em biçin dibistanekê, bila hinek mejiyê me vekin û tiştên xweşik yên Serokatiyê bixin mejiyê me. Piştî wê jî bêyî ku em zehmeti-

yan bikişînin, divê em bibin milîtanên PKK'ê û wisa jiyan bikin." Rewşeke wisa heye. Dibe ku em hinekî çor pênase dikin, lê wisa ye.

Bi ya min, em qet nebêjin pênaseyeke çor e. Nêzîkbûn û xwestek wisa ye. Ji bo vê her kes bi niyeta xwe pênase dike. Dibêjin: "Niyeta me ne xirab e." Tiştê ku wek niyeta baş pênase dikin, ev e. Niyet baş be çi be dike, xirab be çi be dike? Bi rastiyê ve ne têkildar e. Ji xeyalan jî wêdetir, ev nêzîkbûn ne zarokiye jî. Pirsgirêk jî di vir de ye. Pirsgirêk di jiyan de, di nêzîkbûna jiyanê de, di fêmkirina jiyanê de û li hemberî jiyanê di sekna jiyanê de ye. Têgihiştina me ya jiyanê çi ye? Rewşeke wisa heye ku em naxwazin jiyanê fêm bikin jî. Em pîvan û taybetmendiyên jiyanê, li gorî rihetî û keyfa xwe dinirxînin. Bes bila me tengav neke. Lê li vê dinyayê jiyaneke wisa tune. Tenê zarok dikarin bi xeyaleke wisa jiyan bikin. An na ji bo mezinan, rastiyeke jiyanê ya bi vî rengî tune.  Cîhan wisa ye, rastiya jiyanê ev e. Bi rastî jî divê em ji ya şênber û reel qut nebin, divê em ya şênber fêm bikin. Di cewherê wê de zanist û diyalektîk, fêrbûna vê rastiyê ye. Ya din xeyalperestî ye, ji zanist û diyalektîkê qutbûn e. Bi vî rengî nabe, heya ku em wisa nêzîk bibin, em nikarin encamekê bigirin.

Niha encamên ku em ji perwerdeyê bigirin çi ne? Em ji vê pirsê re li bersivan digerin. Wisa be ger em fêrî rast nêzîkî jiyanê bibin, di nav jiyanê de em her xwe perwerde bikin û fêrî vê bibin, baş e. Ya rast û bi kêr tê ev e. Tenê bi vî awayî perwerde dikare encamê bigire. Ji xeynî vê perwerde bi kêrî tiştekî din nayê. Ji ber vê, divê em berê perwerdeyê bidin vir. Gelo dikare fêrî xweperwerdekirinê bibe; dikare bibe xwediyê feraset û şêwazeke wisa, an na? Dê her xwe nû bike, dê li ser perwerdeya xwe bisekine, an na? Mesele ev e. Wisa be perwerde diyardeyeke ku mirov xwe pêk tîne ye, ketina bendewariyên ji derve, ne rast e. Mirov xwe perwerde dike, parzemînên perwerdeyan tenê ji bo xweperwerdekirinê bingehê ava dikin. Ji wê zêdetir tiştekî nade, ketina bendewariyên cuda dê di mirov de şaşiyan ava bike. Divê tu kes wisa nekeve bendewariyan û nekeve nav şaşiyan, dê her kes xwe perwerde bike. Ger hûn wisa fêm bikin û ji bo xweperwerdekirinê hewldanê nîşan bidin, her bijî ji we re, hûn ê bi ser bikevin. An na dîsa xeyal, bendewarî, şaşî derkevin holê, dê dawiya wê jî bibe tûfan.

Divê wisa nebe, jixwe divê em wisa nêzîkî perwerdeyê nebin. Divê em wek diyardeyeke ku xwe perwerde bikin bibînin û divê em her rê û rêbazên li her cihî û di her demê de li xweperwerdekirinê bigerin. Divê

em di perwerdeyan de rê, rêbaz û islûbê wê fêr bibin. Divê em hewl bidin ku vê fêm bikin û ji xwe re bikin fêrbûnek. Ger em vê bikin, her bijî ji me re. Tê wê wateyê ku em serkeftî bûne. Wisa be, bêyî ku em pêwîstî bi dibistan û hinekên din bibînin; em ê hem bikaribin têkoşîn bikin, hem jiyan bikin, hem jî kar bikin. Em ê asteke ku her xwe perwerde dike û bi ser dikeve bi dest bixin. Dê ev rewşeke erênî derxe holê. Bi vî awayî perwerde girtina dest, ya herî baş e. Lê ev dîsa jî pirsgirêkê çareser nake. Ger pirsgirêk, pirsgirêka perwerdeyê be; mirov dikare bi vî awayî çareser bike. Ango pirsgirêkên ku bingeha xwe ji perwerdeyê digirin, em dikarin bi vî rengî çareser bikin. Lê bi rastî jî mijara ku em wek pirsgirêka kadro, an jî wek pirsgirêka guherîn û veguherîna kadro pênase dikin, bi tena serê xwe wek pirsgirêka perwerdeyê derdikeve holê? Na, ne wisa ye.

Ez dikarim vê bi awayekî zelal pênase bikim. Yek, pirsgirêka têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî ye. Du, pirsgirêka rêveberiyê ye; pirsgirêka rêxistinbûn û şêwaza rêveberiyê ye. Sê, pirsgirêka perwerdeyê. Ez hem di nav rêveberiyê de me, hem jî bi perwerdeyan re mijûl dibim. Wek encama ezmûnên xwe van tiştan dibêjim. Ger em perwerdeyê wek pirsgirêka yekane bigirin dest, dê perwrde bibe cihê destpêkirina oportînîzmê, dê bibe cihekî ku ji oportînîzmê re li hincetan digere. Dê perwerdeyê ji xeta partî û Serokatiyê derxe. Pir bi pêşxistina perwerdeyên bi vî rengî, dê qurnaztiyê bi pêş bixe. Ger fêrî partîbûnê neke, vê pêk neyne û ber bi partîbûna rast ve neçe; dê ev perwerde zêdetir rê û rêbazên berovajîkirin û jirêderxistina partiyê fêrî me bike. Ji ber vê herî kêm bi qasî pêşketinên erênî, pêşketinên neyînî û bi rêbazên zirav meşandina dijberbûna partiyê jî bi xwe re bîne. Gelek encamên perwerdeyê yên bi vî rengî hene. Ev temanbarkirina kesan nîn e, heqaret jî nîn e, rastiyek heye û şênber e. Ez dikarim vê îspat jî bikim, tiştekî wisa ku em nikarin îspat bikin nîn e û em tiştên wisa ku em nikarin îspat bikin, nabêjin. Divê heval vê bizanibin. Ez dikarim bi sedan mînakên wisa bidim. Ji ber ku em tiştên şênber jiyan dikin in.

Ji ber vê ez dixwazim vê bibêjim; perwerde ne dermanê her derdî ye. Di hemû şert û mercan de çareseriya pirsgirêkan ne perwerde û dibistan in. Divê em di serî de vê tespit bikin û qebûl bikin. Ji aliyê perwerdeya dibistanê ve tiştê ku em fêr bibin, fêrbûna xwe perwerdekirinê ye; ne tiştekî din e. Têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî, cewhera vî karî ye. Pirsgirêk ne ji ber bêzanebûn û kêmbûna agahiyan e. Pirsgirêk ji

ber heyîna zanebûnên cuda, ferasetên cuda, pîvanên cuda ye. Wisa be çareserî çi ye? Pir zêde fêrbûna zanistê û hînbûna tiştên nû nîn e. Çareserî sererastkirina şaşîtiyan, sererastkirina şaşiyan, sererastkirina ferasetên derveyî partîbûnê û cihê wê bi feraset û pîvanên Serokatî û partiyê dagirtine. Gelo bi fêrbûna zanebûnan ev dibe? Na. Dê bi hînbûna pir tiştan pêk were? Na. Dê bi çi bibe? Dê bi têkoşînê bibe. Li vê derê têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî derdikeve pêş û dikeve rojeva me. Pirsgirêka têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî ye. Di bingeha wê de pirsgirêka guherîn û veguherîna kadro, pirsgirêka têkoşîna xeta bîrdozîk û rêxistinî ye. An na bi fêrbûn û hînbûna pir tiştan, nayê çareserkirin. Dê bi têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî çareser bibe.

Ev têkoşîn jî li her cihî dibe. Rast e, têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî li dibistanê jî dibe. Lê mirov bibêje, tenê li dibistanê dibe, li cihên derveyî dibistanê têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî çênabe; wê demê dibistan nikarin tiştekî jî bikin, dê partî tevlîhev bibe. Çawa dixwaze wisa jiyan bike, wisa tevbigere û piştre jî biçe dibistanê û xwe sererast bike. Di xiristiyanan de diçin dêrê û gunehên xwe didin efûkirin. Li gel me jî hatina dibistanê ziviriye wê. Wisa nabe. Misilman di heftiyekê de rojekê diçin nimêjê û dibêjin: “Gunehên me efû bike.” Ya me jî dişibe wê. Ger wisa nebe, divê em çi bikin? Divê di her kêliyê de, li her cihî em têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî bikin. Wek ku hatiye serê olan, em nikarin partiyê tênê bi rîtûelên ku di demên diyar de tên kirin pênase bikin. Ev nabe, ev nayê kirin. Pirsgirêka herî cidî di vir de ye. Li tu cihan, di nav jiyanê de, di nav têkoşînê de, li qadên xebatê pêwîstiya meşandina têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî nayê qebûl kirin. Cihên ku lê xebat û têkoşînên leşkerî û siyasî tên dayîn, di heman demê de nemeşandina têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî nayê qebûlkirin. An qet nayê kirin, an jî berovajî dikin. Kêm tê kirin û ji cewherê wê tê dûrxistin, hundirê wê tê valekirin.

Peywirên têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî nayên cih. Ji vê revek heye, vê her ji Serokatiyê re berdidin, ji rêveberiyê re tê hiştin. Xirabûna esasî di vir de ye. Ji vê reveke pir cidî heye. Dibêjin: “Çi ji min re; min nedît, ne bihîst.” Lîstika sê qirdikan dilîzin. Redkirina kadrotiyê ya kadroyan ji vir dest pê dike. Têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî nade, lê kadroyê partiyê ye. Kesên ku di vê rewşê de ne, ji destpêkê ve PKK’yîbûn û Apoyî redkirin e. Tu çi dikî bike, kesên wisa kişandina riya rast ne gengaz e. Ger kesek di vê de israr dike û ev tespît hatiye kirin, divê mirov van kesan li derveyî partiyê bihêle. Ew nikare bibe PKK’yî. Ji ber ku PKK’yî bûnê ji

destpêkê ve red dike. Naxwaze bibe PKK'yî. Divê mirov vê qebûl bike; Taybetmendiya yekemîn ya PKK'yîbûnê têkoşîna xeta bîrdozîk-rêxistinî meşandine, bîst û çar seatan ketina nav vê têkoşînê ye. Hem li hemberî derve, hem jî li hemberî hundir, divê mirov wisa tevbigere. Di vê mijarê de her kesê/a ku vê ji nedîtî ve tê, di nav lihevkirinê de ye û nerm nêzîk dibe, PKK'ê înkar dike. Ji wê derê encamek nayê girtin.

Em niha di 2014'an de ne, pirtûka "Parastina gelekî" di 2004'an de derket. Di ser re deh sal derbas bûne. Lê niha pirsgirêkên me ew qas mezin bûne; ger piştî deh salan pirsgirêkên me yên kadro ew qas giran bûbûn û ger sedema vê redkirina kadroyên kevn ya pîvan û taybetmendiyên partiyê be; sedema vê redkirina têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî ye. Ji ber ku pirsgirêkên kadro û pêşengtiyê ne ji ber tunebûna van kadroyên nû ye. Di sekna xeta partiyê ya bîrdozîk-rêxistinî de çênabe û li hemberî pêkhatinên derveyî xeta partiyê, têkoşîn nayê dayîn. Li gel vê bi taybetmendiyên derveyî partiyê, li hemberî partiyê têkoşîn tê dayîn. Ango têkoşîneke berovajî heye.

Têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî li hemberî partiyê didin; bixwe nedin jî, yên ku li hemberî partiyê têkoşînê didin guhdarkirin û ketina bin bandora wan heye. Ev rewşeke pir xeter û giran e. Ev tişt hene, me jiyan kirin û em jiyan jî dikin. Her roj nêzîkatiyên wisa derdikevin holê. Em nikarin xwe li derveyî wan bibinînin. Ger em wisa bibêjin, em dikarin bibêjin, ev ji me re heqaret e? Na. Ji ber ku her roj li kêleka me ev tişt tên jiyankirin. Ger em ê vê wek heqaret bibînin, divê em li pêşiyê bibin asteng. Ger em nikarin pêşiyê lê bigirin û em li kêleka hev û din van tiştan jiyan dikin, diyar e ku di me de jî bingehên wisa hene. Em çawa li kêleka hev û din disekinin, çawa li gel me xayîn derdikevin û em çawa nabînin?

Ji rêveberiyê reviyabûn. Biryargeh bi hêrs bibû. Em çûn ku nîqaş bikin. Ji gel desteya rêveriyê (kurul) reviya ye, lê xebera desteya rêveberiyê jê tune. Ji ber vê dibêjê: "Qisûra min mêze nekin." Ango dibêje: "Ger min bidîta, min ferq bikira, dê min asteng bikira; lê min ferq nekir." Bi vî awayî derbas dike. Min jî got: "Te çi jiyan dikir ku te xayînê li kêleka xwe ferq nekir?" Wek ku ferq nekirin, tiştekî pir baş e. Wisa be ferqa te jî ji wî/ê tune. Hûn li gel hev in, lê tu tiştekî ferq nakî, jixwe bi carekê re her tişt nabe, bi demê re dibe û hûn bi hev re jiyan dikin. Wisa be pîvanên te jî ne li gorî partiyê ne, lewaz in, şîlo ne, ji her tiştî re vekirî ne, liberal in. Di nav xwe de her tiştî dihewînin. Yekî xayîn jî li

gel te xwe amade dike, piştre direve, lê agahiya te jê tune. Ango tu razayî. Ya rast tu nerazayî, tu jî ji tiştên wisa re vekirî yî. Pîvanên te ne zelal in, sekna te ya bîrdozîk-rêxistinî tune, tu bê têkoşînî. Rewşa me, ev e. Ji ber vê seknê, ew qas pirsgirêkên kadro derdikevin. Ji xeynî vê dê sedem çi be?

Ji vî aliyî ve di sekna partiyê de, di xeta Serokatiyê de şemitîn û ji rê derketin heye. Bi taybetî rêveberî, hemû tevgerînên ku vê cidî nagirin, li ser nasekinin û derbas nakin şemitînê îfade dikin. Şemitîna herî bi xetere jî ev e. Serokatî her dibêje: “Taybetmendiya min ya herî esasî, şervaniya min ya têkoşîna xetê ye.” Dema ku ez ji zindanê derketim hatim, min destê wî girt û min got: “Merhaba” jî, ji min re got: “Ez şervanekî rêxistinê yê baş im, ne wisa?” Ew qas zelal e. Yên ku vê nekin tu eleqeya wan bi Rêber Apo re tuneye. Hem jî divê di asta Rêber Apo de bê kirin. Yên ku vê nekin, ne kadroyên Apoyî ne, ew qas zelal e. Lê em li pratîka xwe mêze bikin. Em dibêjin: “Serokatî pir hişk e, destwerdana her kesî dike, çima pir destwerdan dike?” Em vekirî nebêjin jî, em di hundirê xwe de vê dibêjin. Gelek derdor wisa dibêjin. Jixwe bi awayekî vekirî nikarin bibêjin. Jixwe li wê derê jî durûtî heye; tiştê ku difkire bi awayekî vekirî nabêje, lê di hundirê xwe de dikele. Tiştekî ku li vê derê nayê fêmkirin tune. Ji ber vê têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî bi pêş nakeve. Ji ber vê pergala rexne-rexnedayînê bi pêş nakeve; ne di jiyanê de, ne di rêbazan de tê bikaranîn. An qet nayê bikaranîn, an jî pir şîlo ye, pir seranser e, hundirê wê pir hatiye valekirin, pir zêde ji rêzê ye. Piştî vê jî her cure feresatên derveyî xetê, bandorên modernîteya kapîtalîst û bandorên şerê psîkolojîk dikevin nav me. Me dorpêç dikin û di parzemînên me de xwe jiyan dikin. Aliyekî vê ku nyê fêmkirin tuneye.

Ger em ê kadroyê heyî sererast bikin, yek; divê li her cihî pîvana esasî têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî be. Divê di serê hemû têkoşînan de ew hebe, divê her kes vê wek peywir bibîne û lihevkirina di vê mijarê de bişkîne û lîberalîzma di vê derê de ji holê rabe. Jixwe ji xeta Serokatiyê qutbûn bi lîberalîzm û rastgiriyê dest pê dike. Ji nemeşandina têkoşîna xeta bîrdozîk-rêxistinî dest pê dike. Ji têkoşîn nemeşandina li hemberî xwe û li hemberî derve dest pê dike. Di vê xalê de, carekê ji Serokatî qutbûn çêbibe û qutbûn ji vir dest pê dike. Divê em vê bi awayekî zelal diyar bikin, rastî ev e. Gelo cihê vê dibe ku tenê perwerde be? Na, di perwerdeyê de kes pir zêde xeletiyan nake. Mesele em niha wek de-

dektîfan lê bigerin û em yek bi yek bi pêsîra hevalan bigirin, ka kî xeletiyan dike. Nake. Jixwe tiştekî nake ku, li cihê xwe rûniştiye. Ger em rexne bikin, dê her seatê di cihê xwe de wek peykeran rûne. Jiyan teng e, parzemîna xebatê teng e; ji ber vê li vê derê kesayet dernakeve holê. Di parzemînên têkoşînên hişk de, di têkoşînên dewlemend de rastî û taybetmendiyên kesayet dê derkevin holê. Ji ber vê jî cihê têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî, ne perwerde ye, ne dibistan in. Di bingeha xwe de cihên pratîkê ne; pratîk, têkoşîn bixwe ye. Cihên şer in, cihên siyasetê ne, cihên serhildanê ne, cihên xebatê ne.

Niha vê ji qadên xebatê radikin. Piştî wê jî her tiştî taloqî perwerdeyê dikin. Di perwerdeyê de mirov dikarin 3-4 rojan xwe veşêrin; perwerde ji demên kin pêk tên, ne tevlîhev in. Ango kes dikarin xwe veşêrin û heya demekê îdare bikin, bêyî ku pir şaşîtiyan bikin dikarin derbas bikin; ji ber vê dibe ku hemû rewş di parzemîna perwerdeyê de dernekevin holê. Piştî wê jî bi gotina: "Çima perwerdeyê çareser nekir." Rexne kirin ne rast e. Çima em nabêjin: "Çima pratîk çareser nake, safî nake?" Divê tu rexne bikî, di parzemîna pratîkê de çareser bikî; ji ber ku kêmasî û şaşîtî di qadên pratîkê de derdikevin holê. Di dem û cihê wê de rêbazên çareseriyê bi pêş bixe, bi rêbaza rexne û rexnedayînê çareser bike, lê hûn vê nakin. Rêbazeke wisa nayê bi pêş xistin, zor û zehmet tê dîtin. Çima bixwe bike, dê taloq bike û hinekên din bikin. Peywira xwe nagire ser xwe, rev heye, berpirsyariyê ranake, nakeve nav têkoşînê, hawaleyî cihekî din dike. Naxwaze serê xwe biêşîne, an jî rewşeke wî/ê ku çareser bike tuneye; ji ber ku rewşeke wî/ê ya rexnekirin û çareserkirinê tune. Ger hinekî rexne bike, dê bixwe jî derkeve holê. Dibêjin: "Yê ku ji ola min re xeberan dike, bi xwe Misilman be, ne xem e." Ger di rewşeke wisa de rexne bike, dê kesê li hemberî bibêje: "Tu çi yî?" Dê bêdeng bibe, gotineke wî namîne; ji ber ku rewşa wî/ê jî pir ne cuda ye, ji ber vê jî nikare têkoşîneke wisa bimeşîne.

Niha ev rewşeke girîng e. Ruxmê van tiştan jî, li ser esasê guherîn û veguherîna van kadroyên kevn, divê em di parzemînên perwerdeyê de çi bikin? Wê demê, divê ji fêrbûn û hînbûna hin agahiyan zêdetir, têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî bipejirînin. Divê em nebêjin: "Ev xeletiyeke biçûk e." Divê kêmasiya herî biçûk jî, em mezin bikin û binepixînin. Divê em bizivirînin têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî. Em vê çiqasî bi pêş bixin, dê dewreyên perwerdeyê ew qas encam bigirin û serkeftî bibin. Em vê

çiqasî kêm bikin, dê perwerde ew qas bê encam bibe. Ji ber vê, di perwerdeyê de tiştê ku divê bê kirin; ne fêrbûna agahiyan û nîqaş in; divê nirxandina jiyana rojane û dahûrandina pratîka kevn were esas-girtin. Li ser vî esasî zêdetir rexne û rexnedayînê bikin, sekn, bero-vajîbûnên partîbûnê, kêmasî û şaşîtiyên xeta bîrdozîk ku di pişt wan pratikan de veşartîne dahûrîn bikin, dê baştir bibe. Wek Rêber Apo jî dibêje: "Heval ê di jiyanê de windakirinê baştir bibînin û dê li gorî wê hewl bidin ku jiyana rast derbixin holê." Wisa be dê rastir bibe û dê perwerde zêdetir encaman bidin. Ger wisa nayê kirin, dê perwerde tenê bibe veşartina van pratîk û seknên heyî. Dê wan bi rûpoş bike, cila bike û zêdetir bi pêş bixe. Ji vê wêdetir encamekî jî nagire.

Wek me got, ya din jî şêwaza rêveberiyê ye. Ya rast, rewşa pratîkî hinekî rewş û şêwaza rêveberiyê diyar dike. Şêwaza me ya rêveberiyê mirovan perwerde nake. Perwerdehî karekî pratîkî ye, tenê ne teori ye. Me got çi; ji aliyê hest, fikir û danehev û zîrekbûnê ve, xwe ji kar re amadekirin e. Dê em hest û fikir jî wek perwerdeya teorik bigirin dest; em wek perwerdeya moralî û çandî bigirin dest. Lê em ê perwerdeya pratîkî ya danehevan û zîrekbûnê jî bi perwerdeya teorik pêk bînin? Na, ji bo bûyereke ku di pratîkê de bi pêş bikeve; rêxistinbûn û xebata wê di vê mijarê de mirovan bi pêş dixe û dike kadro. Kadro ji dibista-nan zêdetir, di pratîkê de tên perwerdekirin. Berê çepgir û sosyalîstan ev pir zêde derdixistin pêş. Digotin: "Perwerdekirina kadroyan, li ser şaşîtiyên wan dibe." Digotin: "Kadro di nav pratîka heyî de çêdibe û dipije." Niha li gel me ev tişt rabûne, rêveberî berpirsyariyeke wisa nagirin ser xwe. Dema kesek xeletiyên biçûk dike, bê perwerde û ne zîrek hebe;  hema wî/ê digirin û tavêjin. Ger ne kesekî/e li gorî wan be, hema digirin û tavêjin. Ger di astekê de hêza wê/î ya perwerdeyê tu-nebe, pêşengtî û rêbertiya wî/ê tunebe; ev çawa rêveberî ye? Peywira esasî ya rêveberiyê; rêvebirin û organizekirina kar e, ji bo vê amedeki-rina mirovan e û ji bo ku bikarinbin wî karî bikin perwerdekirina wan e, li ser esasê zîrekbûna wî/ê arestekirina mirovan e. Lê wisa nakin. Piştre jî dibêjin: "Pirsgirêka wî/ê heye, bila dibistan perwerde bike." Hema ji ser xwe tavêjin.

Di konevaniya kadro de kêmasî hene, kadro bi awayekî rast nayên arastekirin, di pratîkê de pêşengtî nayê kirin û nayên perwerdekirin. Encamên wê nayên şopandin, li ser esasê encamên pratîka wî/ê kadro nayên perwerdekirin. Ev hemû pirsgirêkên rêveberiyê ne, karên ku

divê rêveberî bikin e; lê rêveberî karê xwe nake, hawaleyî perwerdeyê dike, dema ku ji perwerdeyê encam dernakeve jî, radibin û perwerdeyê rexne dikin. Ez ji bo rexneyan tiştekî nabêjim, ez li dijberî wan dernakevim; lê ev şêwaz ne rast e, tê de şaşîtî hene. Ez jî rêvebir im. Dê çi, li ku û çawa bibe? Divê em vê baş tespit bikin. Bila li qadên pratîkê têkoşîna bîrdozîk-rêxistînî neyê meşandin, bila jiyan û têkoşîn ji vê qut be, bila rêveberî peywira xwe ya pêşengtiyê û perwerdekirinê neyne cih. Piştî wê jî bila hemûyan hawaleyî dibistanê bikin û bila bibêjin: “Bila dibistan wek ku dike tornayê, hema mirovan biguherîne; bila yên herî zîrek ji me re bişîne û bila wê demê ji me re bibêjin ‘bike’ em jî bikin.” Ev ne gengaz e, ev nêzîkbûneke pir hêsan û seranser e. Wisa bibe, baş e; lê nabe. Wisa nêzîkbûn, perwerde wisa girtina dest û kadro wisa girtina dest, ne rast e.

Wisa be, pirsgirêkên guherîn û veguherîna kadro, ji pisrgireka perwerdeyê zêdetir; pirsgirêkên têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî ne, pirsgirêkên şêwaza rêveberiyê ne, pirsgirêkên peywirdarkirin û ji peywirê girtinê ne, pirsgirêkên li ser peywirê rast arastekirinê ne û pêkanîna guhertinê ne. Ji ber ku ev mijareke têkoşînê ye, bi gotinan nayê çareserkirin. Ev guhertin, dê di pratîkê de pêk were. Bi gotinan, wek ku em weazan bidin nabe. Lê di qada pratîkê de, bi gotina “Ev şaş e” û berê wî/ê dana ya rast, ger duristî hebe dê hema sererast bibe. Jixwe duristbûn tunebe; dê xilas bibe û biçe, dê zelal bibe. Dê her tişt derkeve holê; an dê kadro xwe biguherîne, an jî dê qut bibe û biçe. Çareseriyeke cuda ya vî karî tune. Ji ber vê, di rastiya xwe de cihê vî karî, qadên pratîkê ne. Qadên têkoşînê û pergalên rêxistinî ne. Ya rast, pergala me ya rêxistinî tuneye, kar nake. Divê em vê diyar bikin. Rêveberî ji rêzê nêzîk dibe, di pratîkê de têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî nayê dayîn. Her tişt ji perwerdeyê re dimîne, em perwerdeyê jî wek cihên fêrbûna agahiyan digirin dest.

Dibêjin: “Jixwe parêznameyên Serokatiyê derketine, bila nîqaş bibin.” Bi vî awayî derbas dikin. Bala xwe bidinê, ev kadro naguherînin. Ev deh sal in heman tişt e, xwe dubare dike. Cihê çareseriyê, di pirsgirêkan de kûrbûn û giranbûn tê jiyankirin. Ji ber vê ew şaşîtî hatin jiyankirin, an na pirsgirêkên me ne bêçareserî ne. Ne ku em nikarin derbas bikin. Bêguman dê dîsa pirsgirêk hebana, lê pirsgirêkên deh salên berê wek îro ew qas giran dernediketin hemberî me. Dê heya niha bihatana çareserkirin. Em hê jî qala bermahî û bandorên tesfiye-

geriyê dikin. Wê demê em çi ne? Heya niha me têkoşîna çi daye? Ruxmê ku van tesfiyegeran îxanet kiriye, rastiya wan derketiye holê. Lê hê jî bi bandor in, wisa be çima em nikarin bandor bikin? Em ew qas têkoşînê dimeşînin, em her li gel hev in, lê kes ji me bandor nabin. Ji rêveberî û kadroyên heyî bandor nabin. Wisa be tesfiyegerî ji me bandortir e, divê em wisa bibêjin. Niha wisa dibe? Wê demê dê ji me bipirsin û bibêjin: "Hûn pîvanên partiyê û Serokatiyê çiqasî temsil dikin?" Wisa be, em temsîla pîvan û xeta Serokatiyê nakin. Wê demê, em jirêderketinan jiyan dikin, em derketina ji xetê jiyan dikin. Çima em tesfiyegeriyê ji xwe re bikin hincet û sûç di wir de bibînin, sûç jî yê me ye.

Wisa be, em xwe sererast bikin. Em şaşîtî û xeletiyan di xwe de bibînin û sererast bikin. Nexwe wisa nabe. Ji ber vê divê em perwerdeyê tenê di dibistanan de nebînin. Divê em guherîn û veguherîna kadro bi dibistanan sînor nekin. Divê em her cihî wek cihê vê bigirin dest, divê her kes li vê peywirê xwedî derkeve û li cihê ku dimîne, lê xwedî derkeve. Sererastkirin û guhertin bi vê dibe. Peywirên ku dikevin ser dibistanan jî hene, divê em vê jî rast fêm bikin. Ji vê, çi encam derketin? Me du encam derxistin; yek, bi rastî jî divê em pirsgirêkê tenê wek pirsgirêka fêrbûna agahiyan û xwe fêrbûnê negirin dest. Divê em wek pirsgirêka têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî bigirin dest û bizivirînin xeta têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî. Divê em perwerdeyê bizivirînin parzemîneke wisa û şerekî sîng bi sîng bimeşînin.

Ji vî aliyî ve pêngav, tenê ji aliyê siyasî û leşkerî ve avakirina xweseriya demokratîk nîn e. Li ser esasê avakirina kadroyê ku pêşengtiya xweseriya demokratîk bike, pêngava bîrdozîk-rêxistinî girîngtir e. Ji aliyê bîrdozîk-rêxistinî yê pêngava "Avakirina jiyana azad û rizgariya demokratîk" ve bi pêş dikeve. Li vê derê, em dikarin vê jî bibêjin; aliyê bîrdozîk-rêxistinî çiqasî bi bandor be meşandin û serkeftî bibe, ji aliyê leşkerî û siyasî ve jî dê serkeftin ew qas çêbibe. Nexwe serkeftineke bîrdozîk ku bi serkeftina leşkerî û siyasî ve girêdayî ye, ne gengaz e. Ev li dijî diyalektîka PKK'ê û zanistê ye.

Bala xwe bidinê, zayina bi Serokatiyê re rastiyeke bîrdozîk e. Hêza wê, PKK'ê li ser piyan digire. Hemû serkeftinên mezin yên leşkerî û siyasî, bi serkeftina bîrdozîk çêbûn. Gelo bandora berxwedana zindanan ya ku beriya 32 salan bi pêş ketiye, çima îro hê jî berdewam dike? Ji ber ku serkeftina bîrdozîk bi dest xistin. Ger di zindanê de me

têkoşîna bîrdozîk nemeşanda û me serkeftin bi dest nexista; îro ne gengaz bû ku navê PKK'ê jî bihata ser zimanan. Binêrin, partiyên din ketine kîjan halî; wisa be pêngava leşkerî û siyasî, bi sekna bîrdozîk bi pêş dikeve. Ger em ê îro jî pêngaveke siyasî û leşkerî bi pêş bixin, ger em ê pêngava xweseriya demokratîk di qada leşkerî û siyasî de bi pêş bixin, dê bi pêngava bîrdozîk û rêxistinî ve girêdayî bi pêş bikeve. Bi rastî jî ger parzemînên me yên perwerdeyê, di kûrbûna guherîn û veguherîna kadroyê heyî de, pêngavên bîrdozîk û rêxistinî bi pêş bixin; dê ev xwe di qadên siyasî-leşkerî de jî bide der û dê bizivire serkeftinê. Ji derveyî vê bi tu rêbazan nabe. Ger em bi awayekî din bigirin dest, dê rast nebe. Ji ber vê divê em wisa negirin dest û nebêjin: "Di demeke ku em pêngava têkoşîna pratîkî dimeşînin de, karê me li dibistanê çi ye?" Em carinan wisa nêz dibin. Em ê bersiva vê pirsê, li vir bidin. Wisa ji dibistanê ne qut e. Ger li qada pratîkî pêngaveke siyasî-leşkerî hebe, ya li dibistanê jî pêngava bîrdozîk-rêxistinî ye û giştî ye. Ji hev û din ne qut e. Bêyî çêbûna vê, ya din bi ser nakeve. Wisa be dibistanên me, ne derveyî pêngavên ku tên lidarxistin in. Di nav de ne, hem jî di navenda wê de ne. Divê teqez kadro guhertineke bîrdozîk-rêxistinî bike û ji pirsgirêka pêşengtiyê re çareseriyê bibîne; divê têkoşîneke wisa bê meşandin û bi ser bikevin.

Dê serkeftina leşkerî û siyasî, li ser vî esasî bi pêş bikeve. Bi qasî ku me ew bi ser xist, bi qasî ku di dibistanan de me têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî bi ser xist û bi qasî ku me li vê derê serkeftin bi dest xistin; li hemberî dijmin jî ji aliyê siyasî û leşkerî ve em ê serkeftinan bi dest bixin. Serkeftina leşkerî û siyasî, bi serkeftina bîrdozîk-rêxistinî ku di dibistanan de bi pêş dikeve ve wek goşt û neynûkê girêdayî ye. Divê em vê bizanibin. Ji ber vê jî divê em bizanibin ku em di nav têkoşînekê de ne, em di nav pêvajoyê de ne. Divê em wek ku em ji wê qut in, fêm nekin û negirin dest. Berovajî wê serkeftina pêvajoyê, bi serkeftina xebatên ku em li vê derê dikin ve girêdayî ye. Wê demê, ji bo ku perwerde bi têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî encam bigire divê em her tiştî bikin. Her wih, dê tenê yên ku li qadên pratîkê têkoşînê dimeşînin nabin berpirsyarên binketinê. Ji wê jî zêdetir, dê qadên perwerdeyê berpirsyarên wê bin. Divê em dewreya xwe ya perwerdeyê wisa fêm bikin, wisa pênase bikin. Divê em bi pêvajoyê re bikin yek, divê em rist û berpirsyariyên xwe yên pêvajoyê wisa pênase bikin, divê em bikişînin

xeteke ku van berpirsyariyên xwe bi awayekî serkeftî bimeşîne. Divê em bigihînin asteke wisa. Rista perwerdeyê yek jî ev e.

Ji ber vê perwerdeyên heyî, ji fêrbûn û hînbûna agahiyan zêdetir, têkoşînên bîrdozîk û rêxistinî ne. Divê em parzemîna perwerdeyê, wek cihên ku 24 seatan têkoşîn lê tê dayîn bibînin. Divê em li gorî vê nîqaş bikin, li gorî vê nirxandinên xwe bikin. Divê şêwaza me ya jiyanê, şêwaza me ya xebatê û hemû nêzîkbûnên me ji rexne û rexnedayînê re vekirî bin û her di bin venêrînê de bin. Di vê mijarê de divê em li hemberî hemû xeletiyan têkoşîn bikin. Em ê ya rast deynin holê, em çavên xwe ji ya şaş û kêm re nagirin. Divê em nebêjin: “Xeletiyên biçûk in, tiştek nabe.” Kêmasiyên ku di perwerdeyê de biçûk in, dê di pratîkê de mezin bibin. Dibêjin: “Yên ku di perwerdeyê de xwêdanê nerijînin, dê di şer de xwînê birijînin.” Jixwe li vê derê kêmasiyên pir mezin dernakevin holê, ê çawa derkeve? Jixwe bingeheke wisa tuneye; pergaleke xebatê tune. Derkeve jî dê kêmasiyên biçûk derkevin. Wisa be divê mirov wan xeletiyên biçûk ku li vê derê derketin, bi xeletiyên mezin yên ku di pratîkê de derdikevin ve mûqayese bike û wisa sererast bike. Divê ji şaşîtiyeke herî biçûk re jî mûsamaha neyê dayîn. Divê her tişt li vê derê bibe mijara rexne û rexnedayînê. Teqez divê perwerde bigihêje kûrbûn û venêrîneke bi vî rengî. Ger wisa nebe, dê parzemîna perwerdeyê tesfiye bibe û encam nagire.

Du; divê mirov li gorî pêvajoya di dema dewreyê de tevbigere. Divê mirov wê pêvajoyê fêm bike û li gorî peywirên wê demê xwe amade bike. Lê pêvajo diguherin û peywirên nû derdikevin holê. Gelo di her demê de, divê hema ew kes biçe dibistanê? Ev ne gengaz e; ne derfetên me yên wisa hene, ne jî xebatên pratîkî rê didin vê. Wisa be em ê çi bikin? Divê em bi serê xwe di pratîkê de fêrî rêbazên xweperwerdekirinê bibin. Divê em bigihîjin asta xweperwerdekirinê. Serokatiyê got: “Kemal Pîr nîv seatê ez guhdarî kirim û di hemû temenê xwe de ez pêk anîm.” Perwerde ev e. Wisa bi dubare-sêbare hatina dibistanan, Serokatiyê jî erê nedikir. Ez dikarim vê bi awayekî zelal bibêjim. Digot: “Te perwerde girt, lê li hemberî wê te tiştek neda. Ev valederxistina min e.” Wisa nabe, divê heval bizanibin ku ev ne marîfetek e.

Hûn dikarin bibêjin: “Perwerde ye, ma mirov ji perwerdeyê direve?” Hemin mirov direve, perwerde ne dermanê her tiştî ye. Her di dibistanê de mayîn, nayê wateya ku hûn her di rewşeke baş de ne.

Gelo rewşa baş ya kadroyekî/ê bi mayîna di perwerdeyê de dibe, an bi têkoşînê û bi serkeftinên mezin bidestxistinê dibe? Kadro li ku ye? Divê kadro li qadên têkoşînê be, ne li dibistanê be. Wisa her bi perwerdeyê nabe, bi awayekî seranser xwendin nabe. Heval carinan wisa fêm dikin; bi ya wan ku çi dixwîne bixwîne, baş e. Her li dibistanê bûn baş e. Dibêjin: “Binêrin, ev heval ji perwerdeyê nareve, ev baş e.”

Serokatiyê digot: “Hûn çi dixwînin, çima dixwînin û hûn ji bo çareserkirina kîjan pirsgirêkê dixwînin? Ger tu ji bo çareserkirina pirsgirêkê naxwînî, çavên xwe vale vale neêşîne. Çavên xwe xirab neke.” Ji ber vê her xwendin, ne tiştekî baş e. Her tişt xwendin, ne tiştekî baş e, ne taybetmendiyeke baş e. Dibêjin: “Her dixwîne, qet vale nasekine, hûn dibînin?” Dixwîne, lê çi dixwîne? Dixwîne, lê bi wan xwendina kîjan pirsgirêkê çareser dike? Dê em ê li encamê binêrin. Nexwe xwe diwestîne, dema xwe berhawa dike û serê xwe tevlîhev dike. Gelo ev xwendineke baş e? Ma em dikarin vê wek sekneke baş bigirin dest? Na. Ji ber vê her û her perwerde dîtin jî, em nikarin wek sekneke baş û rewşeke baş binirxînin. Serokatiyê wisa nenirxand, milîtan wisa nabe. Kesê milîtan, ger perwerdeyek dîtibe, tê wê wateyê ku xwe bi xwe perwerdekirinê fêr bûye. Dê di hemû jiyana xwe de pêk bîne. Dê her li gorî guherîna pêvajoyê û li gorî peywirên ku nû derdikevin xwe perwerde bike, araste bike; li ser vî esasî jî dê wan peywiran bîne cih û têkoşîna xwe bi awayekî serkeftî bidomîne. Dê ji perwerdeyê vê fêm bike.

Ger perwerdeyekê ew nedaye, ew perwerde bi ser neketiye. Ger kesekî/ê ev ji perwerdeyê fêm nekiriye, ji wê perwerdeyê bi awayekî serkeftî derneketiye. Divê em wisa binirxînin. Pîvanên rast wisa ne. Çima ez van dibêjim? Ya rast amadekariyeke min ya giştî jî tune, ger hebûya, dê min hemû yek bi yek vekirana û rexne bikira. Tiştên ku heval dikin, wek ku rast bin fêm dikin; ya şaş, wek ku rast be digirin dest, xeletî wek ku rewşeke baş be tên parastin û dixwazin van pêk jî bînin. Tiştên wisa tune ne, divê em van sererast bikin. Li gorî xwe pîvanan derdixin û dispêrin partiyê. Tiştên ku ji çep û rastê hatine bihîstin, nêzîkbûnên ku ji hinekan hatine girtin, wek ku rastiyên PKK’ê ne, dixin nav PKK’ê. Ew şaş in. Nasname, hebûneke partiyê jî heye; pîvanên PKK’ê jî hene. Her tiştê ku tê kirin, tiştên ku hinekên din dikin, ji bo PKK’ê ne rast in. Rewşên hene, dibe ku ji bo hinek rêxistinên din rast be, lê ji bo PKK’ê ne rast e. PKK rêxistineke cuda ye. Pîvanên PKK’ê li

gorî PKK'ê ne, ne li gorî pîvanên hinekên din in. Divê em hemû vê bizanibin.

Divê em perwerdeyê ji vî aliyî ve jî binirxînin. Tiştê ku em wek çareserî dibînin çi ye? Divê em di perwerdeyê de fêrî xweperwerdekirinê bibin. Ji wê jî zêdetir, divê em parzemînên perwerdeyê bizivirînin, qadên têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî. Lê divê em bizanibin ku sererastkirina rewşa heyî, tenê di perwerdeyan de nabe. Ger pêşketinên ku di perwerdeyê de çêdibin, bi şêwazeke rêveberiyê, bi qadên xebatê zivirandina qadên têkoşîna bîrdozîk û rêxistinî temam nebin; di rewşa kadroyê heyî de guherîn û veguherîn çênabe. Em nikarin dogmatizm û serhişkiyê derbas bikin. Em di xwe de, guherîn û veguherîna ku Serokatî dixwaze nikarin çêbikin. Em çiqasî parêznameyên Serokatiyê jiber bikin jî, em wek hafizan jiber bikin, her roj bixwînin, em behsa guherîn û veguherînê, paradîgmaya nû bikin jî dê pratîka me wek berê be. Dixwaze bila di her kêliyê de ev hevok, li ser zimanê me bin. Dîsa jî em ê tiştên ku me ji pergalê girtine bidomînin. Îzaheke cuda ya vê rewşê tuneye. Ji ber vê, ji bo ku em guherîn û veguherînê pêk bînin; divê em tenê bi perwerdeyê sînordar nekin, divê em dema wê tenê bi parzemînên perwerdeyê û bi dibistanan ve sînordar nekin, divê em her cihê jiyan û têkoşînê wek qadên perwerdehiyê bibînin. Divê em her qadê bizivirînin cihên perwerdeyê ku perwerdekirin, guherîn û veguherîna kadro gengaz bibe. Riyeke cuda tuneye.

Ji aliyê rêxistinî ve pirsgirêkên me yên pergalî hene. Serokatiyê jî got: "Hûn neguherîn, KCK nehat fêmkirin û hûn nebûn KCK." Bi rastî jî em nikarin bibin. Li holê KCK tune. Hebûna ku berê wek PKK'ê dihate pênasekirin, em niha wek KCK'ê digirin dest. PKK jî ji holê rabûye. Beriya 2000'î me ji hemûyan re digot: "PKK." Lê ERNK ji holê winda dibû. Navê wê hebû, me tevgera civakê wisa pênase dikir. Lê pergaleke wê ya rêxistinî tunebû. PKK hebû. Dema ku em derbasî qada rêxistin û rêveberiyê dibûn, dibû PKK. Bi vî awayî ERNK, wek êniyekê ma. Bû bingeh û destpêka konfedaralîzma demokratîk û netewa demokratîk. Niha jî me navê vê, wek KCK'ê diyar kiriye, lê PKK tune. Em ê PKK'ê di ku dera KCK'ê de bi cih bikin. Em nikarin zelal bikin û di vê mijarê de yekîtiyeke fikrî çêbikin.

Fêmkirin û gûftogokirina nirxandinên Serokatiyê cuda ne, di ser avabûna PKK'ê re 10 sal û 6 meh derbas bûn. Di sibata 2004'an de, di hevdîtinekê de Serokatiyê ji nû ve avakirina PKK'ê anî rojevê. Niha em

ber bi dawiya 2014'an ve diçin. Di ser re 10 sal derbas bûn, lê PKK li ku ye? Yekîtî û cudabûna PKK'ê û KCK'ê di ku de ye? Zelalbûneke pir zêde tune. Rewşeke tevlîhev heye. Ji vî aliyî ve pirsgirêkên me yên pergalê hene. kadroyên PKK'ê xwe wek KCK'ê rêxistin kirine, gel dîsa bê rêxistin e. Di sekna berê ya rêxistinî de cudabûnek tune. Tenê nav hatiye guherîn. Vê carê PKK, bûye KCK. Dê pîvan û rêgezên bîrdozîk yên KCK'ê çawa bin? Ne diyar e. Ji ber ku kadroyê PKK'ê xwe wek KCK'ê bi pergal kiriye, carinan bi pîvanên KCK'ê tevdigere, carinan jî bi pîvanên PKK'ê tevdigere. Ango li gorî xwesteka xwe tevdigere. Lê di nav hev de pêkanîna PKK'ê û KCK'ê girîng bû, divê hev û din temam bikirana. Ji aliyê rêxistinî ve divê ev pêk bihata.

Yek jî divê di nav yekîtiyekê de bihata rêxistinkirin. Ya duyemîn, divê gel bihata rêxistinkirin. Di herêm, bajar, bajarok, gund û taxan de divê bihata rêxistinkirin. Berê jî rêxistinbûna partiyê li van deran tunebû. Welatparêz û ERNK'î li van deran dixebitîn. Niha jî xebateke bi vî rengî heye, lê di asta êniyê de ye. Nazivire pergala KCK'ê û konfedaralîzma demokratîk. Li ser esasê rêveberiyan û meclîsan pergalekî rêxistinî tune. Dema ku wisa nebe jî, rewşa heyî tevlîhev e. Her kesê ku dixwaze, li gorî xwe ji aliyekî ve dikişîne. Ger tu ber bi KCK'ê ve bikişînê, pîvan û rêgezên PKK'ê lewaz dibin. Pîvan û rêgezên jiyanê, pîvanên kadroyê pispor yê fedaî ji holê radibin û belav dibin. Dema ku em dibêjin: "Hûn PKK'yî ne, divê KCK wisa be." Vê carê jî KCK, di nav girse û gel de xwe rêxistin nake. Dibe rêxistineke di ser gel re û wek rêxistineke kadro dimîne. Di ser re deh sal derbas bûn, lê hê jî me ev sererast nekiriye.

Dê PKK, xwe çawa rêxistin bike? KCK, xwe çawa rêxistin bike? Dê ev herdu rêxistin di nav hev de çawa xwe rêxistin bikin? Bi navê KCK'ê, dê di nav civakê de rêxistinbûnên çawa bi pêş bikevin; rêxistinên ciwan û jinan, rêxistinên civakî-aborî û çandî dê xwe çawa rêxistin bikin? Dê avakirina şaxên netewa demokratîk çawa çêbibe? Hê jî ev hemû nehatine zelalkirin, tam pergalek nehatiye avakirin. Rewşeke bi aloz heye, rewşeke anarşiyê ye. Tevlîhevî pir zêde ye. Pergaleke rêxistinî ku her kes li gorî xwesteka xwe tevlî dibe heye. Ev pir girîng e. Wek ku min got, xwe PKK'yî yekî/e çawa dibîne, wisa tevlî dibe. Bi pîvan û rêgezan ve ne girêdayî ye. Ger dilê wî/ê bixwaze dibêje: "Ez PKK'yî me." Dixwaze ji îtîbara PKK'ê sûd werbigire. Lê dema ku kêrî wî nayê jî dibêje: "Ez KCK'yî me û di filan saziyê de kar dikim." Li gorî pîvana wir jî tevdigere.

Rêgez û pîvanên PKK'ê tune dike û bi vî rengî rêxistina PKK'ê jî ji holê radibe.

Her kesek kadroyekî partiyê ye? Di rêxistineke partiyê de kar dike? Mesele rapor dide partiyê? Perwerde dît, ji Ocaxê re rapor dinivîse? Tê li vê derê îtîbar digire, lê dema ku ji vê derê derdikeve, li paş xwe jî mêze nake û diçe. Nabêje: "Xwedê ji we razî be" jî. Gelo ev kar wisa dibin? Wê demê, te ji bo vê Ocax vekiriye û te tê de perwerde dîtiye, wateyeke wê heye? Dê partiyeke çawa ji wê derê derkeve? Ger rêxistin wisa be, ne gengaz e ku tu pîvanên bîrdozîk-rêxistinî yên partiyê biparêzî. Ne gengaz e ku tu kadro bişopînî. Li gorî pîvan û rêgezên partiyê jiyankirin û xebitîna kadro pêk nayê. Dema ku ev rewş bi pêş dikevin, di dem û cihê wê de rexne û rexnedayîna rast bi bi pêş nakeve. Li gorî pîvanên rêxistinên din ku di nav de ye tevdigere. Êdî li komaleyekê kar dike, li qadekê kar dike; li ku dixebite, bi nasname û pîvanên wê derê tevdigere.

Lê bele partî, tenê ne hêzeke bîrdozîk e; em qala pêşeniya rêxistinî dikin. Şoreşgeran çawa endamtiya partiyê pênase kirin? Ev nîqaşeke berfireh e. Rewşenbîrên Ewrûpayê digotin: "Kî xwe ji partiyî dibîne, bila wek endamê partiyê bê qebûlkirin. Ji yên ku xwe partiyî dibînin re em bibêjin 'tu endamê partiyê yî.' Bila tu berpirsyariyên wî nebin, bila ji ber tiştekî nebe gumanbar." Lê şoreşgerên Rûs, ev wek tesfiyegeriyê pênase kirin. Hinek pîvan danîn û endamtiya partiyê wisa pênase kirin; "Kesê ku bername û rêziknameya partiyê qebûl dike, kesê ku aîdata xwe dide partiyê, kesê ku rojane bi awayekî bi pergal di rêxistineke partiyê de kar dike, endamê partiyê ye." Bi vî awayî "Şoreşa Cotmehê" pêk hat û sosyalîzma sedsala 20'emîn bi pêş ket. Lê van pîvanan jî têra PKK'ê nekirin.

PKK bi xwendin û fêrbûna van ferasetan xwest xwe bi sazî dike. Dema ku di kongreya xwe de, rêziknameya xwe amade kir jî, ev tişt wek pîvanên kadrotiyê diyar kirin. Lê ji destpêkê ve ev pîvan, ji bo ku mirov li Kurdistanê bibe kadroyên milîtan û şoreşger têrî nekirin. Ji bo kadroyên ku xeta PKK'ê pêk bînin, têrî nekir. Çi pêwîst kir? Ne yên ku bername û rêziknameyê, yên ku vê jiyan dikin û didin jiyankirin; ne yên aîdatê didin, yên ku 24 seatan hemû hêz, ked û jiyana xwe dide partiyê bûn kadro. Ne yên ku di nav rojê de hin seatan tevlî partiyê dibin, yên ku 24 çar seatan partîbûnê dikin û 24 seatan têkoşînê dikin bûn kadro.

Serokatiyê got: “24 seatan gerîlatiyê bikin.” Niha ev hemû, wek rastiyeke Kurdistanê, ji destpêkê ve di PKK’ê de hebûn.

Di destpêkê de PKK’ê nedikarî van tiştan, wisa pênase bike. Ji ber ku partiyên herî sosyalist in, nikarîbûn wisa pênase bikin. Ji aliyê teoriye ve ew tişt girtin, lê ew tişt têrî rastiya derfetên Kurdistanê nedikirin. Di encamê de pîvanên kadro ku têrî Kurdistanê bikin, derxistin holê. Jiyana rêxistinê li gorî wê ava kir. Tiştên ku wek rêzikname hatine nivîsandin û tiştên ku dihatin jiyankirin, ji hev û din cuda bûn. Li gorî tiştên ku di rêziknameyê de hatine nivîsandin, me hewl dida em partiyê vesazî bikin. Lê di pratîkê de avabûna partiyê, pîvan û rêgezên wê cudatir bûn, ji destpêkê ve ev wisa bû. Bi demê re sosyalîzma pêthatî belav bû, derket holê ku sedemeke herî girîng ya belavbûnê ev e. Li Kurdistanê têkoşîna şoreşgerî û têkoşîna gerîla kûr bû; pêşxistina gerîlatiyê, xeteke fedaiyane pêwîst kir. Nexwe li derveyî vê xetê meş û dimondina têkoşînê ne gengaz bû. Bi vî awayî partîbûn û gerîlatî, di nav hev de bi pêş ketin û di xeta gerîla de partîbûn bi pêş ket. Rêber Apo, di axaftineke xwe ya ku li ser hevalê Egîd kiriye de, ji vê re got: “Di berxwedana netewî de partîbûn.” Wek pîvanên kadrotiya serdema duyemîn ya partîbûnê, ‘di berxwedana netewî de partîbûn û di gerîlatiyê de partîbûn’ derxist pêş.

Bi vî awayî 24 seatan, di rêxistina partiyê de karkirin derket holê. Heta KCK’ê jî rewş wisa bû. ERNK, bû gelê ku li derdora rêxistinbûna PKK’ê dicive. Serokatiyê xwest KCK’ê wek avahiyeke rêxistinî û rêxistina civakî derxe holê. Gelek gumanbariyên ku li ser navê PKK’ê hatine kirin û gelek navên ku bi PKK’ê ve hatine kirin hene; ji bo ku ev hemû, wisa derbasî KCK’ê nebin, xwest PKK’ê wek komîteyekê ava bike. Lê nikarîn vê pêk bînin û hate guhertin. Piştre dît ku kar tevlîhev dibin û hinek tesfiyegeriyê dispêrin rêxistinê, ji nû ve avakirina PKK’ê anî rojevê.

Li ser esasê guherîna bîrdozîk û guherîna paradîgmayê, Serokatiyê ji nû ve anî rojevê; lê em ji nû ve înşa nebûn. Ji nû ve avabûna PKK’ê, KCK’ê ye. PKK tune. PKK nebû hebûneke rexistinî, tenê meclîseke wê çêbû, ji meclîsê wêdetir kadroyên wê tunebûn. Heya kongreya 11’emîn, partî ji 30’î kesên ku di nav meclîsa partiyê de cih digirtin, pêk dihat. Ji derveyî vê tiştek tune. Heta kongreya 10’emîn bi giştî wisa bû. Di kongreya 10’emîn de, ji bo ku ew rewş ji holê rabe hinek hewldan hatin dayîn. Ji bo ku hinek komîteyên parçeyan û komîteya parastina

bîrdozîk were avakirin hewldan çêbûn. Ew jî di pratîkê de nehat şopandin, pêk nehat û pir lewaz ma. Li holê kadroyên PKK'ê hebûn, lê ne di nav rêxistina partiyê de bûn, di nav rêxistinên girêdayî PKK'ê de bûn. Wek PKK'ê; pergaleke rêxistinê, komîteyan, nûnertiyan tune. Ji ber vê li gorî pîvanên PKK'ê civînan li dar naxe, kar nake û nirxandinan nake, karîneyeke wisa ava nake. Nasnameya PKK'ê jiyan nake, ji wê dûr e. Nasnameya PKK'ê dema ku kêrî wî/ê tê bi kar tîne, îtîbara wê bi kar tîne; lê dema ku pêwîstî bi jiyankirina rêgez û pîvanên wê çêbû, di kîjan rêxistinê de be, li gorî wê tevdigere. Dibêje: "Hemû PKK ne." Bi vî awayî PKK'eyeke ku parçe parçe bûye, derdikeve holê.

Ya rast, belavebûna girîng bi vî awayî pêk hat. Me bandorên tesfiyegeriyê ne tenê di pîvanên bîrdozîk de, me nekarî di pergala rêxistinê de jî derbas bikin. Tesfiyegeran dixwestin rêxistina PKK'ê ji holê rakin û bi rastî rakirin. Wek navendekê ma; piştî wê PKK'eyeke ku hêmanên wê yên din tune ne, xwe di parçe û herêman de rêxistin nake çêbû. Ji ber vê rêxistinên partiyê, kadroyên wê di herêm û di nav girseyê de tunebûn. Vê jî rêxistinkirina KCK'ê asteng kir. Dê kî KCK'ê rêxistin bike? Dê kî PKK'ê rêxistin bike, PKK pêşeng e. Li kuderê kadro, rêxistin, komîte û nûnertiyên PKK'ê hebin, li wê derê KCK hate rêxistinkirin. Li cihên ku rêxistinbûna PKK'ê tune, KCK jî nehat rêxistinkirin. Partiya ku xwe rêxistin neke, dê çawa KCK'ê ava bike? Ji ber ku rêxistina wê tunebû, li gorî nasneme û pîvanên wê jiyana wê ya rêxistinî tunebû, pîvanên kadro yên jiyanê û rêgezên wê û pîvanên bîrdozîk yên kadro jî nehatin şopandin.

Wisa şîlobûn çêbû. Gelek ferasetên cuda derketin holê. Wek me bere jî got, reviya ye hê jî dibêjin "Gazî." Dibêjin: "Gaziyên ku jiyana xwe ya şexsî didomînin." Gazî ye, lê jiyana xwe ya şexsî didomîne, çima? Ango birîndar bûye, dema ku mirov birîndar dibe, qey mirov nikare kar bike? Hema dikeve rewşa lê mêzekirinê? Ger wisa be divê yên ku gihîştine temenekî jî teqewîd (emekli) bibin. Yên ku nexweş in jî divê em wisa bikin. Wisa be, dê em hemû bikevin rewşa lêmêzekirinê, dê kî li me binêre? Nizanim. Gelo ev tişt hene? Rêgezên me wisa ne? Ger tunebin, divê çawa bin? Ew qas ji rêderketin hatin jiyankirin. Qet nayê ferqkirin, wek ji rêderketinê nayê pênasekirin û xwezayî tê dîtin, tê qebûlkirin. Hinek fedaî ne û şer dikin; lê hinekan jî kêmek şer kiriye û niha mafê xwe dixwazin, hewl didin bixwazin. Bi vî awayî nabe. Par-

çebûna bi vî rengî pir zêde ye. Niha wek rêxistin em bi pirsgirêkên bi vî rengî re mijûl dibin.

Mesele gelek rêxistin hatine avakirin, hemû wek PKK'ê tên destgirtin, lê ne wisa ye. Berê rêxistinên PKK'ê hebûn. Me digot, artêş û partî di nav hev de ne, me hemû biryargehên arteşê wek komîteyên PKK'ê digirtin dest. Lê tenê ew biryar bû. Di qada civakî de nûnertiyên partiyê hebûn. Lê niha ev guherîne. Em di qada civakî de xwe rêxistin dikin, em tenê bi xeta leşkerî tevnagerin. Ev bîst sal in em stratejiya têkoşîna siyaseta demokratîk bi pêş dixin. Stratejiya berê, tenê li ser esasê şer bû, lê guherî. Bi vî awayî di nav civakê de jî rêxistinbûna partiyê bi pêş ket; li vê derê pêwîstî bi kadroyê ku ji serhildanan re, ji xebatên siyasî re pêşengtiyê bike çêbû. Bi kurtasî ev tune. Pergal û avahiyeke PKK'ê tune, bila xebera hevalan hebe. Wek KCK heye. Heya kongreya 11'emîn, tenê Ocaxa PKK'ê hebû, bi navê PKK'ê perwerde dikir, tenê ew bû. Car caran hin civîn çêdikirin, carinan jî hin daxwiyanî didan. Ji kongreya 11'emîn ve jî hin xebatên rêxistinbûnê hatin meşandin, me encamên wê dîtin.

Hevalan raporên komîteyan xwendin. Ji destpêkê heya dawiyê dibêjin: "Nebû, me nikarî, filan tişt nebû, bêvan tişt nebû." Ji navê vê re jî dibêjin rapor. Gelo raporeke wisa dibe? Ma rapora karnekirinê dibe? Wisa be dê ez ê di derheqê cîhanê de raporan binivîsînim. Nizanim li Amerîqa çi dibe, ez ê bibêjim 'ez nabînim.' Nizanim filan tişt çi dibe. Rapor li ser esasê tiştên ku hatiye kirin, tê nivîsandin; tu yê tiştekî bikî, şaşîtî û rastiyên wê binivîsînî, tu yê pêşketinên ku te çêkirine û encamên wê binivîsî. Ji vê re dibêjin rapor. Ger tu bibêjî: "Min nikarî bikim" wê demê dê ji te re bibêjin: "Tu li vê derê çi dikî?" û dê te bavêjin. Lê di nêzîkbûna me de raporên herî xweşik, yên ku dibêjin "Min nekiriye." Cidî nagirin dest. Wisa be biryarên rêxistinê, xebatên partiyê cidî nehatine dest girtin, girîngî nehatiye dayîn û tune hatine hesibandin. Bi rastî jî ew kar wisa nameşe.

Bi kurtasî heya vê sala dawî jî, li tu cihan derveyî navendê rêxistin û komîteyên partiyê tunebûn. Di vê sala dawî de jî me got, em rêxistin bikin, lê li hemberî vê sekinandinek heye. Dibêjin: "Me fêm nekir." Tevlîhev dikin. PKK, rêxistineke. Dê rêxistinên vê hebin, rêxistinên wê yên navendî hebin, rêziknameya wê hebe û divê tiştên ku di rêziknameyê de hatine diyarkirin pêk werin. Divê komîteyên herêman, komîteyên parçeyan, nûnertî û komîteyên xwecihî hebin. Ji kesekî/ê ku

di nav komîteyeke partiyê de cih negire re, mirov nikare bibêje kadro. Dikare bibêje: “Ez di nav rêxistinên din de me.” Dibe. Lê di nav rêxistinên nêzîkî PKK’ê de bûn, nayê wateya ku tu kadroyê PKK’ê yî.

Ji kesê/a ku 24 seatan di nav komîteyên partiyê de kar nake re, mirov nikare bibêje kadroyê PKK’ê. Ev bîst sal û sî sal berê wisa bû. Em vê niha îcat nakin. Berê rewşeke wisa hebû, lê piştre hate tesfiyekirin. Ji vê dûrketin û qutbûn derket holê. Di qada rêxistinî de tesfiyeyeke cidî bi pêş ket. Ev hemû tevlîhev bûn; hemû rêxistin û sazî niha tevlîhev in. Ji aliyekî ve parçebûn, ji aliyekî ve tevlîhevî, ji aliyekî ve bê kordînetî; bûye alozî û wisa berdewam dike. Kê ji kê re gotiye çi, kê çi kiriye… Êdî her kes li gorî xwesteka xwe tevdigere. Di rêxistineke bi vî awayî de, ew qas ezezîtî, ew qas keyfiyet û ew qas xwespartin derdikeve holê. Ger pergaleke rêxistînî ku bi awayekî rast dimeşe hebûya, ew tişt dibûn? Hinek kes kar dikin, her tiştê xwe datînin holê û feda dikin, laşê wan kun kunkî bûye, ji nexweşxanê direvin û diçin şer; hinek jî hinekî birîndar bûne, vê dikin hinceta xwejiyankirina çil salan. Navê vê jî dikin: “Gazîtî.” Gelo bi vî awayî dibe?

Niha pirsgirêkên wisa hene. pirsgirêkên me yên rêxistinî û pergalî tevlîhev in. Pîvan şîlo ne, tîtîzbûn tune, zanebûneke rast ya rêxistinê tune. Divê em vê diyar bikin. Nabêjin: “Ez partiyî me, di serî de ez bi nasnameya xwe ya partiyê heme û piştî wê nasnameyên rêxistinên din tê.” Nasnameya partiyê, wek nasnameyeke bê rêxistin tê dîtin. Ji ber vê rêgeza rêxistinbûnê ya partiyê bi kar nayê. Disiplîn û qeyîdeyên partiyê bi kar nayên. Gihîştiye asteke wisa dema ku kesek van rêgezan bi kar tîne jî dibêje: “Partiya vir jî, bi vî rengî ye.” Dema ku wisa bû, li gorî her cihî partî derdikeve holê. Partiya Bakur, partiya Başûr, partiya gerîla, partiya siyasetê, partiya çiyan, partiya bajaran… Partiyekê li her cihî xwe rêxistin nekiriye, bi navê her cihî partiyê xwe ava ne kiriye û rêxistina xwe bi pêş nexistiyî ye. Rewşeke wisa derketiye holê.

Rewşa heyî wisa ye. Hin cih wek hinceta vê rewşê, gef û girtinên dijmin nîşan didin û dibêjin: “Qeîdeyên veşartîbûnê zehmet dibin.” Lê ne wisa ye, li cihên ku hêsan e jî nayê rêxistinkirin. Cihê herî hêsan Maxmûr bû, niha Rojava ye, her wiha gelek cihên din yên bi vî rengî hene; li wan deran jî heman rewş heye. Wisa be, bi gef û zextên dijmin ve negirêdayî ye. Berê jî ev zext hebûn, lê dîsa jî PKK xwe rêxistin dikir. Derfet çiqasî pêwîst dikin û rê didin, dê tu jî ew qas xwe rêxistin bikî. Ji bo şoreşgerekî tu kes nikare bibe asteng. An na ger tu bibêjî: “Ez li gorî

derfetan xwe rêxistin bikim, ger derfet tunebin ez xwe rêxistin nekim.” Ev dibe oportînîzm. Ger tu bibêjî: “Li vê derê bi awayekî derveyî fermiyetê em nikarin bikin, ji bo ku fermî bibe jî divê pîvan bên guhertin, em li gorî pîvanên pergalê bikin.” Ev jî dibe revîzyonîzm. Ev tê wateya ji partiyê qutbûn û ji rêderketinê. Tu ber bi cihekî din ve diçî.

Niha ev tişt hene, mijareke balkeş e, lê em nîqaş dikin. Pirsgirêkên me yên kordînekirinê hene, em pir parçe ne. Pirsgirêkên partiyê û KCK’ê hene, wek pergal pirsgirêka parçeyan ya xwerêxistinkirinê heye, pirsgirêkên navendan yên xwerêxistinkirinê hene. Mesele navenda bîrdozîk, li her cihî dibe navendeke ku pir hêsan tê tesfiyekirin; dibe navenda ku herî dereng tê rêxistinkirin. Lê em tevgereke Serokatiyê ne, em li ser esasê bîrdoziyê bi pêş ketine. Rêxistinên din hene, lê navenda bîrdozîk nayê rêxistinkirin; an jî qada ku bi hêsanî tê tesfiyekirin e. Rêveberî girîngiyê nadinê, kadro jî di qada bîrdozîk de cih girtin ji xwe re wek biçûkbûnekê dibînin. Ger tu ji kadroyekî re bibêjî: “Tu kadroyê qada bîrdozîk î” ji xwe guman dike. Rewşeke balkêş e, dibêje “Gelo çiyê min heye ku ji min re wisa dibêjin.” Dev ji her tiştî berde, xebateke Serokatiyê ye. Herî zêde Serokatiyê ev xebat meşandin, lê feresata di me de heye jî, ev e. Hem em dibêjin: “Em bi Serokatiyê ve ew qas girêdayî ne” hem jî em di pratîkê de ew qas bi sekna Serokatiyê re dikevin nav nakokiyan.

Min raporek xwend; rêveberiya Bakur, giliyê ciwanan dikin. Dibêjin: “Êdî em bi hev re şer dikin û Tirkiye jî temaşe dike.” Parçebûna rêxistinî ew qas bi pêş ketiye. Çima? Ji ber ku rêxistinbûna ciwanan, wek şaxeke rêxistinê ye, cuda ye, li kêlekê disekine. Di rêveberiyan de cih nagire, tevlî plansaziyan nabe; li gorî xwe plan dike û rêxistineke cuda ye. Wek rêxistineke cuda xwe bi rê ve dibe. Dema ku wisa dibe, ciwanên PKK’ê û KCK’ê li holê namînin. Wisa nabe. Ev hemû wek pirsgirêkên pergalê hene û divê bên sererastkirin. Me ev nîqaş jî kirin. Pêkanîna yekîtiyê ne zehmet e; bi rastî jî ger em ji wê teori û stratejiyê bawer dikin, divê em li gorî wê rêxistinan ava bikin û rêveberiyên wê çêbikin û wan jî tevlî bikin. Rêveberiyeke me ya partiyê heye, ji 50’î kesan zêdetir pêk tê, lê hevalekî/ê ku ji xebatên ciwanan berpirsyar e di nav de tune. Em navendê kom dikin, lê di nav navendê de, hevalekî/ê ji ciwanan berpirsyar e tune. Me gazî hevalên ciwan kir û me got: “Dê werin û agahî bidin.” Ger wisa jî nebûya, dê navendê biryar bigirta û agahiya ciwanan jî pê nedibû. Jixwe rêveberî plansazî dike,

agahiya ciwanan qet pê nabe. Ew li wir tiştekî dikin, ciwan tiştekî dikin; rewşeke pir parçe derdikeve holê.

Ya rast, li gorî pêwîstiyên teori û stratejiya me, rêxistin nedîtine û ava nekirine. Li gel pirsgirêkên pergalî, pirsgirêkên şêwazê hene. Pirsgirêkên bikaranîna rast hene, di pîvanên rast yên konfedaralîzma demokratîk girtinê de pirsgirêkên me hene, di pergala rêxistinî ku bi jiyana komînal ve girêdayî be û bi awayekî kolektîf bimeşe de pirsgirêkên me hene. Di biryargirtinê de, lidarxistina civînên rast de, di bikaranîn û pêkanîna pergala rapor-fermanameyan de pirsgirêkên me hene. Civînên me pir giran in, xentalwarî ne û bê berhem in. Ji ber ku pir zêde amadekarî nayê kirin. Her tişt di her civînê de tê rojevê, ji ber ku em ew qas diaxifin em diwestin, mirov belave dibe. Ew civîn çima kom bûye; di serî de diyar e, lê piştre tevlîhev dibe, piştre her tişt dibe biryar û lîsteyeke mezin ya biryaran çêdibe. Wisa nabe, di her civînê de em rêxistinê ji nû ve belav dikin û ava dikin. Di nav salê de herî kêm em 4-5 civînên bi vî rengî dikin; rêxistin ava dibe û belav dibe, careke din ava dibe û belav dibe. Lê divê carekê were avakirin û tiştên din lê werin zêdekirin. Lê ya me her tiştî nîqaş dike û ji nû ve ava dike; di nav pergaleke wisa de jî em gelek rêgezan winda dikin. Rêveberiyên me rast nameşin, pergala me ya civînan bê amadekarî ye; ji kolektîvîzmê dûr e, yekîtiya ferasetê lewaz e, ji bo vê jî di girtina biryarên hevpar de qane bûn çênabe. Ya rast, ji ber ku heval ew qas diaxifin, di encamê de diwestin û dev jê berdidin. Çawa be tiştek dernakeve holê, her kes zanebûna xwe pêk tîne, ji ber ku kes, an jî saziyeke ku pir zêde dişopîne jî tune.

Karîneya rêxistinî lewaz e; kordînekirin, raporxwestin û fermandayîn, şopandin, ger kar nehatibin kirin hesab pirsîn tune. Ango kadroyek, ji aliyê pergalekê ve nayê rêvebirin. Li gorî pêwîstiyên wê pergalê tevgerîn çênabe. Dibêjin: “Ger ev alî nebe, ez ê derbasî aliyê din bibim.” Ji bo ezezîtiyê ew qas bingeheke fireh û deriyên ku ew qas vekirî hene; rêveberî û rêxistin, kadro rêxistin nakin û peywirdar nakin. Kadro xwe jî peywirdar dike, derdora xwe jî peywirdar dike. Yek jî her kes dixwaze rêxistinê araste bike û dibêjin: “Nizanim filan tişt bila wisa be, bêvan kes bila biçe wir.” Ê rêxistineke wisa çawa çêbe, dê çawa li ser piyan bisekine? Jixwe nikare li ser piyan bisekine.

Ya rast, pirsgirêkên bîrdozîk û rêxistinî, bi pirsgirêkên kadro ve girêdayî ne. Bi bûna kadroyê rast û bes ve girêdayî ye. Divê kadro xwe

bigihîne asteke têr dike; divê pîvanên rêxistinê rast fêm bike; divê şêwaz, xîtabet, islûbê rast bi pêş bixe. Di van mijaran de pirsgirêkên cidî tên jiyankirin. Di nêzîkbûnên me de, zimanekî nayê fêmkirin û gilover dike heye. Tiştên bi vî rengî zêde ne. Bi disiplîn û rêxistin tevgerîn, wek mekanîkbûnê tê îfadekirin. Em nebêjin sûtal (tolaz/lümpen) e, lê bi rastî jî di sekna rêxistinî de û di sekna kesayetî de sistbûnek heye. Heya gerîla, nikare sekneke leşkerî nîşan bide. Ketina rêza leşkerî jî, ji xwe re wek heqaretekê dibîne. Jixwe kadro qet nêzîkî wê nabin. Bi disiplîn û bi rêxistinî tevgerîn, wek heqaretekê tê dîtin. Lê ev taybetmendiyeke girîng ya Serokatiyê bû. Dema ku Serokatiyê pişta yekî/ê xwar bidîta, destê xwe diguvaşt li pişta wî dixist û digot: “Rast bisekine û rast biaxife.” Lê em nikarin temsîliyeta Serokatiyê bikin û Serokatiyê rast bidin der. Ji ber vê feraset û guftûgokirineke cuda ya Serokatiyê heye, ya her kesî li gorî xwe ye. Ya rast, bixwe çawa be, Serokatî jî wisa dinirxîne. Wisa dimeşîne û dibêje: “Serokatî jî wisa ye.” Lê ne wisa ye, ev şaş e. Ev nêzîkbûn, revîzekirina Serokatiyê ye, berovajîkirin e.

Serokatî, realîteyeke ku li derveyî me ye, divê em di serî de vê fêr bibin; ne li gorî xwe, divê em li gorî rastiya Serokatiyê fêr bibin. Nivîsên wî hene, dîmenên wî hene; vegotina xwe dike. Jixwe kesekî/ê ku bi qasî Serokatî vegotina xwe dike li vê cîhanê tune. Wisa be divê em rastiya wî berovajî nekin, divê em rast fêr bibin û rast tevlî bibin. Ger em ê tevlî bibin, divê em wisa tevlî bibin. Divê em Serokatî tevlî xwe nekin, em tevlî Serokatiyê bibin. Em hatin ku tevlî vê partiyê bibin, ne ku partiyê tevlî xwe bikin. Kadro kesê/a ku xwe tevlî partiyê dike ye, ne kesa/ê ku partiyê tevlî xwe dike ye. Kesa/ê ku tevlî Serokatiyê dibe ye. Lê di tevgerînên me de ne wisa ye; kesayeteke liberal heye, belave bûye, ji rastiya xwe dûr ketiye; Serokatî jî wisa dihesibîne û wisa pênase dike. Piştere jî dibêje: “Ez baş tevlî bûm.” Yên din jî gumanbar dike û gelek navan lê dike.

Serokatî ji bo kadro got: “Haqîqeta ku hatiye rêxistinkirin û çalakger bûye.” Rêxistin heye, çalakî heye; wisa serserîtî û mejî valetî tune. Bûna kadro, wek heqîqetê nirxand. Ger heqîqet jiyana azad be, kadro li ser xeta Serokatî nunerê jiyana azad û jiyana bi vîn e û giştî ye, wisa ne parçe parçe ye. İslûb, şêwaz, nêzîkbûn, jiyan û xebata wî/ê yek e. Hemû di çorçevaya disiplîn û pîvanekê de ne. Kemal Pîr got: “Ji aliyê rihî ve em yek in, giştî ne; rihê Rêber Apo, rihê me hemûyan e; kesên ku bi Rêber Apo re yekîtiya rihî çênekirine, ajanên ku ketine nav me

ne.” Wisa be divê em partîbûn û rêxistinbûnê, wek tevlîbûnekê bigirin dest, divê em wek pejirandina rêgez û pîvanên Serokatiyê bigirin dest.

Çima em van dibêjin? Niha ew qas pirsgirêkên kadro hene; pirsgirêkên bîrdozîk, rêxistinî, pergalî, ferasetî û şêwazî hene. Ji vî aliyî ve pirsgirêkên kadro pir in. Îro pirsgirêkên me yên kadrotiyê bi vî awayî dernakevin holê; em nabêjin: “Kadro kêm in, em zêde bikin; em kadroyên nû tevlî bikin û perwerde bikin; kadroyên ku me perwerdekirine, em peywirdar bikin.” Ne wisa ye. Ger pirsgirêk ew bûya, pêkanîna van hêsan e. Tiştê ku em wek pirsgirêka kadro datînin holê; her cure rewşên rihî, nêzîkbûn, feraset û li gorî xwe bûn hene; êrîş dikin û piştre jî dibêjin: “Me sererast bikin. Bila hinek werin û van pirsgirêkên me çareser bikin.” Pirsgirêkên kadro bi vî awayî derdikevin holê. Ev pirsgirêk li ser esasê pêwîstiyên rêxistinî bi pêş neketine. Ev pirsgirêk, di nêzîkatiyê de yozbûnê û tesfiyegeriyê îfade dikin. Ji rêgez û pîvanên partiyê qutbûnê îfade dikin. Ji ber vê têkoşîneke mezin pêwîst dike. Di vê derê de, perwerde li hemberî van têkoşînkirin e.

Perwerde, li hemberî yozbûn û ji rêderketinên ku di sekna kadro de û di jiyana partiyê de bi pêş dikevin, têkoşînkirin e. Li hemberî belavabûn û yozbûnên di kesayetên xwe de têkoşîn dayîn û li gorî pîvan û rêgezên partiyê xeba, jiyankirin û xwe zivirandina kesayeteke rêxistinkirî îfade dike. Ev tişt çarçove, peywir û berpirsyariyên perwerdeya me jî diyar dikin. Divê bi awayekî din, em perwerdeyê negirin dest, bi peywirên cidî yên sererastkirinê dagirtiye. Wisa be divê em li gorî van pêwîstiyan perwerdeyên xwe li dar bixin û di vê de pîvanek girtin girîng e. Dibe ku li hemberî vê jî dernekevin, lê pîvanên têkoşînê li gorî xwe ne, ya xwe rast dibînin û dibêjin: “Bila her kes li gorî me be.” Na, ya rast ya partiyê ye. Yên ku bi biryarên partî û Serokatiyê hatine diyarkirin in. Divê kadro jî li gorî wê be û tevlî wê bibe. Divê kadro wê bipejirîne, ji dil qebûl bike û li gorî wê xwe biguherîne. An na, yên derveyî xwe jî şibandina xwe nabe. Ger bala we kişandibe, ji ber vê pir zêde rexne tên kirin, lê pir kêm rexnedayîn tê dayîn. Ji ber ku pir zêde rexnedayîn bi pêş xistin, xwe şibandina partiyê ye û tevlîbûna partiyê ye. Rexne kirin jî, yên din şibandina xwe ye. Ger em pir zêde dikarin rexneyan bikin û nikarin rexnedayînê bidin, wateya wê ev e; em tevlî partiyê nabin, em hewl didin ku partiyê tevlî xwe bikin. Divê êdî em dev ji vê berdin, wisa nabe û ev ne sekneke rast e.

Ya rast, xwe tevlîkirina partiyê û lî gorî pîvanên rast xwe tevlîkirin û kişandina rêgezên rast e. Di cewhera xwe de pirsgirêkên me yên perwerdeyê tune, pirsgirêkên me yên tevlîbûnê hene. Di tevlîbûnê de nexweşî û pirsgirêk hene, berovajîbûn hene. Divê em vê sererast bikin û bi awayekî rast tevlî Serokatiyê bibin. Divê bi zanebûn, rêxistinkirî, çalakger û di nav yekîtiyeke armancê de em tevlî bibin. Divê em 24 seatan rastiya Serokatiyê jiyan bikin û bidin jiyandin û wisa tevlîbûneke çêbikin. Rast tevlîbûn, van tiştan îfade dike. Ger di jiyankirinê de qisûr hebin, tevlîbûnê jî xirab dike, yoz dike û mûnafik dike. Di demên berê de, Serokatî pir zêde li ser peyvên "Mûmîntî û munafiqtiyê" sekini. Ji yên ku rast tevlî nabin û oportînîstiyê dikin re Serokatiyê digot: "Munafiq." Di zimanê berê de oportonîzm, munafiqtî ye. Wisa be, divê mirov nebe munafiq û bibe mûmînê partiyê. Di cewherê xwe de, perwerdeya me perwerdeyeke ku kadro bizivirîne mûmînan e. Hewldana wê ye. Di perwerdeyê de armanca ku em dixwazin xwe bigihîninê, ev e.

**PKK WEK VÎNA AVAKERIYÊ Û VÎNA XWEBÛNÊ DERKET HOLÊ**

Pirsgirêk wisa kûr in. Ne ku aliyên wê yên nû jî tune, aliyên wê yên nû jî hene. Lê yên pir hêsan jî hene. Yên ku bi a-b-c ya vî karî ve girêdayî jî hene. Dibe ku em wek Serokatiyê ne bi pêşbînî bin, dibe ku em her tiştî wek berê bi rê ve nebin. Gelo em qet tiştekî nabînin? Qet hêza me ya nirxandinê û hêza me ya dîtina dibêtiyan jî tune? Ger yekî me nikare vê bike, divê 3-5 heval bên gel hev, nîqaş bikin û pêk bînin. Em dikarin bikin. Yên ku di nav partiyê de ne, yên ku tevlî partiyê dibin û demekê perwerdeya Serokatiyê dibînin, mejî û zimanê wan vedibe. Ne di asteke biçûk de ye, dikare li ser hemû cîhanê nirxandinan bike. Ji ber vê gotina: “Me tiştek fêm nekir, me nedît û nebihîst, em nizanin û ji ber vê jî me nekarî em bikin” ne rast e. Wisa be, çima me nekarî tiştên ku em dizanin û dikin biryar, çima pêk naynin? Herî kêm, pêkhatina van bi xwe re hinek din serkeftin anîbana, lê ev jî nabe. Bi rastî jî ji sedî yekê biryaran pêk tê.

Civîna navber ya Kongre-Gel, ji sed xalî zêdetir, kirin biryar. Ji xeynî Tirkiyeyê, makeqanûna tu dewletan ne di ser sed xalî re ye. Lê biryarên ku Kongre-Gel di civînekê de girtine, di ser sedî re ne. Civîna rêveberiya PKK’ê ji ser heftî re biryar girtin. Civîna nirxandina salekê bû. Tenê me 4-5 rojev nîqaş kirin, lê ew qas xal bûn biryar. Niha em ew qas biryaran digirin, lê pêkanîn li ku ye? Ji sedî yek jî nayê pêkanîn, pêkanîn tuneye. Nêzîkbûneke wek ku di civînan de biryar girtin, dê her tişt çareser bibe heye, lê şaş e. Ji vî aliyî ve civîn kirin baş e û pêwîstiyeke; pêwîstiyeke girtina biryarên kolektîf e. Lê ger biryarên ku di wir de tên girtin, nayên pêkanîn, ev dibe oportînîzm, dê li wê derê yozbûn û tesfiyegerî bi pêş bikeve.

Çawa ku civîn rêxistinan ava dikin, ger rast neyên arestekirin û bi baldarî neyên meşandin, dê xirab jî bikin. Gelo Partiya Komînîst ya Yekîtiya Sofyetan, di kongreyê de belav nebû? Di kongreyê de hat belavkirin; Yeltsîn rabû ser piyan, destê xwe li maseyê da û got: “Ez xwe dikişînim.” Partî wisa belav bû, piştî wê jî partî nema. Wisa be divê mirov nekeve şaşiyan, şaşiyên wisa cidî hene. Heval dibêjin: “Çima ew qas perwerde tên lidarxistin, ruxmê ku em dizanin çima ev pirsgirêk nayên çareserkirin?” Perwrde, civîn û biryar çima pirsgirêkan çareser nakin? Ji ber ku şaşî hene. Her tişt tê rojevê; dê çi bibe û çi nebe, tişên

ku me kirine jî em dîsa dikin biryar, tevlîhev dibe, cardin jî nikarin bizivirin û bişopînin.

Dema ku me di civînekê de nîqaş dikir, hate rojevê; min girtekên civîna berî wê vekirin û tiştên ku min nivîsandine derxistin û min got: "Va ew hatine nivîsandin." Em biryarên civînan pêk tînin, an na? Ji bo vê min girtek derxistin û xwendin. Tevlîhev e, em wisa pir bi baldarî pêk naynin. Di wê derê de, mirov çi bike nizane. Tiştekî şênber mirov nikare bibîne, an şîlo ye, an jî her tişt tê de heye, ji ber vê nayê dîtin. Ne ku qet tiştek tune, heye lê wisa dimîne. Dema ku civîn xilas bû, her tişt wek xwe dimîne. Jixwe tu kes nazivire û pişta xwe mêze nake. Êdî çi fêm kiriye, bixwe çi rast dîtiye, wê pêk tîne. Ezezîtî jî wisa bi pêş dikeve. Pirsgirêk di nezanebûn, fêmnekirin û biryarnegirtinê de nîn e. Bi baldarnebûn û bêpergalî heye. Bi rastî jî ji pêwîstiyên bûna rêxistinê dûr ketin heye. Dibe ku ev hemû hebin, pirsgirêk in, dibe ku yên girantir jî hebin. Lê mirov têkoşîn dike û ji holê radike. Ji ber ku ev pirsgirêk hene, divê tirs û xofek bi me re çênebe. Hêzeke ku têkoşîn dike, dikare van tiştan hemûyan ji holê rake. Tiştê balkêş, an jî aliyê wê yê neyînî ev e; nikare têkoşîn bike. Dê têkoşîn bi rêxistin û bi yekîtiya ferasetê pêk were. Hewldaneke ku dibêje, em van pirsgirêkan bi hev re çareser bikin tune; ji pirsgirêkan ecizbûn tune. An jî pirsgirêk bi rêbazên rêxistinî girtina dest, bi şêwaz û rêbazên rêxistinê çareseriyê gerîn tune. Cihê wê, bi rêbazên derveyî rêxistinê pirsgirêkan zêdetir tevlî hev dike. Gotegot, hev û din dayîna nîqaşkirinê û li hemberî hev û din zimandirêjî, her neyînî mêze kirin û li derdora xwe neyînîtî belavkirin heye.

Di ser şoreşa Rojava re 2 sal û 6 meh derbas bûn. Di 1'ê mijdarê de, ji bo şoreşê cîhan rabû ser piyan; ji Efgasîntanê heya Emerîkaya Latîn, ji Ewrûpayê û Efrîqayê gel meşiyan. Lê wek rêveberiya vê şoreşê, me peyveke erênî, hêvî dide û rihê mirovan berfireh dike nedît. Jixwe kêm be jî bi awayekî rast nirxandin û analîza rewşê nehatiye kirin û wane jê nehatine derxistin. Xebat û nirxandineke bi vî rengî tune. Lê moral dayîn û rih jî tune. Her neyînî mêzekirin heye. Tiştên ku ji pêşeng, kadro û partiyê xwe dide der, her neyînîbûn û reşkirin e. Hev û din reşkirin e. Herî dawî Konseya Serokatiya Giştî, ji bo li ser sekinandina vê mijarê gelek meteryal anîne. Tamam, em li ser bisekinin, lê ji sê paran du parên partiyê li Rojava ne. Bila partî li ser me bisekine, yên li Rojava bila li ser me bisekinin. Dibêjin: "Em pêşeng in, me çira pêxist." Wê demê bila me ronî bikin. Lê ev tune. Ya rast ji bo bindestan

bû çirayek, lê hevalên me kêm mabû ku şoreşê bizivirînin erdhêjê. Çawa li ber xwe didin, çawa çêbû, bi çi çêbû? Ger rojekê çîroka wê were nivîsandin, gelo baş nabe? Dê wê demê rewşa wir bê fêmkirin. Dema ku hinek pêşketinên erênî dibin, kesên ku hema xwe dinepixînin û xwe winda dikin (wek ku çiyayên biçûk jî wî/ê avakiribin) derdikevin holê. Lê dema ku rewş hinekî dikeve zehmetiyê û tengasî çêdibin, rewş cuda dibe. Niha rewş wisa ye.

Bi me re hevpeyvînek kirin û gotin: "Efrîn ketiye nav fikaran, ê niha çi bibe?" Çûne û ji Tirkiyeyê alîkariyê dixwazin. Tiştên ku li Kobanê pêk hatin diyar in, her tişt li holê ye. Dibêjin: "Hûn bi Serokatiyê re di nav diyaloxê de ne, divê hûn bi me re jî di nav diyaloxê de bin. Çima hûn diçin Îmraliyê û hûn nizanim çi nadin me?" Nizanim bi kîjan mejî û bi kîjan mentiqî wisa tevdigerin. Serokatiyê, ji bo Kobanê pir hişk rexne kir, wisa be ev rexne qet li ber çavan negirtine. An van gotinên Serokatiyê nebihîstine, an jî di hawayê xwe de ne. Wisa nabe. Dê tu ji aliyekî ve bibêjî: "Li pişt DAÎŞ'ê Tirkiye heye." Ji aliyê din ve jî tu yê bibêjî: "Li hemberî DAÎŞ'ê bila Tirkiye me biparêze û alîkariyê bide me." Ev, xwe îxbarkirin e. Di serî de Kobanê hate îxbarkirin, gotin: "Cihê me yê herî lewaz Koban e, de êrîşî Kobanê bikin…" Dijmin jî hat û êrîş kir. Niha jî li Efrînê wisa dikin. Ev rewşa rihî, ne rihekî şoreşgerane ye.

Dema ku PKK derket, ne wisa bû. Ez vekirî bibêjim, ger PKK wisa bûya, ez tevlî nedibûm. Ger derketin û islûbê PKK'ê wisa bûya, dev ji tevlîbûnê berde, min silav jî lê nedikir. Em ê li gel kesên ku li derdora xwe neyînîbûnê belav dikin, çi bikin? Ji ber ku me PKK, wek hêzeke ku kêmasiyên me ji holê rake dît, em tevlî bûn. Tevlîbûna min wisa bû, ez dikarim vê bi awayekî zelal bibêjim. Niha rewşa heyî û têkiliya PKK'ê heye? Divê em bizanibin ku kîjan nirxandinê bikin. Bi rastî jî divê em bikaribin rexneyan bikin û rexnedayînê bidin. Divê em hêza xwe ya rexnekirinê winda nekin; lê divê li ser esasên avaker, li ser esasê pêşketin afirandinê û serkeftinan bikin.

Li Rojava jî, qaşo rexneyan dikin; lê ne li ser esasê sererastkirinê ye, her teoriya felaket û xeteriyan tê kirin. Ji binî heya serî, neyînîbûn heye. Jixwe hê di ser şoreşê re heyvek derbas nebûbû, hevalan dest pê kirin, hem jî hevalên Rojavayî bixwe dikirin. Gotin: "Gelo ev rêveberiya me baş e, an rêveberiya Baasê baştir e?" Navên wan jî dibêjin, lê li vê derê gotina me rast nabe. "Gelo filan rêveberî baş e, an rêveberiya Baasê baş bû?" Piştre vê xwe di nav gel de jî da der, ji ber vê dema ku

li gelek cihan zehmetî derketin, dest bi nîqaşan kirin. Gotin: “Kîjan baş e?” Ev rewşên derveyî cîdiyetê ne. Ya rast, ger rêxistineke baş dimeşe hebe, ev hemû pratîkên sûç in. Ne li kêleka PKK’ê, di nav PKK’ê de ev tişt tên jiyankirin. Berê li cihên ku PKK lê heye, sekin û nêzîkbûnên wisa dernediketin. Lê niha hene, islûb ev e. Dibêjin: “Tu çiqasî binalî, gilî bikî û li ber hinekan bigerî, tu yê ew qas qezenc bikî. Ger tu çiqasî bibêjî, ez lewaz im, tu yê ew qas bi marifet bî.” Çi têkiliya vê bi PKK’ê re heye. Ev nalîna koleyan e; di yên ku vê dikin de rih û zihniyeteke azadiyê tune. Ev islûb, teqez ne islûbê zanebûna azadiyê ye, islûbê koleyan e.

Em dibêjin: “Me şoreşa azadiyê kiriye.” Lê di nav wê de kole dinalin, xwe parçe dikin, çima? Ji ber ku koletî tê ruxandin, tiştekî ku nayê fêmkirin tune. Koletî diruxe û yên ku li ser pişta koletiyê serweriya xwe dimeşînin, bê desthilatdarî dimînin. Divê serweriya kadro ya ku heye, em wisa binirxînin. Ger kî wisa nêzîkî vê pêngava şoreşê bibe, bizanibin ku ew kole ye. An jî ezbeniyê (efendî) wan koleyan e. An ji ruxîna koletiya xwe ditirse, an jî ji ber ku ezbenîtiya wî ji dest diçe ditirse. Ji ber ku ji azadiyê ditirse. Bi vî awayî nabe. Teqez ew ne islûbên ku bên qebûlkirin in, ne islûbên ku em bala xwe bidinê ne, ne islûbên ku mirov girîngiyê bidê ne. Her gilî bike, lewaziyê wek marîfetekê nîşan bide û her bendewarê hinekên din be û bibêje: “Bila hinekên din bikin.”

Xeteke ku wek “Xeta nîjadperest û reformist” tê binavkirin heye. Xeta Kemal Burkay e, em vê xetê pir baş nas dikin. Ger ew xet rast bûya, pêwîstî bi PKK’ê tune bû. Jixwe beriya PKK’ê jî hebûn. Serokatiyê ev red kir û derket holê. Li hemberî vê xetê têkoşîn kir û derket holê. Ew xet wisa bû: “Li ber hinekan bigere, dibe ku hinek tiştan bidin te.” Xeta libergerînê, xeta koletiyê ye. Ne xeta kesên ku azad dibin in. Rêber Apo, bi rexneyên giran ew xet red kir. Got: “Em ê bikin.” PKK wek vînekê pêkanîn, avakirin û hêza cewherî derket holê. Tiştên ku dikarî, pêk anîn; pêkanîn, wek karê xwe dît. Neket bendewariya hinekên din. Lê tiştekî wisa kirin nav rêxistinê ku navê PKK’ê heye, lê hecmê wê tune. Tenê wek nav maye, ji wê sûd digirin. Lê tiştên ku li ser navê PKK’ê tên gotin û hewldana pêkanînê tê nîşandan, bi PKK’ê re tu eleqeya wê tune. Di rewşeke ku hatiye berovajîkirin de ye. Ya herî xirab jî, ew rewş giştî bûye û şaşbûna wê nayê dîtin. Nabêjin: “Divê em li hemberî vê têkoşîn bikin.” Di vê mijarê de her kes bi serê xwe ye; hinek vê wek marîfet jî dibînin, hinek ji nedîtî ve tên, hinek pir girîngiyê

nadinê. Hinekên me jî bi awayekî şexsî, li gorî xwe rexne dikin, lê sekneke rêxistinî li holê tune.

Ma partiyek wisa dibe? Ka partî yekîtiya ferasetê bû. Dev ji yekîtiya rêxistinî û çalakiyê berdin, lê yekîtiya ferasetê bû. Wek rewşenbîrekî tevlîbûna partiyê jî pêwîst dike ku mirov bername û rêziknameya wê qebûl bike. Gelo nepejirandina bernameyê ye, pejirandina dîtinên di wê derê de qebûlkirin nîn e? Gelo nayê wateya yekîtiya ferasetê? Teqez tê wê wateyê. Lê bala we kişandibe, di me de ev jî tune. Di vê mijarê de dejenerebûnek heye, çawa? Di demeke ku pir amadekarî nehatiye kirin de û di wê astê de hatiye kolekirin de; tu pîvanên teqez yên azadiyê dispêrî vê parzemînê. Divê mirov derketin û meşa Serokatiyê wisa binirxîne. Ew spartin, bi zehmetiyên cuda û bi şiyarkirina hevesên xeyalî mirovan kom dike û dimeşîne. Lê zehmetî hene, divê mirov têkoşîn bike û derbas bike. Her ku mirov bi zehmetiyan re rû bi rû dimîne, hêrs û berteka mirov jî çêdibe; dema ku ew kesê/a dimeşîne dixetime û tê asta nikare bimeşîne, ew hêrs û bertek derdikevin holê, çi di hundirê wan de hebe vedireşin. Serokatiyê tiştên ku piştî komployê hatine kirin, wisa nirxandin. Ev nêzîkatiyên ku nayên partîbûnê; nêzîkbûnên ku parçe dikin, belav dikin û cuda dikin in; nêzîkbûnên ku reş dike, gotegotan dike hemû ji ber vê ne. Hinceteke wê ya cuda jî tune. Pirsgirêka herî cidî, ev rewş bi xwe ye.

Dema ku di vê mijarê de rexne tên kirin, ev bertek tê nîşandan; “Binêre, em li gel hev in.” Jixwe em ne li gel hev bin, ev nîqaş jî çênedibûn. Lê bi serê xwe li gel hev û din bûn, têrî nake. Ango dixwazin bibêjin: “Binêre, em nereviyane.” Pîvana partîbûn û milîtanbûnê, wek nerevînê dibînin. Ger tu nereviyabî, tu milîtanekî/e başî! Ew di sînorên revînê de mayîn e. Dibêje: “Ez dikarim birevim jî, hema di vê kêliyê de jî revîna min gengaz e. Ger ez nerevim, divê tu tiştekî nebêjî. Ez serkeftî me, ger ez birevim jî mafê min e, tu kes nikare tiştekî bibêje.” Li cihekî wisa mayîn heye, gelo ew ne mayîna di sînor de ye? Serokatiyê got: “Hûn ji sedî yekê pêk tînin, di ser sifrê re yek.” Vê rewşê diyar dike. Sînorê sifrê, ango nêzîkbûneke di bin vê re revîn e, ma wisa tevlîbûna rêxistinekê dibe? Bi vî rengî kadrotiya rêxistinê dibe? Bi van pîvanan rêxistinek dikare kar bike? Mirov dikare wisa têkoşîn bike û bimeşe. Yek jî li Kurdistanê mirov dikare vê bike? Di nav civaka ku neçar maye şerê cîhanê bide û ji xeynî hêza xwe ya cewherî tu piştgiriyên wê tune de, bi vî awayî têkoşîn dibe? Nabe.

Bi rastî jî mejiyê hevalan li ku derê ye? Ger wisa bûya, PKK'ê dikarî ji destpêkê ve xwe ava bike? Dikarî gavekê bavêje? Nedikarî. Pêwîst nake ku mirov vê îspat bike, ew qas vekirî ye ku pêwîstî bi îspatan tune. Jixwe partîbûneke ku hatiye jiyankirin heye, em ne pir dûrî vê PKK'ê ne û em ne pir dûrî rastiya dîrokê ne jî, em di nav de jiyan dikin. Her hevalek xwedî çîrokekê ye. Di rapora gaziyan de digot: "Her gaziyek, çîroke wî/ê heye." Dema ku li gorî wan be, hevalên me tiştên wisa xweşik li hev tînin. Lê dema ku mirov berjewendiyên gel, rêxistinê û têkoşînê bipirse, bersivek li holê tune. Ji wî milî ve ne difikire, ne nîqaş dike, ne tevlî dibe, ne jî lêkolîn dike. Ji rêxistinê qutbûn ev e û ezezîtî wisa dest pê dike.

Tiştê ku tesfiyegeriyê dispart partiyê, jixwe helandin bû. Tesfiyegeriya 2002-2004'an ji aliyê rêxistinî ve helandin dispartin me. Xwestin rêxistinê bi dest bixin, dema ku nekarîn vê bi ser bixin jî; vê carê helandina rêxistinê ceribandin. Ev nêzîkbûn, nêzîkbûna helandinê ye. Ezezîtî, destpêka helandinê û bingeha wê ye. Ger ezezîtî neyê derbaskirin, dê helandin û belavebûn bi pêş bikeve. Tesfiyegeriya 2002-2004'an, karî bibe rêxistin? Ev deh sal in, di nav sergoya Barzanî û Talabanî de diçêrin. Karekî herî biçûk ku karine bikin heye? Tuneye. Jixwe li ser wê hebûna xwe bi pêş nexistin ku li ser esasê radestbûna pergalê û domandina jiyana xwe ya şexsî hebûn. Derketina wan jî ew bû, lêgerînên wan jî ew bûn. Ji ber vê em niha nikarin bibêjin: "Em parçe nabin, em ji hev û din naqetin, em li gel hev in û em di rewşeke baş de ne." Ne wisa ye. Rast e, lê em li ser esasê çi disekinin? Peywir û berpirsyariyên me çi ne? Partî dixwaze çi bike û em van dikin, an na?

Mirov ji bo jiyankirinê nayê PKK'ê. Mirov ji bo rûniştin û sekinandinê nayê. Rêgezên wê hene, armancên wê hene, rêxistineke têkoşînê ye. Rêxistineke ku xwe dispêre hêza xwe ya cewherî û 24 seatan şer dike ye. Em tên rêxistineke wisa û em tên şer bikin, em hemû ji bo şer bikin hatin. Serokatiyê bangawaziya şer kir, jixwe piştî ku gerîla hate îlankirin, bû bangawaziya gerîlatiyê. Beriya wê jî wisa bû. Ji tu kesî re negot: "Bên Kurdistanê û jiyan bikin, bila PKK jiyanê bide we." Kî bibêje, wisa hate gotin, derew e. Em hemû vê baş dizanin. Dema ku şer nebû jî, PKK'ê got: "Dê şer bibe, werin û şer bikin." Bangawaziya "Werin em şer bikin" kir. Her kes bi vî rengî hat, tu kes nikare tiştekî cuda bibêje. Yên ku dijberî vê diparêzin, bila werin îspat bikin, em her tiştî ji wan re bihêlin.

Ger em hatibin bangawaziya şer, tê wê wateyê ku em hatine rêxistina şer. Ger em li ser vî esasî 24 seatan şer bikin, dê em hebin, hem jî em di xeta serkeftinê de şer bikin. Bila qet xebera te ji vê tune be, vê pirsgirêkê negire ser xwe, tu tiştekî têkoşînê nebîne û vê derê wek cihekî jiyanê bibîne. Karekî herî biçûk jî neke, di lêgerîna derfetên xwe jiyankirinê de be. Dema ku ew derfet nedan te jî, gilî bike, çep û rasta xwe gumanbar bike, xirab û belav bike. Gelo wisa dibe? Ger rêxistin li ser seknên wisa bisekine, li hemberî wê têkoşîn bike, van red bike dê ne mafdar be? Divê em rasteqîn nêzîk bibin û bi daraz nêzîk bibin. Şoreşa wijdanê, di vê derê de pîvangirtin e, divê em kêmekî xwedî wijdan bin. Lê bala we jî kişandibe, ew tişt tune ne, di van tiştan de pir zêde lewazî çêbûne. Ji rêderketin, piralî ye; êdî dikare ji her cihî bandor bibe. Dê bandorên tesfiyegeriyê bibin, bandorên şerê taybet û psîkolojîk bibin, bandorên hevkariya dijmin bibin, bandora psîkolojiya ku şert û mercên zehmet derdixin holê bibe. Lê çawa dibe, bila bibe; ji ku bandor bibe bila bibe, tesfiyegerî tesfiyegerî ye. Tu wate û girîngiyeke hinceta wê nabe, bi vî awayî nabe. Divê teqez ev tişt bên dîtin.

Divê sekn, bertekeke hevpar; islûb û feraseteke hevpar derkeve holê. Têkoşîna bîrdozîk meşandin û bûna rêxistineke ku li ser esasê rexne û rexnedayînê dimeşe, ev tişt pêwîst dikin. Ger wisa bibe, dê ev hemû bên çareserkirin. Ne ku nayên çareserkirin. Jixwe ev ne tiştên ku ji ber nefêmkirinê pêk tê ne. Ev tişt, tehrîk, bertek û ecizbûnên ku bingeha xwe ji ajoyên ji rêzê yên jiyana şexsî digirinin. Ya rast, bêzarbûnên şexsî ne. Ev tiştên ku mirov bi têkoşîneke rêxistinkirî ya bîrdozîk bigire bin hakîmiyetê û herî kêm mirov bikişîne astekê bê zirar in. Ew tiştên ku nebin, nîn in. Ji bo ku wisa be, pêwîstî bi têkoşîneke bîrdozîk-rêxistinî heye.

Yek jî divê ew têkoşîn bi awayekî rêxistinkirî bimeşe. Fikra hevpar, sekna hevpar û nêzîkbûnên rêxistinî pêwîst dikin. Yekîtiya dîtinê, yekîtiya nêzîkbûnê, yekîtiya têkoşînê kirin pêwîst dike. Ji bo ku mirov bikaribe vê bike jî, divê mirov xwedî armanc be û li ser esasê armancên hevpar bibe yek. Ji bo ku mirov bikaribe hin tiştan bi ser bixe, divê mirov bibe xwediyê angaştên mezin û jiyanê fedayê vê serkeftinê bike. Mirov nikare wisa bibêje: "Dev jê berde; jixwe dema wê derbas bûye; bibe jixwe bûye, nebe jî nabe; ma em ê cîhanê rizgar bikin." Di nav me de dev jê berdan heye, pir zêde xwe dide der. Wisa tirsîn heye, bipêşxistina teoriya nabe heye. Ya herî xirab jî, dema ku bi pîvanên

xwe jiyan bike û tevbigere û bi ser nekeve; vê carê berpirsyariyê tavêjin ser xeta Serokatiyê. Dibêje: "Binêrin, em dikin, em ew qas biryar digirin, têkoşîn dimeşînin, lê nabe." Nabêje ku "Ya rast, em wek têkoşînê dikin nîşan didin, lê em têkoşîn nakin û her tiştî xirab dikin, em xetê xirab dikin."

Herî dawî Serokatiyê got: "Tiştên ku hûn dikin, ne yên min in, navêjin ser min. Bêjin ku 'em dikin' bila serkeftin jî ya we be, bila serneketin jî ya we be. Jixwe serkeftina we tune, qet nebe binketinên xwe navêjin ser min. Li ser navê xwe bikin, ger we bi ser xist, bila serkeftin ya we be; lê dema ku we bi ser nexist jî, libinketinên xwe xwedî derkevin. Xeta min ya serkeftinê, qirêj nekin." Ma di fermanameya herî dawî de jî wisa nedigot? Wisa ye. Serokatî hat cihekî wisa. Sekna me, sekna rêxistinê û kadroyan wisa nirxand. Ji ber ku, bala xwe bidinê; bi rastî jî sekna ku bi dijmin re mijûl dibe, pir lewaz e. Mesele êrîşî Rojava kirin, van êrîşan rewşeke cuda derxist holê, ger wisa nebûya, dê çawa bibûya kes nizane. Rewşa Rojava jî, ya cihên dîtir jî; pêşketina şer hinekî kişand xetê. Bi zora dijmin dike. Înkarker e, di cewherê xwe de ji bo wê êrîş dike, ger êrîş neke û hinekî pêşiya me vebe, em ê çi bikin, ne diyar e. Lê dijmin nikare vê qebûl bike, tehemûl nake û sebir nake. Ger hinekî tehemûl bike, dikare vê rêbazê li hemberî me biceribîne.

Bêguman em ji mînakên li derveyî xwe jî waneyan derdixin. Pir tê nîqaşkirin, gelek heval ji Tirkiyeyê hatine, niha dizanin. Li holê partiyeke wek CHP'ê heye, divê em hinekî lê binêrin û waneyan jê derxin. Qaşo partiya ku dewlet ava kiriye, partiya ku xwediyê milet e, partiya Kuva-î Mîlî ye. Ew têrî hin tiştan nakin. Ji ber vê em jî nikarin ji bo xwe bibêjin: "Partiya ku rastî derxistine holê ye, partiya ku berxwedan bi pêş xistiye; partiya ku rih, hest û zanebûna netewî derxistiye holê ye; partiya ku gerîla derxistiye holê ye." Ev tişt rast in, lê têrî nakin. Em nikarin PKK'ê jî bi van taybetmendiyan pênase bikin. Bi rastî jî seknên ku dixwazin PKK'ê wisa pênase bikin û di vir de bihêlin hene. Ji CHP ya ku siyaseta dewletê ya demekê dimeşand re gotin çi? Gotin: "Êdî serweriya te xilas bû." piştî wê CHP, li Tirkiyeyê bû mijara henekan. Niha bûye hêza ku partiyên deshilatdariyê pê li piştê dikin û derdikevin ser koltixên xwe ye. Ji xeynî Ecevît, tu kesî nikarî vê partiyê bike deshilatdar. Jixwe ya Ecevît jî çawa bû, her kes dizane. Di encamê de wî jî got: "Ev partî wisa nameşe." Û dev jê berda. Çima? Ji ber ku serweriya wê xilas bû.

Ez çima vê dibêjim? Hinek nêzîkbûn û seknên ku derdikevin holê, ji bo PKK'ê jî hin dîtinên wisa bi pêş dixin. Nexwe ne xwezayî ye. Rêxistineke têkoşînê, rêxistineke şoreşa azadiyê dimeşîne wisa nabe. Ger em PKK'ê wek pêşengê şoreşa azadiyê bibînin, teqez em van tiştan qebûl nakin. Ger wisa nêzîkbûn çênebe, tiştên bi vî rengî derdikevin holê. Mirov dikare bi hêsanî vê bibêje; nêzîkbûnên wisa derveyî xwezaya wê, ji ku derdikevin. Em hewl didin ku lêkolîn bikin. Wek ku bandor û rista PKK'ê xilas bûbe, dema wê derbas bûbe, nêzîk dibin. Gelo tesfiyegeran jî wisa nedigotin? Di 2002-2003'yan de dema ku Serokatiyê got: "Hûn dikarin navê PKK'ê jî biguherînin, pirsgirêkên me yên bîrdozîk hene…" Ev jî bi kar anîn û di parzemîneke wisa de, wek feraseteke ku em hemû jî bandor kirin û xapandin, ev gotin derxistin pêş; "Bandora PKK'ê xilas bû, bû dîrok, êdî dê tiştên nû hebin." Nêzîkbûnên ku di PKK'ê de guherîna paradîgma û ji nû ve avabûnê wisa fêm kirin çêbûn. Ma nebûn? Hem jî zêde bûn. Gelo tesfiyegeriyê, ev nêzîkbûn wek teori pêşkêş nekirin û ji bo xapandina her kesî, ev nespartin partiyê? Spartin. Li ser partiyê ferz kirin. Niha tesfiyegerî hate derbaskirin, di wê astê de spartinek tune; lê bala xwe bidinê, bandora wê hê jî ji holê ranebûye. Hê jî di bingeha gelek tiştên ku wek pirsgirêk derdikevin pêşiya me de, ev heye.

PKK, paşverû tê dîtin, wek ku dema wê derbas bûye tê dîtin. PKK, dijberî demokrasiyê tê dîtin. Ew xeta nijadperest û reformîst, PKK li pêşiya çareseriya pirsgirêka Kurd asteng dibîne. Rengvedanên (yansıma) vê di nav me de jî hene. Li pêşiya azadî û demokrasiyê jî asteng tê dîtin. Dibêjin: "Jiyanê asteng dike." Jiyana çi asteng dike? PKK, jiyanê diafirîne; bi rastî jî ew tam berovajîkirin e. Lê van tiştan dispêrin çi? Bala xwe bidinê, naspêrin rewşa gel; dispêrin rewşa kadroyan. Li ser pişta kesên ku dibêjin: "Ez ê bibim milîtanê fedaî yê vê partiyê û ez bi mirinê girêdayî me" ev tişt tên kirin. Lê em jî nikarin dengê xwe derbixin.

Li ser pişta me êrîşê PKK'ê dikin. Lê em dibêjin: "Em milîtanên fedaî yê ku PKK'ê bigihînin serkeftinê ne." Lê li hemberî PKK'ê di ser pişta me re êrîşan dikin, em nikarin li hemberî vê jî bisekinin. Ev milîtanî û fedaîbûneke çawa ye? Fedaîtiya bi vî rengî dibe, milîtantiya fedaî wisa dibe? Milîtanê fedaî kesê/a ku partiyê rizgar dike û didomîne ye, an amûreke ku ji ser pişta wî/ê re êrîşî partiyê dikin e? Niha em ketine vê rewşê. Rewşa kadroya dibe hinceta gotinan: "PKK'ê dema xwe derbas

kiriye û her cure şaşîtî kiriye.” Bêguman bersiva vê jî heye. Di destpêka 2000’î de jî hesab dikirin ku dê PKK êdî nikare tiştekî bike. Lê dîsa jî hêza PKK’ê hebû, hêz û demareke ku wê ber bi xwe dide hebû û vê demarê PKK meşand jî. Herî dawî faşîzma DAÎŞ’ê jî wisa hesab kir û got: “Her kesî li hemberî min çok daniye, dê PKK jî çok deyne.” Lê çawa xwe li ser zinarekî dît. Ev rastiyeke, aliyekî me yê wisa jî heye. Lê divê em ji bîr nekin ku ji vî aliyî ve PKK ne giştî ye, ne yekgirtiye. Ew demar wisa li ber xwe dide, têkoşîn dike, fedaî ye; rêxistinê, têkoşînê, gel bi ser dixe û ji bo afirandina jiyana azad her roj nirxên nû derdixe holê. Lê aliyekî wê jî heye, her wisa gotegotan dike, reş dike û paşve dikişîne. Derdora ku dijmin li ser hesaban dike, ev in. Her dibin amûrên êrîşên li hemberî PKK’ê. Ev nabe.

Divê em van cudabûnan ji holê rakin, divê yekîtî û giştîbûn hebe. Dê yekîtî û giştîbûn di kuderê de hebe? Bêguman dê di xeta berxwedanê de be. Xeta PKK’ê ev e. Di parêznameyan de Serokatiyê bi awayekî zelal danî holê. Got: “Yên ku jê razî nabin û napejirînin, dikare biçe û ji xwe re rêxistinekê ava bike, dikare feraseta xwe rêxistin bike û bimeşîne.” Ji vê re ne PKK, ne jî kesekî/ê din nikare tiştekî bibêje. Dijberî vê dê baştir bibe. Mirov dikare pê re têkiliyan deyne û di nav piştgiriyê de be jî. Ji ber ku her kes li gorî feraset û nasnameya xwe tevdigere, têkilî danîn û îtîfaq kirin zêdetir bi wate ye. Dê zêdetir encamgir be. Lê ji aliyekî ve bikeve nav û bibêje: “Ez vê rast dibînim û dipejirînim.” Lê ji aliyekî ve jî li gorî wê tevnegere, wê pêk neyne û bi hêza ku te ji wê derê girtiye, hewldana pêkanîna tiştên cuda nîşan bide. Ev pir xetere ye. Serokatiyê herî kêm, ev wek: “Ajantiya objektif” pênase kir. Got: “Objektif, an jî sûbjektîf; ajan ajan e.” Yên objektif zêdetir bi xeterî ne. Di navgîniya salên 80’yî de ji vê rewşê re digotin. “Ajantiya sosyal.” Têgeheke wisa jî di lîteretûra partiyê de bi pêş ket. Çi îfade dike? Dikeve nav partiyê û bi îmkanên partiyê, hewl dide ferasetên xwe yên derveyî partiyê pêk bîne. Dikeve nav partiyê û dibêje: “Ez ê karên partiyê bikim” lê nake, hewl dide bi derfetên partiyê pîvan û ferasetên xwe pêk bîne. Ji vê re pênaseyên wek: “Ajantiya objektif, ajantiya sosyal” tê kirin.

Niha ev hemû mijarên girîng in. Ne wek gilîkirinekê, wek rexneyan fêm bikin, divê em wêneyê xwe xêz bikin. Divê em ji rastiyan nerevin û biçûk nebînin. Şaşiyeke mezin jî ev e; hinek heval vê tînin ziman jî, nêzîkbûneke ku xwe pir dinepixîne heye. Beriya wê nizanim, lê heya

komployê em di nav têkoşînê de bûn, tiştên wisa pir rêxistinkirî û zanebûn tune bûn. Piştî komployê ev tişt pir zêde bi pêş ketin. Em neçar man ku her tiştî bi rê ve bibin û me ev dît; hinek heval pir biçûk dibînin, girîngiyê nadinê, xwe nepixandin heye, pir zêde ji xwe bawerkirin heye. Di zindanê de jî, li derve jî nêzîkbûnên wisa derketin holê. Dibêjin: “Hûn pir zêde dinepixînin.” Ji hevalên ku tiştên wisa tînin rojevê re dibêjin: “Em îdare bikin, tiştekî ku pir zêde were nepixandin nîn e.” Lê bi gotina wisa, em heya rewşa îro hatin. Ev siyaset bi bandor bû, encamên wê li holê ne; avahiyeke me ew qas mezin heye, lê nakeve tevgerê.

Şoreşa Rojhilat hinekî xistin tevgerê, lê encama wê jî li holê ye. Ne sekneke bîrdozîk ya rast li holê heye; ne rêxistinbûneke civakî ya teqez heye; ne jî şerekî misoger heye. Ma hûn dibêjin qey şerê li Rojava bi pêş dikeve, ji Bakur pir cudatir e? Xirabtir e; ji ber ku hê şer heye, em nikarin li ser kîteyên wê bisekinin. Her roj gilî tên û dibêjin: “Filan fermandar, bêvan kes wisa wisa dike…” Berxwedaneke ew qas cîhanê tîne gel hev e, lê şervanê di nav xwe de jî eciz dike. Ew şervan êdî nefret dike. Ma wisa dibe? Ew tişt hene, hevalên ku van tiştan nizanin, bila bizanibin. Lê divê em bizanibin ku pirsgirêkên me ne û ji bo derbaskirinê em bizanibin. Rewş wisa ye û wisa jî berdewam nake.

Ji vî aliyî ve divê mirov pirsgirêkan bi awayekî rast deyne holê, sedemên wê baş tehlîl bike. Ya girîngtir jî divê vîn, zanebûn û têkoşîna derbaskirin û sererastkirina pirsgirêkan derkeve holê. Ger ê ji nû ve partîbûn çêbe, ger li ser esasê paradîgmaya nû ji nû ve înşa çêbe, ger PKK li ser esasê paradîgmaya demokratîk ekolojik û azadîxwaziya jinê bizivire partiyeke ku têkoşîna çalak dibe û bizivire partiyeke ku şoreşê pêk tîne, tenê bi vî awayî dibe. Ger di vê mijarê de hestiyarî, rêxistinbûn, disiplîn, têkoşîn û pêşveçûyîn derkeve holê, dê ev bibe, nexwe ne gengaz e. Divê hemû heval vê bizanibin û xwe nexapînin û nebêjin: “Hêza me pir e, PKK bi qasî cîhanekê mezin bûye, ê derfenan bidin Kurdan.” Di rastiya xwe de, gotinên wisa ji bo ku kesên nezan bikişînin têkoşînê tên gotin.

Ew hemû rast in, lê bi serê xwe têrî nakin. Ger em xwe di asteke wisa ya propagandayê de bisekinînin, em ê bi prapagandaya xwe, xwe bixapînin. Jixwe di nav me de hewayên wisa jî pir in, propagandayên ku wisa di nav me de dikin, mirov dibîne ku em kirine nav şaşiyan, her wiha ev propaganda, derdora me jî şaş dikin. Şaşiyên çawa ne?

Dibêjin: “PKK naruxe, PKK her tişt e, her tiştê wê pir baş e, filan tiştî dike û bêvan tiştî dike…” Ne wisa ye, ger tenê seatekê dev ji kar berde, bingehekî ku her tiştî winda bike jî heye. Rast e, dema ku em têkoşînê dikin, ew tişt derdikevin holê. Lê ka em seatekê têkoşîn nekin, wê demê em ê bibînin çi tê serê PKK'ê. Salekê navê xwe guhert, ev deh sal in hê jî me nekarî xwe komî ser hev bikin, hê jî em nikarin li wî navî xwedî derkevin.

**Divê Nêzîkbûnên Propagandawarî**
**û Nedîtina Merheleyên Jiyankirî Bên Derbaskirin**

Hinek dixwazin PKK'ê tune bikin, di endamên wê de jî rev pir zêde ye. Ji nav hecm û rêgezên wê revîn û guman kirin heye. Wisa be divê em ne di nav nêzîkbûnên ku bi asta propagandayê ya li pêşketinan mêze dike de bin û divê em pêşketin çawa hatine bidestxistin bibînin. Bêguman PKK, pêşketinên mezin derdixe holê. Lê wisa bi hêsanî nabe, bi tena serê xwe nabe. Bi têkoşînên mezin dibe; bi rijandina xwêdan û xwînê, bi keddayînê dibe. Bi serê xwe, bê rêxistin û bê partî pelek jî ji cihê xwe nalive; bi vî rengî tenê hevokek jî dernakeve holê. Berdêl û qelenê her tiştî heye, ango bi têkoşîn, em bi keda diran û neynûkan jê qut dikin û digirin. Nexwe bi serê xwe nabe. Hawayekî wisa ava dikin ku, mirov dibêje qey PKK pifî tiştekî dike û hema her tişt pêk tê. Jixwe her tişt bûye û PKK'ê cîhan bi dest xistiye. Nêzîkbûnên ku pir zêde dinepixînin û her cihî tijî şaşî dikin hene. Ev rastiya PKK'ê ya têkoşer jî di siya xwe de dihêle, ser wê digire û şaşiyan diafirîne.

Ji vî aliyî ve bi rastî jî ji têkoşînê qutbûn heye. Ji şoreşgertiyê, ji pîvanên şoreşgertiyê û ji berxwedanê qutbûn heye. Tespîteke ku civîna me ya Komîteya Navendî herî zêde li ser sekini ev bû. Ji şoreşgertiyê qutbûn heye, lewazbûne heye. Di rihê şoreşgerî, têkoşîna şoreşgerî, her tişt wek têkoşînê girtina dest de lewazî hene. Dibe ku ev di nav girseya partiyê de û di nav welatparêzan de hebe; lê ev di kadro û partiyê bixwe de heye. Di nav kadro û partiyê de nêzîkbûneke wisa pir zêde heye. Li gorî vê jî seknek heye. Ev rengvedana xwe li ser civakê dike û di nav civakê de dêrdorên çîna navîn bi pêş dikevin. Pasîfîzm, bêberxwedanî, ji pergalê qutnebûn; welatparêziya lewaz, peywir û berpirsyarî negirtina ser xwe, pir kêm fedakarî û wêrekî nîşan dayîn û zêdetir ji partiyê maf xwestin derdikeve holê. Li ser civakê ev tişt serwer dibin. Li her cîhî ev tişt hene, em dinepixînin.

Bêguman wek rêxistin kêmasiyên me jî hene; em nikarin kar bimeşînin, em nikarin hinek derdoran rêxistin bikin, lê ferasetên şaş jî ne kêm in. Jixwe me mînaka gaziyan da, li ser navê şehîdan jî malbatên şehîdan hene. Tu destê xwe davêjî ku, wek "Malbatên bi nirx." pênase dikin; lê piraniya wan ketine pey pereyên xwînê. Ji ber ku wisa ne, ma ew tewanbar in? Na, partiya ku ew rast perwerde nekirine tewanbar e. Em rast perwerde nakin, çima em rast perwerde nakin? Ji ber ku feraseta me şaş e, em rast perwerde nakin. Ji ber ku em dixwazin bila wisa bin, ji ber wê em perwerde nakin. Rengvedana me li ser wan malbatan wisa dibe. Ger wisa bûya, PKK'ê ji roja destpêkê ve, piştî şehîdê yekemîn nedikarî gavan bavêje. Ma em ê çi bidin kê? Lê her şehîdekî/ê yên din kişandin, rêxistin mezin kir, bû bandoreke ku dikişîne nav têkoşînê. Lê niha ne wisa ye, hinek dixwazin xwe li ser pişta şehîdan bidin jiyankirin. Li hemberî vê seknek tune, têkoşîneke bes tune. Hemû parçe wisa ne. Malbatên şehîdan ji Rojava hatine, ji her tiştî eciz bûne, gilî dikin. Ji Bakur tên, dîsa heman rewş. Jixwe li Rojhilat di wê astê de têkiliyên me tune. Li Ewrûpayê û Rûsyayê jî wisa ye. Jixwe cihên ku girseya me herî zêde lê ye, ew der in. Ez çima van hemûyan dibêjim, berovajîbûnên ferasetê çêbûne, ez hewl didim wan nîşan bidin, da ku heval bizanibin.

Nêzîkbûn, feraset û dîtinên PKK'ê yên li gorî xwe hene. PKK, ne bê pîvan û bê rêgez e. Ne tevgereke ku her kes li gorî xwe guftûgo bike ye. "Tu çawa guftûgo bikî, tu çawa fêm bikî, wisa ye." Ne wisa ye. Ne PKK wisa bê pênase û bê pîvan e; ne jî Serokatî wisa liberal û şîlo ye. Dijberî wê rast e. Di cîhanê de kesê ku herî misoger û zelal Rêber Apo ye. Xwe bi jiyan, çalaki, gotin û nivîsandinê xwe zelal kiriye. Ya ku herî bi biryar dimeşe PKK ye. Ew qas bername û rêziknameya wê heye; qeîde û xeteke wê heye. Niha rêziknameyê vekin û binêrin, kadroyê PKK'ê kî ye? Hemû sifat û taybetmendiyên herî têkoşer û baş, ji bo kadroyê PKK'ê hatiye gotin û di wê rêziknameyê de jî hatiye nivîsandin. Ew qas şehîd hatine dayîn, bi rastî jî kadroyê partiyeke ku di xeta fedaî de dimeşe jî divê wisa be. Lê yek jî li qadan binêrin, yên ku wek kadro li holê ne wisa ne? Na, ya rast belave dibin. Serokatiyê got: "Di nav birînan de ye." Em di nav kul û birînan de ne. Lê rêzikname dibêje: "Kadro wisa ye." Tu jî hatî û tevlî wê rêziknameyê bûyî, ger tu ne wisa bî tevlî nebe. Na ger tu bibêjî: "Ez ê hem tevlî bibim, hem jî xwe bispêrim partiyê" wisa nabe. Ev tevlîbûn û meşandina têkoşînê nîn e.

Serokatiyê got: “Li hemberî partiyê, têkoşîneke pir xeter meşandin e.” Dibêjin: “Keleh, ji hundir ve tê fetihkirin.” Ji hundir ve nêzîkbûnên derveyî partiyê spartina partiyê; ajantiya objektif e. Ev ne mijarên wisa hêsan in, pir xetere ne. Zêdetirî enerjiya me ji van tiştan re berhewa dibe.

Em lêkolîn bikin; ji bo hevalên ku di vê mijarê de bi xwestk û bi zîrekî tevdigerin, ez dikarim mijareke lêkolînê bibêjim. Rêveberî enerjiya xwe ya rojene, çiqasî ji van karan re berhawa dike; çiqasî wê jî ji bo çareserkirina pirsgirêkên teorik, stratejîk, rêxistinî û bîrdozîk xerc dike? Bila li ser vê lêkolîn bê kirin. Bila ji navenda partiyê, an jî konseya rêveber ya KCK’ê dest pê bikin; bila hemû rêveberî, ciwan, jin û hemû biryargeh bên lêkolînkirin û şopandin. Wê demê dê bibînin enerjiya rêveberiyê bi ku ve diçe. Divê em amarekê (bilanço) derbixin. Ev pirsgirêk bingeha xwe ji kê digirin, ev mijareke cuda ye, lê divê em amarekê derbixin. Dema ku ev tişt bû, dê bê dîtin ew enerjiya ku berhawa dibe ji sedî heştêyî ne kêmtir e. Ya rast di nav rêveberiyê de, hevalên ku bi karên din re mijûl dibin nîn in. Hemû heval bi vê re mijûl dibin. Her kes mijûlbûneke wisa ava dike, ji ber şêwaza rêveberiyê ye.

Berovajîbûnên ferasetê pir zêde ne, xwe spartinên ezez pir zêde ne. Em nikarin bi sekin, helwest û şêwazên bi vî rengî encam bigirin. Ji aliyê islûb ve jî, ji aliyê şêwazê ve jî pirsgirêkên rêxistinî û pirsgirêkên rêveberiyê wisa derdikevin holê. Cudabûn çêbûye, mesele Serokatiyê pir caran radikir û davêt. Wekî din, nedikarî xwe bi van pirsgirêkan re mijûl bike; nedikarî bi van pirsgirêkan xwe bixitimîne. Dema ku ew pirsgirêk digihîştin asteke ku wî tengav dikin û dixitimînin, hema qut dikir û tavêt. Li karê xwe mêze dikir. Ji ber ku yên wisa ne kar dikin, ne jî kar didin kirin. Dijberî wê hinekên dixwazin kar bikin hebin jî, wan jî dixetimînin û paşve dikişînin. Niha jî pirsgirêkên bi vî rengî hene, divê em derxin holê û bibînin.

Çi rast e, çi şaş e; partî çi qebûl dike, çi qebûl nake û çima qebûl nake? Divê em vê baş bizanibin. Ji ber ku di me de pir şemitîn çêbûne, du heval fikrên cuda dibêjin. Hevalên nû jî wisa ne, yên ekvn jî wisa ne. Berê ne yekîtiya ferasetê; yekîtiya bertek û pîvanan hebû. Lê niha wisa ye? Ger bûyerek çêbûbe ez tiştekî dibêjim, ew tiştekî din dibêje. Ev çi nîşan dide? Ya rast, em her yek partiyek in. Li holê partiyeke tenê tune. Em wek PKK tevdigerin, me nasnameya PKK’ê girtiye dest xwe û

em lê xwedî derdikevin, lê em xwe didin axaftinê û em tiştên cuda dibêjin. Wisa be, li holê PKK tune, her kes bixwe heye.

Di gelek mijaran de, cudabûnên feraset û bertekê derdikevin holê, ev çi diyar dike? Diyar dike ku di partî û xeta Serokatiyê de yekîtî tune; diyar dike ku xeta Serokatî û partiyê bi awayekî hevpar nehatiye pejirandin; diyar dike ku her kesî li gorî xwe guftûgo kiriye û li gorî xwe fêm kiriye. Ev jî tê wê wateyê ku her kesî xwe kiriye cihê partiyê. Xwe wek partiyê dibîne. Ji bo kadroyekî wisa xwe perwerdekirin pêwîst nake. Ger bikeve perwerdeyê jî, pêwîst nake ku xwe biguherîne û fêrî hin tiştan bibe. Kadroyekî wisa pêwîstî nabîne ku bikeve nav rêxistinê, di komîteyekê de cih bigire, bi disiplîn û bi pîvan be, li hemberî kêsên derdora xwe rêz nîşan bide û kolektîvîzmê ava bike. Çima? Ji ber ku bixwe partî ye, rastiya her tiştî dizane, hemû gotin û kiryarên wî/ê rast in. Divê her kes li wî/ê binêre û li pêş wî/ê bimeşe. Tê rewşeke wisa. Ev hemû şaşiyên mezin in. Di cewherê xwe de berovajîbûnên di sekna kadro de nîşan dide. Tê wateya ji pîvanên kadro û xeta rêxistinê derketinê.

Dema ku em gihîştin asteke wisa, dê perwerde jî bê wate be. Hevalan digot: “Ew qas perwerde tê kirin, çima ev sererast nabin?” Ji kesekî/ê ku dibêje; “ez her tiştî dizanim re” tu dikarî çi fêr bikî, ew derdora xwe fêr dike. Ew di rewşeke wisa de ne ku em hemû her tiştî dizanin û her kesî fêr dikin. Partî hinek zanebûnê dide, da ku em ji bo şoreşê bi kar bînin, lê em li hemberî partiyê bi kar tînin. Li hemberî yekîtiya partiyê, sekna birdîzok ya partiyê û li hemberî meşa partiyê bi kar tînin. Dema ku wisa bibe jî, perwerde encam nade. Jixwe ji bo fêrbûna hin tiştan nehatiye perwerdeyê, ger hebe ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe hatiye. Rewşa ku kadroyên me di nav de ne, ev e.

Ji pîvanên pêşengtiyê ketin heye. Di kongreya ku di 2009’an de li Garê çêbû de, gelê Rojava got: “Bê kadro şoreş nabe, lê bi van kadroyan jî şoreş nabe, van bigirin û yên nû bidin me.” Bixwe zivirîn û çûn, lê kadro hemû li Garê man. Partiyê nizanî dê çi ji wan bike. Me kom kirin, hin perwerde û hin platform kirin; piştre me dîsa hinekên wan şandin. Dîsa me di 2013’an de, li Garê rêveberiya TEV-DEM’ê kom kir, dîsa gotin: “Bê kadro nabe, lê bi van kadroyan jî nabe, yên nû bidin me.” Em şoq bûn. Yên baş kî ne, em çi bidin? Jixwe kesê/a ku me neşandiye nemaye. Rewş ev e. Wisa nabe. Ketina kadro ya vê rewşê, di heman demê de jiyankirina partiyê ya rewşeke wisa ye. Divê pêşeng gel ronî

bike, bi her awayî rê nîşan bide, zana bike, bi rêxistin bike û bikişîne çalakiyê. Gel dibêje: “Bê pêşeng nabe.” Ji vê bawer dike. Ji ber ku di perwerdeya Serokatiyê re derbas bûye û dizane ku kadroyê rasteqîn çawa ye. Lê yên ku ne wisa ne jî, ji deriyên xwe diqewitîne.

Niha jî gelek pirsgirêk hene. Nikarin bibin rêxistin û partî, hev û din guhdarî nakin. Bi pey madiyata ji rêzê ketine, ger derfet bibînin dê ji xwe re meaşê jî girê bidin û biçin jiyan bikin. Ji kadro re her tişt tê gotin, kadro jî van gotinan tîne xwe. Ne rewşeke baş e. Mirov dibêjin: “Em PKK’ya berê dixwazin.” Lê ev ne rewşeke baş e. Ji aliyê dîtina rastiya PKK’ê ve baş e; lê ya nû çima ew qas guheriye û ji cewhera xwe dûr ketiye ku mirov wisa dibêjin? Ew mirov hemû, bi perwerdeya PKK’ê gihîştin wê astê, di bin rêveberiya Serokatiyê de bi sedanhezaran kadro li wir kar kirin. Di encama van xebatan de gelê Rojava gihîşt asteke wisa. Lê dema ku ew qas fersend derketin jî, cihê ku kadro pîroz bibînin, wan dahf didin. Ma pîvanên gel guherîne? Na, pîvanên kadroyan guherîne. Yên ku ji xwe re dibêjin kadroyên partiyê, divê bên ser hişên xwe û cidî bin. Divê pîvanên partiyê jî di çarçoveyeke giştî de be, kadro di ser gel re bide der. Kadroyekî ku xwe ew qas zanyar dibîne, li hemberî her tiştî serî radike û xwe dike cihê partiyê nabe. Dema ku hinek ziman dikeve devê wî/ê, mejiyê wî/ê hinek bi pêş dikeve, hinek kar dike û tê naskirin; xwe dide axaftin.

Serokatiyê ji bo rewşên wisa digot: “Potensiyela tesfiyegeriyê.” Dema ku potensiyela tesfiyegeriyê, ji xwe re bingehê bibîne, xwe bi çalak dike. Her yekî/ê wan dibe axayek. Milîtantiya PKK’ê ne wisa ye. Piştî wê jî hev û din qebûl nekirin reşkirin dest pê dike. Dibêjin: “Nizanim te çi kir, min çi kir…” Ma hûn dizanin di bingeha wê fikra neyînî ku li Rojava heye de çi heye? Lêgerînên ji derfetên şoreşê derxistine holê sûd wergirtin heye. Piraniya wan wisa ye, lêgerîn ji bo vê ye. Dibêjin: “Ez çawa dikarim hinekî din bandora xwe zêde bikim, çawa dikarim derfetên xwe zêde bikim, çawa dikarim jiyana xwe bi pêş bixim?” Encama ku Konseya Serokatiya Giştî, ji lêkolîn û şopandinên xwe derxistiye ev e; li Rojava herî zêde kadro bi bûyerên trafîkê jiyana xwe ji dest didin. Bila agahiya hevalan hebe. Em vê dikin. Hevalên ku ji Rojava hatine û hevalên ku dê biçin Rojava hene, ji bo vê bila agahiya hevalan hebe. Jixwe ev tişt hatine nivîsandin, ji ber vê bi awayekî vekirî dibêjim.

Serokatiyê jî got: “Dema ku mirovan kadroyên PKK’ê didîtin, dibûn xwedî pîvan. Ji xwe bawer nedikirin, lê ji kadro bawer dikirin.” PKK rêxisti-

neke wisa bû, kombûneke kadro ya bi vî rengî bû. Bi vê mirov bandor kirin û bi pêş ket. Nexwe ne ji ber ku xwedî marîfetên pir cuda bû û jiyan da mirov, wisa bi pêş neket. Rûmet da mirovan, ew kirin kesên rasteqîn û xwedî pîvan; wêrekî û fedakarî da wan. PKK ew bû û kadro jî kesê/a ku ew tişt belav dikirin bû. Niha di van tiştan hemûyan de şemitîn, dejenerebûn çêbûye; hev û din reşkirin û dayîna nîqaşkirinê heye. Em tiştekî din jî bibêjin, hev û din dûr xistin heye, dahf dide. Bi rastî jî balkêş e, wek ku ne hevrê bin, wek ku dijminê hev bin. Berê ger rêxistineke partiyê, yekîtiyeke partiyê û hevrêyekî/ê karek kiribe, kelecan û coşek ava dikir. Wek karekî pir mezin dihat dîtin, dibû destan û li ser zimanan digeriya. Hemû partiyê propagandaya wê dikir. Niha hinekên me karekî dikin, hinekên din jî sûretê xwe tirş dikin; dev ji propaganda û fêmkirina wê berde, bi qasî ku ji destê wan tê dixwazin bandora wê kêm bikin.

Min ev cara destpêkê, dema ku di 94'an de ji zindanê derketim û hatim qada Serokatiyê, min ji Şemdîn Sakik bihîst. Wê demê ew jî li wê derê bû. Me şerê li welat dinirxand, rabû û got: "Hûn difikirin ku wisa ye, ev hemû derew in." Ez û hevalê Fûat, di cihê xwe de cemidîn. Çawa çêdibe? Çawa mirov ji tiştên ku PKK'ê kirine re dikare wisa bibêje? Yên ku wisa dibêjin, bixwe wisa tevdigerin. Jixwe piştre em fêr bûn ku herî zêde ew wisa dike. Lê ew piştre derketin holê. Bixwe wisa ye, ya heyî jî wisa dinirxîne. Hevalên me kiryarên hev û din napejirînin, her wiha nikarin bi hev re kar jî bikin, ji karên hev û din ne razî ne. Ji bo ku hevrêyên li gel wî/ê zêdetir kar bikin, hewldan nîşan nadin. Ev partiyeke çawa ye? Lê ger em wisa tevbigerin, em ê çawa bibin hevrê? Em ê çawa hev û din perwerde bikin, em ê çawa di parzemîneke wisa de li hemberî ew qas paşverûtiyê têkoşîn bikin? Ma ev gengaz e? Na. Divê em rast bigirin dest, ger wisa be em nikarin. Em van tiştan xwezayî dibînin û bê bertek guhdar dikin. Di nav partiyê de ew qas tiştên wisa belav dibin, lê qet ne xema we ye.

### PKK Pênaseya Xwe Ji Sekna Xwe Ya Giştî û Rast Digire

Di nav partiyê de venêrîn, hev û din şopandina kadroyan tune. Axaftina her tiştî serbest e. Ma ne wisa ye? Di wêjeya partiyê de heye, bixwînin û binêrin, ka nav partiyê çawa ye? Ka giştîbûneke çawa heye? Wek kombûneke hevrêyan ka kes çawa li hev û din xwedî derdikevin? Divê em vê bibînin. Lê rewşa heye, pir cuda ye, ji wê rastiya partiyê qutbûn heye. Em nikarin bi vî awayî bibin hevrê û rêxistin. Wê demê em hev û din dixapînin. Em hem ew qas soz didin ku em ê ew qas hez bikin û rêz nîşan bidin; hem jî em dijberiya wê dikin. Ew durûtî ye, xapandin e. Bêguman ev nêzîkbûn baweriyê nade mirovan. Ma têki-

liyên hevrêyan wisa dibe? Heta tehrîbata van tiştan jî hatiye jiyankirin, gihîştiye asteke wisa, ji ber vê sererastkirin nabe.

Çima perwerde encam nade? Ger ev tişt wisa bimînin, di nav partiyê de her gotin bê kirin û her nêzîkbûn bê nîşandan û tu kes dengê xwe dernexe; dê perwerde çi encamê bide, em ê çi sûdê ji perwerdeyê bigirin? Em ê çawa hev û din perwerde bikin? Lê partiya Serokatiyê ne wisa bû. Serokatiyê ev got: “PKK, ne kolaneke ku em her tiştî bibêjin û her nêzîkbûnê bi pêş bixin, van tiştan qebûl nake.” Lê niha her gotin tê kirin, her cure nêzîkbûn bi pêş dikevin, her kes dikare li gorî xwesteka xwe tevbigere û ev tişt tên qebûlkirin, li hemberî derketinek tune. Hebe jî tenê mirûzê xwe tirş dikin, xwe paşve dikişînin û gotegotan dikin, bertekên şexsî nîşan didin. Ev rêbaz, ne rêbazên partiyê ne, encam neda û nade jî. Ev rêbaz perwerde nakin.

Ev hemû nîşan didin ku dewreya me ya perwerdeyê xebat û qadeke têkoşînê ya birdîzok û rêxistinî ye. Ji ber ku sererastkirinên bi vî rengî tenê bi têkoşîneke bîrdozîk ku têrî bike çêdibin. Ger wisa nebe, têkoşîna bîrdozîk nayê dayîn, sererastkirina ku em qalê dikin pêk nayê. Ev, ne tiştên ku wisa bi gotinan werin kirin in, têkoşîneke misoger dixwaze. Herî kêm di asta şerê li êniyê bi DAÎŞ’ê re tê kirin de, li hemberî rêderketin û yozbûnên navxweyî jî têkoşînek pêwîst dike. Wekî din nabe. Divê em ji tu tiştan re destûr nedin, divê di nav partiyê de disiplîn û cidiyeteke giştî hebe. Divê li hemberî hemû cureyên lêşqatiyê, ezezîtiyê, li gorî xwe bûnê, reşkirinê, sekneke hevpar hebe. Divê feraseta hevpar, berteka hevpar, sekna hevpar hebe û divê em birêxistinî tevbigerin. Ger bi rastî jî heval dibêjin: “Em bibin hêzeke mezin ya hêrsê, em şoreşê bigihînin serkeftinê, em bibin hêz û partiyeke pêşeng ku şoreşê dibe serkeftinê” bi vî awayî dibe. Dê ew me bike pêşeng; ger wisa nebe, em çiqasî navê xwe bikin pêşeng jî, em nabin pêşeng. Wisa be, mirov dikare bibe pêşeng, lê şertên wê hene. bi gotina: “Ez pêşeng im” mirov nabe pêşeng. Peywir û berpirsyariyên pêşengtiyê hene, ger van pêk bînin, pêwîst nake ku bibêjin: “Ez pêşeng im.” Jixwe pêşengtî di pratîkê de dibe, bi gotinan nabe. Çiqasî nav û taybetmendiyên pêşengtiyê li xwe bike, lê pêwîstiyên wê nayne cih; ê wê demê bi mirov bikenin. Herî zêde bi vî awayî Xwexapandin derdikeve holê. Ger rewş ev be, wisa nabe, em nikarin bi vî rengî bikin. Lê em bibêjin, em nikarin bibin pêşeng jî, ne rast e. Şert û qeîdeyên wê

hene; ger mirov şêrt û pîvanên wê bîne cih, mirov dikare bibe pêşeng, pêwîstiyên peywir û berpirsyariyan di pratîkê de bîne cih.

Partiya ku bi rastî jî wisa be, li hemberî hemû zehmetiyan dikare derketinên şoreşgerî bike. dîroka PKK'ê bi sedan-hezaran mînakên wisa dagirtî ye. Di parzemînên herî zehmet de, di parzemîna faşîzma 12'ê Îlonê de, di zindanan de, di parzemînên ku pergala qirkirina çandî ew qas li ser serwerbûn de; pêwîst bike bi tenê kesekî, li ser esasê rastiyan PKK derneket û serkeftineke wisa bi dest nexist, pêşketin neafirandin? Dîroka partiyê û Serokatiyê, vê nîşanî me nade? Pir eşkere nîşanî me dide. Wisa be tiştê di vê derê de girîng ne hebûna hecmî ye. Ya esas û diyarker, feraset û çawanî ye, ne pirhejmarî ye. Sekna rast, sekna giştî, sekna bi pîvan; ji kombûnên wisa re partî dihat gotin. Pênaseya PKK'ê wisa bû. Niha di van tiştan hemûyan de şemitîn, belavebûn û yozbûn heye. Em bibêjin, dejenerebûn heye dibe ku rastir be. Bi rastî jî dejenerebûn heye.

Em dikarin van nêzîkbûnan hemûyan wek lîberalîzm pênase bikin. Di parêznameyan de Serokatiyê, lîberalîzm wisa pênase kir. Got: "Hêza herî mezin ya kapîtalîzmê ye." Hêza xwe ji teknîk, pere û çekên xwe nagire; ji bîrdoziya xwe digire. Bandorên bîrdoziya liberal ku li ser PKK'ê kirine jî ev in. Êrîşên li ser PKK'ê yên vê pergalê wisa ne, divê em vê bizanibin. Jixwe bi serê xwe tişt nabin; di encama êrîşên modernîteya kapîtalîst û şêrê wê yê psîkolojîk ku lîberalîze dike de bi pêş dikevin. Ev encamên şerekî ne, êrîşên dijmin van ava dikin. Em di êniyan de li ber xwe didin û bi awayekî fedaiyane canê xwe didin; lê li hemberî van êrîşên ku dejenere dikin û lîberalîze dikin, em nikarin li pişt êniyê têkoşîneke têr bidin. Em nikarin xwe bigirin, em pîvanan winda dikin, bandor dibin û xwe belav dikin. Partî ew qas tevlîhev dibe, ev tevlîhevî hemû partiyê ji hêzê dixin. Di encama vê de em dikevin asteke ku em nikaribin peywirên pêşengtiyê pêk bînin. Nexwe sedemeke cuda tune.

Wê demê, divê em van tiştan bibînin û wek pirsgirêk bigirin dest. Têkoşîna partiyê tenê wek têkoşîneke leşkerî û siyasî girtina dest û gotina: "Ez ê bibim siyasetmedarek, leşkerek baş" ne rast e. Divê em vê wek pîvan deynin holê; çiqasî têkoşîna bîrdozîk bi pêş bikeve dê ew qas têkoşîna leşkerî-siyasî bi pêş bikeve. Di têkoşîna bîrdozîk de çiqasî serkeftin çêbibe, dê di têkoşîna leşkerî û siyasî de jî ew qas têkoşîn çêbibe. Ger di têkoşîna bîrdozîk de serkeftin çênebe, ne gengaz e ku di têkoşîna leşkerî û siyasî de jî serkeftin çêbe. Kî vê bibêje, derewker e,

tiştek fêm nekiriye û agahiya wî ji tiştekî tune. Diyalektîka partiyê û rastiya zanistê vê bi awayekî zelal eşkere dike. Ji ber vê divê em xwe yekalî negirin dest û tengav nekin. Ji revîna têkoşîna bîrdozîk, tu kes nikare bibe şervan û fermandarekî/e baş. Tu kes nikare di êniya şer de serkeftinan bi dest bixe, divê em xwe nexapînin. Pratîka me ev bi awayekî vekirî nîşanî me daye. Ango mirov di kîjan astê de têkoşîna bîrdozîk bimeşîne, dê mirov di wê astê de têkoşîna leşkerî û siyasî bi ser bixe. Ger bi têkoşîna bîrdozîk mirov biçe şer, ê li wê derê bi şêwaz, islûb û tempoyeke rast şer bike û bi ser bikeve. Ger wisa neke nikare bi ser bikeve, ji ber ku rast nameşe. Divê hemû hevalên me vê jî baş bizanibin û sererastkirinek were çêkirin.

Divê em girîngî û cihê têkoşîna bîrdozîk baş bibînin. Di civîna me ya navendî ya ku herî dawî me li dar xist de jî, em li ser vê mijarê sekinîn. Têkoşîna bîrdozîk bi piranî tenê wek gotin, tê ziman; dema ku pir tengavbûn tê jiyankirin, dibêjin. Ew jî wek karê hinekan tê dîtin, her kes wek karê xwe nagire dest. Ji rêxistinkirina xebatên bîrdozîk revîn heye, ji vê revîn, ji partiyê revîn e. Divê em bizanibin ku bi revîna ji van xebatan em nikarin bibin hêzên leşkerî û siyasî. Di bingeha hemû binkeftinên xebatên siyasî û leşkerî de revîna ji xebatên bîrdozîk heye. Lêgerîneke xebatên siyasî û leşkerî ku xwe naspêre xebatên bîrdozîk heye. Pir zelal e ku ev serkeftinê nayne. Serokatiyê got: “Ji sedî yek.” Gelo ev serkeftin e? Ne wisa be divê yên ku di qadên siyasî û leşkerî de xebatê dimeşînin hesab bidin.

Hevalên ku di 2011-2012’an de li Bakur şer kirine, hê jî raporeke cidî nenivîsandine. Ez berpirsyarê wan im û rapor dixwazim. Min rapora xwe bi pirtûkên ku ji sedan rûpel û ji çend cîldan pêk tê da wan, bi vî awayî min rapora xwe da wan, lê hê jî tu kesî raporeke cidî nenivîsiye. Me di civîna komîteya navendî de kir biryar, em ê ji Rojava jî bixwazin. Ger dema wê bê, em ê berxwedana Kobanê bigirin dest û binirxînin; çi dibe bila bibe, kê çi kiriye û çi heq kiriye, em ê deynin holê. Nexwe bi ser girtin û bi ajîtasyonê her tişt meşandin ne gengaz e. Ajitasyon cuda ye, nirxandinên ku dadihûrînin cuda ne. Hevalên me yên li qadên pratîkî raporan nadin, rewşa xwe û kiryarên xwe nanivîsîn. Hema dibêjin: “Me fêm nekir û me nekarî ku em bikin.” Te çi fêm nekir? Divê em di serî de wê fêm bikin, ma ev jî gotin e? Her tişt vekirî bû, li holê tiştêkî ku nayê fêmkirin tune

bû. Ew hemû hewl didin ku xwe û rêxistinê bixapînin. Qey dibêjin, em ê rêxistinê jî wisa bixapînin, lê ne wisa ye. Em neçar in bizanibin ka li wê derê nêzîkbûneke çawa heye, şer çi ye û siyaset çi ye, em fêr bibin. Divê em girêdana wê ya bi têkoşîn û xebatên bîrdozîk ve û girêdana wê ya bi pêşengtiya partiyê ve bibînin. Divê em bizanibin ku bêyî vê serkeftin ne gengaz e.

Tu kesî girîngî neda vê û bi vî rengî negirt dest. Wisa bi nêzîkbûneke teng, hestiyar û bi nêzîkbûneke fedekariya şaş çûyîna ser kar; derxist holê ku serkeftinan nayne, windahiyên mezin çêdike, peywir û berpirsyariyan li holê dihêle. Di vê mijarê de HPG neçar e ku cidî be û nirxandinên rast bike. YPG neçar e ku nirxandinên rast bike. Divê TEV-DEM û rêxistina me ya li Bakur rasteqîn nêzîk bibe. Ger dibêjin, jixwe tu kes tiştekî fêm nake û nikare binirxîne, çi bibe jî em ê bi wan bidin qebûlkirin, di nav şaşiyên mezin de ne. Wisa zanîn û fêmkirin jî pir ne zehmet e. Di nav ew qas fersend û derfetan de çi kirin? Me ew qas şehîd dan, nirxên ku wan ava kirine çi bûn? Çiqasî ew nirx komî ser hev kirin û li ser wî esasî têkoşînek hate meşandin, çiqasî têkoşîn nehat meşandin? Divê em rasteqîn bin û rast dahûrîn bikin.

Bi baldarî bişopînin, dema ku hinekî kombûn çêbû, ma diyar nebû ku gel çiqasî têkoşer e? Ger astengî ji pêşiyê rabin, kêm dimîne ku gel bixwe jî şoreşê pêk bîne. Heke wisa be, hinekî pêşengtiya rast bihata kirin dê di 2011'an de li Bakur şoreş çêbûbûya. Ya rast jî wisa bû, hemû pêşketinan ev nîşan dida, biryara partiyê û fermana Serokatiyê jî wisa bû. Lê çima çênebû? Ma gel nedikir? Gotin: "Gel ranabe serhildanê û li ber xwe nade." Ji xwedê bitirsin, di serhildanên 6-8'ê cotmehê de me dît ku gel çi kir. Yên ku nakin kî ne, li holê ne. Pêwîst nake ku mirov berpirsyariya xwe bavêje ser hinekên din. Divê em rast û rasteqîn bin û ji tiştên ku diqewimin encamên rast derbixin. Ji bo sererastkirinê ev pêwîst dike, ji ber vê em dibêjin. Divê mirov hesab bide, lê hesabekî baş ku şaşîtiyan sererast bike û bi awayekî serkeftî wan ji holê rake pêwîst dike.

**Konfederalîzma Demokratîk Ne Koalîsyonek e**

Ji ber ku pirsgirêk piralîne û kûr in, divê mirov nîqaş û dahûrandinên xwe jî kûr bike. Armanca me li ser vî esasî hinek pirs avakirin û li ser vî esasî sekneke fikrî û lêkolînê dirxistina holê ye. Ger li ser vî hîmî berfirehbûn û kûrbûna lêhûrbûnê, di encamê de teqezbûn û kesayeta rêxistinkirî çêbibe, ê wê demê encam bê girtin. Dê wê demê ew nîqaş baştir bigihîjin encamê. Armanca me di vê çarçoveyê de ye.

Em van mijaran di kadro de dijber û şaş diyar dikin. Pirsgirêkên me yên kadro, rêxistinê û rêveberiyê bi vî awayî derdikevin holê. Ya rast, pirsgirêka bîrdozîk ya partiyê tune. PKK, di dîroka xwe de cara ewil gihîştiye asteke teorik-bîrdozîk ya bi vî rengî. Hemû mirovahiya azad ronî dike. Parêznameyên Serokatiyê misoger di vê astê de ne. Rastiyeke Serokatiyê ku ne tenê Kurd xîtabî hemû mirovahiyê dike heye. Asteke wisa ya bîrdoziyê heye. Jixwe ew hêza herî mezin ya partiyê ye. Pirsgirêk di ku de derdikeve holê? Di pejirandin û daqurtandina kadro ya vê bîrdoziyê de çêdibe. Pirsgirêkên bîrdozîk û fêmkirinê bingeha xwe ji şîlobûn û tevlîheviya bîrdoziya partiyê nagirin. Tiştekî wisa tune. Wek pirsgirêkên kadro yên nefêmkirinê, nepejirandinê û danequrtandinê derdikevin holê. Ya esas jî di pêkanînê de ye. Di pêkanînê de, di pergalê de tevlîhevî heye. Çima? Ji ber ku Serokatiyê rewşa teorik û bîrdozîk ronî kir, bi parêznameyên xwe danî holê. Berpirsyariya Serokatiyê bi awayekî serkeftî û bes pêk hatiye.

Lê Serokatî nikare pirsgirêkên rêxistinî bi rê ve bibe û çareser bike. Şert û mercên ku di nav de ye, destûr nadin. Di vê rewşê de divê em pêk bînin; jixwe ronîkirina Serokatiyê ya teorik-bîrdozîk rê û rêbazên vê jî datîne holê. Di vê derê de pirsgirêk tên jiyankirin, sedemeke herî girîng ya pratîzenebûnê nebûna rêxistinê ye. Rêxistineke ku xeta teorik-bîrdozîk û stratejiya nû bigihîne serkeftinê tune. Di vê mijarê de nêzîkbûnên ku girîngî nadin rêxistinbûnê û bi awayekî têr li ser pergala rêxistinî nasekinin hene. An jî ferasetên ku nirxandinên Serokatiyê li gorî xwe fêm dikin, ferasetên pir cuda derdixin holê hene. Nêzîkbûneke ya berê nikare derbas bike û di fêrbûnên berê de maye û dixwaze di dema nû de jî wan pêkbîne heye. Ji ber vê bi rastî jî ji aliyê pergala rêxistinî ve tevlîhevî heye.

Di pêşketina vê rewşê de bandora tesfiyegeriya 2002-2004’an jî heye. Ew jî bi têkoşîna rêxistinî nehat derbaskirin, bi têkoşîna Serokatiyê hate derbaskirin. Ango pêngaveke partiyê ku li hemberî ferasetên

tesfiyegeriyê têkoşîn dike û nêzîkbûnên rast nîşan dide derneket holê. Serokatiyê tesfiyegerî tesfiye kir û rêxistin komî ser hev kir. Di kadro de tevlîheviyek hebû. Çi rastiya partiyê ye, çi tiştên ku Serokatiyê dane û çi dîtinên tesfiyegeran bû, ne diyar bû. Li hemberî fikrên tesfiyegeran têkoşîna bîrdozîk-rêxistinî nehat dayîn û ew fikir nehatin derbaskirin. Me nikarî em xebateke ku hemû fikrên tesfiyegeriyê dinirxîne û li hemberî wê jî rastiyên partiyê dinirxîne bimeşînin. Me got, em dereng mane, lê hê jî em nikarin bikin. Em niha dibînin ku her çiqasî dereng bûbe jî, heya ku em têkoşîneke wisa nemeşînin, em nikarin encam bigirin. Pirsgirêka me ya herî sereke ev e.

Bi kurtasî guherîna paradîgmayê û pêvajoya ji nû ve avabûnê bi êş derbas bû. Xwe ji nû ve pênasekirina PKK'ê; li gorî wê bi nirxandinên teorik-bîrdozîk bi pêş xistina bername, rêzikname û pergala rêxistinî; li ser vî esasî xwe perwerdekirin û veguhertin çênebû. Di nav rêxistinê de çelqandinek, tengavbûnek û wek encam jî şemitînek derket holê. Dîsa yê ku komî ser hev kir Serokatî bû. Serokatî xeta teorik-bîrdozîk zelal kir. Tiştên ku divê bên kirin, di parêznameyên bi navê "Parastina Gelekî, Çareseriya Netewa Demokratîk" de diyar kirin.

Ji vî aliyî ve pirsgirêkên teorik neman û hatin çareserkirin. Lê ji aliyê veguherîna strateji, tektîk û rêxistinê ve di heman astê de pêşketin çênebûn, di asta ku ew feraset pratîze bibin de bi pêş neket, pir bi sînor ma. Bi vî awayî rêxistinbûna KCK'ê di nav demê de bi awayekî bi pêl (dalgalı) bi pêş ket. Lê ji nû ve avabûna PKK'ê çi ye, dê çiwa bibe? Kesekî nedizanî. Di kongreya ji nû ve avabûnê de tiştekî ku nehat nîqaşkirin nema. Li wê derê PKK hatiye avakirin, an tiştekî din pêk hatiye, mirov nizane. Ger em niha bizivirin û li wan girtekan (tutanak) binêrin, dê her kes şoq bibe. Gelo mirov dikare bibêje, tesfiyegerî derbas bûbû, PKK ji nû ve ava dibû, li hemberî tesfiyegeriyê fikrên Serokatiyê hatibûn pejirandin û avabûna PKK'ê wisa çêbû? Na. Ya rast, bandorên tesfiyegeriyê li her cihî hebûn; di esasê xwe de bi qasî ku têrî dike derfetên axaftin û helwest nîşandayînê jî tunebûn.

Dema ku rêxistinbûna KCK'ê hebe, dê PKK di ku dera vê de cih bigire? Ew mijar pir şîlo ma. Fikra ku dibêje: "Ger wisa be bila PKK xeta bîrdozîk-felsefîk be, KCK jî rêxistin be" demeke dirêj li ser me serwer bû. Pergalên rêxistinî û vesaziyên li ser vî esasî bi pêş ketine nekarîn bi qasî ku têrî dike ya rast bipejirînin. Rewşeke bi aloz derket holê û di rewşa rêxistinî de tevliheviyek hebû. Li her cihî tê nîqaşkirin, herî dawî

me di civîna xwe ya komîteya navendî de jî ew mijar pir nîqaş kir. Di kongreya 11'emîn de ew nîqaş hinekî bi pêş ketibûn, vê sala dawî jî rojeveke esasî ya hemû civînên me di pergala rêxistinî de zelalbûn çêkirin e. Ew jî dişibe di şevreşê de bi palikandina destan meşînê.

Ger di partiyeke çil salî de hê jî feraset û şemitînên bîrdozîk yên bi vî rengî hene, dê rêgezên partiyê yên esasî çi bin? Tevlîbûna partiyê çawa be? Peywirên milîtanên partiyê çi ne? Têkiliyên hevrêtiyê çi ne? Pîvanên PKK'ê çi ne û li gorî van pîvanan tevnegerîn tê çi wateyê? Ger hê jî mijarên wê zelal nebûbûn û di nîqaşê de bin; bingeha xwe li hemberî tesfiyegeriyê ji têkoşîneke bi bandor nemeşandinê digire. Bingeha xwe bi têkoşînê derbasnekirina tesfiyegeriyê digire. Serokatiyê tesfiyegerî derbas kir. Niha jî em li ser esasê hêza Serokatiyê dimeşînin. Lê di rewşa heyî de kadro û rêveberî xwedî li ji nû ve avabûn û partîbûnê dernakeve. Nêzîkbûna ku dibêje: “Serokatî wisa dike, rast e, em jî bi Serokatiyê re bimeşin” derket holê. Nexwe wek milîtanekî/ê gotina: “Ew rast e, ferasetên rast ev in, em ê bibin milîtanên ku van dimeşînin” dernakeve holê û li ser vî esasî têkoşînek nayê dayîn. Ev çi îfade dike; li ser pişta Serokatiyê meşînê îfade dike, sekneke li ser lingên xwe disekine tune. Bi têkoşîna xwe, bi tevlîbûna Serokatiyê meşek tune; xwe spartina Serokatiyê û li ser hêza wî meşîn heye.

Pirsgirêkên bîrdozîk, pirsgirêkên ji rêzê derdikevin holê; di nav partiyê de ew qas feraset, rêgez û pîvanên nû derketine û ji rêderketinek çêbûye; bingeha xwe ji vê digire. Ev nêzîkbûn hemû, piştî komployê wek bandorên pergalê yên di nav me de û li ser bingeha tesfiyegeriyê derketin holê û me nekarî em derbas bikin. Çawa? Civînên me pir berfireh in û her civînêk her cihî digire dest, kûrbûnek çênabe û seranser dimînin. Li gorî paradîgma û stratejiya nû, me nekarî em nîqaşeke pergalî bi kûrahî û giştî bikin. Di civînên wisa de bi awayekî teng û seranser hate dest girtin, her bi parçe bi pêş ket. Ji ber vê me nekarî em bibin pergaleke yekgirtî, di feraseta pergala me de yekîtî çênebû, li ser vî esasî jî karîneya rêxistina me bi pêş neket.

Pergala KCK'ê çi ye? Di nav wê de dê PKK çi be? Dê HPG çi be? Dê rêxistina jinê û rêxistina ciwanan çi be? Dê komale û saziyên din çi bin? Ne ku qet li ser van nîqaş çênebûn, lê bi kûranî û giştî çênebûn, parçe parçe çêbûn. Me lêhûrbûneke têr nekir. Yek jî cihê ku em ji van nîqaşan encameke hevpar derxin, parçe parce bû. Her carê tiştek meşiya û ya din li pey ma. Dema ku me cara ewil hevpeymana KCK'ê

amade kir, hinek hevalan gotin: “Ev şaş in.” Kongre kom kirin û bi piraniya reyan, hewl dan hemûyan biguherînin. Yên din jî xwe kişandin quncikekî. Di vê civînê de kê çiqasî rey digirtin, li gorî wê dimeşand, ne li gorî hevparî û yekîtiya fikir bû.

Ji ber vê hevpeymana KCK’ê çend caran guherî. Heval dikarin lê binêrin, herî dawî min got: “Ez lê mêze nakim, êdî bes e.” Mirov ew qas jî pê nalîze. Me got: “Kerem bikin, pêk bînin.” Lê tu kes nêzîk nebû. Di nav wê zivistanê de me hemû karên xwe berdan û em pê re mijûl bûn. Dema hinek tişt derketin holê jî zimanê hinek hevalan vebû û hê jî li ser hin tiştan diaxifin. Bi rastî jî, bi awayekî giştî xwendin, fêmkirin û gotina: “Divê ew tişt wisa be” tune. Dîtineke giştî danaynin holê, li gorî xwe her kesek tiştekî tavêje holê û an jî dixe navberê. Rêxistin wisa nabe. Kordîneyeke wê tune, giştîbûneke wê tune. Çima wisa bû? Ji ber ku di pêşengtiya partiyê de ji nû ve avabûnek çênebû, wisa bû. Serdema guherîna paradîgmayê, serdema ji nû ve avabûnê; bi awayekî rêxistinkirî û bi pergal xwe guhertin bi pêş neket. Guherîna navê PKK’ê û xwe fes kirin; avabûna KADEK, Kongre-Gel, KCK; bala we kişandibe me pêvajoyeke pir zehmet derbas kir, pir bi parçe bû û pir bi pêl bû.

Di van hemûyan de, avahiya ku giştîbûnê pêk bîne, bi nîqaşên ku têra xwe kûr û giştî pergalê ava bike dê çibûya? Pêşengtî bû, ew jî partî bû. Lê partî ji holê rabû. Pergal û partî hat ruxandin, tune hat hesibandin, hat feskirin. Gotin: “Em dibin pergal.” Dema ku ew pergal nemeşiya, xwestin partiyê jî pê ve bikin; ji ber ku pêwîstiya pêşengtiyê hebû, bê pêşeng nedimeşiya. Vê carê jî ev pirs derketin holê; dê pêşeng li ku be, dê çawa be û pergal li ku be û çawa be? Dê rêxistinbûna jin û ciwanan di ku de cih bigire? Dê parastin, siyaset, aborî di ku de be? Ev hemû bi awayekî parçe hat destgirtin û hewldana pêkanînê hate nîşandan. Bi vî rengî pergal û avahiya me ya rêxistinî wek şalê pînekirî bû. Em di nav heman pergalê de ne, lê her kes ji vê pergalê heman tiştî fêm nake, em wek koalîsyonekê ne.

Konfedaralîzma demokratîk ne koalîsyonek e, konfedaralîzma demokratîk xwe dispêre yekîtiya ferasetê û yekîtiya rêxistinî esas digire. Bi awayekî azad xwe rêxistinkirina cudahiyan û bi vîna xwe tevlîbûna pergalê îfade dike. Ev ne koalisyon e; yekîtiya feraset û rêxistinî, cudabûnan rêxistin dike û tevlî dike. Koalisyon jî tê wateya her kes li gorî xwe, xwe rêxistin dike û di hin mijaran de yekîtiyê pêk tîne û li gel hev dimînin. Di vir de cudabûnên ferasetî, rêxistînî û şêwazê hene,

tenê di hin mijarên esasî de yekîtî heye. Sekna me ya rêxistinî ku heye, zêdetir nêzîkî koalîsyonekê ye. Em navê xwe dikin: “Konfedaralîzma demokratîk.” Em dibêjin em wisa rêxistin dibin, lê ne wisa ye. Pênaseyên wan li holê ne.

Ya din jî em parêznameyan dixwînin, em ew qas fikir teng û di rewşeke ku tiştekî fêm nake de nîn in. Divê wisa nêzîkbûnek nebe. Me xwe kiriye halekî wisa ku qey tu yê bibêjî li dinyayê hemû kesên ku tiştekî fêm nakin, hatine û di nav PKK’ê de kom bûne. Ev ne rast e. Em rewşê fêm dikin, em di asteke ku rewşê fêm bikin de ne. Ya rast ev e. Ji bo vê hê jî tevlîhevî û aloziyek heye. Pergaleke ku hem cudabûnan rêxistin dike û demokrasiya herî berfireh ava dike; hem jî pergaleke ku giştîbûnê pêk tîne, yekîtiyê çêdike, hemû encamên xebatan kom dike û berê wan dide coka şoreşê tune. Ne pergal, ne jî rêxistinbûneke me ya bi vî rengî heye. Herî dawî Serokatiyê jî got: “Hûn pir parçe ne, li holê kordîneyeke we jî tune.” Ji her seriyekî dengek derdikeve, rastiya her kesî li gorî wî/ê ye. Her kes fermanekê dide, dê kî fermana kê guhdarî bike. Ne diyar e. Li holê bi dehan kordîne hene, lê dema ku di bin bûna kordîneyekê de kom nebin, bêkordînetî û parçebûn derdikeve holê. Ev wek rojê vekirî ye.

Ev li ser navê demokrasiye tên kirin. Dibêjin “Konfedaralîzma demokratîk, xweseriya demokratîk wisa ye.” Çi eleqeya wê heye? Teqez ne wisa ye. Divê heval vê bizanibin; Serokatî li ser piyan digire. Nexwe em bi hêza xwe li ser piyan nasekinin. Em bi pergal û rêxistinbûna xwe jî ne li ser piyan e. Kordînasyona Serokatiyê, pergala heyî, di nav yekîtî û giştîbûnekê de digire. Ger wisa nebe dê ev pergal belave bibe û parçe bibe. Bila tu kes xwe nexapîne. Xeterî heye, divê em vê xetereyê bibînin. Nêzîkbûneke bê berpirsyarî heye, pir kêm lêhûrbûn heye. An bi rastî jî heval fêm nakin, an jî xetereyan nabînin û girîngî nadinê. Ger fêm nekin jî û nebînin jî ne baş e. Ji ber ku ne tiştekî hêsan e; ew nirx bi ked û xwînê hatine avakirin, mirov nikare wisa bi hêsanî bimeşîne, mirov nikare bavêje nav xetereyên ji rêzê. Divê li hemberî vê hestiyarî, hesasiyet, tevdîr û seknek hebe.

Niha ji van tiştan dûrketin û qutbûn heye. Me ev mijar hemû di wê civînê de nîqaş kirin, ji vî aliyî ve hatin rojevê. Me hem parçebûn, hem bê kordînetî, hem jî bêtêkiliya di navbera rêxistinan de nîqaş kir. Divê riyên çareseriyê çawa bin? Ya heyî çi ye û pirsgirêk bingeha xwe ji ku digirin? Ji bo ku riyên çareseriyê bên dîtin, me ew hinekî danîn holê. Lê

tenê wek feraset hinek tişt derxistina holê bes nake. Divê rastî bên şênberkirin û ji bo pêkanîna wan xebat bi pêş bikeve. Divê pir zêde bê şopandin û pêkanîn çêbe. Hê jî me ji vî aliyî ve gav neavêtine, em ê ji bo vê hewldan nîşan bidin. Ji bo ku encamên civînê pratîze bibin, bi taybetî ji bo ku encamên rêxistinî pratîze bibin, me pir zêde nekarî gavan bavêjin. Pêwîstî bi nîqaşên ku li ser pratîkên şênber çêbibe heye. Pêşengtiya PKK'ê, pergala KCK'ê, di hemû astan de têkiliyên wan bi hev re, di nave PKK'ê û KCK'ê de rista rêxistinbûna jin û ciwanan, tevlîkirina van nîqaşkirin û pêkanîn pêwîst dike. Dîsa di nav vê pergalê de, girîngiya qada parastinê; di nav pergala netewa demokratîk; konfedaralîzma demokratîk de şêwaz, şêwe û rêbazên parastinê girtina dest; divê ew hemû bên nîqaş kirin.

Bi taybetî mijara parastinê girîng e. Serokatiyê wek şaxek ji heşt şaxên netewa demokratîk danî holê, lê di dawiyê de jî got: “Netewa demokratîk, xwe dispêre gelê ku şer dike.” Wisa be parastina cewherî, tenê ji van şaxan ne yek e. Hêmaneke hebûnê ye, xaleke ku mirov li ser wê hebûna xwe bilind bike ye, ev hinekî din derket pêş. Girîngiya rêxistinbûn û perwerdehiya parastinê derket holê. Şerê ku li herêmê bi pêş dikeve, êrîşên faşizma DAÎŞ'ê hene. Her ku diçe Kurdistanê dikişînin nav şer. Ji bo hebûn û azadiya gel bê parastin, rêxistinbûn û perwerdahiya parastina cewherî divê wek şaxekî ji rêzê neyê destgirtin, divê wek şaxekî bingehîn û hîmî were destgirtin. Piştî wê şaxên din; aborî, perwerde, tenduristî, çand, ekoloji; dê ew çi bibin? Em hê nû hin konferansên aboriyê li dar dixin. Nîqaşeke ku em ji roja destpêkê ve bikin, me hê nû dest pê kiriye. Ew jî konferanseke giştî ye. Bi sedan mirov tevlîbûne, hinek rapor hatine pêşkeşkirin. Ji aliyê afirandina zanebûnekê ve baş e, lê bi nêzîkbûneke wisa giştî, ew kar nameşin.

Kûrbûn pêwîst dike, xebatên qomîsyonê pêwîst dikin. Divê 5-10 kesên ku ji vî karî fêm dikin bên gel hev û din, bi mehan lêkolîn bikin û li ser nîqaş bikin. Divê belgeyekê derxin holê û konferansên bi vî rengî jî wê belgeye nîqaş bikin. Ji ber ku ew tune, xebatên me jî seranser derbes dibin. Em bi wê şêwaza xwe ya xebatê nikarin xeta bîrdozîk-polîtîk ya Serokatiyê bizivirînin projeyeke pêkanînê. Em ê nikaribin pergala aborî, çandî, civakî, siyasî, ekoloji û leşkerî ya vê xetê biafirînin. Dê seranser bimîne. Ew seranserî çi dike? Dihêle ku pergala kevn, wek xwe berdewam bike. Nikare wê biguherîne. An jî çep û rast dikişîne û

belav dike. Guhertineke mayînde û teqez çênake. Ji ber ku ne xwediyê kûrbûn û giştîbûnê ye. Wisa nabe.

Nîqaşkirin baş e; lê her nîqaş, civîn û xwendin jî ne baş e. Mesele Serokatiyê carinan kesên ku pirtûk dixwendin mêze dikir û pirs dikir ka çi dike. Wî/ê jî digot: "Ez pirtûkê dixwînim." Serokatiyê digot: "Heyfa çavên te ye. Tu çima dixwînî, ji bo kîjan armancê derxî dixwînî. Divê armancek hebe." Divê armanca her civîn û nîqaşê jî hebe û encam bide. Ger encam nade, xebatên wisa bi gotina: "Binêrin civîn li dar xistin baş e, ya min jî baş e." Nabe. Gotina: "Nîqaş kirin baş e, ez jî nîqaş dikim." Nabe. Bi nîqaşê û civînê dibe ku tu xirab jî bikî. Wek min berê jî got, bi civînan rêxistin jî tên avakirin, lê di civînan de rêxistin tên belavkirin jî. Binêrin, gelek rêxistin di civînan de parçe bûne û belav bûne. Ger baş nayên amadekirin, tiştên ku bi seranserî û bêxemiyê tên kirin çênabin. Ne rast in û bes nakin.

Bûna pergala rêxistinî û heya gund û taxan belavkirina komînalîzmê jî girîng e. Hevalekî digot: "Me pergala komînal nîqaş kiriye." Lê min hinek encamên wê mêze kir, bi mantiqekî aboriya kapîtalîst lê mêze dikir. Ger nîqaş jî wisa bûne, xelî li serê me. Pînekirin çêdibe. Me konferanseke çandê li dar xist, min mêze kir ku dê hemû encam pînekirî bibin, ez li hemberî hemû encam û biryaran derketim. Ji bo ku em çanda moderníteya kapîtalîst û moderníteya demokratîk li hev bînin konferansan li dar naxin. Dijberî wê, ji bo ku em çanda moderníteya kapîtalîst biruxînin, çand, huner û wêjeya moderníteya demokratîk serwer bikin xebatan dimeşînin. Lê gelek nêzîkbûnên pînekirinê bi pêş dixin. Her hewl dide ku herdu pergalan li hev bîne, hinek ji wê digire, hinek ya din û dike yek. Ji ber ku wek feraset, rih û zanebûn derbas nake. Hinek nerehetî û dijberbûn heye, lê ne bi awayekî giştî, mayînde û kûr e. Ya rast moderníteya demokratîk tam napejirîne. Hinek tiştên wê rast dibîne, lê hinek tiştên wê jî misoger û nepixandî dibîne. Di tevgera me de li hemberî Serokatiyê nêzîkbûnek wisa heye, divê em li xwe mikur werin. Nêzîkbûneke ku sekna bîrdozîk-teorîk ya Serokatiyê pir kûr, tûj û zehmet dibîne heye. Ev nayê ziman jî, di hundir de tê jiyankirin.

**Sedemên Rêxistinî Yên Berovajîbûnên Bîrdozîk**

Dibêjin: "Parêzname pir giran in û em fêm nakin…" Ya rast, nayê pejirandin û nayê daqurtandin, bingeha xwe ji vir digirin. Nexwe tiştekî ku nayê fêmkirin tune, divê em hinekî rasteqîn nêzîk bibin. Ne ku giran in û em fêm nakin. Ferasetên me yên cuda hene, li xweşa me naçe, nayê hesabê me. Divê em rast îfade bikin, em berovajî nekin, em xwe nexapînin û hewl nedin ku hinekên din jî bixapînin. Yên ku nikaribin Serokatiyê fêm bikin, nikarin tu kesî din jî fêm bikin. Serokatî dizane ku xîtabî kîjan civakê dike. Ka carekê pirtûkên din bixwînin, ka kî fêm dike. Dev ji fêmkirinê berde, ez nikarim bixwînim jî. Serokatiyê çend caran navê pirtûkên ku dixwîne dan, min hemû kom kirin, lê min nikarî ji xeynî 4-5 pelan bixwînim. Min dît ku ez nikarim fêm bikim, min dev jê berda. Hinek heval jî van pirtûkan pir dixwînin, qey fêm dikin; lê çawa dibe nizanim, Serokatiyê fêm nakin. Ne wisa ye, di vê derê de pirsgirêk ne fêmkirin e. Pirsgirêka qebûlkirin û ne qebûlkirinê ye; pirsgirêka rast dîtin û rast nedîtinê ye. Divê em rast deynin holê. Dema ku em wisa dibêjin, heval dibêjin: "Way me zehmetî kişandiye û em bi Serokatiyê re tên hemberî hev û din." Na, divê em pirsgirêkê wisa negirin dest.

Em ji aliyê rih û fikir ve tiştên cuda hizir bikin, lê ji derve bibêjin: "Em girêdayî ne." Ma ew rewşeke baş e? Berî her tiştî ew, durûtî ye. Wisa nabe. Ji vê derê tu çareserî dernakevin. Tu cudabûna xwe deyne holê, dibe ku tu derfetên nîqaşê bibînê. Ger tiştên ku tu dibêjê rast bin, Serokatî jî dikare biguherîne. Serokatiyê çend caran pirsî û got: "Heval ji bo parêznameyan çi dibêjin?" Me nikarî tiştekî cidî bigihînin Serokatiyê. Serokatî nabêje ku her tiştê ez dibêjim teqez e û nayê guhertin. Jixwe tu nîqaş bikî, dibe ku tu jî şaşîtiya xwe bibînî û ya di rast de yekîtiyek çêbe. Lê ger wek bîrên tarî tu di hundirê xwe de qebûl nekî û ji derve jî dîmenekî ku wek pir zêde qebûl dikî nîşan bidî, ji wê derê tu encam dernakevin.

Niha nêzîkbûn û helwestên bi vî rengî jî hene. Bala we jî kişandibe, ji ber vê di vê mijarê de em nikarin proje û dîtinên giştî, kûr û berfireh ku bizivirin rêxistin û çalakiyê derxin holê. Qadeke ku hatiye plankirin jî tune. Serokatiyê di encamê de ew rewş dît û got: "Civîneke parastinê jî nehatiye kirin." Çima wisa got? Ji ber mêze kir ku rêxistinbûn, mantiq û xebatên gerîla yên kevn, hê jî wek berê ne. Ji 85'an heya 95'an û 2000'î, li Bakur rêxistinbûna gerîla çawa bû, hê jî wisa ye. Ji xeynî wê tiştek tune. Ji ber vê me paradîgma, stratejî guhert, lê pratîka me hê

wek xwe ye. Ew ne guhertin e, tenê gotin e, bi vî awayî em naguherin. Em tenê dibêjin ku me guhertiye; hin têgehên tên ser ziman tên guhertin, lê em angaşt dikin ku em guherîne. Pergala rêxistinî û şêwaza xebata pratîkî wek xwe maye. Jixwe her dem, ya diyarker pratîk e. Gotin ne diyarker e. Dibe ku pêşiyê lê veke, lê ya mayînde û diyarker pratîk e. Ji ber vê pratîk çi be, encam jî wisa derdikeve holê.

Niha rewşa pergala me ya rêxistinê jî wisa ye. Ya rast me xwest ku em di pergala rêxistinê de jî gelek guherînan bikin, me hinek tişt guhertin jî, lê di cewher de me ya kevn pir derbas nekir. Yên ku me guhertine jî pir parçe ne, ji giştîbûnê dûr in. Hev û din temam nake, yekîtiyeke xwezayî ava nake; hev û din dahf dide,  reş dike, parçe dike û tevlîhev dike. Ev xebatan jî zehmet dike. Di bingeha xwe de, ji ber ku me guherîn û veguherîn bi awayekî îstîkrar nemeşand, ew tişt derketin holê. Em bi awayekî parçe û bi pêl û bi tunekirina pêşengtiya partiyê ketin nav meşeke wisa. Piştî wê jî me nekarî em vê pêşengtiyê bimeşînin û em bigihîjin pergaleke giştî. Me nekarî em hevsengiyekê ava bikin û xwe bigihînin xetekê.

Ew tê çi wate yê? Pêşengtî, partî li cihê xwe rûneniştî; hê jî partî ne diyar e, ne şênber e. Ji nav û nasnameya wê revîn heye. Her kes li gorî xwe dibe partîperest, rêgezên esas yên partiyê jî nayên cih. Disiplîn û rêxistinbûneke partiyê tune. Ango pêşengtiya partiyê tune. Mesele konferansa aboriyê tê lidarxistin, di vê konferansê de nêrînên PKK'ê çi ne, kes nizane û behs jî nake. Xebateke bi vî rengî ya PKK'ê tune. Jixwe yên ku tevlî wir dibin jî, tevlî dibin. Wek PKK'yiyan tevlî dibin, ma çi pêwîstî bi PKK'yiyên cuda heye? Di rewşeke wisa de her kes PKK'yî ye, lê rêxistinbûn û fermiyeteke PKK'ê jî tune. Wisa nabe, em dikarin vê bi awayekî zelal bibêjin.

Komîteya aborî-maliyeyê hinekî pê re mijûl dibe. Pir zêde bi pêş neketin. Civînên xwe her li Qendîlê dikirin, ji ber ku me hinekî rexne kirin, êdî li Rojava û Bakur jî civînên xwe li dar xistin. Lê tenê binke hate guhertin, bawer nakim ku naveroka wê hatibe guhertin. Çima? Ji ber ku divê kadroyên partiyê pêşengtiyê bikin, yekîtiya fikir û çareseriyê biafirîne. Lê nayê wê wateyê ku ji ber pêşengtîkirina partiyê û çareserî afirandina wê, kadroyên partiyê bibêjin: "Li ser her tiştî jî ez ê serwer bim û ez her tiştî dizanim." Li gel me wisa dibe. Em deh hevalên ku gerîlatî kirine kom dikin û dibêjin: "Dê plana aboriya komînal amade bikin." Dê ji aboriya komînal çi fêm bike? Navê wê jî nebihîstiye. Lê

heval rûdinin û li ser kar dikin. Çend caran ji min pirsîn, min got: “Ez tiştekî fêm nakim, pêwîst nake ku ez tevlî civînên bi vî rengî bibim.” Her carê dixwazin, ez dîtinên xwe bînim ziman. Lê dîtineke min wisa tune, ez ne neçar im ku diyar jî bikim, ez ne neçar im ku her tiştî bizanim. Ez nizanim, yek jî di asta pêkanînê de nizanim. Dibe ku ez teoriya aboriyê bizanim, lê teori û pratîk cuda ye. Pratîk projekirinê dixwaze, zanista wê cuda ye, lêkolînên wê cuda ne. Ger di vê derê de kûrbûn çênebe, dê têgehên teorik nezivirin pratîkê. Lê hinek heval dibêjin, qey wisa dibe.

Ez dixwazim vê bibêjim; dema ku em netewa demokratîk înşa dikin û jiyana civakî araste dikin, divê em zêdetir zanistê bi kar bînin. Divê em zêdetir girîngiyê bidin pisporiyê, divê em zêdetir pisporan bikin nav vî karî. Divê pêşengtiya partiyê wan tevlî bike. Divê nebêje: “Ez her tiştî bi rê ve dibim û hukim dikim.” Divê bi zanebûna xwe pisporan bide xebitandin û projeyeke aborîk ku li gorî xeta polîtîk-bîrdozîk ya Serokatiyê ye, bi pêş bixe. Divê projeyên perwerdehiyê derbixe, projeyên dadgeriyê, projeyên parastinê derxe holê. Nexwe bibêje: “Ez rûnim û projeyan derbixim” nabe. Rûdinin û dibêjin, hûn derxin. Dema ku em jî nikarin derxin, em xwe jî dixitimînin. Ji ber vê projeyên ku di pratîkê de pêk tên, ne li gorî pergala me ne û em nikarin bi kar bînin. Avabûn ji bo vê bi pêş nakeve, em ji ber vê nikarin pergala xwe ava bikin.

Di kadro de yozbûn, şîlobûna bîrdozîk, cudabûn û ji rêzê nêzîkbûn bingeha xwe ji vê derê digire. Nizane ku çi bike. Li ser esasê karkirinê, berpirsyarî nagire û berê xwe nade pratîkê. Hêza ku divê pêşengtiyê bike, dibe pirsgirêk; ji ber ku kar nake, di derheqê karê ku bike de proje û şênberbûnek tune. Nikare civakê di mijarekê de araste bike, nikare berê wan bide rêxistin û çalakiyê. Dê çawa rêxistin bike û bikişîne nav çalakiyê, nizane.

Çima ez van tiştan dibêjim, hewayekî wek “Berê PKK’yî baş bûn, kadroyên wan piştre xirab bûn, kesên herî xirab yên cîhanê hatin û di PKK’ê de kom bûn” derdikeve holê, ne wisa? Ger em pirsgirêkê wisa deynin holê, dê dîsa çareserî neyê dîtin. Bi rexneyên bi vî rengî, em nikarin xwe bigihînin cihekî. Pirsgirêkên bîrdozîk, rêxistinî bingeha xwe ji ku digirin? Ger em bingeha wan tespit bikin û derbas bikin, em ê pirsgirêkan jî çareser bikin. Nexwe ger em pirsgirêkan çareser nekin û pirsgirêkê wek baş û xirab deynin holê, em encameke rast nagirin. Ji

ber ku başî û xirabî jî li gorî pîvanên tu digirê dest diguhere. Em ê li vê derê bibêjin: “Ew xirab e.” Dê ew jî li wê derê bibêje: “Na ez baş im.” Wisa be em ê çawa pirsgirêkê çareser bikin? Tu çiqasî dibêjî xirab e, bibêje. Dê ew jî li wê derê ew qas israr bike û bibêje: “Ez baş im, ne xirab im.” Dê çareserî çawa bibe, em nikarin wisa çareser bikin. Pirsgirêk di cudakirina başî û xirabiyê de nîn e. Divê em vê cudabûnê baş bigirin. Divê em bingeha pirsgirêkan ku hemû pirsgirêk ji wê derê derdikevin,  bibînin. Divê mirov pirsgirêkan bi sedemên wan tespit bike, da ku mirov bikare bingeha wê bi tevahî ji holê rake. Sedemeke herî girîng ku kadroyan ew qas diçelqîne jî, ew tiştên ku ez dibêjim in. Her wiha nebûna pergaleke rêxistinî jî, bingeha xwe ji vê derê digire.

Hê jî rewşeke wisa heye; dê PKK were rêxistinkirin an na? Divê di serî de kadroyên PKK’ê wisa bibêjin: “Ez di ku dera rêxistinbûna PKK’ê de cih digirim? Ma ez di rêxistineke PKK’ê de me, an na? Gelo ez fermanan digirim, ez rapor dinivîsînim û digirim?” Divê teqez van pirsan ji xwe bike. Yên ku van pirsan nekin û ne di nav lêpirsîneke wisa de bin, teqez ne kadroyên partiyê ne. Ger em di nav hin rêxistinên din de bin, ew nayê wê wateyê ku em di nav rêxistinbûna PKK’ê de ne. Wek me li jor jî got, pirsgirêk bingeha xwe ji pêşengtiyê digire. Ji bo pêşengtiya partiyê têrî bike jî, hem divê di xeta bîrdozîk-polîtîk de yekîtiyek hebe, hem jî divê mirov bi rêxistinî bixebite. Ji ber vê rêxistinbûna PKK’ê tune, komîteyên PKK’ê tune, mesele kadroyên wê ne di nav rêxistinbûna PKK’ê de ne. Di nav rêxistinên cuda de ne; di nav KCK’ê, HPG’ê, Komalên Ciwan û KJK’ê de ne. Dibe ku hûn bibêjin: “Ma ew ne rêxistinên PKK’ê ne?” Na, ne wisa ye.

Rast e, li gorî xeta bîrdozîk-polîtîk ya PKK’ê xwe rêxistin dikin û PKK’ê wek hêzeke pêşeng qebûl dikin; lê ger mijar pênasekirina rêxistinê be rêxistinbûna PKK’ê cuda ye, ya KCK’ê cuda ye, ya Komalên Ciwan jî cuda ye. Komalên Ciwan xîtabî milyonan ciwan dike, ma ew ciwan hemû PKK’yî ne? Em pîvanên PKK’yîbûnê datînin holê, em dibêjin divê kadro wisa be, xwedî filan taybetmendiyan be. Em li rêziknameyê binêrin; çend xalan pêk tîne, lê ne kadroyê PKK’ê ye, sempatizan e. Wisa be, divê kadroyên PKK’ê ne rêxistinkirî bin, lê di rewşa heyî de bê rêxistin in. Derdora ku ji destpêkê ve rêxistinkirî ye û divê îro jî rêxistinkirî bin, bê rêxistin in. Ji ber vê rista pêşengtiyê nayê cih. Ger em di nav rêxistinên din de bin û ew jî rêxistinên PKK’ê bin; tê wê wateyê ku em di nav PKK’ê de kar dikin û em di komîteyeke PKK’ê de

ne. Na, li gorî her kesî pîvanên wan hene. Ger wisa bûya, Komalên Ciwan nedigot: “Ez rêxistineke cuda me.” Kongre li dar nedixist, nedikarî bername û rêziknameyê çêke. Lê rêziknameyên wan cuda ne.

Ger PKK li gorî rêziknameya xwe, xwe rêxistin neke; dema ku kadroyên PKK’ê ketin nav rêxistineke din, li gorî rêzikname û bernameya wê rêxistinê kar dike. Ango pîvan û rêgezên bîrdozîk yên PKK’ê dahf dide aliyekî. Di kîjan rêxistinê de be, li gorî wê tevdigere. Ew qas helandin, cudabûna ferasetê û di sekna bîrdozîk de şemitîn, bingeha xwe ji vê jî digire. Ew jî rewşeke cidî ye. Ji bo çareserkirina vê rewşê divê çi bê kirin? Em bi niqaşan hatin asteke wisa; ya yekemîn, divê kadroyê PKK’ê di nav xwe de be, divê rêxistinbûneke partiyê çêbibe. Divê nûnertî û komîteyên wê yên navendî, herêmî, xwecihî çêbibin. Divê tu kadroyên ku nekevin nav rêxistinbûna PKK’ê nemînin. Ger neketibe nav rêxistinbûnekê û kar nake, divê em ji wî/ê kesî/ê re nebêjin kadro. Divê em vê zelal bikin. Em ê ji bo vê sicîlan bigirin û em ji bo vê yekîneyeke sîcîlan li vê derê ava dikin. Kî kadroyê/a PKK’ê ye û kî nîn e, dê di sîcîlan de diyar be. Em ê sîcîla hemûyan bigirin û kî di kîjan rêxistinê de ye diyar bibe. Divê teqez di rêxistinekê de kar bike.

Wisa be, ji bo ku komîteyên PKK’ê gel rêxistin bikin dê çi bikin? Wisa nikare bibêje: “Em komîteya PKK’ê ne” û li cihekî bisekine. Divê gelek rêxistinên parelel ava bike û di nav wan rêxistinan de jî kar bike. Ji bo ku pêşengiyê bike, divê di nav van rêxistinan de kar bike. Ji wê jî zêdetir, yên ku rêxistinbûna KCK’ê ava dikin, divê kadroyên PKK’ê bin. Tenê ji xwe rêxistikirinê ne berpirsyar e; divê KCK’ê û hemû rêxistinên ku KCK’ê pêk tînin jî ava bike. Wisa be divê di nav wan de kar bike. Niha kadro dikare bikeve nav rêxistinbûnên bi vî rengî û dikare kar bike? Dikare kar bike, lê çawa kar bike? Divê hem di rêxistineke PKK’ê de be, hem jî di nav wê rêxistina din de be. Divê du nasnameyên wî/ê hebin. Divê bikaribe her du pergalên rêxistinê jî bi hev re bimeşîne. Ger dikeve nav wê rêxistina din, dev ji PKK bernede. Divê ji komîteya PKK’ê dernekeve, dijberî wê divê wek PKK’yiyekî/ê li wê derê kar bike. Dema ku di komîteyeke PKK’ê de hate peywirdarkirin, divê li ser esasê peywira xwe li wê derê kar bike; dema ku li wê derê kar dike, divê hem pîvan, bername û rêziknameya wê rêxistinê li ber çavan bigire, hem jî kadrotiya PKK’ê li ber çavan bigire. Divê tevlî civînên komîteya PKK’ê bibe û li gorî pîvanên PKK’ê li wê derê hesab bide. Divê li gorî wê rêxistina din ku di nav de ye, li gorî bername û rêziknameyên wan bixebite,

tevlî civînên wan bibe û li wê derê jî hesab bide wan. Divê em bikaribin van pêk bînin.

Em tenê bi vî awayî dikarin pergala xwe ya rêxistinî bi pêş bixin. Partî dikare wisa rista xwe ya pêşengtiyê, ji aliyê rêxistinê ve pêk bîne. Ger ne wisa be û em bibêjin: "Em ê PKK'ê rêxistin bikin û bila kadroyên PKK'ê tevlî xebatên din nebin û em rêxistinên din ava nekin" em ê li wê derê wek kombûneke ku ji sedan kesî pêk tên bimînin û tu bandora me jî namîne. Em nikarin bibin rêxistineke pêşeng. Wekî din ger em bikevin nav van rêxistinên din û em bibêjin: "PKK van jî rêxistin dike, em li gorî van rêxistinan kar bikin, bes e" nabe. Pîvanên wan cuda ne, sekna wan ya bîrdozîk cuda ye, sekna wan ya rêxistinî cuda ye, pîvanên kadroyên wan cuda ne. Ger tu li gorî wan tevbigerî, wê demê tu yê pîvanên bîrdozîk yên kadroyê PKK'ê biguherînî. PKK li wê derê tesfiye dibe. Ji aliyê rêxistinî ve jî parçe parçe dibe. PKK giştîbûnê pêk tîne; ger rêxistinbûna PKK'ê tunebe dê PKK çawa giştîbûnê ava bike? Çima em ew qas parçe ne? Çima hemû encamên ku ji hemû xebatan derdikevin, li cihekî kom nabin? Ji ber ku em dibêjin hêza li wê derê pêşengiyê bike partî ye; lê hêza partiyê ya ku yekîtiyê çêke tune, rêxistinbûna partiyê tune, pergala rêxistinê tune. Hêza pêşeng nikare komî ser hev bike, ji ber vê jî her tişt bi parçe ye, ji her aliyî ve diherike û belav dibe.

Ji vî aliyî ve divê em PKK'ê bi tevgerên din re tevlîhev nekin û qiyas nekin. Divê em ne PKK'ê û KCK'ê wek hev û din bibînin, ne jî wek ku li hemberî hev in û alternetîfa hev û din in bibînin. PKK di nav KCK'ê de; KCK di nav PKK'ê de be. Ji aliyê rêxistinî ve dê PKK di nav KCK'ê de be; ji aliyê bîrdozîk ve jî dê KCK di nav PKK'ê de be. Ger em pergaleke wisa ava bikin û li gorî wê rêxistin bikin, em dikarin bimeşînin. Ji ber ku ji aliyê rêxistinî ve PKK di nav KCK'ê de be; divê li her cihê ku rêxistinbûna KCK'ê heye, PKK jî hebe. Li wê derê divê PKK'yî hem wek qometiyên rêxistina xwe, hem jî wek komîteyên KCK'ê hebin. Niha hemû kadroyên PKK'ê ne, lê dibêjin "Em KCK ne." Ev nabe. Ji bo guherîna vê pergalê me konferans çêkirin, me nîqaş kir û me komeke PKK'yî peywirdar kir, lê nekarîn şeş mehan xwe bikin rêxistin. Hewl didin ku her tiştî bi van pênc kesan pêk bînin û niha jî dibêjin: "Hêza wan têrî nake, nikarin bikin." Gelo ê çawa bikin? Di 1979'an de pênc kesan nedikarî bikin, ji bo vê me partî ava kir, sedema avakirina PKK'ê ew bû. Serokatiyê got: "Rêxistin mezin bû, ez bi serê xwe nikarim rêxistin bikim, em partiyê ava bikin û bila rêveberiyeke wê hebe, tenê rêveberî

dikare vî karî kordîne bike.” Niha jî pir mezin bûye, dê pênc kes çawa bi rê ve bibin? Wan pênc kesan, nekarî xwe bikin 25 kes. Wek PKK’ê me dendikê rêxistinê çêkir, lê nekarî xwe bike KCK. Hê jî di destê xwe de digire, gelo dê bibe KCK, an na?

Hemû sazî belave ne; DBP li aliyekî ye, HDP li aliyekî ye, şaredarî li aliyekî ne, DTK li aliyekî ye; her kes li gorî xwe seriyeke, ma dîtina vê pir zehmet e? Pêwîstî bi kordînasyoneke ku van hemûyan kordîne bike heye. Ji bo dîtina vê pêwîst nake ku mirov bibe zanyar. Wek rojê ronî ye û aliyekî wê yê ku mirov nîqaş bike tune. Lê em nikarin vê bikin û ev 6 meh in em nîqaş dikin: “Gelo dê bibe, an na? Dê komîteya rêvebe-riyê li ku be, bila li filan cihî be?” Heya gel Serokatiyê jî birin, tevlî tekmîlan kirin. Piştî wê jî dibêjin, dê ew kar çawa bibe? Em dest û piyên xwe li hev digerînin, ez dikarim bi awayekî vekirî vê bibêjim. Piştî ew qas danehevên rêxistinî ew tişt nabin, bi vî awayî nabe!

Ji bo DBP jî wisa ye, dibêjin: “Dê DBP kadroyan perwerde bike, bûye PKK.” Çima, DBP kadroyên xwe perwerde dike, KCK jî kadroyên xwe perwerde dike. Kadroyên KCK’ê hene. Gelo kadroyên komaleya Sarmaşikê jî tune? Ma bê kadro kar dikin? Endamên wan tune ne? Hene. Endamên Saziya Malbatên Şehîdan tune? Ma ew ne kadro ne? Wisa be, em kadro bidin wan, dê bibin kadroyên PKK’ê? Wisa nabe. Tê wê wateyê ku ew kadro endamê rêxistinekê ye. Ger rêxistin cuda be, kadroyê wê jî cuda ye; kadroyên her rêxistinekê hene, nayê wê wateyê ku hemû kadroyên PKK’ê ne. Ger DBP kadroyan perwerde bike, dê kadroyên PKK’ê perwerde neke. Risteke DBP’ê heye, ji nav DTK’ê der-dikeve; ji rêvebirina siyaseta demokratîk û bi înaşkirina xweseriya de-mokratîk berpirsyar e. Bi awayekî fermî kar dike û li gorî wê pîvanên wê hene. Dibe ku ji hinek aliyan ve nêzîkî taybetmendiyên PKK’ê be, lê nikare bibe PKK. Ger wisa be, pêwîst dike ku em PKK’ê fes bikin û tevlî DBP’ê bibin. Wisa nabe.

Ji nasnameyê rev heye, bi vî awayî hinek têgeh tên şîlokirin. Hinek têgeh hevpar in, civaknasî wisa dibêje; em nikarin li gorî xwe fêm bikin, em nikarin li gorî xwe kadro pênase bikin. Em dikarin naverok û tay-betmendiyên kadrotiyê pênase bikin. Bêguman dê PKK li gorî xwe pênase bike. Lê kadro, tê wateya endamekî/e rêxistinê. Ger her rêxis-tin cuda be, dê li gorî wê endamên wê jî cuda bin. Wisa dike, lê tê rexnekirin, ew ne rast e. Piştî wê jî ji aliyê bîrdoziyê ve em belav dibin, her tişt tevlîhev dibe, pîvan xilas dibin, ji aliyê siyasî ve jî em nikarin

siyasetê bikin, dixetime. Di vê mijarê de dewlet pir qurnaz in. Dema ku tiştek derdikeve û hûn diçin ku bi wan re hevdîtinan bikin, dibêjin "Em parçe ne, em nikarin serweriya xwe teqez bikin, em cuda difkirin, parçebûn heye." Hem jî di derheqên rêxistinên îstîxbaratî de wisa dibêjin. Ne gengaz e ku rêxistineke îstîxbaratî ya dewletekê, ji hikumet û rêveberiya wê dewletê qut bifikire. Lê ji bo xapandinê tê wan tiştan dibêje, siyasetê dimeşîne. Tu dibêjî: "Wisa kirine." Ew dibêjin: "Ew ne ji me ye, ji ber ku wî wisa kiriye, ew tişt derketine." Ev tişt hene. Lê em rêxistinên ku bi rastî jî cudane, dixwazin bikin yek. Ev ne rast e. Ji ber vê DBP, nikare wek DBP'ê kar bike. Niha ketine hewaya PKK'ê. Me hevserokên wê jî nedîtin ku em ji wan re bibêjin: "Binêrin hûn ne PKK ne, xwe nexin wan hewayan. Em cuda ne, em rêveberiya PKK'ê ne, bêguman em ê PKK'ê rêxistin bikin û biparêzin. Lê hûn ne di rêveberiya PKK'ê de ne." Qet eleqeya wê tune, eleqeya wan bi pîvanan re tune.

Di DBP ya îro de, li gorî ya berê pir kêmtir kadroyên PKK'ê hene. Wisa be, DBP dê çawa bibe PKK? Gelo ew gengaz e? Ne gengaz e, ew qas aloziya rêxistinî ne gengaz e. Ev hemû tevlîhev dibin. Dema ku îtîbar, yetkî û derfet ji PKK'ê tên, wê demê dibin PKK'yî. Lê dema ku pîvan û disiplîn pêwîst dike, dibêjin "Ez DBP'î me." Ev derfetên ku li hemberî rêxistinê polîtîkayê didin meşandin, ezezîtiyê bi pêş dixe. Sekna bîrdozîk jî tune dike, dihelîne. Pîvan û rêgezan ji holê radike, belave dike.

Ji aliyê rêxistinî ve, divê kadroyên PKK'ê li cihê lê ne xwe jî rêxistin bikin. Ger di nav rêxistineke din de bin jî; divê hem wê rêxistinê bi rê ve bibin, hem jî divê bizanibin ku wek PKK'ê kar dikin û divê pergala rêxistinî-bîrdozîk ya PKK'ê biparêzin. Divê karîn, pergal û venêrîna wan hebe. Divê hem ji sekna bîrdozîk berpirsyar bin, hem jî ji faliyetên polîtîk-pratîk plan bikin û bimeşînin. Pêşengiya vê bikin. Divê di pergalê de jî sererastkirin û zelalbûnek bê çêkirin. Divê em tevlîhev nekin; KCK rêxistineke demokratîk ya gel e, pergala netewa demokratîk û civaka demokratîk e; PKK jî tevgereke bîrdozîk û felsefîk e, pêşengiyeke kadro ye. Ew kadro wek ya sosyalîzma pêkhatî, ne kadroyê rêveberiyêye jî, divê di vê mijarê de jî zelalbûnek hebe.

Zivistana derbasbûyî, Rojava hevalan venêrîn kirin, biryarên baş derketin. Biryar baş in, lê yek jî pêk neanîne, piştî şopandina salekê ev derket holê. Dê kadroyên PKK'ê di esasê xwe de li qadên bîrdozîk û parastinê bên peywirdarkirin. Dê kadro li qadên civakî pir kêm hebin.

Kadroyên li qada civakî jî, divê her li derdora xwe rêxistinbûna KCK'ê û rêveberiya netewa demokratîk ava bikin û wê li gorî inşaya xweseriya demokratîk bimeşin. Lê li ku ne? Di qada parastinê de hinek hene, li qada bîrdozîk bi qasî hejmara têliyên destekî ne. Hemû rêveberiyan dadigirin. Dibêjin: "Em ê li ku bibin rêveber, em ê li ku derê bikevin meclîsan, bikevin nav kometiyên rêveberiyê" û li ser wê şer dikin. Ger me biryareke wisa negirta, dê rêxistinbûna ku bi navê xweseriya demokratîk hatiye avakirin, tijî kadro bibûya. Me hinek sînor danîn, tedbîr girtin û baş bû. Vebûnek çêbû, bawerî da gel û mînak derxist holê. Hin hêzên din jî gotin: "Wek ku di pratîka sosyalîzma pêkhatî de derketiye holê, PKK hema li ser derfetan rûniништ, nebû dewlet û rêveberiyeke ku derfetan di destê xwe de digire. Vê naxwaze. Di nav gel de karê perwerdeyê û rêxistinbûnê dike." Ya rast, divê karê kadroyên PKK'ê ew be, ne ku bibin rêveberî, divê bibin kesên ku gel perwerde dikin û rêxistin dikin. Divê gel teşfîqî jiyana komînal û demokratîk bikin û ji bo vê teşfîqî têkoşînê bikin. PKK, tê wateya rêxistin û tevgereke gel.

Niha ew sazîbûnên li Bakur jî, KCK ne. PKK çi ye? Gelê ku çalakiyan dike, pêwîst bike dê sazîbûnên heyî jî bikişîne têkoşînê. Ger şaş bin, ji bo rast bimeşin, divê pêşengiyê bikin. Divê bibe nunerê zane yê gel û bibe nunerê çalakiya rêxistinkirî. Bi vî awayî divê têkoşîna rêxistinbûna gel ku dizivire konfedaralîzma demokratîk bide. Divê vê rêxistinbûnê li gorî xeta konfedaralîzma demokratîk, ji tundî û metîngehiyê dûr, li ser esasên azadî, wekhevî û parvekeriyê bigihînin asta rêveberiyekê. Divê ji bo vê têkoşîn bike, bixebite. Nexwe wek ku di sosyalîzma pêkhatî de hatiye ceribandin, wisa bi carekê re avakirina wê ne gengaz e.

Mijarên ku divê di pergala me ya rêxistinî de bên sererastkirin û di mijara sedemên şemitîna bîrdozîk-rêxistinî de, em dikarin van tiştan bibêjin. Ew jî sedemên girîng in. Ger ew neyên derbaskirin, em nikarin pirsgirêkên xwe yên bîrdozîk çareser bikin; em nikarin yekîtiyeke bîrdozîk ava bikin. Em tenê bi xebateke rast û têr ya rêxistinî dikarin pirsgirêkên bîrdozîk çareser bikin. Perwerde jî şaxeke vê ye, lê têrî nake. Şaxeke wê jî rêxistinbûn û rêveberî ye, pergala rêxistinî ye. Di pratîkê de jî ew pirsgirêk bi vî rengî derdikevin holê.

## PÊWÎSTIYÊN XETA SEROKATIYÊ Û XETA BÎRDOZÎK-POLÎTÎK

Peywireke girîng ya dewreya me ya perwerdeyê; bi guftigoya pratîka xwe, kêmasî û şaşîtiyên xwe derxistina holê ye û bi sedemên wan ve ji holê rakirina wan e. Ji bo ku em bikaribin van bikin jî, divê em bizanibin ku ya rast çi ye. Divê em vê bi qasî ku têrî dike fêr bibin û bizanibin. Tiştê ku em wek xet, xeta Serokatiyê, xeta bîrdozîk-polîtîk pênase dikin heye û pêwîstiyên wê hene. Ew çi ne? Pêwîstiyên wê yên bîrdozîk, felsefîk, paradîgmayî, stratejîk û tektîkî çi ne? Divê em van derxin zanebûnê, ji bo vê jî em perwerdehiya parêznameyan dikin.

Divê felsefe, teori, xeta bîrdozîk-polîtîk, feraseta stratejîk-tektîkî, rêveberî, şêwaza xebat û jiyanê ya Serokatiyê bi awayekî rast bê fêmkirin û bizivire zanebûnekê. Divê wisa bibe, da ku em bizanibin çi bikin. An jî tiştên ku nehatine kirin em derxin holê. Ger em vê nizanibin, em nizanin ku çi nehatiye kirin. Ger em nizanibin divê çi bê kirin, di pratîkê de tiştên ku nehatine kirin, em ê ji ku  bizanibin? Tenê em dikarin wisa bizanibin. Divê em vê xetê bizanibin, da ku em bizanibin tiştên em dikin çiqasî rast in, an jî kêm û şaş in. Bi vî awayî em dikarin tespit bikin. Ger wisa nebe, em nikarin bizanibin. Ger em xeta rast nizanibin, em nikarin kêmasî û şaşîtiyan jî derxin holê. Ji bo vê jî divê em li ser esasê parêznameyan xeta Serokatiyê bipejirînin. Em bi vê armancê perwerdehiya parêznameyan dikin, li ser vî esasî ye. Bernameya perwerdeyê ji nîvî zêdetir, ji parêznameyan re tê veqetandin. Her wiha em li dahûrandinên Serokatiyê ku berê kirine temaşe dikin, dixwînin. Ji bo bingehekî bide çêkirin, em li ser rastiya Serokatiyê lêkolîn û lêgerînan bi pêş dixin.

Bi awayekî şênber jî, em li ser esasê pênc parêznameyên dawî ku wek "Manifestoya şaristaniya demokratîk" tên pênasekirin perwerdeya xwe li dar dixin. Hin materyalên wek "Nexşeya rê" ku wan temam dikin hene, têbîniyên hevdîtinên Serokatiyê hene. Yek jî pirtûka ku guherîna paradîgmayê cara ewil dinirxîne; "Parastina gelekî" heye. Jixwe parêznameyên bi navê: "Parastina Gelekî, Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk" wek partîbûna serdema sêyemîn hatin pênasekirin. Kongreya 9'emîn, li ser esasê "Parastina Gelekî" bernameyek derxistibû, wek kurteya wê bû. Kongreya 11'emîn jî li gorî "Manifestoya Şaristaniya Demokratîk" bername ji nû ve girt dest, araste kir û kurteya wan derxist. Serokatiyê di 77'an de bername, di 78'an de

manîsfesto nivîsandibû. Hevalê Xeyrî gotibû: “Ters bû, karê me ters dest pê kir.” Divê di serî de manifesto bihata amadekirin û piştre bername bihata nivîsandin. Wê demê, di 76’an de jî hevalê Xeyrî û Serokatiyê wek manifesto, reşnivîseke (karalama) dirêj çêkiribûn. Di parêznameyan de û di hin dahûrandinan de heye, lê ew nehatin arastekirin. Ji ber vê Serokatî, ji bo amadekirina bernameyekê amade bû, bernameyeke bi vî rengî amadekirin, dibe ku bingeha xwe ji wê derê bigire.

Niha li gorî pergala ku hevalê Xeyrî diyar kiriye, pergala rêxistinê meşiya, dimeşe. Serokatî manifesto amade kirin, ji wê derê bername hatin derxistin. Bernameya kongreya 11’emîn, hin dîtinên pirtûka “Parastina Gelekî” di nav xwe de bihewîne jî, zêdetir bi awayekî şênber xwe dispêre pirtûkên “Manifestoya Şaristaniya Demokratîk.” Bi taybetî jî pirtûka “Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Nemokratîk.” Bi vî awayî bername û rêziknameyek ava bû. Xwe avakirina partiyê pêk hat. Lê ya esas, em li ser manîfestoyê perwerde dibînin. Pirtûkên “Parastina Gelekî û Manifestoya Şaristaniya Demokratîk” bi taybetî jî pirtûka “Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk” pêk tê. Lê em yên din jî bi awayekî giştî lêkolîn dikin.

Serokatî ji bo pirtûka “Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk” wisa got: “Ew pirtûk li ku be, ez li wir im. Pirtûkeke ku fikrên min di nav de heliyan e.” Ji ber vê em perwerdehiya Serokatiyê, li ser van esasan li dar dixin. Li ser esasê pirtûkan perwerde li dar xistin ne şaş e, ji aliyê têgihiştina teorik ve girîng e. Ji destpêkê ve şêwaza me wisa ye. Ev şêwaz nû bi pêş nakeve, an jî ji ber ku parazneme nû ne, wisa nabe. Ji destpêkê ve, ji 74-75’an ve di PKK’ê de perwerde li ser vî hîmî bi pêş dikevin. Berê jî me li ser hinek pirtûkên Marksîst, pirtûkên ku teoriya Marksîzmê didin; me perwerdeyên xwe plan dikirin û ew dixwendin. Ev her dem wisa bû. Bi demê re wêjeya partiyê bi pêş ket, êdî li gel teoriya giştî, me rastiya Kurdistanê jî pênase kir. Bi vî awayî di materyelên perwerdeyê de jî guhertin çêbûn.

Pergal pir zêde neguherî, materyalên perwerdeyê guherîn. Perwerdeyeke ku bi vî şêwazvî hatiye lidarxistin encam da, serkeftî bû. Pêşketina PKK’ê, diyar dike ku perwerdeyeke bi vî şêwazî hatiye lidarxistin encam daye. Ji ber vê li ser esasê parêznameyan; xwendin, lêkolînkirin, nîqaşkirin; bi taybetî di zanebûnê de û di fêmkirina teorik de encaman derdixe holê. Ev şêwaz ne şaş e, rast e. Em cara ewil nace-

ribînin, şêwaza perwerdeyê ku em ji destpêkê ve bi pêş dixin e. Carinan me bi komên biçûk jî li dar dixist; carinan wek komên ku ji 3-5 kesan pêk tên jî perwerde dihatin lidarxistin. Piştre pergala dibistanê û qampan, li ser vî esasî gihîşt asteke ku dimeşe. Niha jî em perwerdeya Serokatiyê ya esasî, bi vî şêwazî dikin. Em hemû rastiya Serokatî û pirtûkên wî lêkolîn dikin, em axaftin û nivîsandinên cur bi cur dişopînin, nîqaş dikin. Li gel wê em nîqaşên alîkar dikin û materyalên alîkar dixwînin. Bi şêweyeke waneyên perwerdeyê yên hatine diyarkirin, xwendin û nîqaşkirina van pirtûkan, tevlîbûneke aktif e.

Di vê de armanca me ji her aliyî ve pejirandina rastiya Serokatî ye. Bi yekalî mezînekirina rastiya Serokatiyê; bi awayekî giştî û têr, bi awayekî rast fêrbûn û xwe gihandina asteke fêmkirinê ye. Ango xwe ji aliyê fikrî ve gihandina xeta Serokatiyê ye. Divê em bi awayekî çalak-aktîf tevlî vê bibin. Divê em vê bikin, da ku em bikaribin rexne û nirxandinan jî bikin. Ger ew nebe, em nikarin nirxandinên pratîk bikin, em nikarin analîzên polîtîk bikin. Ger em bikin jî, em ê li gorî ferasetên cuda bikin. Em nikarin li gorî feraseta partiyê û Serokatiyê bikin. Ji bo ku em bikaribin rexne û analîzan li gorî rastiya Serokatî û partiyê bikin, divê em xeta Serokatiyê bipejirînin. Divê em pîvanên red-qebûl, pîvanên rast û şaş bizanibin. Nexwe em ê li gorî çi analîzan bikin, ji hev û din veqetînin û li gorî çi bibêjin rast e, an şaş e? Bêguman divê em rastiya Serokatiyê bizanibin û li gorî wê ji hev veqetînin.

Divê di vê çarçoveyê de nêzîkbûneke lêhûrbûnê hebe, bi awayekî rast nêzîkbûna parêznameyan girîng e. Xwendin û guhdarkirin têrî nake. Divê were lêkolînkirin, nîqaşkirin û li ser wê lêgerîn hebin. Divê amadekariya waneyê hebe, tevlîbûna nîqaşan hebe, tiştên ku nehatine fêmkirin divê bên pirsîn, divê her hevalek dîtinên xwe raber bike. Divê wisa dûr, bêalî û sînordar nemînin. Divê her hevalek bikaribe tevlî bibe, fikrên xwe bîne ziman û bikaribe xwe îfade bike. Çi fêm kiriye, divê bîne ziman ku şaşîtî û kêmasiyên wî/ê jî bên sererastkirin. Wisa nebe, sererastkirin nabe. Ji ber vê dibe ku di destpêkê de zehmetî jî bên kişandin. Lê tevlîkirin û teşvîqkirina her hevalekî/ê pêwîst dike. Divê her hevalek zorê bide xwe û xwe têvlî bike, wekî din nabe. Dibe ku guhdarkirin hinek tiştan bide fêrkirin, lê bes nake.

Divê mirov tevlîbûneke xurt çêbike. Mirov mijarên ku bi xwe tevlî dibe û dîtinên xwe tîne ziman, baştir fêm dike. Wisa be dê zêdetir fêr bibe, nexwe têgihiştin û pejirandin kêmtir bibe, dê sînordar bimîne.

Şopandina xwendin û nîqaşan bes nake. Lê mirov tevlî nîqaşan bibe, dikare zêdetir bişopîne jî. Di vê mijarê de dibe ku di destpêkê de xwe îfadekirin ne hêsan be, lê divê hinekî xwe biêşînin, hewldan nîşan bidin. Kêm û şaş be jî, divê her kes dîtina xwe deyne holê û îfade bike. Pêwîst nake ku mirov bitirse û xwe paşve bikişîne; jixwe şaş be, dê bê sererastkirin. Jixwe kêmasî û şaşîtiyên me tunebana, em ne li vê derê bûn. Ji bo wê bila heval nebêjin: "Dê kêmasiyên min derbikevin û dê encamên wê bibin çi ne diyar e." Jixwe ji destpêkê ve em kêmasî û şaşîtiyên we qebûl dikin. Ji ber ku em pir zane ne, em nehatine vê derê. Yên pir dizanibin hebin, bila biçin, çima hatine? Hatineke wisa, rast jî nabe. Wisa nabe, ger em hatibin perwerdeyê, şaşîtiyên me hene, kêmasiyên me hene. Hin xalên ku divê em fêm bikin û sererast bikin hene em hatine. Di perwerdeyê de jî divê em van bikin. Ji ber vê divê tiştên wisa fikaran ava nekin û mirov paşve nekişînin. Carinan wisa dibe, dewreyek derbas dibe, lê hevalekî/e ku qet neaxifiye heye, berê pir çêdibû. Dema ku em rastî tiştên wisa hatin, em pir cidî li ser sekinîn û me da sekinandin. Me wisa qebûl nekir.

Aliyekî girîng yê perwerdeyê jî, xwe gihandina asta xwe îfadekirinê ye, divê hêz û wêrekiya xweîfadekirinê bi me bide qezenckirin. Ji vî aliyî ve divê nîqaş zêdetir bi çawanî û bi hilberîn bin. Dibe ku nayê fêmkirin, an jî kêm bên fêmkirin, misoger divê ew bên derbaskirin. Ji bo vê jî divê em bikaribin pirsan bikin, divê bê ku were fêmkirin tu mijar neyên derbaskirin. Ger wisa nebe, dê perwerde vale derbas bibe. Divê em nebêjin: "Nayê fêmkirin." Di vê çarçoveyê de nêzîkbûnek li hemberî parêznameyan heye, ew ne rast e.

**Rêbaza Fêmkirinê Ya Herî Baş Serokatî Ji Serokatiyê Fêrbûn e**

Ji Rojava nîşeyek şandine, dibêjin "Ji me re pirtûkên ku vebûna parêznemeyan dike bişînin." Akademiya Zanistên Civakî heye, van mijaran dinivîsin, lê tiştên ku Serokatiyê nivîsandine, hêsantir tên fêmkirin. İslûbê hevalên me qet nayê fêmkirin. Ez ji nivîsên wan tiştekî fêm nakim, yek jî her kes li gorî xwe guftûgo dike. Guftûgoya Serokatiyê pir cuda ye. Ger mirov rastiya Serokatiyê li gorî xwe guftûgo bike, dê mirov biguhere, te çiqasî fêm kiribe, tu yê ew qas binirxînî. Ger ez li ser Serokatiyê dîtinên xwe bînim ser ziman, dê ew nirxandin bibin dîtinên min. Ez ê li ser navê Serokatiyê bibêjim, lê ez ê guftûgoya xwe bikim. Dê ez çiqasî fêm bikim, ez ê ew qas bînim ziman û vebibêjim. Tiştê ku

min fêmnekiriye, ez ê çawa bibêjim? Ger min kêm fêm kiribe, ez ê kêm bînim ziman. Ger min şaş fêm kiribe, ez ê şaş bibêjim. Ji ber vê Serokatî, ji Serokatiyê fêrbûn û hewldana fêmkirinê nîşandan rastir e, zêdetir esas e.

Mesele, tiştên teorik û gişît hene. Di derbarê dîrokê de ne, di derbarê pergala kûrewî de ne, di derbarê jiyanê de ne, analîzên felsefîk û teorik in. Pejirandina van tiştan, di wê astê de kombûneke zanistî dixwaze. Yên ku ne di wê astê de bin, nikarin di wê astê de fêm bikin. Ji bo ku ew nehatiye fêmkirin, pêwîst nake ku em hema bikevin nav fikaran jî. Ew karekî danehevê ye, bi qasî ku danehev bi pêş ketin, dê fêmkirin jî çêbibe. Lê ji wan deran, Serokatî di derheqê jiyan û têkoşînê de encaman derdixe. Ew encam şênber in û aîdê me ne. Teqez mirov dikare wan fêm bike, ji bo ku mirov niha Serokatiyê fêm bike û pêk bîne; ew encam bes dikin. Ger kesek wan rast û bi qasî ku têrî dike fêm bike, wê demê dikare pratîka xwe li gorî xeta Serokatiyê pêk bîne. Dibe ku hin pirsgirêkên felsefîk-teorîk fêm nekiribin, ew ne girîng e, an jî ne kêmasiyeke pir mezin e. Ne kêmasiyeke ku li pêşiya pratîka me bibe asteng e. Mirov dikare bi awayekî serkeftî pratîkê jî bike. Lê ger xwe bigihîne asteke ku wan mijaran jî bi kûranî fêm dike, asta xwe ya fikrî di wê astê de bi pêş bixe, dê baştir bibe. Divê ji bo wê jî mirov hewldan nîşan bide. Ji bo ku mirov di wê astê de rewşê fêm bike, divê mirov bixebite, ew jî girîng û pêwîst e.

Lê wek ku min got, divê tenê bi mêzekirina wan, mirov nebêje "Parêzname nayên fêmkirin." Li ser zanista civakî nirxandin hene, nirxandinên dîrokî hene, li ser jiyanê nirxandinên felsefîk hene. Asta mêzekirina Serokatiyê û asta têgihîştina wî pir bilind e û kûr e. Mirov di wê astê de nikare raber bike. Di Serokatiyê de, raberkirineke danehevên pir kûr heye û wê wek angaşt diyar dike. Wek encaman raber dike. Ji vî aliyî ve hemû parêzname, pir bi kûrahî ne. Her hevoka wê, bi wateyên pir kûr tijî ye. Pêwîst dike ku em li ser bisekinin û lêhûrbûnekê çêbikin. Ne wek xwendina çîrokekê ye; ger dixwazin wek roman û helbestekê fêm bikin, dixwazin tenê xîtabî hestên wan bike, nabe. Parêzname ne wisa ne. Ne dîrok wisa ye, ne jî cîhan wisa ye. Çawa wisa be? Ji ber vê ketina nav bendewariyeke wisa û ji parêznameyan tiştekî wisa hêvî kirin, ne rast e. Şaşîtî di wê derê de ye, lê ger li ser lêhûrbûn bibe û bê nîqaşkirin ne tiştekî ku nayê fêmkirin e. Divê mirov li ser lêkolîn bike, lêhûrbûn bike û nîqaş bike.

Ji vî aliyî ve mirov bibêje nayê fêmkirin û bide aliyekî, rast nabe. Gotina “Min xwend, fêm kir; min careke guhdarî kir û min fêm kir” jî ne rast e. Ew kar, ew qas jî ne hêsan e. Fêmkirin û pejirandina parêznameyan hewldaneke mezin dixwaze. Yek jî domdariyê dixwaze. Tenê heya astekê mirov dikare fêm bike. Gihîştina fikirê ku wek hemû hatiye fêmkirin, an jî wisa girtina dest şaşî ye. Dema ku mirov kêmekî fêm kir, divê mirov wek her tişt fêm kiriye, negire dest. Ew hemû rewşên ku bêne jiyankirin in. Dîsa diyar dikim, ji ber ku ev rewş hemû hene, divê em negihîjin dîtineke wisa ku dibêje: “Heya ku ez giştî fêm nekim, ez nikarim pratîkê bikim.” Yên ku li ser lêhûrbûnê dikin, hewldan nîşan didin, dizanin ku çi û çawa bikin. Dizane ku armanca me çi ye û em ê van armancan bi kîjan rêbazên têkoşînê pêk bînin. Ji ber vê dê bibîne û bizane ku divê çi bike û çawa bike. Bi vî awayî dê xwe bigihîne asteke ku bikaribe kar bike. Em dikarin vê wisa binirxînin.

Dibe ku di hin mijaran de kêm bimîne, lê divê mirov nebe encamek wisa; “Me perwerde nedît, ji ber vê em nikarin pratîkê bimeşînin.” Ger nêzîkbûn ew be, dê bigihîje encameke wisa. Ger bigihîje encameke wisa, dê şaş bibe. Divê em vê diyar bikin. Ji ber vê divê em rast nêzîkî parêznameyan bibin. Divê zêdetir lêhûrbûn çêbibe; divê bê xwendin, lêkolîn bê kirin; divê tenê bi guhdarkirinê nemîne, divê bê nîqaşkirin. Lê divê herî kêm xwe bigihîne teoriya ku di nav pratîkê de pêwîst dike. Her hevalek dikare vê bike. Dikare ji wan nîqaşên ku tên kirin, xwe bigihîne encamên ku pê kar bike. Em dikarin ji aliyê perwerdeyên parêznameyan ve, van tiştan bibêjin.

Tenê ne ew e, lê em çima di destpêkê de vê digirin dest? Ya yekemîn, ji bo ku ji aliyê teorik ve, mirov bizanibe ku çi rast e, ci şaş e, çi xirab e. Ango ji bo ku di nîqaşên parêznameyan de, mirov bizanibe çi bike û çi neke. Ji perwerdehiyê asteke têgihiştina teorik ya bi vî rengî mirov dikare bigire. Lê divê mirov vê bi çi misoger bike? Mirov dikare li gorî pêwîstiya felsefîk, teorik, stratejîk û tektîkî ku di naveroka parêznameyan de heye; pratîka heyî lêpirsîn bike û misoger bike. Em vê xetê jî, ji bo ku bikaribin lêpirsîneke rast û analîzeke rast bikin fêr dibin. Ger em bi xeta heyî, dahûrandina pratîka heyî bikin; waneyên pratîkê di vê çarçoveyê de bigirin dest; dê asta me ya têgihiştinê zêdetir bibe, em ê zêdetir bikaribin xwe bigihînin asteke fikrî ya pêkanînê, şênberbûnê û pergalbûnê.

Ji ber vê beşa duyemîn ya bernamê, mijarên pratîkî ne. Ya rast, mijarên ku dîrokê û roja îro lêpirsîn dike ye. Me ev wek analîza têkoşînên dîrokî û pratîkî; li gel dîroka partî û jinê, bi awayekî rojane nîqaşkirina têkoşîn û xebatên qadên bîrdozîk, civakî û leşkerî plan kirin. Di bermeya perwerdeyê de ew cih digirin. Ya esas ew e; em ê çi û çawa bikin? Me wek bersiv, danehevên têkoşîna pratîkî, bi xeta Serokatiyê ve analîzkirin; ji vê derê wane derxistin diyar kir. Di vê mijarê de parêzname, ketina ser xetekê û şêwaza nêrînekê avakirinê armanc dikin.

Nirxandina pratikan jî, bi derxistina waneyên pratîkên ku me jiyankirine, ji hev veqatandina şaşîtî û rastiyan; tiştên ku divê me bikirana û me nekirine, an jî me bi awayekî bes û têr nekirine, analiz dike û waneyan jê derdixe. Ji ber vê divê em heman girîngiyê bidin analîza pratikan û domandina wan. Divê em analîzkirina pratîkê girîng bibînin. Ji bo pejirandina parêznameyên Serokatiyê, ku çawa divê em lêhûrbûn û lêkolînekê bikin; divê di heman astê de, em tevlî nirxandina pratikan jî bibin. Divê em zêdetir tevlî bibin, lêhûrbûn bikin û lêkolîn bikin. Di nîqaşkirina pratîka giştî ya partiyê de, di nîqaşkirina pratîka qad, dîrok û roja îro de, şênbertir di nîqaşkirina herêman, yekîneyan de; pratîka me çiqasî bes dike, çiqasî kêm maye; çiqasî rast e û çiqasî şaş e, divê em analiz bikin. Şaşîtî û kêmasiyên me di ku derê de bûne, divê em van bibînin û em jê waneyan derbixin û derbas bikin. Ji vî aliyî ve, analîza pratîkê dibe rexne û rexnedayîn.

Di analîzkirina pratîkê de jî, divê heval rast nêzîk bibin. Divê kûr bibin û hewldanê nîşan bidin. Fêrbûna şênber û mayînde, ji analîza pratîkê derdikeve, ji waneyên pratîkê derdikeve. Lê bi awayekî rast analîzkirina pratîkê jî girîng e. Divê em li gorî pêwîstiyên xeta Serokatiyê û bi qasî ku têrî pêwîstiyan bike, analiz bikin. Li gorî xwe analîzkirin, ne rast e. Pîvana me, pîvan û xeta Serokatiyê ye, ew pîvan û xet dibêjin çi? Em ê çi bikin, wê dibêjin. Gelo me kir, an na? Me nekiribe, ji ber çi ye? Divê em çawa bikin? Ya ku me kiriye rast bûye, an na? Ger rast nebûye, kêmasî û şaşîtî bingeha xwe ji ku digirin? Divê em li ser hîma van pirsan, dahûrîn bikin.

Divê em ji analîza pratîkê nerevin, lê divê em analîzkirina rast jî esas bigirin. Divê em wisa li gorî xwe, kêfî, teng û seranser nirxandinan nekin. Divê em ji dahûrandin û analîzkirina pratikan re vekirî bin û em wêrekî nîşan bidin. Divê em nebêjin: “Kêmasiya me ye, carinan kêmasî

û şaşîtî derdikevin, em ser bigirin û derbas bikin ê çi baş bibe.” Em dikarin derbas bikin û ser bigirin, lê ew tiştekî nade me. Şaşîtî û kêmasî derketin holê em ê binirxînin. Dibe ku dîtin û ferqkirina şaşîtiyên xwe mirov biêşîne jî; lê ji bo ku êdî em ya rast pêk bînin, divê em şaşîtiya di wê derê de bibînin û li ser vî esasî dê ya rast çawa bibe, em tehlîl bikin. Ger em vê nekin, em ê dîsa şaşîtiya berê bidomînin. Em ê bikevin rewşeke ku nikarin yên rast pêk bînin. Em ê ya rast çawa bikin? Li ku derê bikin? Ger em vê bizanibin, em ê ya rast pêk bînin; lê ger em nizanibin û nikaribin derxin holê, em ê çawa bikin? Em nikarin bikin. Ji bo vê divê em bi awayekî rast nêzîkî pratîkê jî bibin. Yek, divê em vekirî bin. Dudu, divê em wêrek bin. Sisê, divê em di her tiştî de şênber bin. Çar, wek rêbaz divê em ji ya giştî werin ya taybet. Wisa bi jiberkirinan, ne şênber, yek bi yek bûyer girtina dest, ya giştî negirtina dest û wisa nirxandin nekirin nabe. Ew nêzîkbûnên şaş in. Encamên rast jî nadin.

Li gorî pêwîstiyên xeta Serokatiyê nêzîkbûnek pêwîst dike. Yek jî di vê derê de nêzîkbûneke rast, bi îstîkrar û dide qezenckirin pêwîst dike. Em çima van dikin? Ji bo ku em xirabiyên hinekan derbixin, an jî ji bo em hinekan tewanbar bikin û mehkûm bikin nakin. Ji bo ku em şaşîtiyan derbas bikin û em bikaribin ya rast pêk bînin dikin. Ger em vê nekin, em ê dîsa şaşîtiyan bikin. Ji bo ku êdî em yên rast pêk bînin, divê em pratîka xwe ya heya niha analîz bikin; ka şaş e, an rast e? Di vê derê de guman pir çêdibin, pir zêde girtîbûn heye. Bi qasî ku gengaz e, heval dixwazin nekevin navê. Di kelekê re derbas dibin, an jî bi hinekên din îzah dikin. Ew ne rast in. Divê em di vê mijarê de wêrek bin. Divê em kêrê tam lê bidin, wisa di kelekê re derbasbûn nabe.

Qezenckirin jî girîng e. Yek jî di rexne û nirxandinan de, divê em ji aliyê rêbazê ve di du xalan de baldir bin. Ya yekemîn, divê em nebêjin: “Li gorî min wisa ye.” Jixwe Serokatiyê di hevdîtineke xwe de got: “Êdî ez tune, divê PKK gotina ez dev jê berde, êdî em hene.” Divê em nebêjin: “Ez wisa difikirim, li gorî min wisa ye.” Li gorî xeta partiyê çawa be, divê em wisa bifikirin. Tiştên ku diqewimin, li gorî xeta partiyê û Serokatiyê çawa ne? Divê em di nirxandinê de vê xetê esas bigirin. Ya duyemîn, divê em sererastkirinê esas bigirin. Armanca me, teqez divê ji pratikan wane derxistin be. Ji ya şaş wane derxistin, ya rast dîtin û pêkanîn esas e. Di vê derê de avakirin esas e, nexwe divê bi awayekî ku kesekî/ê mehkûm dike û dixîne nebe. Divê islûbekî wisa neyê bikaranîn. Yek jî divê em rexneyên xwe, ji bo wane derxistin û

encamgirtinê bikin. Divê em bi şêwazeke ku vê encamê bide, bikin. Ya din, bi tu awayî ne rast e. Me ji ya rast dûr dixe û bertekan ava dike.

Xaleke din jî, pratîkeke me ya giran heye, şaşîtî û kêmasî pir in. Serokatiyê got: “Ya ku tê pêkanîn, ji sedî yek e.” Ev rewşeke pir giran e. Ji ber vê revek heye. Ji analîzkirin û lêpirsînkirina pratîkê rev heye, jê dûr sekinîn heye. Wek nêzîkbûnekê heye. Cihê wê, bi tiştên giştî tê derbaskirin, bi teoriyên giştî tê derbaskirin. Di nav ya giştî de, tiştên şênber tên fetisandin. Divê wisa nebe. Çi dibe bila bibe, carekê me ew tişt kirine. Em xwe veşêrin, ê çi bibe? Jixwe partî dikare wan pratikan binirxîne. Jixwe Serokatiyê nirxand û di encama wan pratikan de ferman da. Gelo em veşêrin ê çi bibe, em veneşêrin ê çi bibe? Li gorî partiyê eşkere ye, ger em veşêrin, em ê xwe bixapînin. Ji ber vê divê em wêrekiyê nîşan bidin, divê em bizanibin ji pratîkê fêr bibin. Partiyên şoreşger, xwe li ser pratîka xwe perwerde dikin. Şoreşger, li ser pratîka xwe tên perwerdekirin. Ew têgeheke girîng ya lîteratûra sosyalîzmê bû. Li ser waneyên xwe tên perwerdekirin, dê ew zêdetir mayînde bibe. Nexwe ya din, jiberkirin e, teori ye, tenê hinekî perspektîfan ava dike, rê nîşan dide. Şênber nake.

Di fikir de şênberbûn, bi waneyên pratîkê dibe. Ger em waneyên pratîkê dernexin, em nikarin di pratîkê de şênbêr bibin. Em ê giştî û teorik bimînin. Em ê bibêjin û nekin; wê demê em ê ji hinekên din hêvî bikin, da ku pêk bînin. Lê ew jî nekin, em ê çi bikin? Heval radibin û rexne dikin, lê mafê me yê rexnekirinê tune, ji ber ku divê em bikin, berpirsyarê pêkanînê em in. Ji ber vê bi hêvîkirina ji hinekan, tiştek nakeve destê me.

**Ger Rexne û Rexnedayîn Tunebe Em Nikarin Fikrên Nû Bi Pêş Bixin**

Niha ev jî mijareke girîng e, bi vî rengî nêzîkî pratîkê bûn, girîng e. Divê em nêzîkbûna rexne-rexnedayînê teqez pêk bînin. Rexne û rexnedayîn, rêbazeke pir xweş e. Ger ev nebe, em nikarin fikir ava bikin. Dev ji rêxistinê berde, em nikarin bibin civak jî. Em ê nizanibin sibê çi bikin. Hinekî bi zehmetî dibe, bi êş dibe; lê perwerde bi wê dibe, tenê em bi vî awayî dikarin xwe bigihînin rastiyan û bibin kesên ku rastiyan pêk tînin. Wisa be em çi bikin? Ji ber ku êş dide, em nikarin dev jê berdin. Ji bo me rêbazeke jêveneger e. Rêbaza esasî ya perwerdeya me ye, rêbaza esasî ya rêxistinbûna me ye, rêbaza bingehîn ya çareserkirina pirsgirêkan e.

Her tişt bi rexne û rexnedayînê dibe. Ji ber vê nêzîkbûna bi rexne û rexnedayîn girîng e. Bi kûranî pêkanîna wê girîng e. Mirovê/a bi hêz vê dike; mirovê/a perwerdekirî, di cewhera xwe de kesê/a ku dikare rexne û rexnedayînê bike ye. Tiştê ku em ji perwerdeyê fêr bibin, pêkanîna rexne û rexnedayînê ye. Bi ya min, yên din hemû ji serê me bifirin û biçin; ger em fêr bibin, ya ku bimîne rêbaza rexne û rexnedayînê ye. Her ê ew me bibe encamê. Rexne û rexnedayîneke rast wek ku pirsgirêkan fêrî me dike, em ê çi, çawa bikin, wê jî fêrî me dike. Em ê bi hêsanî li ser wî esasî bimeşin. Ji bo vê jî, ji vê re vekirîbûn pêwîst dike.

Ger bala we kişandibe, bernameya perwerdehiya me ber bi cihekî ve diçe. Em xeta giştî ya Serokatiyê dipejirînin; li ser vî esasî em pratîka giştî ya partiyê analîz dikin û jê waneyan derdixin; em ji wê derê ber bi pratîka xwe ve tên. Di nav van tiştan de, em li ku derê ne? Me kêmasî û şaşîtiyên çawa nîşan dane? Çima wisa bûye? Vîna me ya pêkanîna rastiyan çiqas e? Em ê van jî, di platforman de binirxînin. Platformên şexsî yên ku di dawiya perwerdeyê ya ku tên lidarxistin de; kes paşeroja xwe analîz dike û jê waneyan derdixe, ji bo pêşerojê xwe amade dike, bi biryar dike, bi pergal dike. Platform tê vê wateyê. Dema ku ev, di asteke bes de nîşan da, partî jî erê dike û li ser vî esasî diçe peywirên pratîkî. Ger partî erê neke, nikare biçe. Ger helwesteke ku nayê erêkirin derkeve holê, partî jî erê nake, platform jî erê nake.

**ENCAM**

Me waneya xwe xilas kir. Perwerdeyeke sererastkirinê ye. Bala xwe bidinê, kêmasî û şaşîtiyên me hene. Divê teqez em li ser esasê xeta Serokatiyê sererastkirinekê bikin. Ji bo vê divê em fêrî rastiya Serokatiyê bibin û pratîka xwe dahûrîn bikin. Ya duyemîn, em di pêvajoyeke girîng re derbas dibin. Li her cihê Kurdistanê pêşketinên şoreşgerî tên jiyankirin. Şerekî mezin rû dide. Em di pêvajoyekî dîrokî re derbas dibin. Berpirsyariyeke me ya wek belavkirina Şoreşa Rojava li her çar parçeyên Kurdistanê û yekîtiya demokratîk ya Kurdan pêkanînê heye. Li ser vî esasî divê em li hemû parçeyan şoreşa azadiyê bigihînin serkeftinê û em pêşiya şoreşa Rojhilata Navîn ya demokratîk vekin. Peywireke me ya dîrokî ya bi vî rengî heye. Derfet û îmkanên vê hene, her tişt amade ye; lê em ne di asteke bes de ne, em ne amade ne. Ji aliyê hecm û çawaniyê ve em ne bes in, ji bo vê em perwerdehiyeke amadekariyê li dar dixin.

Me di serî de jî diyar kir, ger em amade bin, em ê şerê vê bikin. Teqez em ê şoreşê pêk bînin û li her cihî pergala xwe înşa bikin. Peywir ew qas zêdê ne, lê ji ber ku em kêm in û ne amade ne, em nikarin bikin. Her kes jî ji nefêmkirinê tê. Li Bakur, pêvajoyek dimeşe, her kes şoq bûye. Dibêjin: “Ger pêvajo tune be, PKK ji vê bawer nake û ruxmê wê jî têkoşîn nake; wisa be, di pêvajoyê de tiştek heye, hevdîtin tên kirin, gelo çi dibe?” Bi vî rengî hewl didin, fêm bikin. Ev şîlobûn, ji ber rewşa me derdikeve holê. Ji bo vê gelek fikir û şaşiyên derdikevin holê û rengvedana vê li ser civakê jî dibe. Divê em pêşiyê li vê bigirin, bingeha xwe ji pratîzenebûna me digire. Ger em asteng nekin, dê gelek şaşî û pêşdaraziyên din jî derkevin holê. Divê em vê rewşê bi awayekî bilez derbas bikin.

Ji bo pirsgirêk fêrbûna hinek tiştan nîn e. Pirsgirêk, ji wê pêngava şoreşgerî re amadebûn e. Bala xwe bidinê, ji aliyê bîrdozîk, rêxistinî û rêveberiyê ve gelek peywirên girîng yên sererastkirinê hene. Pirsgirêkên me yên partîbûnê hene. Em nikarin van taloq bikin, divê em ji bo serkeftinê van çareser bikin. Ji aliyê din ve, ji aliyê leşkerî-siyasî ve jî divê em amadekariyên pêngaveke mezin bikin. Ji bo serkeftinê, ev şert e. Ew jî peywireke ku nayê taloqkirin e.

Em di rewşeke wisa de ne; divê an em pêngava şoreşgerî bi ser bixin û dîrokê binivîsin; an jî deskeftiyên di destê me de ne jî dê heba

bibin, dê tune bibin. Em di rewşeke wisa de ne. Wisa be, divê em vê dewreyê wisa bigirin dest û li gorî vê tevlî bibin. Serkeftina wê, dê hem kêmasiyên me yên partîbûnê ji holê rake, hem jî dê bihêle ku em pêngavake mezin ya leşkerî-siyasî bikin. Ji bo ew pêk were jî, çi pêwîst bike divê em bikin. Divê kêmasî û lewaziyek dernekeve holê. Ger em di vê derê de biser bikevin, em ê hem sererastkirinê bikin, hem jî pêngavê li dar bixin. Wisa be, perwerde ne tiştekî derveyî pratîkê ye; teqezkirina serkeftina pratîkê ye. Dibêjin: "Şer, beriya şer, di dema amadekariyê de, tê qezenckirin." Dê em jî di perwerdeyê de hewl bidin vê bikin. Ger em perwerdeyeke rast û têr bibînin, em dikarin bi awayekî serkeftî vê pêk bînin; divê mirov bi vê jî bawer bike û li gorî wê tevlîbûnekê bike.

# WATE Û GIRÎNGIYA PERWERDÊ

*“Perwerdeya me, perwerdeyeke têkoşînê ye. Parçeyek ji têkoşîna hundirîn e. Di qada leşkerî û siyasî de, di têkoşîna li hemberî hêzên derve tê dayin de û li hemberî bandorên van hêzan ku di nav me de avakirine, têkoşîneke bîrdozîk û rêxistinî ye. Wisa be divê em perwerdeyê wek diyardeyeke têkoşînê bigirin dest. Li hemberî bandorên ku dijmin di nav me de avakirine; têkoşîneke hundirîn, têkoşîneke çînî û cînsî ye. Têkoşîneke terbiyekirina nefsa xwe ye.”*